



### NAVEROKA HEJMARA 13

#### Sernivîsar

Rengîn bi kurdî, r. 2

#### Husein Muhammed

Hoker di zimanê kurdî de, r. 3

#### Mikaîl Bilbil

Peyvrêzî di frazên navdêrî de, r. 18

#### Zafer Açar

Qertaf, ravek, r. 52

#### Seîd Veroj

Xebatên pêşîn li ser alfabeya kurdî-latînî, r. 63

#### Ayhan Yıldız

Xelîl Xeyalî û kurdî berî sed salan, r. 75

#### Ce'ferî Şêxulîslamî

Zimannasî çi ye?, r. 82

#### Hesenî Qazî

Zimanekanî Hindistan, r. 92

#### Deham Ebdulfettah

Lêker di zimanê kurdî de (3), r. 101

#### Ayhan Meretowar

Edebiyata kurdî ya klasîk, r. 128

#### Destana Derwêşê Evdî

li inglîzî hat wergerandin, r. 140

#### Seîd Veroj

Analîzek Seyehmed û Xece sero, r. 144

#### Şahîne Bekirê Soreklî

Tehlûkeya li ser kurmancî, r. 180

#### Rêzimana zimanê inglîzî

bi ravekirina kurdî, r. 185

#### Krzysztof Lalik

Language policy in Kurdistan, r. 265

#### Michiel Leezenberg

The Shabaks and the Kakais, r. 283

## Sernivîsar

### Rengîn bi kurdî

Kerem bikin hejmareke nû ya kovara xwe û zimanê xwe *Kanîzarê*, xwandevevanên hêja. Vê carê em hejmareke 300 rûpelî û bi naverokeke dagirtî bi kurmancî, soranî, zazakî û inglîzî dixin xizmeta we kurdiyarên anku evîndarên zimanê kurdî.

Di vê hejmarê de **Husein Muhammed** hokerên (hevalkar, zerf, *adverb*) kurdî bi berfirehî dide nasîn. Nivîsara wî ya din vê carê li ser bingehên rêzimana inglîzî bi ravekirina bi zimanê kurdî ye.

**Mikaîl Bilbil** vekolîneke li ser peyvrêziyê pêşkêş dike. **Zafer Açar** qertaf û ravekên rêzimanî bi berfirehî vedikole.

Bi soranî **Ce'fer Şêxulîslamî** beşên cuda-cuda yên zimannasiyê dide nasîn. Dîsa bi soranî **Hesen Qazî** behsa pirzimanîtiya Hindistanê dike.

Vekolîna **Deham Ebdulfettahî** li ser lêkerên (fiil, kar, verb) kurdî di vê hejmarê de jî didome. Hin beşên wê dê hê têra çend hejmarên bîna jî bikin.

Di vê hejmarê de em çend gavan ji zimannasiyê ber bi edebiyatê ve jî diavêjin bi şertê ku têkiliya wê bi zimanê kurdî ve hebe. Bi vê minasebetê em vekolîneke **Ayhan Meretowar** li ser edebiyata kurdî ya klasîk belav dikin.

Herwiha em cih didin nivîsareke **Şahîne Bekirê Soreklî** li ser wergera dastana Derwêşê Evdî ji kurdî li inglîzî. Nivîsara din ya Soreklî li ser tehlûkeya derbarê man û nemana kurmancî ye.

Ji **Seîd Verojî** em nivîsarekê bi zazakî û yekê jî bi kurmancî belav dikin. Nivîsara bi zazakî dastana Xecê û Siyabendî vedikole. Nivîsara wî ya bi kurmancî jî li ser dîroka bikaranîna alfabeya kurdî-latînî ye.

Bi inglîzî di vê hejmarê de em cih didin vekolîneke lêkolerê polonî **Krzysztof Lalik** li ser siyaseta zimanî li Kurdistanê. Vekolîna din jî ya vê hejmarê bi inglîzî ji lêkolerê holandî **Michiel Leezenberg** e û derbarê şebekê û kakeyiyan û zimanê wan e.

Kerem bikin *Kanîzara* xwe bixwînin û jê re binivîsin!

## HOKER DI ZIMANÊ KURDÎ DE

*Husein Muhammed*

### MIJAR Û PEYVNASIYA WÊ

**Hoker** anku *hevalkar* (bi inglîzî *adverb*)<sup>1</sup> ew peyv in ku wek ravekerên lêkeran (karan, fiilan, verban) tên bikaranîn. Hoker adeten çawaniyê, demê, cihê, sebebî yan awayê kirina yan qewimîna tiştêkî diyar dikin.

Navên ku di rêzimanê de li van peyvan hatine kirin çawaniya wan peyvan diyar dikin. Bo nimûne, "hoker" ji hi peyva "ho" (hosa, usa, wisa, wiha, bi vî/wî awayî) û ji "-ker" (kirin) hatiye çêkirin. Peyva "hevalkar" (ku bi piranî di rêzimanên Başûrê Kurdistanê de tê bikaranîn – bi soranî bi awayê "awelkar") ji peyva "heval" û "kar" (lêker, fiil, verb) hatiye çêkirin ji ber ku hoker/hevalkar bi piranî li gel lêkeran tên bikaranîn û wan şirove û rave dikin.<sup>2</sup>

Hoker dikarin bersiva pirsên wiha didin:

- çawa?
- kengî?

Bo nimûne (hoker di nimûneyan de hatine *xwehrkirin*):

- zû hat (çawa hat?)
- îro dît (kengî dît?)

Ew herwiha dikarin bikevin pêşiya frazên lêkerê. Bo nimûne:

- xweş stranan dibêje

<sup>1</sup> Bi tirkî zarf, erebî ظرف û farisî قيد

<sup>2</sup> Bidin ber "hevalnav" anku "rengdêr" ku navdêran (navan) rave dikin.

Tevî ku hoker bi piranî wek ravekerên lêkeran tên nasîn. Lê hoker dikarin ji bilî lêkeran herwiha bi taybetî bo xurtkirina an sistkirina rengdêran jî tên bikaranîn:

- *zêde xweş*
- *gelek hêja*

Hoker herwiha dikarin wek ravekerên hev jî bîn xebitandin:

- *pir bihêz* neajo! (hem "pir" û hem jî "bihêz") di vê hevokê de hoker in.)

## HOKER JI ALIYÊ WATENASÎ Û BIKARANÎNÊ VE

Ji aliyê watenasî û bikaranînê ve hoker dikarin li ser çend beşên cuda bîn parvekirin:

- hokerên demî
- hokerên cihî
- hokerên çawaniyê
- hokerên çendaniyê
- hokerên misogerkirinê
- hokerên neyînîkirinê
- hokerên pirsiyarkirinê
- hokerên mixabiniyê
- hokerên dubarekirinê

### Hokerên demî

Bi alîkariya hokerên demî wextê kirina an qewimîna tiştekî tê diyarkirin. Mirov dikare hokerên demî li ser çend beşan parve bike û nimûneyan jê bide:

- nuqteyên demî yên diyar: bo nimûne "îro, sibê, îşev, duhî, pêr, petrapêrar, hingê..."
- nuqteyên demî yên nediyar: "berê, niha, hingê, paşî, pêşî, dûv re, şûn de..."
- dubarebûnên diyar: bo nimûne "hero / herroj, salane, her hefte..."

- dubarekirinên nediyar: bo nimûne "roj bi roj, heta û heta, carinan, daîmen, hergav, tîcar / çucar, qet, qetiyen..."

-

Hokerên demî bi piranî peyvên dariştî ne, bo nimûne:

- "îşev" ji "î-şev"
- "rojane" ji "roj-ane"
- "herdem" ji "her" û "dem"

Lê hin peyv jî li gor zimanê niha wek peyvên xwerû tînan hesibandin, bo nimûne "duh(î), pêr, hingê" lê di rastiyê de ew jî tarîxiyên peyvên pêkhatî ne.<sup>3</sup>

## Hokerên çawaniyê

Bi alîkariya hokerên çawaniyê (hokerên awayî), mirov awayê kirin an qewimîna tiştê diyar dike.

Hokerên çawaniyê gelek caran rengdêr in ku wek hoker tînan bikaranîn:

- zû herin
- xweş diaxivin

Awayê din yê berbelav yê çêkirina hokerên çawaniyê ew e ku rengdêr pêşî bi paşgirekê (adeten –î) tînan navdêrkirin û paşî bi pêşgira "bi" dibin hoker. Bo nimûne:

- azad (rengdêr) → azadî (navdêr) → bi azadî (hoker)

Hokerên çawaniyê dikarin paşgiran jî ji rengdêran bînin çêkirin (bo nimûne bi paşgiran –ane, -ka – li jêrtir binêrin.)

<sup>3</sup> Bo etîmolojiya van peyvên, binêrin: Rehnas – ferhenga etîmolojî ya kurdî:  
<https://zimannas.wordpress.com/2016/11/02/3073/>

## Hokerên cihî

Bi alîkariya hokerên cihî mirov der û devera qewimîna yan kirina tişteki diyar dike. Hin nimûne ji hokerên cihî ev in:

- vir
- wir
- hindir
- jêr
- jor
- pêş
- paş
- hindir

Hokerên cihî dikarin an serbixwe yan jî li gel daçekên wek "ji, li, bi ...ve" û hwd. din bîn xebitandin.

## Hokerên çendaniyê

Hokerên çendaniyê miqdara anku qiyasa tiştan diyar dikin. Hinek ji nimûneyên hokerên çendaniyê ev in:

- gelek, pîrr, zehf, zêde, kêr, hindik...

Hokerên çendaniyê adeten rengdêr in ku bêyî ti pêşgir an paşgir an wek hokerên tîr bikaranîn.

Hokerên çendaniyê dikarin hem bikevin pêş lêkeran û hem jî pêş rengdêran:

- pîrr xweş
- pîrr xwar

## Hokerên pirsiyarkirinê

Hokerên pirsiyarkirinê yan pirsiyarkî çend peyv in ku pê dem, cih, çawanî yan çendaniya tiştan tê pirsîn. Bo nimûne:

- kengî / kingê
- çima, çira, bo çi
- çawa(n), çilo(n), çito(v) / çito(r)
- çend, çiq(iy)as, çi qeder

Herwiha peyvikên giştî yê pirsînê jî wek hokerên pirsiyarî tên hesabandin:

- gelo, ma, aya

Di kurmanciya rojhilatî de bi taybetî vê dawiyê peyva "erê" – ku bi eslê xwe hokereke misogerkirinê ya bi wateya "belê" ye – êdî zêdetir li şûna "gelo, ma, aya" wek hokereke pirsîkirinê tê xebitandin. Bo nimûne: "Erê tu çûyî?" (Gelo tu çûyî?)

## Hokerên misogerkirinê

Mebest ji hokerên misogerkirinê anku tekîdkirinê ku ew peyv û peyvik in ku mirov pê hin gotinan an hevokan piştrast an mikum dike yan jî şika ji wan diyar dike. Bo nimûne:

- belê, erê, bêguman/bêşik, jixwe / nexwe / manê, helbet, tabî / teb'en, zaten, belkî, texmînen, ihtimalen...

Hinek ji hokerên misogerkirinê peyvên xwerû ne, ji nimûneyên me "belê, erê, helbet". Hinek jî peyvên pêkhatî yan dariştî ne, bo nimûne "bêguman, jixwe, nexwe". Hinek bi eslê xwe peyvên xwemalî ne, bo nimûne "erê, jixwe, nexwe", hinek jî ji zimanên din hatine, wek mîna "belê, helbet, tabî / teb'en, zaten" ku bi eslê xwe ji erebî ne. Hinek hokerên misogeriyê yê pêkhatî yan dariştî ji peyveke xwemalî û yeke bi eslê xwe biyanî hatine çêkirin, bo nimûne "bêşik" ku ji "bê" ya xwemalî û "şik" ya bi eslê xwe erebî hatiye sazîkirin.

## Hokerên neyînîkirinê

Mebest ji hokerên neyînîkirinê yan nerênîkirinê ew peyvik in ku pê tê diyarkirin ku gotinek an hevokek nerast e yan jî dijîtiya tiştêkî tê kirin. Bo nimûne:

- na, ne, nei, no... (û formên din yê devkî û devokî yê wek wan)
- qet, hîç, ti / tu / çu (wek "ti car, tu car, çu car...")
- eslen, qetiyen
- ti car / çu car / tu car, hergîz

Hinek ji hokerên neyînîkirinê peyvên xwerû ne, wek "na / ne, qet, hîç, ti / çu". Hinek jî peyvên dariştî yan pêkhatî ne, wek "eslen, qetiyen" (ji "esl+en, qet'+en) yan "ticar / ti car". Hinek bi eslê xwe xwemalî ne, wek "na, ne, ti, hîç" lê hinek jî ji zimanên din hatine, wek "qet, eslen" ji erebî yan "hergîz" (ti car, çu caran) ku vê dawiyê bi rêya soranî ji farisî ketiye hin nivîsên kurmancî jî.

## Hokerên heyf an mixabiniyê

Mebest ji hokerên heyfê yan hokerên mixabiniyê ew peyvikên hoker in ku bêjer bi wan dixwazin xembîniya xwe yan nerazîbûna xwe bi wan peyvikan diyar bikin. Bo nimûne:

- mixabin, maalesef, heyf (wek di gotina "heyf ku ew şehîd bû"), bi dax ve (li ber modêla soranî "be daxewe")

## Hokerên dubarekirinê

Mexsed ji hokerên dubarekirinê ew peyvên hoker in ku pê dubare- anku tekrarbûn tê diyarkirin. Bo nimûne:

- dîsa / dîsan, cardin, dubare, tekrar (wek di gotina "film dubare/tekrar hat weşandin")
- carinan, hin car / hincar / hinca
- geh-geh, dem bi dem



## PEYDABÛNA HOKERAN

Di zimanê kurdî de hoker dikarin peyvên xwerû yan dariştî bin. Mebest ji "peyvên xwerû" li vê derê ew e ku ew peyv ne ji du yan çend peyvên din û ne jî ji peyvekê û yek yan çend gireyan (pêşgiran an paşgiran) peyda bûne.

### Hokerên xwerû

Bo nimûne, peyvên wek "hêdî, kêr, pîr, zêde, xweş, zû" hokerên xwerû ne ji ber ku mirov nikare wan êdî parve bike ser çend beşan.

Hokerên xwerû yê çawaniyê bi eslê xwe rengdêr in lê li gor bikaranîna wan di hevokê de ew carinan rengdêr in û carinan jî navdêr in. Bo nimûne:

- ew straneke xweş e ("xweş" li vê derê rengdêr anku sifet e)
- ew xweş diaxive ("xweş" li vir hoker e)

Cudahiya hokeran ji rengdêran di kurdî de ew e ku rengdêr dikevin dûv navdêrên ku rengdêr şirove dikin lê hoker dikevin pêş peyvên ku rave dikin:

- straneke xweş ("xweş" li vir rengdêr e)
- xweş diaxive ("xweş" li vê derê hoker e)

Hokerên xwerû di kurdî de dikarin bi eslê xwe peyvên xwemalî bin (ji nimûneyên li jor "kêr, pîr, xweş, zû) yan jî bi eslê xwe biyanî bin (ji nimûneyên li jor "hêdî, zêde" ku bi eslê xwe ji erebî hatine.)

## Hokerên dariştî

Hokerên dariştî dikarin bi alîkariya pêşgir an paşgiran bên sazkerin. Ew herwiha dikarin bi rêya dubarekirinê jî peyda bibin.

### Bi pêşgirên "bi" û "bê"

Awayê herî berbelav ê çêkirina hokeran di kurdî de bi alîkariya navdêran li gel peyvika "bi" ye:

- bi roj (*daily*), bi şev (*at night*), bi xweşî (*joyfully*), bi şadî (*happily*), bi rehetî (*calmly, in a calm manner*), bi xirabî (*badly*), bi mêranî (*bravely*)...

Ew hem dikarin hokerên demî bin (wek "bi roj, bi şev") û hem jî hokerên çawaniyê bin (bo nimûne "bi mêranî, bi xirabî").

Wek ku tê dîtin, hin ji van peyvên bingehîn di eslê xwe de pêşî ji rengdêriyê bûne navdêr û paşî jî bi alîkariya "bi" bûne hoker:

rengdêr →	navdêr →	hoker
xweş	xweşî	bi xweşî
şad	şadî	bi şadî
rehet <sup>4</sup>	rehetî	bi rehetî
xirab <sup>5</sup>	xirabî	bi xirabî
mêr <sup>6</sup>	mêranî	bi mêranî

Hêjayî gotinê ye ku cudahiya hokerên bi pêşgirên "bi" û "bê" sazkerî ji navdêrên bi daçek ew e ku ev hoker nayên çemandin lê komikên daçekî tên çemandin. Bo nimûne:

- bi roj (= hoker)
- bi rojê (= komika/fraza daçekî)

<sup>4</sup> "Rehet" û "xirab" a li dûv wê ji erebî ne û bi eslê xwe di erebî de navdêr in lê di kurdî de ew wek rengdêr tên bikaranîn. Formên wan ên navdêr "rehetî, xirabî" ne.

<sup>5</sup> Binêrin têbîniya pêştir.

<sup>6</sup> Bi eslê xwe peyva "mêr" navdêr e lê li vê derê bi guhastinê bi maneya "wêrek, bicesaret, bisteh" wek rengdêr hatiye bikaranîn û forma wê ya navdêr wek "mêranî" hatiye çêkirin.

Mirov dikare van herdu awayên ji hev cuda di hevokên wiha de bibîne:

- Bi roj em şiyar in. (bi roj = hoker)
- Bi rojê (bi alîkariya roja li esmanan) dinya germ dibe. (bi rojê = komika daçekî)

Peyvika “bi” herwiha bi ketina nav peyveke dubarekirî jî hokeran çêdike:

- roj bi roj
- sal bi sal
- cih bi cih
- ser bi ser

### Bi pêşgira “î-“ û varyantên wê

Pêşgira “î-“ çend hokerên demî çêdike:

- îro (< îroj)
- îşev
- îsal
- îcar (> îca, îjar, îja...)

Li vê derê pêşgira “î-“ wateya “vê, ev” dide peyvên “ro(j), şev, sal, car” yên bi eslê xwe navdêr û wan dike hoker. Li gor devokan varyantên pêşgira “î-“ wiha ne:

- bi kurmancî: i-, hi-, hî- (bo nimûne “iro, hiro, hîro” anku “îro”)
- bi soranî: em-, îm- (emro, îmro = îro)

Di kurmanciya rojhilatî de bikaranîna pêşgira “î-“ yan nadir e (carinan varyanta wê di peyva “iro, iroke” de tê bikaranîn lê formên serdest “evro, evroke” ne) yan jî qet peyda nabe (formên wek “îşev, îsal, îcar” nayên bikaranîn û li cihê wan gotinên wek “ev şeve, ev sale, vê carê” li kar in).

### Bi pêşgira “her-“

Peyva her bo pêkanîna hin hokeran dibe pêşgir û wan wiha saz dike:

- herdem (daîmen)
- hergav (daîmen)
- hero / herro < heroj / herroj (her roj)

### Bi paşgirên "-ka, -ke"

Paşgira "-ka" çend hokeran ji çend rengdêran saz dike:

- dûr > dûrka
- hêdî > hêdîka
- zû > zûka

Paşgira "-ka" û varyanta wê tarîxiyên herwiha peyvên wek "nika" ya kurmanciya rojavayî û zazakî, "noke, nuke" yê kurmanciya rojhilatî û "henûke" ya soraniya mukriyanî jî çêkirine ku hemû maneya "niha, vê gavê" didin. Heman paşgira "-ke" herwiha peyvên "evroke, iroke" yê kurmanciya rojhilatî de jî hene ku alternatîvên formên "evro, iro" yê bi wateya "îro, vê rojê" ne.

Lê paşgirên "-ka, -ke" êdî di peyvsaziyê de ne çalak in û hokerên nû saz nakin.

Cudahiya peyvika "bi" di çêkirina hokeran de ji "bi" ya daçek ew e ku peyva serekî li pey daçekê diçeme lê di hokersaziyê de naçeme:

- "bi" wek daçek: bi + hêz → bi hêz-ê (*by force, with power*)
- "bi" di hokersaziyê de: bi + hêz → bi hêz (*forcibly, powerfully*)

Carinan herdu form jî mimkin in:

- bi zor (hemû komik / fraz bi hev re = hoker)
- bi zorê (bi = daçek, zor = navdêr)

Cudahiya "bi" di hokersaziyê de ji "bi" di rengdêrsaziyê de ew e ku di hokersaziyê de ew ji peyva serekî cuda tê nivîsîn lê di rengdêrsaziyê de ew bi peyva pey xwe ve dizeliqe:

- rengdêr: bi + hêz → bihêz: *Ew kesekî bihêz e.* (ew xurt e, ew qewî ye)
- hoker: bi + hêz → bi hêz: *Ew bi hêz şer dike.* (bi xurtî)

### Bi paşpirtika “-ane”

Vê dawiyê paşpirtika –ane bi rêya soranî ji farisî ketiye kurmancî jî û xaseten di zimanê nivîskî de pir tê bikaranîn bo çêkirina hin peyvan ji navdêran. Gelek ji wan peyvan hem wek hoker, hem wek hoker û hem navdêr tîn bikaranîn:

- mehane:
  - o rengdêr: *kovara mehane* (ya ku her mehê carekê derdikeve, *monthly*)
  - o navdêr: mehaneya wî 3 000 dolar e (meaş, muçe, pareyê ku her mehê ji ber karkirina xwe werdigire, *monthly salary*)
  - o hoker: em mehane hev dibînin (her mehê, her mehê carekê, di mehê de carekê, *every month*)

Tevî ku ev paşpirtik heta van dehsalên dawiyê di kurmancî de tine bû jî, ew niha di zimanê nivîskî de bi awayekî pir aktîv tê bikaranîn û bikaranîna wî roj bi roj zêdetir dibe.

### Paşpirtika “-kî”

Paşpirtika –kî hin hokeran bi taybetî ji navên gel an deveran çêdike:

- erebkî (wek ereban, mîna ereban)
- ermenkî (wek ermenan, mîna ermenan)

Paşpirtika –kî herwiha dikeve pey peyveke dubarekirî jî û wisa hokeran çêdike:

- paşpaşkî, pêşpêşkî

### Bi paşpirtikên “-î” û “-ê”

Hin rengdêr di kurmanciya navendî de dikarin bi paşpirtika –î bibin hoker. Di kurmanciya rojhilatî de li cihê wê paşpirtika –ê tê bikaranîn. Di herdu komdevokan de jî mimkin e ku ew heman rengdêr bêyî ti paşpirtikê bi guhastinê wek hoker bîn bikaranîn:

rengdêr →	hoker bi -î	hoker bi -ê	hoker bi guhastinê
gelek	gel(e)kî	gelekê	gelek
hin(d)ek	hin(e)kî	hindekê	hin(d)ek
piçek	piç(e)kî	piçekê	piçek

Paşpirtikên -î û -ê di çêkirina hokeran ji rengdêran de êdî ne berhemdar û çalak in. Mirov nikare ji bilî van nimûneyên li jor (û belkî du-sê libên din) zêdetir hokeran pê ji rengdêran çêke.

### Paşpirtika “-en”

Ev paşpirtika bi eslê xwe erebî ye û bi piranî tenê li gel peyvên ji erebî wergirtî heye. Ew hokeran hem ji rengdêran û hem jî ji navdêran saz dike:

- heqîqet → heqîqeten
- ihtimal → ihtimalen
- qetî, qetî → qetiyen
- waqî' → waqî'en, waqiyen
- tarîxî → tarîxiyen

Carinan rengdêr bi xwe di kurdî de cih negirtiye yan pir kêm li kar e lê hokera jêçêkirî peyda dibe û berbelav e. Bo nimûne:

- teqrîb-en

Hin caran ev hem paşpirtik li peyvên ne-esil-erebî jî tê barkirin:

- dîrokî → dîrokiyen<sup>7</sup> (wek wergera “tarîxiyen”)

### Bi navgîna “û”?

<sup>7</sup> Nimûneyek ji bikaranîn peyva “dîrokiyen”: “Lê ermenî jî hin peyv dane zimanên îranî, bi taybetî kurmancî û zazakî ku dîrokiyen bi ermeniyên re û di nav ermeniyên de hebûne.” <https://zimannas.wordpress.com/2015/11/19/peyven-me-ji-ku-ten-2/>

Di gotina “hetaûheta” yan “heta û heta” de wisa dixuye heçku peyvika “û” hatibe bikaranîn. Ji aliyê etîmolojî ve eslê peyvê “heta bi heta” bûye wek “roj bi roj” lê di bilêvkirina sivik de B bûye W û taliyê wek “heta û heta” hatiye texmînkirin.

## WEKHEVÎ Û CUDAHİYÊN HOKERAN JI RENG DÊR Û NAVDÊRAN

Hin hoker ji gelek aliyan ve dişibin rengdêran, hin jî mîna navdêran in. Lê dîsa jî ew ji hin aliyên din ve ji rengdêr û navdêran cuda ne loma ew wek bireke an sinifeke cuda ya peyvyan tîs hesabandin.

Li jêr em ê pêşî behsa wekheviyên hokeran li gel rengdêr û navdêran bikin. Dûv re jî em ê berê xwe bidin cudahiyan hokeran ji navdêran û rengdêran û sebebên serbixwetiyê hokeran ji rengdêr û navdêran diyar bikin.

### Wekheviyên hokeran li gel rengdêr û navdêran

Gelek peyv hene ku bi şikl û dirûvên xwe eynî ne lê tenê bikaranîna wan di hevokan de carinan wan dike rengdêr û hin caran jî hoker. Bo nimûne:

- Ew stran xweş e (“xweş” li vê derê rengdêr e)
- Ew xweş stranan dibêje (“xweş” li vê derê hoker e)

Hejmareke ne kêr peyvên kurdî di heman demê de rengdêr û hoker in û tenê bikaranîna wan di hevokan de diyar dike ka her carê ew çî ne. Bi piranî hokerên çawaniyê wiha hevşeweyên rengdêran in.

## Wekheviyên rengdêran li gel navdêran

Hejmareke mezin ya hokeran bi eslê xwe ji navdêran peyda bûne. Gelek peyv hem navdêr in û hem jî hoker in û tenê bikaranîna wan di hevokê de diyar dike ka ew kengî navdêr in û kengî jî hoker in.

Bo nimûne:

- Ew îro hat. ("îro" li vir hoker e.)
- Îro rojê xweş e. ("îro" li vê derê navdêr e.)

Hokerên demî û cihî teqrîben hemû hevşeweyên navdêran in.

## Cudahiyên hokeran ji navdêr û rengdêran

Hin peyv hene ku tenê hoker in û wek rengdêr an navdêr nayên bikaranîn yan pir kêmtên bikaranîn. Bi taybetî hokerên misogerkirinê, yên neyînîkirinê, yên pirsiyarkirinê û yên dubarekirinê wiha ne. Bo nimûne:

- hokerên misogerkirinê: belê, erê, belkî...
- hokerên neyînîkirinê: na, ne, qet, hîç, ti...
- hokerên pirsiyarkirinê: gelo, ma, aya...
- hokerên mixabiniyê: mixabin, malesef...
- hokerên dubarekirinê: dîsa...

Kêmtaran heta hin ji van hokeran jî wek navdêr tên bikaranîn. Bo nimûne:

- Di referandûmê de erêya / belêya serbixweyîxwazan dijî naya/neya îraqîparêzan. (Li vir "erê/belê" û "na/ne" wek navdêr hatine bikaranîn.)
- Biryar hat erêkirin. ("erê" li vir wek rengdêr hatiye xebitandin û li gel "kirin"ê bûye komikeke/frazeke lêkerî.)



## Cudahiyên hokeran bi taybetî ji rengdêran

Tevî ku gelek gelek hoker bi şiklê xwe hevşêweyên rengdêran in jî, ew bi peyvrêziya xwe ji rengdêran cuda ne. Rengdêr adeten dikevin dûv navdêra ku rave dikin lê hoker berî lêkera ku rave dikin tên. Bo nimûne:

- straneke xweş ("stran" navdêr e û "xweş" ya ku li dûv stranê tê rengdêr e)
- xweş got ("xweş" li vir hoker e û berî "got" ya ku lêker e tê)

Herwiha hoker berî rengdêrên ku rave dikin jî tên:

- gelek xweş
- pîrr baş
- zêde dirêj

Navdêr bi girêdekên wek "-a, -ê, -ên" bi rengdêran ve tên girêdan lê di navbera hoker û rengdêran de yan ti tişt nîne yan jî paşgira "-î" (kurmanciya navendî) yan "-ê" (kurmanciya rojhilatî) heye:

- gelek baş a – gelekî baş (bi devokî "gelkî baş")
- piçek şîrîn – piçekî şîrîn – piçekê şîrîn (bi devkî "piçkî/piçkê şîrîn")

Lê paşgira "-î" jî herdem ne mimkin e. Bo nimûne:

- Ev çay hindik şîrîn e (ne "\*kêmî şîrîn e" lê bidin ber "ev çay piçek / piçekî / piçekê şîrîn e")

## Cudahiyên hokeran bi taybetî ji navdêran

Tevî ku gelek hoker (bi taybetî yê demî û cihî) bi eslê xwe navdêr in an jî navdêran hatine çêkirin, lê dîsa jî ew di bikaranînê de ji navdêran cuda ne.

Cudahiya serekî di navbera hoker û navdêran de ew e ku navdêr li gor cinsê rêzimanî, hejmara rêzimanî û diyariya rêzimanî diçemin anku ditewin yanî paşgiran werdigirin lê hoker naçemin an

tenê bi nuqsanî diçemin. Bo nimûne (formên bi stêrka \* li pêş nînin an nerêzimanî ne anku ne rast in:

- navdêr: av, ji avê, ava zelal, avek, avekê, avên kûr...
- hoker: îro, ji îro, heta îro, ji îro pêve... (wek ku tê dîtin, "îro" naçeme anku natewe, bo nimûne nabe \*îroyê, \*îroya, \*îroyên, \*îroyek, \*îroyekê...")

Navdêr li gel daçekan di kurmancî de diçemin, bo nimûne "li malê, bi tirimpêlê". Lê hokeran bi daçekan re jî naçemin, bo "li vir, bi azadî" (ne "\*li virê, bi azadiyê").

Hinek ji hokerên demî û cihî bi xwe çemandî ne, bo nimûne:

- hokerên demî: sibê (kurtkirina "sibeh-ê"), hingê/hîngê (kurtkirina "hingeh-ê" anku "wê gehê, wê gavê, wê demê")
- hokerên cihî: "vira, wira, kura" (kurtkirinên "van deran, wan deran, kû deran") yên kurmanciya navendî û "vêrê, wêrê, kêrê" (kurtkirinên "vê derê, wê derê, kû derê") yên kurmanciya rojhilatî

# PEYVRÊZÎ DI FRAZÊN NAVDÊRÎ DE (DEVOKA MÊRDÎNÊ)

*Mikaîl Bilbil*

## Kurte

Frazên navdêrî hem bi awayekî pêşnavdêrî hem jî paşnavdêrî tên modîfîyekirin ku modîfîyekerên paşnavdêrî ji yên pêşnavdêrî gelekî komplekstir in. Di vê xebatê de modîfîyekerên pêşnavdêrî û paşnavdêrî ji aliyê peyvrêziya xwe ve hatine vekolan. Modîfîyekerên weke diyarker, çendîker, nîşander, rengdêr, tamamker, frazên daçekî û risteyên peywendiyê, sereyan modîfiye dikin û di hin rewşan de peyvrêziya wan ji ber sedemên pragmatîk û fonksiyonî diguherin ku li ser vê guhertinê hêmanên weke prosodî, topîkalîte û fokûs tesîrdar in. Bi taybetî dema ku ji yekê zêdetir rengdêr û tamamker sereyekê modîfiye dikin li gor rewşa topîkalîte û fokûsê, hiyerarşiyê semantîk ava dikin ku pozîsyona nêzîkbûn û dûrbûna sereyê û guhertina peyvrêziyê yek ji stratejiya vê pêvajoyê ye. Ev rewşên peyvrêziya frazên navdêrî di vê xebatê de bi daneyên ji devoka Mêrdînê û bi perspektîfeke tîpolojîk hatine ravekirin.

**Bêjeyên Sereke:** Fraz navdêrî, modîfîyeker, sere, devoka Mêrdînê, kurmanciya Mêrdînê

## Word Order in Noun Phrases (Mardin's Accent)

### Abstract

Noun phrases are modified both prenominal and postnominal and the postnominal modifiers are more complex than prenominal ones. This paper deals with these prenominal and postnominal modifiers in term of their word orders. The modifiers, such as determiners, quantifiers, demonstratives, complements, adpositional phrases and relative clauses, modify the head nouns due to their semantic and pragmatic situations. In that modification, there is an effect of the

prosody, topicality and focus construction. Especially when more than one adjective and complement modify a head noun, they build a semantic hierarchy according to their topical and focal cases. The position of closeness/farness to a head noun and changing word order of modifiers are a part of the strategy of this process. This study analyses these cases of word order of noun phrases according to data based on Mardin's accent from the typological point of view.

**Key Words:** Noun phrases, Modifiers, Head noun, Mardin's accent, Mardin's Kurmanji

## Destpêk

Modîfîyekerên ku navdêran ji gelek aliyên ve modîfîye dikin, ji aliyê pozîsyona sentaktîk ve pêşnavdêrî (prenominal) û paşnavdêrî (postnominal) ne. Lê di kurmancî de modîfîyekerên piştî sereyê bêtir tîr bikaranîn û bêtir komplîke ne. Bi taybetî dema ku ji yekê zêdetir rengdêr û temamker tîr bikaranîn û risteyên peywendiyê (relative clause) navdêran modîfîye dikin, rewşa modîfîyekeran bêtir komplîke ne. Lewra eger ji yekê zêdetir rengdêr û temamker dema ku ji bo yek navdêrê be, li gor rewşên semantîk û pragmatîk pozîsyona wan ya nêzîkbûn û dûrbûna sereyê dikare biguhere. Loma jî tîkiliyek di navbera hiyerarşîya wan ya semantîk û rewşa peyvrêziyê wan de çê dibe ku bi taybetiyên morfolojîk sentaktîk xwe nîşan didin.

Bêguman li ser modîfîyekerên ku navdêran modîfîye dikin, ji bo kurmanciya bakur, gelek xebatên rêzimanî hene. Lê ev xebat bi awayê îndîrekt behsa rewşa wan ya sentaktîk dikin û bi qasî ku em zanin, li ser vê mijarê xebatek nîne ku rasterast hatiye kirin. Di vê xebatê de ev rewşa sentaktîk ya modîfîyekeran li gor daneyên ji devoka Mêrdînê<sup>8</sup> hatine ravekirin ku qismek dane ji xebatên

---

<sup>8</sup> Li herêma Mêrdînê du devokên sereke hene. Herçend ji aliyê sentaktîk zêde ne dûrî hev bin jî bi taybetî ji aliyê morfolojîya lêkeran tiştên cuda di wan de pir in. Yek jê devoka Tûr Abdîn e ku hin herêmên navçeyên Nisêbîn, Midyat û Stewrê dikevin ber vê devokê.<sup>8</sup> Ya din jî devoka Omeriyan e ku Qoser, Dêrik, Şemrex, Mahsertê, navenda Mêrdîn û hemû beriya Mêrdînê û navçeya Serê Kaniyê ya Rihayê nêzî vê devokê diaxivin.

sehayî ne (projeyên mastera bêtez ku pêşî hatine qeydkirin û dûvre jî hatine nivîsandin) û qismek jî yên nivîskarê vê xebatê bixwe ne ku axêverê zikmakî (native speaker) yê vê devokê ye.

## A. MODÎFİYEKERÊN KU BERÎ SEREYÊ TÊN

1. **Çendîker (quantifier):** Çendîker weke ku ji navê wê jî diyar e, ji aliyê çendîniyê ve navdêran modîfiye dikin.

a. **Çendîkera nenasyar (indefinite quantifier):**

- (1) a. *hinik* kes  
 b. *gelik* zarok  
 c. *hemû* zilam

b. **Çendîkera partîtîf a nenasyar (partitive indefinite quantifier):** Dema ku bêjeyên weke *hinik*, *gelik*, *hemû*, *qismek*, *piçik*, *çendik* berî fraza daçekî ya "ji"yê tên, mîna çendîkera wê frazê tên bikaranîn:

- (2) a. *Hinik ji hevala* nehatini.  
 b. *Gelik ji van zaroka*, feqîr in.  
 c. *Piçik ji nan* ji bo me nehiştiyi.

Ev çendîkerên weke *hinik*, *gelik*, *hemû* çawa ku berî frazên daçekî tên piştî frazên daçekî jî dikarin bîn:

- (3) a. *Ji hevala hinik*, nehatini.  
 b. *Ji van zaroka gelik*, feqîr in.  
 c. *Ji nan piçik*, ji bo me nehiştiyi.

Lê ev pirs dikare bê pirsîn ku çi ferq di navbera wan her du bikaranîn de heye ku di yekê de (2.a.) çendîker berî fraza daçekî tê, di ya din de (3.a.) piştî fraza daçekî tê? Bersiva vê pirsê bi peyvrêzî û fonksiyonên wê ve têkildar e. Fonksiyonên pragmatîk yên peyvrêziyê hene ku tegehên topîkbûnê (topicality) û fokûsê têkildar dikin. Weke meyleke giştî tiştên ku em dixwazin cext bikin ango derxin

pêş û girîngiyê bidinê, li pêş cih digire.<sup>9</sup> Guhertina pozîsyona hêmanan ji ber rewşên pragmatîk dikare pêk bê. Di gelek zimanan de, pozîsyona hêmanan a ber bi serê fraz û risteyê û pozîsyona ber bi dawiya fraz an risteyê, xwedî fonksiyonên semantîk in. Emma Geniušiene li ser pozîsyona ber bi pêş û ber bi paşiyê diyar dike ku pozîsyona pêşî pozîsyona herî tematîk (thematic) e û ya dawî jî ya herî rematîk (rhematic) e.<sup>10</sup> (Vê *prensîba topîkbûnê* ku pozîsyona pêş îfade dike êdî em dê weke PT bi kar bînin.) Ev PT bêtir du mijaran têkildar dike ku *tema* têkildarî topîkalîteyê ye û *rema* (rhema) jî têkildarî fokûsê ye. Her wiha *topîkalîte* agahiyên kevin û fokûs agahiyên nû dide.<sup>11</sup> Di kurmancî de jî tendansa hêmanên topîk ango tematîk ku em girîngiyê bidin wan li destpêkê cih digirin, ên fokûs ku agahiyên nû ne piştî wan in.<sup>12</sup>

Piştî van agahiyên paşxaneyî eger em vegezin ser frazên di (2.a. û 3.a.)yê de em dikarin bibêjin ku dema ku em dixwazin cextê deynin ser çendîkera "*hinik*"ê em dê forma ku bêjeya *hinik* li pêş e, tercîh bikin. Lê eger em bixwazin *ji hevala* bêtir cext bikin em dê wê berî çendîkerê bibêjin:

*Hinik ji hevala* nehatini. (cext li ser *hinikê* ye)

*Ji hevala hinik* nehatini. (cext li ser *ji hevala* ye)

Lazim e em vêya bibêjin ku rewşa ku modîfîyekerek hem berî hem jî piştî frazekê bê û bibe sebeb ku şiroveyên semantîk biguherin îstîsnaî ye. Ji ber ku di kurmancî de bi awayekî tîpîk (typically) modîfîyeker yan berî yan jî piştî sereyan tên. Rewşeke din a van çendîkerên partîtîf heye ku dema ku berê jî û piştî sereyan jî bîn ji prosodiye<sup>13</sup> tê îstîfadedekin. Sereyek û modîfîkera wê di heman demê de yekîneyeke sentaktîk jî pêk tînin û ji ber ku yekîneyeke sentaktîk in jî dema ku tên gotin weke yekîneyekê tên gotin. Di navbera frazan de em piçekî disekin dûre dewam dikin. *Sînoren navbera*

<sup>9</sup> Givón, Talmy. *Syntax, An Introduction, Volume II*, John Benjamins Publishing Company, Amsterdam/Philadelphia, 2001. r. 270.

<sup>10</sup> Geniušiene, Emma. "Passives in Lithuanian (in comparison with Russian)," in *Passivization and Typology Form and Function*, Editor: Werner Abraham & Larisa Leisiö, John Benjamins Publishing Company, Amsterdam/Philadelphia, (p. 29-61). 2006. r. 41.

<sup>11</sup> Halliday, M.A.K. *Language Structure And Language Function* in *On Grammar*, Edited by Jonathan Webster (2005), Continuum, London-New York, 1970. r. 192.

<sup>12</sup> Ebûzeyd, Sanya Cabar (2013). *Cihgihorîna Kerestana Di Ristê Da (Govara Badîni)*. Teza Doktorayê. Zankoy Soran - Fakultî Adab - Beşî Kurdî, Kurdistan/Iraq r. 138.

<sup>13</sup> Prosodî (prosody), di ziman de tiştên weke intonasyon, ton, navber (break), guvaş û teqla (rhythm) axaftinê îfade dike.

*frazan bi navbereke kurt (minor break) û yê navbera risteyan jî bi navbereke dirêj tê nîşandan. Bi xêra sînorên prosodîk, gotin utterance jî weke beşên bimane saz dibin û fambarî zelal dibe.*<sup>14</sup> Di xebatên lînguîstîk de navberên prosodîk yê kurt (minor break) ku bêhnvedana navbera du frazan nîşan dide, bi yek xêzê (I) û navberên dirêj (major break) jî ku di navbera du risteyan de pêk tê, bi du xêzan (II) tî nîşandayîn. Li vir ji me re *navbera kurt* lazim e û êdî em dê weke NK bi kar bînin. Eger alîkariya prosodîk nebûya ev bikaranîna çendîkeran ku hem berî hem jî piştî frazên daçekî tî, dê rê li ber tevliheviyê vekira. Heke em sînorên frazên xwe yê jorîn bi awayekî prosodîk nîşan bidin dê wisa bin:

*Hinik ji gund (I) çûni Mêrdînê.*

*Hinik ji hevala (I) nehatni.*

Çima em vana dibêjin gelo? Ji ber ku ev çendîker dema ku weke yekîneyeke sentaktîk neyên gotin, rola wan a semantîk û sentaktîk diguhere û êdî ne çendîker in. Dema ku bi awayekî prosodîk em sînorên frazên ku me dabûn biguherin dê wisa bibin.

- (4) a. *Hinik ji gund (I) çûni Mêrdînê.*  
 b. *Ji gund hinik (I) çûni Mêrdînê.*  
 c. *Hinik (I) ji gund çûni Mêrdînê.*  
 d. *Ji gund (I) hinik çûni Mêrdînê.*

Di risteyên (4.a.) û (4.b.)yê de çendîker û fraza daçekî bi hev re weke yekîneyeke sentaktîk çêkirine ku dema tî gotin tu NK di navbera çendîker û fraza daçekî de tune. Lê di risteya (4.c) û (4.d.)yê de di navbera bêjaya *hinik* û fraza daçekî de NK heye. Loma di (4.c)yê û (4.d.)yê de *hinik* êdî ne di fonksiyona çendîkerê de ye lê ew weke cihna nenasyar hatiye bikaranîn û rola wê ya rêzimanî jî biker e. Di (4.c) û (4.d.)yê de, fraza daçekî *ji gund* jî fonksiyoneke hokerî (adverbial) dibîne û rewşa derketinê (ablative) nîşan dide. Jixwe dema ku di (4.c) û (4.d.)yê de ji bo ku em erkên rêzimanî tesbît bikin, em bipirsin ku “kî çûne?”, bersiva vê pirsê ne “*hinik ji gund*” e lê bersiva vê ku pirsiyara bikerê dike, *hinik* e. Loma eger *hinik ji gund* di (4.c) û (4.d.)yê de yekîneyeke sentaktîk û yek fraz bûya, wê

<sup>14</sup> Kompe, Ralf. *Prosody In Speech Understanding Sysytems*. Springer, Berlin. 1997. r. 132.

demê divê biker jî *hinik ji gund* bûya. Lê ne wisa ye û *ji gund* daçeka frazî ye ku di hevokê de roleke hokerî dilîze.

**c. Çendîkera hejmarî (numeral quantifier):** Hejmar bixwe jî navdêran modîfiye dikin û weke çendîker tên bikaranîn:

### Bi hejmarên resen

Hejmarên resen berî navdêran tên û weke çendîker tên bikaranîn:

- (5) a. *çar dar*  
 b. *bîst jin*  
 c. *yek zilam*

Dema bêjeyên weke *nîv* an *rib* li hejmaran zêde dibe, hejmarên resen berî navdêrê tên û bêjeyên weke *nîv* û *rib (ek)* jî bi gihaneka *û'yê* ve tên girêdan û piştî navdêran tên:

- (6) a. *du nan û nîv*  
 b. *du nan û ribek*

Dema hejmara resen *yek* be, meyl ew e ku li şûna wê paşgira *-ik/-ek'*<sup>15</sup> li navdêran bê zêdekirin. Jixwe *-ik* ku ji bo nenasyariyê tê bikaranîn, weke ku Celadet & Lescot dibêjin ji bêjeya *yekê* tê<sup>16</sup>. Lê em ji bîr nekin ku *-ik* ji bo nenasyariyê jî tê bikaranîn. Loma dema ku cext li ser hejmarê hebe û hejmar girîng be *yek* bêtir maqûl (acceptable) e. Yanî li gor kontekstê bikaranîna wan dikare biguhere:

- (7) a. Kontekst: Çend zilam hatin?  
 b. *Yek zilam hat.*  
 c. Kontekst: Kî hat?  
 d. *Zilamik hat.*

<sup>15</sup> Li gor metnên sehayî ku li ber destê me ne, li Mêrdînê bikaranîna *-ik'*ê ji ya *-ek'*ê zêdetir xuya dike.

<sup>16</sup> Bedirxan, Emîr Celadet & Lescot, Roger. *Kürtçe Grameri*, Doz Yayınları, İstanbul, r. 90



Her wiha hin bêje jî hene ku weke çendîker pîvana tiştan nîşan didin û bi hejmaran re jî tîb bikaranîn: <sup>17</sup>

- (8) a. sîtilik av                                      sê sîtil av  
       b. kûpik şerab                                      pênc kûp şerab  
       c. cotik gore                                      deh cot gore

**d. Çendîkera dijber (contrastive quantifier):** Bêjeyên weke *tenê*, *hew*, *bes* ku hemû di yek maneyê de ne, dema ku berî navdêran tîb maneyêke dijber çêdikin. Her wiha ev çendîker fokûsê dikşînin ser navdêra ku ji bo wê hatine bikaranîn:

- (9) a. *Tenê* mi rahiştê. (MIN rahiştê, ne hinekên din.)  
       b. *Hew* bavî wî çibû. (BAVÊ WÎ çibû, ne hinekên din.)  
       c. *Bes* ti dilê mi rihet diki! (TI dilê mi rihet dikî, ne hinekên din.)

Dema çendîker berî lêkeran tîb, êdî ne modîfîyekerên navdêran in lê hokerên dijber (contrastive adverb) in.

- (10) a. Mi *tenê* rahiştê. (Min bi serê xwe rahiştê.)  
       b. Bavî wî *hew* çûbû. (Bavê wî carek din neçû.)

Bêjeya *tenê* dema ku piştî navdêran jî tîb dîsa dikare fonksiyona modîfîyekerên navdêrî bibîne. Lê bêjeyên *hew* û *bes* wisa nikarin bîbî bikaranîn. Ev her du bikaranînên *tenê* yê, bi awayekî prosodîk ji hev tîb cudakirin:

- (11) a. Ehmed *tenê* (I) nehatibû. (Herkes hatibû lê Ehmed nehatibû.)  
       b. Ehmed (I) *tenê* nehatibû. (Hinekên din jî bi Ehmedî re hatibûn.)

Bikaranîna bêjeya *tenê* ya (11.a) û (11.b)yê ji aliyê tîkiliya prosodî û sentaksê ve balkêş e. Dema weke ku di (11.a)yê de hatiye kirin, bêjeyên *Ehmed* û *tenê* bi hev re bîbî gotin û piştî wê NK hebe, tîb famkirin ku “herkes hatibû lê Ehmed nehatibû”. Lê eger weke ku di (11.b)yê hatiye kirin NK piştî bêjeya Ehmedî be û bêjeya *tenê* yê û lêker bi hev re bîbî gotin, êdî bêjeya *tenê* yê hokera lêkerê ye û maneya risteyê diguhere û tîb famkirin ku “hinekên din jî bi Ehmedî re hatibûn”. Yanî em dikarin

<sup>17</sup> Qanatê Kurdo. *Rêzimana Kurdî- Kurmancî - Soranî*. Ji soranî wer. Zülküf Ergün, Weşanên Nûbiharê, İstanbul. 2013. r.113.

bêjeya *tenê'yê* bi şiklê ku bi navdêra berê xwe re yekîneyeke sentaktîk çêkiribe bibêjin û weke modîfîyekera sereyekê bi kar bînin û her wiha em dikarin bêjeya *tenê'yê* bi şiklê ku bi lêkera piştî xwe re yekîneyeke sentaktîk çêkiribe bibêjin û weke hokera lêkerê bikarbînin. Ev yek ji bo têkiliya prosodî û rolên rêzimanî balkêş e û nîşanî me dide ku prosodî çawa rolên rêzimanî jî diguherîne. Weke ku me li jorê jî got, bêjeyên *bes* û *hew* çê nabe ku wisa bînin bikaranîn:

(12) a. \*Ehmed hew, dixwend.

b. \*Ehmed bes, dixwend.

## 2. Diyarker (determiner):

**a. Nîşander (demonstrative/deictic):** Nîşanderên ku berê navdêran tên û wan nîşan didin didu ne: *Ev* ji bo nîşandana nêzîk, *ew* jî bo dûr tê bikaranîn. Herçend li gor hin teoriyên rêzimanî nîşander weke rengdêr tên dîtin jî perspektîfên fonksiyonel, ji ber ku nîşandayîn bixwe ne taybetiyekê heyberan e, nîşanderan bi serê xwe weke kategoriyeke dibînin ku bi diyarkeran ve girêdayî ye: <sup>18</sup>

(13) a. ev mase

b. ew mase

Nîşander weke navdêran ditewin û dikevin rewşa oblîk û bi vî awayî jî hem zayend dikare bê diyarkirin hem jî yekhejmarî/pirhejmarî:

(14) *nêzîk*

*dûr*

a. *mê*

*vê masê*

*wê masê*

b. *nêr*

*vî kevrî*

*wî kevrî*

c. *pirhejmar van* xwendekara

*wan* xwendekara

**b. Diyarkerên Amajenekirî (non-referential):** Diyarkerên mîna *ti*, *filan*, *her* bêyî ku referanteke diyar nîşan bidin, tên bikaranîn:

(15) a. *ti* heval

b. *filan* roj

<sup>18</sup> Givón, h.b., Volume II, r. 6.

c. *bêvan* zilam

d. *her* zarok

**c. Rewşa sifirê (zero case):** Di kurmancî de dema ku bêje xwerû bin û tu gireyeke rewşî (case) nestendibin jî nasyar in. Yanî rewşa sifirê bixwe jî rewşê nîşan dide. Pêşnavdêrbûna rewşa sifirê bi awayekî hîpotezî ye. Dema ku bêjeyek xwerû be mîna ku artîkela nasyariyê ya Îngilîzî *the* li ber wê hebe, nasyar e: <sup>19</sup>

(16) a. *Heval hat.* (*The friend came.*)

b. *Mi dîwar lê dikir.* (*I was building the wall.*)

Di risteya jorîn de dema ku kesek bibêje *heval hat* tê wê maneyê ku:

a. *Heval*, ji bo kesê ku dibeje angî axêverî nasyar e û ew dizane kîjan *heval* hatiye.

b. Ê ku dibêje angî axêverî difikire ku guhdar jî dizane ku ew behsa kîjan *hevalî* dike û ew *heval* ji bo guhdarî jî nasyar e. Yanî di rewşên nasyariyê de li gorî axêverî, guhdar dizane ew behsa çi dike.

**3. Rengdêr:** Di kurmancî de rengdêr piştî navdêran tên. Lê rengdêrên namdarî hem berî hem jî piştî sereyan dikarin bên:

(17) a. Xalê Ehmed

b. Apê Mûsa

c. Berber Elî

d. Şêx Seîd

e. Mele Xelîl

Îzafe weke ku li jor jî xuya ye di hinekan de tê bikaranîn, di hinekan de nayê bikaranîn. Di mînakên weke Xalê Ehmed, Apê Mûsa de dema Xal û Ap ne rengdêr lê weke navdêr bên bikaranîn jî dîsa bi heman awayî tên bikaranîn. Herçend di nivîsê de eger kontekst neyê zanîn, jihevderxistina wan hinekî zahmet be jî di axaftinê de bi awayekî prosodîk cudahiya wan heye. Lewre weke mînak eger *xal* weke rengdêr hatibe bikaranîn guvaş (stress) li ser navê taybet e lê eger *xal* navdêr be guvaş li ser bêjeya *xalê* ye:

<sup>19</sup> Ji bo agahiyên berfireh binêre: Lyons, Christopher. *Definiteness*, Cambridge University Press. Cambridge, United Kingdom, 1999.

- (18) a. Xalê Ehmed (guvaş li ser *Ehmed* e, *xal* rengdêr e: Ehmed bixwe xal e)  
 b. Apê Mûsa (guvaş li ser *Mûsa* ye, *ap* rengdêr e: Mûsa bixwe ap e)  
 c. Xalê Ehmed (guvaş li ser *xal* e, *xal* navdêr e: Ehmed ne xal e, xal yê Ehmedî ye)  
 d. Apê Mûsa (guvaş li ser *ap* e, *ap* navdêr e: Mûsa ne ap e, ap yê Mûsayî ye)

Îzafeya ku di kurmancî de guvaşê nastîne jî li hin gundên Beriya Mêrdînê bi awayekî enteresan, guvaşê distîne: mala min, pezê Ehmed.

## B. MODÎFIYEKERÊN KU PIŞTÎ SEREYÊ TÊN

### 1. Çendîker

a. **Çendîkerên nenasyar (indefinite quantifier):** Bêjeyên *giş*, *hemû*, *tev*, *din* weke çendîkerên paşnavdêrî tên bikaranîn:

- (19) a. *Xwendekar giş (I) hatin.*  
 b. *Heval hemû (I) nexweş in.*  
 c. *Mamostê din (I) li wir maye.*

Çendîkerên *giş*, *hemû*, *tev* weke hokerên mêjerî jî tên bikaranîn. Li gor rewşa prosodîk ji hev tên cuda kirin. Eger berî çendîkeran NK hebe êdî ne çendîkera fraza navdêrî ne, lê hoker in û bersiva pirsê *çiqas* a ji bo lêkerê ne:

- (20) a. *Xwendekar (I) giş hatin. (Çiqas hatin? Giş hatin.)*  
 b. *Heval (I) hemû nexweş in. (Çiqas nexweş in? Hemû nexweş in.)*

b. **Hejmarên rêzîn (ordinal):** Dema ku hejmar rêza tiştekî modîfiye dikin, dibin hejmarên rêzîn. Bi paşgira *-a'yê* çêdibe ku ev, di eslê xwe de morfema pirhejmarîyê *-an* e:

- (21) a. *mala çara*  
 b. *xanyê şeşa*

Bêjeyên weke *pêşîn, navîn, dawîn, ewilîn, paşîn* jî rêza sereyê ji aliyê rêzê ve modîfiye dikin<sup>20</sup>:

- (22) a. beranê *pêşî*  
 b. dersa *paşî*  
 c. kavira *dawî*

**2. Diyarker (determiner):** Diyarkerên ku sereyê diyar dikin, hinek ji wan bêje ne hinek jî morfemên bend (bound morpheme) in. Yanî diyarkirina sereyan hem bi awayê morfolojîk hem jî leksîkolojîk çêdibe:

**a. Paşgirên nenasyariyê (indefinite suffix):** Paşgirên ku navdêran dikin *nenasyar* dudu ne:

**1. - (i)k yan jî - (e)k:** Ji bo nenasyar û yekhejmaran tê bikaranîn. Dengdêra (vowel) wan, dema ku dawiya bêjeyê bi dengdêrekî biqede, dikeve û “k” tenê dimîne. Herçend forma -ik û -ek'ê zêde tînan bikaranîn, li mentîqeya Tor Abdînê forma - (a)k'ê jî heye:

- (23) a. Hevalik, hostak  
 b. Xwendekarek , mamostak  
 c. tiştak, zanak

Dema ku navdêrên nenasyar gireyên tewangê distînin, yê tewangê piştî wan tînan. Wexta ku gireyên tewangê distîne, dengê “i”yê jî dikeve û “-k” tenê temsîla nenasyariyê dike:

- (24) a. Hevalkî / hostakî  
 b. Hevalkê / hostakê

Dema ku modîfiyekereke din tê bikaranîn û ew modîfiyeker û sere bi îzafeyê ve bi hev ve tînan girêdan jî dîsa dengê “i”yê dikeve û “-k” dîsa tenê dimîne. Li hin deveran jî îzafeyê piştî nenasyariyê û bi taybetî jî ya mê nayê bikaranîn:

- (25) a. Hevalik Ehmed (hem ji bo nêr hem jî mê)  
 b. Hevalkî Ehmed (nêr)

<sup>20</sup> Ciwan, Murat. *Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi /Rêzimana Kurdî Bi Şîrovekirina Tirkî*, Zekisan Matbaası, Diyarbakir, r. 2014. 100-101.

**2. – (i)n:** Ji bo nenasyar û pirhejmaran tê bikaranîn. Dema ku piştî bêjeyeke ku bi dengdêrekê diqede tê, dengê “-n-”yê weke alîkar (ji bo ku du dengdêran bi hev ve girê bide) berî wê tê:

(26) **a. Hevalin**

**b. hostenin**

Eger îzafeya pirhejmar û nenasyariyê bi hev re bên bikaranîn, îzafeya piştî nenasyariyê tê û dengê “i”yê dikeve û “n” tenê nenasyariya pirhejmar temsîl dike. Ji dêvla îzafeya “ê”yê ya pirhejmar, li Beriya Merdînê gelek caran “î” tê bikaranîn:

(27) **a. Hevalnî Ehmed**

**b. hostenî me**

Eger paşgira tewangê ya pirhejmar *-a* û ya nenasyarî bi hev re bên bikaranîn paşgira tewangê piştî nenasyariyê tê û dengê “i” dîsa dikeve û “n” tenê nenasyariya pirhejmar temsîl dike.

(28) **a. Hevalna xwar.**

**b. Hostena go.**

**b. Nîşander û paşgira nîşander (deictic suffix):** Bêjeyên weke *ha, han, hanê* bi nîşanderên pêşnavdêrî re tên bikaranîn û rewşa nîşanê xurttir dikin:

(29) **a. Ev hevala han (ê)**

**b. Ew xaniyê han (ê)**

**c. Ew zarokê han (ê)**

Di hin devokan de *ha/han/hanê* gramatîkalîze bûye û bûye paşgira *-a'yê*.<sup>21</sup> Ev paşgir diçe dawîya navdêran û weke *nîşandera paşgirî* (deictic suffix) tê bikaranîn. Dema weke paşgir tê dawîya navdêran, zayenda navdêran a biyolojîk û ya rêzimanî notralîze dibe û hem ji bo *nêr* û hem jî *mê* heman form tê bikaranîn. Ji bo yekhejmaran forma *-aya* û ji bo pirhejmaran forma *-na/ana* jî berbelav in.

(30) **a. Ev hevala han (ê)**

ev hevala / hevalaya (mê)

**b. Ev hevalê hanê (ê)**

ev hevala / hevalaya (nêr)

<sup>21</sup> Bedirxan & Lescot, h.b., r. 224.

c. Ew zarokê han (ê) ew zarokna / zarokana (pirh.)

d. Ew hosteyê han (ê) ew morîkna / morîkana (pirh.)

**c. Paşgira baneşanî (vocative suffix):** Sereyê ji aliyê rewşa bankirinê ve diyar dike. Ji ber ku li gor cinsiyeta nêr û mê ji hev cuda ne, ji aliyê cinsiyetê jî rewşa sere diyar dikin. Piştî lêkeran jî tên bikaranîn:

(31) a. Hevalê! Xwedê nehiştê!

b. Hevalo! Xwedê nehişto!

c. Hevalno! Xwedê nehiştno!

### 3. Rengdêr (adjectives)

Rengdêrên ku ji aliyê sentaktîk ve piştî navdêran tên, ji aliyê semantîk ve xwedî taybetiyên curbicur in. Talmy Givón rengdêrên ku modîfîyeker in dike du grûp ku hinek ji wan taybetiyên siruştî, şênber (concrete) û neguher (stable) in ku ew rengdêrên prototîp in û hinek jî taybetiyên kêmsênber (less concrete) û guherbar in ku ew jî rengdêrên neprototîp in.<sup>22</sup> Eger em bi vê perspektîfa Gîvonî li kategoriyên rengdêrên modîfîyeker binêrin, rengdêrên modîfîyeker dê wisa bin:

#### A. Yên Prototîp

##### a. Endaze (size)

(32) a. *Endazeya giştî (general size):* mala mezin, mala biçûk

b. *Berfirehiya berwarî (horizontal extension):* oda fireh, oda teng

c. *Stûrî (thickness):* qelema stûr, qelema zirav

d. *Berfirehiya emûdî (vertical extension):* zilamê dirêj, zilamê kin

e. *Bilindbûna emûdî (vertical elevation):* dîwarê bilind, dîwarê nizam

f. *Dirêjî (length):* riya dirêj, riya kin

**b. Reng (color):** Rengdêrên ku asta ronîbûnê an jî rengên curbicur îfade dikin:

(33) a. *Ronîbûn (brightness):* xanyê tarî, xanyê ronî, çaya tarî, çaya vekirî

b. *Reng (color):* sola kesk, erdê şîn, çêleka zer

<sup>22</sup> Givón, Talmy. *Syntax, An Introduction, Volume I*. John Benjamins Publishing Company, Amsterdam/Philadelphia, 2001. 81-84.

**c. Taybetiyên bihîzyarî (auditory qualities):** Rengdêrên ku têkildarî deng û bihîstina wan, rengdêrên bihîzyariyê ne:

- (34) a. *Bidengbûn (loudness)*: dengê bilind, dengê nerm, cihê bideng, cihê bêdeng  
 b. *Bilindbûna sade (absolute pitch)*: dengê bilind, dengê nizm  
 c. *Bilindbûna nisbî (relative pitch)*: dengê zirav, dengê stûr  
 d. *Aheng (harmony)*: dengê nerm, dengê hişk  
 e. *Newa (melody)*: dengê newayî, dengê bênewa

**d. Teşe (shape):** Li gor teşeya navdêran ku yek, du an sê rehendî (dimension) ne, diyar dikin. Teşeyên navdêran li gor rehendan:

- (35) a. *Yekrehend (one-dimensional)*: darê rast, darê xwar  
 b. *Durehend (two-dimensional)*: kevrê gurover, kevrê çargoşe  
 c. *Sêrehend (three-dimensional)*: kevrê gundorî, şekrê kûpikî

**e. Çêj (Taste):** Rengdêrên ku çêjên curbicur diyar dikin:

- (36) xwarina şêrîn, bihîvê tal, şekrê tirs

**f. Destdan (Tactile):**

- (37) a. *Tevin (texture)*: erda zivir, erda şimatok  
 b. *Mûqavemet (resistance)*: doşeka hişk, doşeka nerm  
 c. *Tûjbûn (pointedness)*: kêra tûj, kêra ko

**g. Jêçêbûn (substance):** Rengdêrên ku jêçêbûna navdêran diyar dikin jî hene<sup>23</sup> ku Gîvon behsa wan nake. Jêçêbûn ji ber ku taybetiyeye sereke ya rewşa wan a fizîkî ye, divê di nav rengdêrên prototîp de bin:

- (38) deryê darîn, xencera zêrîn, şala hirî

## B. RENG DÊRÊN KÊMPROTOTÎP

<sup>23</sup> Bilbil, Mîkaîl & Baran, Bahoz. *Rêzimana Kurmancî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê, İstanbul, 2008. r. 49.



Rengdêrên kêmprototîp ji bo taybetiyên navdêran ên zêde ne şênber (less concrete) û taybetiyên rewşên ku bêtir guherbar (transitory) in, tên bikaranîn:

**a. Nirxî (Evaluative):** Rengdêrên ku fikrên subjektîf ên mirovan ên derheqê taybetiyeke demkî de an jî fîzîkî ya navdêran îfade dikin, rengdêrên nirxî ne:

(39) zilamê baş/xerab, keçka xweşik/nexweşik, zarokik şêrîn, dijminê bênamûs

**b. Rewşên Bihurbar (Transitory states):**

(40) zilamê meşxûl, ava gemarî, şîrê germ, oda sar.

Rengdêrên vê grûpa heterojen, taybetmendî û rewşên derveyî, hundirî, civakî û mental îfade dikin:

(41) **a. Mejiyî-hundurîn (mental-internal):** zilamê qeherî, hevalê xemgîn/kêfxweş

**b. Tevera derveyîn (external activity):** kesê meşxûl, kesê betal

**c. Rewşa derveyîn (external condition):** kirasê qirêj/paqij

**d. Leza tevgerê (speed of motion):** xortê bilez, teksiya hêdî

**e. Germahî (temperature):** cihê germ/sar, ava şîrgerm/cemidî

**c. Rewşên Jiyani (States of living):** Rewşên cuda yê candaran ên weke emir, jiyani, tendurîstî û hwd. diyar dikin:

(42) **a. Emir (age):** jina pîr, zilamê kal, gundiye yextiyar/ciwan cilê nû/kevin

**b. Jiyani (life):** însanê sax, însanê mirî

**c. Tendurîstî (health):** keça nesax/nexweş, keça saxlem

**d. Kar (business):** xortê betal, kesê bikar/bêkar

**d. Rengdêrên Namdariyê:** Ev cure rengdêr jî paye, rade, peywir û asta civakî ya navên taybet nîşan didin.<sup>24</sup>

<sup>24</sup> Bilbil & Bahoz. h.b., r. 42.

(43) Nûriyê nedar, Evîn Xanim, Ehmedê bijîşk

**e. Orîjîna Neteweyî:** Bêjeyên ku nasnameya etnîkî didin diyarkirin rengdêrên orîjînî ne.

(44) hunermendê *kurd*, zilamê *ereb*, keçka *swêdî*

Eger du an bêtir rengdêr ji bo yek sereyê bîn bikaranîn gelo dê kîjan weke pozîsyon bêtir nêzîkî sereyê bin? Ango peyvrêziya di navbera modîfîyekeran de dê çawa be û li gor çi be? Gelo tu pîverên hiyerarşik di navbera vê peyvrêziyê de hene yan na? Derheqê vê mijarê de gelek zimanzanan li gor tîpolojîya zimanan gelek fikrên cuda gotine. Zimanzan Gruber van pênc xalan dibêje: Rengdêr bêtir nêzîkî sereyê tê bikaranîn, eger rengdêr:<sup>25</sup>

(45) **a.** ji bo navdêr wateyeke bêtir bingehîn be.

**b.** taybetiyeke bêtir siruştî û daîmî ya navdêr be.

**c.** agahiyeke (li gor agahiyeke taybet) bêtir giştî be.

**d.** agahiyeke (li gor agahiyeke nû) bêtir têzanîn be .

**e.** nesînordar (non-restrictive) be.

Zimanzanekî din Lynn M. Berk jî ji bo îngilîzî, li ser pozîsyona nêzîkbûn û dûrbûna rengdêran a navdêrên ku modîfîye dikin, diyar dike ku herçend ne teqez be jî rengdêr bêtir bi vê rêzê tîn bikaranîn: Pêşî *teşe* tê û piştê jî *emir* (*age*), *reng* û *jêçêbûn* (material characteristics) û *orîjîna neteweyî* tê. <sup>26</sup> Martin J. Endley jî nêzîkî rêzkirina Berkî û bi awayekî tablo pozîsyon û hiyerarşiya rêzbûna rengdêran (di îngilîzî de) wisa rêz dike:<sup>27</sup>

1	2	3	4	5
nirxî (evaluation)	rehend (dimension)	rewşa emir (condition of age)	reng (color)	jêçêbûn, orîjîna neteweyî (material characteristics, national origin)

Endley, Martin J. *Linguistic Perspectives on English Grammar: A Guide for EFL Teacher*, Information Age <sup>25</sup>  
Publishing, inc. Charlotte –America, 2010. r. 96.

<sup>26</sup> Berk, Lynn M. *English Syntax, From Word to Discourse*, Oxford University Press, Oxford/New York, 1999. r. 180.

Endley, h.b., 96.<sup>27</sup>

Li gor tabloya Endley ya jorîn, rengdêrên ku jêçêbûn û orîjîna neteweyî îfade dikin bêtir nêzîkî navdêran tên bikaranîn, piştî jî rengdêrên ku *reng*, *rewşa emir*, *rehend* û *nirxî* diyar dikin tên. Yanî li gor nêzîkbûna pozîsyona navdêran rêza 5-4-3-2-1 dişopînin:

“an old, brown, leather briefcase” <sup>28</sup>

kevin qehweyî çermîn çente ( çenteyê çermîn, qehweyî, kevin)

Di vê mînakê de em dibînin ku rengdêra ku jêçêbûnê diyar dike (çermîn/leather) rengdêra herî nêzîkî navdêrê ye û piştî jî *reng* (qehweyî/brown) û *emir* (kevin/old) hatiye. Gelo di kurmacî de jî rengdêr ji aliyê rêzbûnê ve, li gor hin pîverên diyar rêz dibin an jî ji ber rewşên pragmatîk ne xwedî cihekî standard in û pozîsyon û rêza wan guherbar (flexible) e? Ango hiyerarşiyê ku li gor hin rewşên semantîk pozîsyona wê diyar e, heye an na? Weke mînak em ji mînaka Endley îstîfade bikin, ma şert e ku em di kurmacî de *jêçêbûnê* nêzîkê navdêrê bi kar bînin û piştî jî yên din? Ango dema ku em rêza wan sê rengdêran biguherînin gelo sentaks û peyvrêziya kurmacî rê dide an na? Herçend Peter Svenonius diyar dike ku di zimanên de ku *teşe* û *reng* bi awayekî pêşnavdêrî berî bêjeyan tên, bi awayekî giştî, rengdêrên ku *teşeyê* diyar dikin berî rengdêrên ku rengî diyar dikin tên;<sup>29</sup> di kurmacî de her du jî paşnavdêrî ne û bêguman tîpolojîya kurdî û gelek zimanan ne weke hev e. Eger em sê rengdêrên ku li jor ji bo zimanê îngilîzî li gorî hiyerarşiyekê rêz bûne û peyvrêziya wan hişk (rigid) e di kurmacî de biceribînin:

- (46) a. çentakî çermîn, qehweyî û kevin  
 b. çentakî çermîn, kevin û qehweyî  
 c. çentakî qehweyî, çermîn û kevin  
 d. çentakî qehweyî, kevin û çermîn

<sup>28</sup> Endley, h.b., r. 96,

<sup>29</sup> Svenonius, Peter. “The Position Of Adjectives And Other Phrasal Modifiers In The Decomposition Of DP” in *Adjectives And Adverbs Syntax, Semantics, And Discourse*. Edited By Louise McNally and Christopher Kennedy. Oxford University Press, Oxford. United Kingdom. 2008. r. 34

e. çentakî *kevin*, *qehweyî û çermîn*

f. çentakî *kevin*, *çermîn û qehweyî*

Dema em li mînakên jorîn binêrin em dikarin bibêjin ku kurmancî rê dide her şeş rêzbûnan jî. Di axaftina rojane de sê an bêtir rengdêr ji bo navdêrekê kêr daran tînin bikaranîn, ji ber vê yekê eger em li gor du rengdêrên ku di hiyerarşiya Endleyî de yek ya herî nêzîk (jêçêbûn/orîjîn) yek jî ya herî dûrî navdêran (nirxî/evaluative) e, binêrin, xuya dibe ku bê problem cihê wan dikare bi hev biguhere:

- (47) a. Dergûşa *darîn û xweşik* (*the nice wooden cradle*)  
 b. Dergûşa *xweşik û darîn* (*\*the wooden nice cradle*)  
 c. Hunermendê *kurd û meşhûr* (*\*the kurdish famous artist*)  
 d. Hunermendê *meşhûr û kurd* (*the famous kurdish artist*)

Di van mînakên de rengdêra *darîn/kurd* li gor hiyerarşiya Endleyî divê nêzîkê navdêrê û *xweşik/meşhûr* jî divê di dawî de bûya. Lê em dibînin ku kurmancî ne weke îngilîzî û hin zimanên din e û rê dide her du awayan jî. Lê ev yek nayê wê maneyê ku dema ku di kurmancî de peyvrêziya rengdêran tê guhertin, ji aliyê şîroveya semantîk ve tiştek ferq nake. Berovajî vê yekê, di navbera peyvrêzî û rewşên semantîk ên cuda de têkiliyê xurt heye û guhertina cihê rengdêran ne keyfî lê fonksiyonî ye. Em bi mînakên rewşên pozîsyonên cuda û aliyê wan ên pragmatîk îzah bikin:

(48) a. Li Mêrdînê rojê *kin û tarî* hindik in.

b. Li Mêrdînê rojê *tarî û kin* hindik in.

Di mînakên jorîn de *kin û tarî û tarî û kin* bi gihaneka *û'yê* bi hev hatine girêdan. Dema ku di navbera du rengdêran de gihaneka *û'yê* hebe divê em fam bikin ku her du rengdêr jî ji bo yek serî hatine bikaranîn û rolên wan ên sentaktîk yek in. Li jorê di navbera (48.a.) û (48.b.)yê de herçend ferqek mezin tune be jî li gor prensîba PTyê di (48.a.)yê de *kin* û di (48.b.)yê de *tarî* bêtir girîng û li pêş e. Yanî di her du bikaranînan de jî fokûsa navdêran nîne. Lê dema ku yek tê fokûskirin, wê demê li gel hêmanên morfolojîk, bi awayekî peyvrêzî jî tê kodkirin û rengdêra fokûskirî bi awayekî îcbarî diçe dawîya frazê. Di rewşên wiha de yê ku rengdêrek ji bo navdêrekê hatibe bikaranîn û rengdêrek din jî ji bo her duyan bi hev re bê bikaranîn, fokûs li ser a dawiyê ye û êdî gihaneka *û'yê* nayê bikaranîn lê ji îzafeya "î"yê tê îstîfadekirin ku ji aliyê cinsiyet û hejmarê ve notralîze bûye. Di kurmanciya

standard de ji formên (a, ê, ên) îstîfade tê kirin lê li herêma Mêrdînê (û hin herêmên din jî) ji dêvla van sê forman jî tenê “î” tê bikaranîn:

(49) a. Li Mêrdînê *rojê kin î tarî*, hindik in. (rojên kin, tarî ne)

b. Li Mêrdînê *rojê tarî yî kin*, hindik in. (rojên tarî, kin in)

Dema ku em li şiroveya semantîk (semantic interpretation) a van hevokan binêrin, em dibînin ku herçend peyvêziya wan neguheriyê jî, maneya wan ji binî ve guheriyê. Di bikaranîna (48.a)yê de (*rojê kin û tarî*) *roj* hem *kurt* in hem jî *tarî* ne lê di (49.a.)yê (*rojê kin î tarî*) de *roj* ne *kin* û *tarî* ne lê *rojê kin*, *tarî* ne. Dîsa di (48.b)yê de *roj* hem *tarî* hem jî *kin* in lê di (49.b.)yê de *rojê tarî*, *kin* in. Bi vî awayî hiyerarşiya semantîk a navbera wan, ji binî ve guheriyê û di (49.a)yê de *tarî*, di (49.b)yê de jî *kin* hatiye fokûskirin. Mimkun e ku ev îzafeya “î”yê bi awayekî diyakronîk ji îzafeyên resen hatibin. Lê ji wê bêtir belkî ji ber ku fonksiyonek nû lê bar bûbe guherîbe. Mesela di farisî de, dema ku risteya peywendiyê hebe, sereya frazê ji dêvla îzafeya normal, îzafeya “î”yê distîne ku Richard Larson û Hiroko Yamakido ji bo vê “î”yê *morfema peywendiyê* (relative morpheme) dibêjin û diyar dikin ku mimkun e ku bi awayekî diyakronîk ji îzafeyê hatibe.<sup>30</sup> Îzafeya di zazakî de jî dema ku berî navdêran be cuda ye lê dema ku berî rengdêran tê û wesifdanê dike cuda ye û li gor rewşa rewşî (tewandî û rasterast) jî diguhere.<sup>31</sup> Ji bo ku rewşa fokûskirî ku bi vê îzafeyê tê çêkirin û ya ne fokûskirî bêtir bê zelalkirin em li mînakên jêrîn binêrin:

(50) a. Sêvê sor û buha kirîbûn. (*sêv* hem *sor* û hem *buha* ne)

b. Sêvê buha û sor kirîbûn. (*sêv* hem *buha* hem *sor* in)

c. Sêvê sor î BUHA kirîbûn. (*sêvên sor*, *buha* ne)

d. Sêvê buha yî SOR kirîbûn. (*sêvên buha*, *sor* in)

Di frazên (50.a.) û (50.b.)yê de ferqa di navbera *sêvê sor û buha* û *sêvê buha û sor* bi mijara topîkbûnê û hiyerarşiya wê ve dikare bê îzahkirin. Yanî eger li gor prensîba PTyê ku hêmanên topîk û girîng berê tînin gotin em hereket bikin, em dê bibêjin di (50.a.)yê de rengdêra *sor* ji rengdêra *buha*

<sup>30</sup> Larson, Richard & Yamakido, Hiroko. “Ezafeyên û Herêmên Zêdekirî yên Navdêran û Rengdêran” in *Adjectives And Adverbs Syntax, Semantics, And Discourse*. Edited By Louise McNally and Christopher Kennedy. Oxford University Press, Oxford. United Kingdom, 2008. r. 45.

<sup>31</sup> Malmîsanij, M. *Kurmanca Île Karşılaştırmalı Kurmanca (Zazaca) Dilbilgisi*, Weşanxaneyê Vateyî/Vate Yayınevi, İstanbul, 2015. r. 114-115.

bêtir li pêş e û girîngtir e. Di (50.b.)yê de jî *buha* ji *sor* pêşdetir hatiye gotin û *buha* ji aliyê maneyê ve ji *sor* bêtir li pêş e. Ev rewş weke ku me berê behs kiribû rewşa tematîk têkildar dike. Di (50.c.) û (50.d.)yê de jî fokûs li ser wê rengdêrê ye ku ji bo sereyeke modîfîyekirî ye ji aliyê rengdêreke din ve. Yanî di (50.c.)yê de fokûs li ser *buhayê* ye ku weke modîfîyekera *sêvê sor* hatiye bikaranîn û di (50.d.)yê de jî fokûs li ser *sorê* ye ku weke modîfîyekera *sêvê buha* hatiye bikaranîn. Em dikarin bibêjin ku di qalibeke wisa de fokûs li ser modîfîyekera dawî ye û wateyeke dijber jî tê de heye. Yanî bêyî ku em ji stratejiya guvaşa emfatîk (emphatic stress) îstîfade bikin, bi awayekî sentaktîk, em fokûsa dijber (contrastive focus) pêk tînin. Dema ku em ji aliyê rewşa fokûsa dijber ve lê binêrin, ji bo (50.c.) û (50.d.)yê em dê wisa bibêjin:

(51)a. *Sêvê buha yî sor (sêvên buha, ne zer an rengeke din in lê sor in)*

b. *Sêvê sor î buha (sêvên sor, ne erzan in lê buha ne)*

Dema ku rengdêreke din lê bê zêdekirin û fokûs li ser du rengdêran be, dîsa gihaneka *û'yê* tê bikaranîn:

(52)a. *Sêvê buha yî sor û biav kirîbûn. (sêvên buha, sor û biav in)*

b. *Sêvê sor î buha û xweş kirîbûn. (sêvên sor, buha û xweş in)*

Di (52a.)yê de *sor û biav* ji bo *sêvê buha* hatine bikaranîn. Di (52.b.)yê de jî *buha û xweş* ji bo *sêvê sor* hatine bikaranîn. Ji aliyê fokûsê em lê binêrin, em dibînin ku di (52.a.)yê de fokûs li ser *sor û biav'ê* û di (52.b.)yê de jî li ser *buha û xweş'ê* ye. Eger ew rengdêr berî îzafeyê bihatina wê demê dîsa bi gihaneka *û'yê* bi hev ve dihat girêdan û maneya wê jî bi binî ve diguherî:

(53)a. *Sêvê buha û biav î sor, kirîbûn. (sêvên buha û biav, sor in)*

b. *Sêvê sor û xweş î buha, kirîbûn. (sêvên sor û xweş, buha ne)*

Di (53.a.)yê de *sor* ji bo *sêvê buha û biav* hatiye bikaranîn, di (53.b.)yê de jî *buha* ji bo *sêvê sor û xweş* hatiye bikaranîn. Heman rewşa fokûsê ji bo van jî derbas dibe û fokûs li ser hêmana herî dawî ye. Lê lazim e mirov bibêje ku di axaftinê de gelek caran fokûs bi awayekî prosodîk, bi guvaşê (stress) tê çêkirin.

Di metnên sehayî yên herêma Mêrdînê de xuya dibe ku bi piranî rengdêrek tenê navdêran modîfîye dike û bikaranîna du rengdêran ji bo navdêrekî ji ya sisiyan zêdetir jî be bi giştî hindik tîn

bikaranîn. Dema ku du an zêdetir rengdêr sereyekî modîfiye dikin, bikaranîna gihaneka û'yê jî obsiyonel e:

(54) a. "... zilamekî feqîr, belengaz, jiderbketî ..." <sup>32</sup>

b. "... riyek dûr, dirêj û bieziyet ..." <sup>33</sup>

c. "... qîzaka xwaşik û bi şawaq û beraq ..." <sup>34</sup>

d. "... xêlîka kesk û sor û zer..." <sup>35</sup>

Dema ku mirov li metnên herêma Mêrdînê dinêre mirov dibîne ku rengdêrên fokûskirî herî zêde dema ku peyvrêziya *sere + cihnav + rengdêr* hebe tên bikaranîn. Yanî cihnav sereyekê modîfiye dike û rengdêr her duyan modîfiye dike û fokûs li ser rengdêrê ye. Em ji bîr nekin ku ev fokûsa bi vî awayî, fokûsa dijber (contrastive fokûs) e û bêyî ku pêwîstî bi stratejiya *guvaşa dijber* (contrastive stress) hebe tê çêkirin:

(55) a. "... dewrana me yî berê ..." <sup>36</sup>

b. "... kurê min î delal ..." <sup>37</sup>

c. "... çêleka wa y' zer..." <sup>38</sup>

<sup>32</sup> Çoban, Mehmet. *Bikaranîna Rengdêran Li Herêma Midyadê*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2014. r. 13.

<sup>33</sup> Atış, Ali. *Di Devoka Çiyayê Mazî de Bikaranîna Hevalnavan*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2016. r. 9.

<sup>34</sup> Arslan, Aydın Gulçin. *Rêjeya Bikaranîna Dengan Di Herêma Torê de*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn. 2013. r. 9.

<sup>35</sup> Alkan, Fırat, *Di Hin Dûrikên Ji Herêma Mêrdîn de Rengdêr*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn. 2014. r. 13.

<sup>36</sup> Îldem, Abdulkadîr. *Dengbêj Mihemedê Xursî*. Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2013. r. 8.

<sup>37</sup> Arslan, h.b., . r. 14.

<sup>38</sup> Bulgan, Bilal. *Bikaranîna Hevalnavan (Rengdêran) Di Devoka Herêma Kercewsê De*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn. 2013. r. 16.

d. “*Bi serê golkê min î beş...*”<sup>39</sup>

Di peyvîziyêke wisa de eger em cihê cihnav û rengdêrê biguherînin, wê demê fokûs diçe ser cihnavê. Lê di pratîkê de, ev yek ne şaş be jî zêde nayê bikaranîn. Ji ber ku di kurmancî de çêkirina fokûsê ji stratejiyên morfolojîk û sentaktîk bêtir bi stratejiyên prosodîk çêdibe ku guvaş rêya herî berbelav e. Yanî ji dêvla ku em cihê cihnavê biguherin em dê cihnavê bi guvaş bibêjin. Ew guvaş jî ne *guvaşa nêtar* (neutral stress) lê *guvaşa dijber* (contrastive fokûs) e. Hinek zimanzan ji bo vê guvaşê ku dengî bilindtir dike û maneyên dijber çêdike, *guvaşa emfatîk* (emphatic stress) dibêjin.<sup>40</sup> Lê li vir weke ku Givón<sup>41</sup> bi kar tîne em dê *guvaşa dijber* bi kar bînin ku bi fokûsa dijber çêdibe. Eger em van bikaranînen ku cihnav û rengdêr di wan de hene tev li konteksta wan a semantîk nîşan bidin dê çêtir bê famkirin:

1. Guvaşa nêtar (neutral stress) heye û fokûs li ser rengdêrê ye.

(56) a. *Kontekst*: Hevala te ya çawa?

b. Hevala min î baş

2. Guvaşa nêtar (neutral stress) heye û fokûs li ser cihnavê ye.

(57) a. *Kontekst*: Hevala baş a kê?

b. Hevala baş î mi. (ne hevala hinekî din lê ya min)

3. Guvaşa dijber (contrastive stress) heye û fokûs li ser cihnavê ye.

(58) a. *Kontekst*: Hevala baş a kê?

b. Hevala MIN î baş. (ne hevala hinekî din lê ya min)

Di fraza (56.b.)yê de fokûs li ser rengdêrê ye û ew fokûs bêyî ku ji guvaşêke ku cextê an maneyên dijber çêbike, bi awayekî morfo-sentaktîk hatiye çêkirin. Morfo-sentaktîk e lewre “î” hatiye bikaranîn ku morfolojîk e û li pozîsyona dawîya frazê cih digire ku sentaktîk e. Di fraza (57.b.)yê de jî

<sup>39</sup> Demirkaya, Îslameddîn. *Di Nava Eşîra Morîkan De Rêjeya Zayenda Bêjeyan*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn. 2014. r. 12.

<sup>40</sup> Erguvanlı, Eser Emine. *The Function of Word Order in Turkish Grammar*. University of California Press, Berkeley-Los Angeles-London, 1984. r. 118.

<sup>41</sup> Givón, h.b., *Volume II*, r. 380.



dîsa guvaşa nêtar yanî ya normal hatiye bikaranîn û fokûs bi awayekî morfo-sentaktîk li ser cihnavê yê. Lê di fraza (58.b.)yê de cihnav, ne bi guvaşa normal ango nêtar lê bi ya dijber hatiye gotin û fokûsa dijber ava kiriye. Fokûsa ku bi guvaşê çêdibe di kurmancî de ji ya morfo-sentaktîk xurttir e. Ji ber wê jî digel ku di fraza (58.b.)yê de fokûs li ser rengdêrê ye, guvaşa dijber li ser cihnavê ye û fokûsa cihnavê ya bi riya guvaşa dijber, fokûsa rengdêrê betal kiriye. Jixwe di fraza (58.a.)yê de “baş” weke kontekst hatiye dayîn û loma jî ew êdî ne rema (rhema) lê tema ango topîk e. Her wiha lazim e mirov vêya bibêje ku guvaşa dijber dikare biçe ser rengdêrekê jî ku bi awayê morfo-sentaktîk hatiye fokûskirin. Weke mînak, di fraza (56.b.)yê de em dikarin guvaşa dijber daynin ser rengdêra ku jixwe di rewşa fokûsê de ye.

(59) **a.** *Kontekst:* Hevala te ya çawa?

**b.** Hevala min î BAŞ. (Hevala min a ne xerab lê ya BAŞ)

Em dikarin bibêjin ku di fraza (59.b.)yê de fokûs hem bi awayê morfo-sentaktîk hem jî prosodîk hatiye kodkirin. Dema ku guvaşa dijber lê zêde dibe mane jî bêtir dibe dijber. Yanî dixwaze bibêje “*hevala min, ne ya xerab lê ya BAŞ*”.

Ji bilî bikaranîna îzafeya “î”yê îzafeyên resen (ji bo nêr û pirhejmariyê -ê, ji bo mê) jî di fokûskirina rengdêran de tîn bikaranîn. Lê hinek rewşên wan yê prosodîk ji hev cuda ne û ferqî di navbera rewşa guvaş û melodiya gotinê (speech melody) wan de heye. Eger em bi mînakan sê rewşên van bikaranînan îzah bikin:

(60) **a.** Hevala min î BAŞ

**b.** Hevala min a BAŞ

**c.** Hevala min (I) A BAŞ.

Li Mêrdînê ev her sê bikaranîn jî hene ku (60.a.) herçend forma (60.a.) zêdetir tê bikaranîn jî (60.a.) û (60.b.) ji aliyê maneyê ve li şûna hev tîn bikaranîn û her du jî ji aliyên prosodîk ve weke yek yekîne tîn gotin û di gotina bêjeyên wê de NK nîne. Lê di (60.c.)yê de piştî *hevala min* NK heye û piştî îzafe û rengdêr bi hev re hatine guvaştin. Şiroveya semantîk a vê bikaranînê, ji ya (60.a.) û (60.b.)yê cudatir e lewre fokûsa rengdêra wê ji yê din xurttir e. Yanî (60.a.) û (60.b.) bi awayekî monotonîk weke yek fraz tîn gotin lê di (60.c.)ê de ew rîتما (rythem) wê diguhere û piştî ku NK berî

rengêrê tê dayîn hem îzafê hem jî rengdêr bi hev re guvaşê distînin. Bi vî awayî hem melodiya axaftinê bêtir harmonîk dibe hem jî fokûs tê cextkirin.<sup>42</sup>

**4. Temamker (complement):** Dema ku navdêr an cihnavêk sereyê modîfiyê dike, wê ji aliyê xwedîtiyê ve tamam dike û maneya xwedîtiyê çêdike.

**1. Temamkerên ku cihnav in:** Hin cureyên cihnavan dema ku piştî sereyên navdêrî tên wan ji aliyê xwedîtiyê (possessive) ve modîfiyê dikin. Weke kategoriyeke serbixwe cihnavên xwedîtiyê tune ne. Mesela di îngilîzî de weke kategoriyeke serbixwe (his, her, their hwd.) cihnavên xwedîtiyê hene. Cihnavên kurmancî dema ku piştî navdêran tên û bi alîkariya *îzafeyê* ve, bi navdêran re tên girêdan maneya xwedîtiyê çêdikin. Em dikarin weke çar kom wan kategorîze bikin ku weke tamamker tên bikaranîn:

**a. cihnavên kesî (personal pronoun):** Cihnavên kesî yê forma tewandî (oblîk) *mi, te, wî, wê, me, we, wan* piştî sereyan bînin, ji aliyê maneya xwedîtiyê ve sereyan modîfiyê dikin:

(61) a. deftera *mi/te/wî/wê/me/we/wan*

b. kitêba *mi/te/wî/wê/me/we/wan*

**b. Cihnavên nîşander (demonstrative pronoun):** Cihnavên nîşander eger berî navdêran bînin tenê nîşanê dikin û wateya xwedîtiyê nadin. Lê dema ku piştî navdêran tên hem maneya nîşanê di wan de heye hem jî maneya xwedîtiyê li wan bar dibe. Dema ku weke paşnavdêrî bînin bikaranîn jî dîsa weke nîşanderên pêşnavdêrî li gor *nêzîk/dûr, mê/nêr* û *yekhejmar/pirhejmar* xwedî formên cuda ne:

	<i>nêzîk</i>	<i>dûr</i>
(62) a. <i>nêr</i>	deftera <i>vî</i>	deftera <i>wî</i>
b. <i>mê</i>	qelema <i>vê</i>	qelema <i>wê</i>
b. <i>pirhejmar</i>	hevalê <i>van</i>	hevalê <i>wan</i>

<sup>42</sup> Ji bo têkiliya rîtim, melodiya axaftinê û hêmanên prosodîk li vê gotarê binêre:

Nooteboom, Sieb. "The Prosody Of Speech: Melody And Rhythm". In *The Handbook Of Phonetics Sciences*. 640-673. W.J. Hardcastle and J. Laver (edit) Oxford: Blackwell, 1997.

**c. Cihnavaya vegerok (reflexive pronoun):** Cihnavaya vegerok *xwe*, dema ku piştî navdêran tê wateya xwedîtiyê dide:

(63) a. deftera *xwe*

b. navê *xwe*

c. ca *xwe*

Cihnavaya *xwe'yê* li hin herêmên weke *Semsûr û Meletî*, dema ku piştî navdêran tê maneya “wî/wê” dide.<sup>43</sup>

**d. Cihnavaya hevûdinî (reciprocal pronoun):** Cihnavaya hevûdinî *hev/hevdû* dema ku piştî navdêran tê maneya xwedîtiyê çêdike û wan ji aliyê xwedîtiyê ve modîfiye dike.

(64) a. defterê *hev*

b. malê *hev*

c. azadya *hev*

**e. Cihnavên nenasyar (indefinite pronoun):** Bêjeyên weke *hinek, hemû, gelek hem weke çendîker hem hoker hem jî cihnavên nenasyariyê* tînan bikaranîn. Dema ku piştî navdêran tînan, ew jî weke *temamkerên* din maneya xwedîtiyê çê dikin:

(65) a. hevalê *hemûya*

b. mala *geleka*

c. azadya *hinika*

**2. Temamkerên ku navdêr in:** *Temamkerên navdêrî* bi awayekî teorîk bêsînor dikarin piştî sereyê bînan û wê *temam bikin*. Du *navdêrên* ku yek *modîfiyeker* yek jî *modîfiyekirî* ye *frazên herî hêsan pêk tînin*.

(66) a. nanê *tenûrê*

b. pezê *gundiya*

<sup>43</sup> Tan, Samî. *Rêziman û Rastnivîsa Zaravayê Kurmancî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol. 2005. r. 116-

Sere û temamkerên wê bi çend awayan dikarin bibin yek fraz. Weke mînak, dibe ku du an zêdetir temamker ji bo yek serêyê bîn bikaranîn. Eger sere ji bo du heb modîfyekerên cuda hevbeş be, wê demê ne hewce ye her du sere jî bîn bikaranîn û dikarin bibin yek fraz:

- (67) **a.** *mala koçera û mala bêkesa*
- b.** *mala koçer û bêkesa*
- c.** *kitêbê xwendekara û kitêbê mamosteya*
- d.** *kitêbê xwendekar û mamosteya*

Di fraza (67.a.)yê de sereya *mal'ê* ji bo *koçer û bêkesa* hevbeş e loma ya yekem dimîne û ya duyem dikeve û forma (67.b.)yê peyda dibe. Di fraza (67.c.)yê de jî sereya *kitêb'ê* ji bo *xwendekar û mamosteya* hevbeş e û ji ber ku hevbeş e ya duyem dikeve û forma (67.d.)yê peyda dibe.

Di hin frazan de jî dibe ku du sere ji aliyê yek navdêrî bê temamkirin. Eger du sereyên cuda hebin û modîfyekera wan hevbeş be, ji bo du heb sereyên cuda yek temamker tê bikaranîn û wê demê, dibin yek fraz:

- (68) **a.** *xwendekarê zanîngehê û mamostê zanîngehê*
- b.** *xwendekar û mamostê zanîngehê*

Herçend bi awayekî teorîk navdêr bi awayekî bêsînor dikarin bîn cem hev jî dema ku em li metnên sehayî yên herêma Mêrdînê dinêrin, xuya dibe ku herî zêde du navdêr tîn cem hev, sisê hindiktir in, çar û pênc gelekî hindik in. Weke mînak, di nav metneke sehayî de (7019 bêje), frazên ku ji çar navdêran pêk dihatin *dudu bûn*, ya ku ji pênc navdêran pêk dihat jî tenê yek bû.

- (69) **a.** "... *devê deriyê mala bavê xwa ...*"<sup>44</sup>
- b.** "... *heyra maçkirina ruwê xwa ...*"<sup>45</sup>
- c.** "... *nêriyê mala bavê wê ...*"<sup>46</sup>

<sup>44</sup> Kartal, Lokman. *Rêjeya Bikaranîna Denga Di Devoka Tûr Abdîn/Torê De (Kercos/Gundê Xerabêna)*. Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn. 2013. r. 19.

<sup>45</sup> Kartal, h.b., r. 13.

<sup>46</sup> Kartal, h.b., r. 15.

Di axaftina rojane de gelek caran bêjeyên têkildarî merivatî û malbatîyê weke temamker tên bikaranîn û frazên dirêj çê dikin. Weke mînak, frazên jêrîn ji gelek navdêran pêk tînin û ji bo guhê kesî xerîb nayên:

(70) a. *Daweta kurê metka ca min*

b. *Keça xaltîka amojna bûka me*

Dema ku rengdêr li sere û temamkeran zêde dibin li gor rewşa wan a fokûsê îzafeya “î”yê an jî yê resen ê/a tên bikaranîn. Weke ku berî jî me got, forma “î”yê pir berbelav e. Dîsa dema ku navbera prosodîk ango NK hebe, a/ê tên tercîhkirin û fokûs xurttir e.

(71) a. “... li ser diranekî wî nî kursiya ...”<sup>47</sup>

b. “... a xwe yî dinê ...”<sup>48</sup>

c. “... lawê apê keçikê (l) yê heq ...”<sup>49</sup>

Frazên daçekî jî dema ku weke modîfîyeker tên bikaranîn û dikevin ber fokûsê dîsa heman rewş diqewime. Yanî bi “î”yê dibin hêmana fokûskirî û dema ku NK û îzafeyên a/ê bînin bikaranîn jî fokûsa xurt çêdibe. Em ji bîr nekin ku her du awayên fokûsê jî maneyên dijber çêdikin. Lê ya ku bi îzafeyên a/ê’yê çêdibe xurttir e û bêtir maneyeke dijber dide:

(72) a. mala Ehmed î li gund (ne ya li bajêr an cihekî din lê ya gund)

b. mala Ehmed (l) a li gund (ne ya li bajêr an cihekî din lê ya li gund)

c. arvanê me yî li êş (ne yê li embar an cihekî din lê yê li êş)

d. arvanê me (l) yê li êş (ne yê li embar an cihekî din lê yê li êş)

e. kurê Eyşe yî li Stenbolê (ne yê li Mêrdîn an bajarekî din lê yê li Stenbolê)

f. kurê Eyşe (l) yê li Stenbolê (ne yê li Mêrdîn an bajarekî din lê yê li Stenbolê)

<sup>47</sup> Koşar, Fikret. *Bikaranîna Rengdêran di Çîrokên Devoka Qoserê (Mêrdîne) de*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yê Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn. 2014. r.18.

<sup>48</sup> Demirkaya, h.b., r. 9.

<sup>49</sup> Ayta, Ramazan. *Çîrok û Çîrçîrokên Kaniya Xezalan*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yê Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn. 2013. r.12.

Bikaranîna hêmanên prosodîk di hin rewşan de, ne tenê ji bo çêkirina fokûsê ye lê maneya hin frazên ku bi du şiklan dikarin bên famkirin jî ji hev cuda û zelal dike. Ji ber ku di hinek forman de ew tevlihevî dikare çêbibe. Weke mînak em li her du formên li jêrîn binêrin, xuya dibe ku ne alîkariya prosodîk be zelalî çênabe:

(73) a. *lawê birê min î mezin*

b. *lawê birê min ê mezin*

Her du frazên jorîn, dema ku alîkariya prosodîk nebûya me ji hev dervedixist. Ji ber ku em dikarin ji bo frazên (73.a.) û (73.b.)yê dikarin bipirsin ku gelo rengdêra *mezin* modîfîyeker *birê min* e an jî ya bêjeya *law'ê* ye? Bi gotineke din, gelo yê *mezin*, *bira* ye an jî *law* e? An jî eger çawa be rengdêr ji bo modîfîyêkirina *law* e û çawa be ji bo *bira* ye? Dema ku em li bikaranînê binêrin, em dibînin ku bi awayekî prosodîk ji hev tên cihêkirin:

(74) a. *lawê birê min î mezin*

b. *lawê (I) birê min î mezin*

c. *\*lawê birê min (I) î mezin*

d. *lawê birê min ê mezin*

e. *lawê (I) birê min ê mezin*

f. *lawê birê min (I) ê mezin*

Di fraza (74.a.)yê de NK nehatiye bikaranîn loma jî yê *mezin*, *law* e. Di fraza (74.b.)yê de NK piştî *law'ê* hatiye bikaranîn û *birê min î mezin* weke yekîneyeke sentaktîk hatiye parastin û ji ber ku rengdêra *mezin'ê* di nav sînorên wê yekîneyê de maye, *mezin* ji bo *bira'yî* ye. Di fraza (74.c.)yê de ji ber ku berî îzafeya “î”yê NK nikare bê bikaranîn rewşeke nerêzimanî çêbûye. Di fraza (74.d.)yê de jî rewş, weke ya fraza (74.a.)yê ye. Weke ku me berê jî gotibû, herçend ne bi qasî forma îzafeya “î”yê jî be ev form jî heye û (74.d.) û (74.a.) li şûna hev dikarin bên bikaranîn. Di fraza (74.e.)yê de NK piştî *law'ê* ye û *birê min ê mezin* yekîneyeke sentaktîk pêk aniye ku rengdêra *mezin'ê* di nav sînorên wê de maye û loma jî rengdêra *mezin* ji bo *law'ê* hatiye bikaranîn. Di fraza (74.f.)yê de jî NK piştî *lawê birê min* hatiye bikaranîn ku di vir de *lawê birê min* weke yekîneya sentaktîk hatiye bikaranîn û em fam dikin ku *mezin* ji bo *law'ê* hatiye bikaranîn. Baş e, li vir pirseke wisa em dikarin bipirsin: Eger di

(74.a) û (74.f)yê de *law*, *mezin* be û rengdêra *mezin* jî ji bo *law'ê* be, çima em rengdêrê nêzîkî navdêra wê bikarnaynin û nabêjin:

(75) a. *lawê mezin î birê mi*

b. *lawê mezin ê birê mi*

Belê, ev bikaranîn jî hene lê bi awayekî pragmatîk di maneyê de cudahî heye: Di frazên di (74.a) û (74.f)yê de fokûs li ser *mezin* e. Lê di (75.a) û (75.b)yê de fokûs ne li ser *mezin* e lê li ser *birê min* e. Weke me berê jî got, dema ku em ji guvaş û NK îstîfade bikin wê demê di frazeke weke ya (75.b.)yê de fokûsa xurt çêdibe:

(76) b. *lawê mezin (I) Ê BIRÊ MI*

**5. Risteya peywendiyê (relative clause):** Dema ku sereya frazê ji aliyê risteyekê tê modîfîyêkirin ku bingihaneka (subordinator) “ku”yê, peywendiyê di navbera sere û risteyê de çêdike, ew riste dibe risteya peywendiyê. Bikaranîna *ku*'yê herçend di kurmanciya standart de tendanseke xurt be û di asta îcbariyê (obligatory) de be jî, di devokên kurmancî de opsiyonel e. Lê li hin herêman herçend dîsa opsiyonel be jî bi awayekî xurt tê bikaranîn:

(77) a. “... *tiştê gi digot ...*”<sup>50</sup>

b. “*Gava ku pîrê di xew re diçû ...*”<sup>51</sup>

c. “...*jinika kû merê wê çûya hecê*”<sup>52</sup>

d. “*Tiştê mi gotiyi ...*”<sup>53</sup>

<sup>50</sup> Akbaş, Mehmet Şerif, *Di Devoka Qoserê De Rêjeya Bikaranîna Dengan*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn. 2013. r. 13.

<sup>51</sup> Şimşek, Ahmet. *Rêjeya Bikaranîna Dengan Di Devoka Kercosê De (Wek Minak Şeş Çîrokên Herêma Kercosê)*. Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn. 2013. r. 15.

<sup>52</sup> Derin, İpek. *Frekansê Tîpê Kurdî Devoka Nisêbînê da (Mêrdîn)-Rêjeya Bikaranîna Dengan* Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn. 2014. r. 3.

<sup>53</sup> Baş, Abdulhekîm. *Rêjeya Bikaranîna Dengan Di Devoka Qoserê De*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn. 2013. r. 11.

**7. Frazên daçekî:** Dema ku daçek bi navdêran re bên bikaranîn, frazên daçekî çêdikin. Ew frazên daçekî bixwe jî weke modîfîyekerê navdêrekî dikarin bên bikaranîn.

(78) a. "... *eskerê li ber derî* ..." <sup>54</sup>

b. "... *ava li ber bêrma* ..." <sup>55</sup>

c. "... *marê ser devê kaniyê* ..." <sup>56</sup>

d. "... *hevalek ji yê we* ..." <sup>57</sup>

#### ENCAM

Modîfîyekerên sereyên frazekê dibe ku pêşnavdêrî (prenomina) yan jî paşnavdêrî (postnominal) bin û ev tiştekî tîpolojîk e. Di kurmancî de û her wiha di devoka Mêrdînê de jî gelek cure modîfîyekerên paşnavdêrî hene û ji yê pêşnavdêrî gelekî komplîketir in. Di peyvrêziya frazên navdêrî de ev xalên jêrîn tesîrdar in û rewşên sentaktîk ên cuda derdixin holê:

**1.** Topîkalîte, di hinek rewşan de tesîrê li peyvrêziya frazan dike. Ji ber ku di topîkbûnê de hêmana girîng li gor yê din bêtir li pêş cih digire. Çendîkerên partîtif yê weke *hinik*, *gelik* hwd. ji ber rewşa hiyerarşîya topîkbûnê, hem berî hem jî piştî sereyan dikarin bên bikaranîn. Lewre di hin rewşan de rolên semantîk yê peyvrêziyê (semantic role of the word order) hene.

**2.** Weke hêmanek prosodîk, guvaş di hin rewşan de fonksiyona bêjeyê diyar dike. Weke mînak, dema ku *xalê Ehmed* tê gotin, eger guvaş li ser *Ehmedî* be, wê demê *xal* modîfîyeker Ehmed jî sere ye lê eger guvaş li ser *xalî* be *xal* sere û *Ehmed* jî modîfîyeker e.

**3.** Prosodî alîkariya diyarkirina sînorên frazan dike. Bi taybetî navbera kurt (minor break) dide zelalkirin ku sînorê frazê heta ku ye û kîjan modîfîyeker di nav wê yekîneya sentaktîk de maye. Weke

<sup>54</sup> Çoban, h.b., r. 13.

<sup>55</sup> Çoban, h.b., r.15.

<sup>56</sup> Kartal, h.b., r. 19.

<sup>57</sup> Güneş, Mehmet Bakır. *Rêjeya Bikartanîna Dengan Di Di Devoka Tor Abdîn De*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yê Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn. 2013. r. 19.



mînak, dema ku “*xwendekar giş (I) hatin*” û “*xwendekar (I) giş hatin*” tê gotin, bi xêra navbera kurt tê famkirin ku di ya pêşî de *giş* modîfîyeker e û beşek ji frazê ye lê di ya dawî de hokera lêkerê ye.

4. Di kurmançî de dema ku ji yekê bêtir rengdêr sereyekê modîfiye dikin, pozîsyona nêzîkbûn û dûrbûna wan û ya sereyê weke îngilîzî û hin zimanên din ne xwedî cihekî standard in lê rêza wan guherbar (flexible) e. Yanî sentaks û peyvrêziya kurmançî rê dide ku bi hev biguherin û ev guherîna wan jî bi fonksiyonên pragmatîk ve girêdayî ye ku tesîrê li şiroveya wan a semantîk dike. Weke mînak, di îngilîzî de dergûşa *xweşik û darîn* bê gotin divê *darîn* nêzîkî dergûşê bê bikaranîn û ev yek li gor hiyerarşiya navbera rengdêran diqewime. Lê di kurmançî de hiyerarşiyeke standard a bi vî awayî di navbera rengdêran de tune, peyvrêziya wan guherbar e û guherîna peyvrêziya wan jî bi rewşa wan a topîkbûn û fokûsê ve girêdayî ye. Ji ber topîkbûn û fokûsê peyvrêziya wan dikare biguhere ku pozîsyona nêzî sereyê topîkbûnê û ya ber bi dawî jî fokûsê nîşan dide. Yanî dema **ku** fokûs li ser rengdêrê be berî îzafeyê tê bikaranîn û rengdêr diçe dawî.

5. Ladana (deletion) pêkhênên hevbeş, çî sere çî jî modîfîyeker, tesîrê li peyvrêziya frazan dike. Weke mînak, di fraza *mala koçera û mala bêkesa* de ji sereyên hevbeş yek dikeve û di *xwendekarê zanîngehê û mamostê zanîngehê* de jî modîfîyekerê hevbeş *zanîngeh* dikeve.

6. Dema ku ji yekê zêdetir temamker û rengdêr ji bo yek sereyê tên bikaranîn, pozîsyona pêşî pozîsyona herî tematîk (thematic) e û ya dawî jî ya herî rematîk (rhematic) e. Loma kîjan modîfîyeker bê fokûskirin, diçe dawiyê û ji îzafeyê tê îstîfadekirin. Weke mînak, dema ku *keça Ehmed î mezin* tê gotin fokûs li ser *mezinê* ye lê dema ku em dibêjin *keça mezin î Ehmed* fokûs li ser bêjeya *Ehmedê* ye.

7. Risteyên peywendiyê ku bi awayekî obsiyonel bi “*gi/go/ku/kû*”yê çêdibin weke modîfîyekerên navdêran her dem paşnavdêrî ne û hemû taybetiyên risteyê normal nîşan didin.

8. Frazên daçekî jî weke modîfîyekerên navdêran tên bikaranîn û pozîsyona wan hişk e û ji bilî rewşa çendîkerên partîtîf tu carî berî navdêran nayên û modîfîyekerên paşnavdêrî ne.

## ÇAVKANÎ

**Akbaş, Mehmet Şerif.** *Di Devoka Qoserê De Rêjeya Bikaranîna Dengan*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn. 2013.

**Alkan, Fırat.** *Di Hin Dûrikên Ji Herêma Mêrdîn de Rengdêr*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn. 2014.

**Arslan Aydın, Gulçin.** *Rêjeya Bikaranîna Dengan Di Herêma Torê de*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn. 2013.

**Atış, Ali.** *Di Devoka Çiyayê Mazî de Bikaranîna Hevalnavan*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn. 2016.

**Ayta, Ramazan.** *Çîrok û Çîrçîrokên Kaniya Xezalan*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn. 2013.

**Baş, Abdulhekim.** *Rêjaya Bikaranîna Dengan Di Devoka Qoserê De*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn. 2013.

**Bilbil, Mikail&Baran, Bahoz.** *Rêzimana Kurmancî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê, İstanbul. 2008.

**Bulgan, Bilal.** *Bikaranîna Hevalnavan (Rengdêran) Di Devoka Herêma Kercewsê De*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn. 2013.

**Ciwan, Murat.** *Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi / Rêzimana Kurdî Bi Şîrovekirina Tirkî*, Zekisan Matbaası, Diyarbakir. 2014.

**Çoban, Mehmet.** *Bikaranîna Rengdêran Li Herêma Midyadê*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn. 2014.

**Demirkaya, İslameddin.** *Di Nava Eşîra Morîkan De Rêjeya Zayenda Bêjeyan*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn. 2014.

**Derin, İpek.** *Frekans Tîpê Kurdî Devoka Nisêbînê da (Mêrdîn)-Rêjeya Bikaranîna Dengan*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn. 2014.

**Ebûzeyd, Sanya Cabar.** *Cihgîhorîna Kerestan Di Ristê Da (Govara Badînî)*. Teza Doktorayê. Zankoy Soran - Fakultî Adab - Beşî Kurdî, Kurdistan/Iraq, 2013.

**Bedirxan, Emîr Celadet & Lescot, Roger.** *Kürtçe Grameri*, Doz Yayınları, İstanbul (sal nehatiye diyarkirin)

- Endley, Martin J.** *Linguistic Perspectives on English Grammar: A Guide for EFL Teacher*, Information Age Publishing, inc. Charlotte -America. 2010.
- Erguvanli, Eser Emine.** *The Function of Word Order in Turkish Grammar*, University of California Press, Berkeley-Los Angeles-London, 1984.
- Geniušiene, Emma.** "Passives in Lithuanian (in comparison with Russian)" in *Passivization and Typology Form and Function*. Editor: Werner Abraham & Larisa Leisiö, (p. 29-61), John Benjamins Publishing Company, Amsterdam/Philadelphia. 2006.
- Givón, Talmy.** *Syntax, An Introduction, Volume I*, John Benjamins Publishing Company, Amsterdam/Philadelphia. 2001.
- Givón, Talmy.** *Syntax, An Introduction, Volume II*, John Benjamins Publishing Company, Amsterdam/Philadelphia. 2001.
- Güneş, Mehmet Bakır.** *Rêjeya Bikaranîna Dengan Di Di Devoka Tor Abdîn De*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2013.
- Halliday, M.A.K.** *Language Structure And Language Function in On Grammar*, Edited by Jonathan Webster (2005), Continuum, London-New York, 1970.
- Hopper, Paul J.** "Some Principles of Grammaticization" in *Approaches To Grammaticalization*, John Benjamins Publishing Company Amsterdam/Philadelphia. 1991.
- Îldem, Abdulkadîr.** *Dengbêj Mihemedê Xursî*. Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn. 2013.
- Kartal, Lokman.** *Rêjeya Bikaranîna Dengan Di Devoka Tûr Abdîn/Torê De (Kercos/Gundê Xerabêna)*. Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn. 2013.
- Kompe, Ralf.** *Prosody In Speech Understanding Sysytems*. Springer, Berlin, 1997.
- Koşar, Fikret.** *Bikaranîna Rengdêran di Çîrokên Devoka Qoserê (Mêrdînê) de*. Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn. 2014.
- Larson, Richard & Yamakido, Hiroko.** "Ezafê And The Deep Position Of Nominal Modifiers" in *Adjectives And Adverbs Syntax, Semantics, And Discourse*. Edited By Louise McNally and Christopher Kennedy. Oxford University Press, Oxford. United Kingdom, 2008.

- Lyons, Christopher.** *Definiteness*, Cambridge University Press. Cambridge, United Kingdom, 1999.
- Makas, Hugo.** *Kurdische Texte im Kurmânji – Dialekte Aus Der Gegend Von Mêrdîn & Eine Probe Des Dialektes Von Diarbekir; Ein Gedicht Aus Gäwar; Jezidengebete* Apa - Philo Press /Amsterdam- 1979.
- Malmîsanij. M.** *Kurmancca Île Karşılaştırmalı Kırmancca (Zazaca) Dilbilgisi*, Weşanxaneyê Vateyî/Vate Yayınevi, İstanbul. 2015.
- Nooteboom, Sieb.** “*The The Prosody Of Speech: Melody And Rhythm*”. in *The Handbook Of Phonetics Sciences*. 640-673. W.J. Hardcastle and J. Laver (edit) Oxford: Blackwell. 1997.
- Qanatê Kurdo.** *Rêzimana Kurdî-Kurmancî-Soranî, ji soranî wer.* Zülküf Ergün, Weşanên Nûbiharê. İstanbul, 2013.
- Svenonius, Peter.** “*The Position Of Adjectives And Other Phrasal Modifiers In The Decomposition Of DP*” in *Adjectives And Adverbs Syntax, Semantics, And Discourse*, Editor: Louise McNally and Christopher Kennedy, Oxford University Press, Oxford-United Kingdom, 2008.
- Şimşek, Ahmet,** *Rêjeya Bikaranîna Dengan Di Devoka Kercosê De (Wek Mînak Şeş Çîrokên Herêma Kercosê.* Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn. 2013.
- Tan, Samî.** *Rêziman û Rastnivîsa Zaravayê Kurmancî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2005.
- Nooteboom, Sieb.** “*The The Prosody Of Speech: Melody And Rhythm*”. In *The Handbook Of Phonetics Sciences*. 640-673. W.J. Hardcastle and J. Laver (edit) Oxford: Blackwell, 1997.

## Qertafên ku ravekê bi hevalnavan ve diwesfînin

**Zafer AÇAR**

### Destpêk

Di kurmancî de hin qertaf hene ku di ravekê de dibin pêvekê raveber û ravekerê, wan ji aliyê zayend, mêjer, diyarî û nediyariyê ve nîşan dikin. Di ravekê de, veqetandekên diyarkirinê yên raveberê, yên; yekjimar û nêr 'ê', yekjimar û mê 'a' û pirjimar 'ên', veqetandekên nediyarkirinê yên; yekjimar û nêr 'ekî', yekjimar û mê 'eke' û pirjimar 'ine' ne. Eger ravek hevalnavekê yan çend hevalnavan bigre û eger raveber bi qesta 'yek tenê' de bê bikaranîn wê demê qertafên beriya hevalnavan ên bi ravekê re tên bikaranîn wiha ne: yekjimar û nêr 'î', yekjimar û mê 'e' û pirjimar 'ne'. Em çend mînakên bidin:

“Diya min e delal.” Di vê hevokê de raveber yekjimar û mê ye û tenê ye lewma jî divê qertaf 'e' be, em nikarin bêjin “Diya min a delal” lewre dê yek e. Lê eger hevokek wiha be:

Xwîşka min e delal. Wate: Xwîşkeke min tenê heye û ew delal e.

Xwîşka min a delal. Wate: Xwîşkine min hene ji wan ez behsa yekê dikim ku ew delal e.

Bavê min î camêr. Di vê hevokê de raveber yekjimar nêr û tenê ye lewma divê qertaf 'î' be, lewre jî ber ku bav jî yek e em nikarin bêjin “Bavê min ê camêr.” Lê eger hevokek wiha be:

Birayê min î xwendevan. Wate: Birayekî min tenê heye ew jî xwendevan e.

Birayê min ê xwendevan. Wate: Birane min hene yek ji wan xwendevan e.

Hin mînakên din:

“Pozê te yî bilind.”

“Miya sor e kel.”

“Berçavka wî ye tavê.”

Di bêjeyên pirjimar de jî qertafa ‘ne’ bi kar tê û zayendê ji holê radike.

“Malên gund **ne** mezin.” Wate: Malên gund hemî mezin in.

“Malên gund **yên** mezin.” Wate: Hin malên gund mezin in.

Ji aliyekî din ev qertaf gava nav/raveber, veqetandekên nediyariyê bigrin jî wisa ne.

Maleke me **ye** mezin.

Gundekî me **yî** mezin.

Hespine me **ne** beza.

Em dibînin ku qertaf dîsa wekî xwe dimînin û hevalnavan bi cînavê ve li gorî zayend û mêjera ‘raveberê’ diyar dikin. Lê ji bo qertafên pirjimariyê Celadet Bedirxan qertafa ‘en’ê bi kar tîne (2010, r.48) ku em wisa nafikirin. Lewra ji mînakên jî diyar dibe ku ev qertaf ‘ne’ ye.

Bedirxan, van qertafan wekî ‘Veqetandekên Nebinavkirî di Pêşiya Rengdêran de’ bi nav dike û van qertafan wekî: ‘î’, ‘e’ û ‘en’ bi nav dike. Dîsa di xebateke xwe ye din de ya bi Roger Lescotîre çêkiriye de; di çar ciyan de behsa van qertafan kiriye ku di rûpela 111-112’yan de behsa jêdera van qertafan dike û ji Devera Tor Abîdîn-Eşîra Hevêrakan mînak dide ku li gorî wî, ev qertafên; ‘î’, ‘e’ û ‘en’ dawiya qertafên nediyariyê yên ‘ekî’, ‘eke’ û ‘ine’ (‘dibe ku ‘inen’ be û ‘n’ ya dawiyê ketibe’) ne. Di rûpela 243 ya heman xebatê de van qertafan (‘î’, ‘e’ û ‘en’) wekî ‘cînavên ku pîleya hevalnavan zêdedikin’ bi nav dike. Dîsa di rûpela 264’an de van qertafan wekî ‘qertafên nediyariyê’ bi nav dike û dibêje: “ev paşgir di nav avaniyê de gava bi serê xwe ne wekî cînav bi kêr tên”. Paşê hin mînakên dide û di mînakekê de qertafa pirjimariyê wiha bi kar tîne: “Avên çemên zozanan **en** sar in”. Peyre dibêje di bikaranîna cînavên “yê, ya, yê; ê, a ,ên û î, e, en de pirtîkî sistahiyek heye ku em wiha jî bêjin ne xelet e: “Avên çemên zozanan **ên** sar in.” [2] Dîsa di rûpela 353’yan de ev qertaf wiha tên navandin; navek bi çend hevalnavan ve bê wêfandîna tên bikaranîn û eger nav diyar be ‘ê, a, ên, lê ku nediyar be ‘î, e, ên’ tên bikaranîn. (2000, r.111-112, 243, 264, 353)

Ji bilî van qertafan hin qertafên cînavên kesî hene ku ew, cureyên lêkera ‘bûn’ in û divê bi van qertafan ve neyên tevlihev kirin. Em bi mînakên wan diyar bikin:

Tu bavê min î camêr î.= ‘î’ya dawiyê qertafa cînava kesî ya duwem e û lêkera ‘bûn’ e.

Ew diya min e delal **e**. = ‘e’ya dawiyê qertafa cînava kesî ya sêyem e û lêkera ‘bûn’ e.

Ew zarokên me ne jêhatî **ne**. = ‘ne’ya dawiyê qertafa hersê cînavên kesî yên pirjimar e û lêkera ‘bûn’ e.

Piştî van danberhevan niha jî em van qertafan; di hin cureyên edebiyata kurdî de, ciyê ku derbas dibin nîşan bidin:

### **Di Hin Klam û Çîrokan de**

#### **Di Çîroka Siyabend û Xecê de**

Di vê çîrokê de di gelek ciyî de hatiye bikaranîn ku em ê jê çend mînakên bidin:

Di rûpela 69. û di gelek rûpelên din de “Herê Siyabendê min î şengîn e.”

Di rûpela 126. de;

#### **Siyabend**

Xeca min **e** nazik û biqîmet,

Delal û torina min **e** bi hurmet,

...

#### **Xecê**

Siyabendê min î bê sa û delal,

Tu erfûtê min î bê tirs û kemal,

...

Di rûpela 145. de;

#### **Xecê**

Birêd mine helal û bi qîmet,[\[3\]](#)

...(Semend, 2006, r.69, 126, 145)

### **Di Klama ‘Wey Dil’ de**

Di klama Dengbêj Şakiro ‘Wey Dil’ de, di dîsgotinan de qertafa yekjimar û nêr ‘î’ wiha derbas dibe:

...

Fenanî gakî bêwerîs î bêcil

Fenanî kirasî qol î bêmil

Fenanî dara bê şalûl û bê bilbil

Fenanî xas baxçekî rût î bê gul

...(Nûbihar, 120, r. 61-64)

### Di Memê Alan de

Di Destana Memê Alan de di gelek ciyî de ev qertaf derbas dibin. Em ê jê çend mînakên nîşanê bidin.

Destan wiha dest pê dike:

“Bajarê Mixribê bajarekî ezîmî pir giran e.” Di rûpela 112’yan de;

...

Mîna teyrekî serdestan î çeng bi şerab î xebxeb zêr û per zêrîn im!

Ez ne Tirk û ne Tacik im, ez Kurd canpola î serhişk î dilbirîn im!

Dîsa di rûpela 134’an de;

Beko got: Mîrê min te berê xwe dabû sefereke pir e mezin û giran e...

Di rûpela 22’yan de;

“De, rabin, berê xwe bidin bajarê Mixribê û qonaxê xwe nê giran e.”<sup>[4]</sup> (Lescot, 1997, r. 21, 112, 134, 22)

Wekî ku me pêşde diyar kiribû ev qertafên ku ravekê bi hevalnavan ve girêdidin li gorî raveberê teşe digirin. Niha jî em ê van qertafan li gorî cureyên ravekan diyar bikin û wan bi mînakên nîşanê bidin:

### Piştî raveka navî:

Piştî raveka navî ev qertaf bi hevalnavekî ve bi ravekê ve tîr girêdan û raveberê di maneya ‘yek tenê’ de diyar dîkin. Mêjer û zayenda van qertafan li gorî raveberê ye. Hin mînak:

Kurê Hesenê Mamoste.= Mamoste, Hesen e em behsa kurê wî dîkin.

Kurê Hesenî<sup>[5]</sup> yê mamoste.=Çend kurên Hesen hene em behsa yê mamoste dîkin.

Kurê Hesenî yî mamoste.= Kurekî Hesen heye ew mamoste ye jî.

Keça Hesenê Mamoste.

Keça Hesenî ya mamoste.

Keça Hesenî ye mamoste.



Zarokên Hesenê Mamoste.

Zarokên Hesenî **yên** mamoste.

Zarokên Hesenî **ne** mamoste.

Vê carê bila raveker mê be û navê wê 'Gulê' be:

Kurê Gulê**ya** Mamoste.

Kurê Gulê **yê** mamoste.

Kurê Gulê **yî** mamoste.

Keça Gulê**ya** Mamoste.

Keça Gulê **ya** mamoste.

Keça Gulê **ye** mamoste.

Zarokên Gulê**ya** Mamoste.

Zarokên Gulê **yên** mamoste.

Zarokên Gulê **ne** mamoste.

Mînakên jor jî nîşan didin ku eger ji raveberê qest kesek/komek be wê demê qertafên diyarkirina tenêbûnê tên bikaranîn. Em çend mînakên din lê zêde kin:

Deriyê malê **yî** dadayî.

Ji ber ku deriyê malê yek tenê ye û nêr e em qertafa yekjimar û nêr yanî "î"yê bi kar tînin. Eger deriyê malê ji yekî zêdetir bûna wê demê me dê wiha bigota: "Deriyê malê **yê** dadayî." Hin mînakên din:

Wê satila avê **ye** hesin tijî av kiribû û ji kaniyê diçû malê.

Pencereyên malê **ne** girtî.

Malên kevin **ne** gund.

Ev qertaf, bi raveka navî re xwe gelek baş nade nîşan lewra di zimanê rojane de guhertin dîtine û hin caran bi veqetandekên diyarkirî ve tên tevlihevkirin. Niha jî em van qertafan piştî raveka cînavî bibînin.

**Piştî raveka cînavî:**

Wekî ku tê zanîn raveka cînavî bi cînavên kesî yê koma tewandî ve tî çêkirin. Ev qertaf bi raveka cînavî re baştir tî xuyan. Herwiha raveka bi cînava vegerok 'xwe'yê ve hatiye çêkirin re jî ev qertaf dikarin bî bikaranîn. Hin mînak:

Xwedayê me **yî** mîhrîban î dilovan.

Pêxemberê me **yî** şîrîn.

Bavê min î jîrek.

Dayîka min **e** delal.

Devê wê **yî** biçûk, pozê wê **yî** tûj û çavên wê **ne** gir.

Zarokên we **ne** baqil.

Xwendevanên we **ne** jîrek di azmûnê de bi ser ketin. Xwezî yê me jî wisa jîrek bûna.

Ji van mînakan jî tê diyar ku kesên di ravekê de derbas dibê kesek be yanî nepêkan be ku ji yekî zêdetir be, wê gavê ev qertaf tî bikaranîn. Lewra Xwedayê me yek e, Pêxemberê me yek e dîsa bav û dê jî yek in. Herwiha ji bo pirjimariyê eger qest komê tenê be yanî lider komê din tunebin qertafa '**ne**' tî bikaranîn.

Gava bêjeyên kurmancî bi ravekê, bi hev ve tî girêdan li gorî pîvanên rêzimana kurmancî qertafên ku bi hevalnavan re tî nivîsandin di cî de neyên bikaranîn carna bi qertafa nêr 'ê', ya mî 'a' û ya pijimar 'ên' ve tî tevlihevkin herwiha bi gihaneka 'û' ve jî tî tevlihevkin. Em bi mînakan vî diyar bikin.

Mala me **ye** mezin.=Maleke me heye, ew mezin e.

Mala me **ya** mezin.=Maline me hene, ez behsa ya mezin dikim.

Dîsa ji bo ku em gihaneka 'û' bi kar bînin em hevalnaveke din jî li raveka jorê zêde kin û bi qertafên din re bidin ber hev.

Mala me **ye** mezin **e** kevin.

Mala me **ye** mezin **a** kevin.

Mala me **ye** mezin **û** kevin.

Gundê me **yî** biçûk **î** şîrîn.

Gundê me **yî** biçûk **ê** şîrîn.

Gundê me **yî** biçûk **û** şîrîn.

Hespên me **ne** beza **ne** rewan.

Hespên me **ne** beza **yên** rewan.

Hespên me **ne** beza **û** rewan.

Wekî ku ji mînakên jî diyar dibe raveka pêşîn, ji ber ku “mal” bêjeyeke mê ye, qertafa ‘e’yê digre û tê vê maneyê: “Maleke me tenê heye ew jî hem mezin hem jî kevn e.” Raveka duwem maneya wê ev e: “Hin malên me ne mezin hene ku yek ji wan kevn e û em behsa wê dikin.”

Raveka sêyem jî maneya wê: “Maleke me ye mezin heye ew kevn e jî.

Wekî ji mînakên bi gihaneka ‘û’ ve hatine çêkirin dixuyê ku; gihaneka ‘û’ ji aliyê wateyê ve dişibe qertafên bûne mijara xebata me lê gihaneka ‘û’ ji ber ku mêjer û zayendê diyar nake ji van qertafan cuda dibe. Herwiha eger bêjeyên li pey hev rêz dibin ji heman cinsî bin ne hewce ye mirov gihaneka ‘û’ yê têxe navbera wan.

Em vê mentiqê di raveka bi bêjeya “gund” re hatiye çêkirin de jî dibînin. Qertafên bi vê bêjeyê re ji ber ku “gund” bêjeyeke nêr e, diguherin û dibin ‘î’. Dîsa raveka ku bi bêjeya ‘hesp’ ve hatiye çêkirin de qertafa ‘ne’ tê bikaranîn ku wateya ‘tenêbûn’ a komê dide, yanî; ‘hemî hespê me beza û rewan in’. Em çend mînakên din jî lê zêde kin:

Birayê min **î** biçûk **î** nehs.

Xwîşka min **e** biçûk **e** delal **e** xweşik.

Kurên me, kur **ne** jêhatî **ne** mêrxas in.

Wî navê xwe yî rind li kurê hevalekî xwe kiribû.

Wan paşnavê xwe ne nexweş guhertin.

Wê diya xwe ye pîr biribû parkê.

### **Piştî raveka hevalnavî**

Gava ev qertaf tîn piştî raveka hevalnavî dîsa li gorî mêjer û zayenda bêjeya pêşîn teşe digrin û dikevin navbera hevalnavan û wan yekpare nisbetî navê dikin. Hin mînak:

Esmanê çik î sayî.

Bayê kur î sar.

Ava sar e zelal e xweş.

Miya sor e kel e kurr e qor.

Mehên sar ne dirêj ên zivistanê.

Çavên gir ne zer, dêmên sor ne glover, eniya fireh e çîl...

Ji mînakên jor jî diyar dibe ku di raveka hevalnavî de ev qertaf dikevin nava hevalnavan û nav çiqas hevalnavan bikaribe bigre ev qertaf bi wan re tê bikaranîn û wan dikin wesfê navî. Dîsa ev qertaf dikevin navbera hevalnavan û wan dikin hevalnavên hevedudanî. Mînak:

Kevn e kola

Vik e vala

Kil î kor

Xil î xar

Tu yî tune

Rep î rast

Reş e belek=reşbelek

Şîn î boz=şînboz

Çik î sayî=çiksayî

Piştî van mînak û jêderan divê em vê jî bêjin ku ji bilî xebatên Celadet Bedirxan di kitêbên rêzimana kurmançî de em rastî bikaranîna ku em behsê dikin nehatine. Tenê Samî Tan di berhema xwe ye Rêzimana Kurmançî de di binbeşa Hevalnavên Çawaniyê de van qertafan wekî bikaranîneke cuda ya qertafên hevalnavan bi nav dike, qertafa ‘î’ wekî ya nêrtiyê dinavîne, qertafa ‘e’ wekî ya mêtîyê lê li şûna qertafa ‘a’ yê bi kar tîne, behsa qertafa pirjimariyê nake û di mînakên xwe de jî qertafên diyariyê bi kar tîne. (2011, r.166) Dîsa di heman berhema nivîskar de li şûna qertafên ku em qala wan dikin, qertafên diyarkirinê di binbeşa ‘Raveka Zincirîn’ de wiha derbas dibe:

“Dema raveka tiştêkî bi alîkariya çend tiştan bibe, ravekariya zincirî derdikeve holê. Tiştên ku tiştêkî din rave dikin, bi alîkariya gîhaneka ‘û’yê digihêjin hev.

Mînak:

Hevala çavşîn û porzer

Dayîka dilşewitî û keserkur” (2011, r.324)

Lê wekî ku me pêşde jî gotibû eger bêjeyên ku raveberê diwesfînin ji heman cinsî bin ne hewceye meriv gîhaneka ‘û’ bi kar bîne. Li gorî me ravekên jorê rastin lê dikarin wiha jî bin:

Hevala çavşîn e porzer

Dayîka dilşewitî ye keserkur

Di dewamê de Samî Tan mînakên bi veqetandekê tên çêkirin dide û veqetandekên diyarkirinê bi kar tîne û van mînakan dide:

Hevalê bejinzirav ê çavşîn

Destbirakê Lezgîn ê bejinkurt ê bi kul û keser

Keça porzer a destbiçek a li ser lat û zinaran

Dayîka biçefî ya li pêş

Fermandarê çavsor ê xwînxwar ê zordest

Deriyê malê yê mezin ê neqîşandî (2011, r.325)

Wekî ji mînakên Tan jî diyar dibe ku wî veqetandekên diyarkirinê bi kar aniyê û bi vî awayî rast in lê em nizanin ka raveber bi qesta ‘yek tenê’ de hatiye bikaranîn an na. Lewre wekî mînak; eger di raveka ‘Hevalê bejinzirav ê çavşîn’ de mebest ji heval ‘kesek tenê’ be û ‘diyar’ be, divê ravek wiha be: ‘Hevalê bejinzirav î çavşîn. Herwiha di mînaka “Deriyê malê yê mezin ê neqîşandî” de jî eger deriyê malê ji yekî zêdetir bin ravek rast e lê eger derî yek tenê be wê demê divê em wiha bêjin: “Deriyê malê yî mezin î neqîşandî”. Dîsa ji bo mînakên din jî heman tiştî em dikarin bêjin.

## Encam

Di kurmancî de ravek mijareke bingehîn e û bi xêra hin qertafan mêjer, zayend, diyarî û nediyariya hêmanên ravekê diyar dibe. Ji bilî veqetandekên ku raveker û raveberan diyar dikin veqetandekên ku ravekê bi hevalnavan ve girêdidin hene ku em wan; gava raveber yekjimar û tenê be ji bo navên nêr qertafa 'î', ji bo navên yekjimar û tenê yên mê qertafa 'e' û ji bo navên pirjimar û tenê qertafa 'ne' yê bi kar tînin. Ev qertaf bi ravekên navî, ravekên cînavî û ravekên hevalnavî re, dema em van ravekan bi hevalnavan diwesfînin, beriya hevalnavan tînin bikaranînin. Ev qertafên ku hin caran bi qertafên diyariyê yên raveberê diyar dikin ve tînin tevlihevkerin, bi taybetiyê xwe ve ji van qertafên diyariyê vediqetin ku ew jî tenêbûn/yekbûn û nebûna raveberê ye.

Me di vê nivîsa xwe de cî da mijareke rêzimana kurmancî ku ji bilî xebatên Celadet Bedir Xan, em rastî xebateke ku bi van qertafên; 'î', 'e' û 'ne' yên raveberê ji aliyê, mêjer û zayendê ve diwesfînin nehatin. Celadet Bedir Xan van qertafan wekî 'Veqetandekên Nebinavkirî yên tînin ber rengdêran', 'paşgirên veqetandekên nebinavkirî', 'cînavên pêleya hevalnavan zêde dikin' bi nav dike.

Em van qertafên ku bûne mijara xebata me dikarin wekî 'veqetandekên hevalnavî', 'qertafên yeknimûneyîya raveberê' yan jî wekî 'cînavên aîdî raveberê' bi nav bikin. Lewra ev qertaf hem hevalnavan dikin wesfê navê/raveberê û hem jî nav eger tenê be tînin bikaranînin û li gorî tenêbûna wî navî teşe digrin. Yanî girêdayî tenêbûn/yeknimûnebûna wî navî ne.

## ÇAVKANÎ

1. Baran, Bahoz.(2012). *Rêzimana Kurmancî*. Stenbol: Belkî.
2. Bedirxan, Celadet.(2010). *Bingehên Gramera Kurdmancî*. Stenbol: Avesta.
3. Bedirxan, C. û Lescot, R.(2000). *Kürtçe Dilbilgisi(Kurmanci)*,(Çapa:5). Stenbol: Doz.
4. Kovara Nûbihar, Hejmar:120 rp: 61-64.
5. Semend, S.(2006). *Siyabend û Xecê*. Stenbol: Hîvda.
6. *Memê Alan*, Berhevkar: Lescot, R.(1997). Stenbol: Avesta,.
7. Tan, S.(2011). *Rêzimana Kurmancî*, (Çapa Berfirehkirî). Stenbol: Enstîtuya Kurdî.

8. Yıldırım, K.(2012). *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi(Kurmancî Lehçesi)*, çapa duwem. Stenbol: Mardin Artuklu Üniversitesi.

[1] Perwerdekar, Xwendevanê Lîsansa Bilind a Bitez a Ziman û Edebiyata Kurdî ya Zanîngeha Bîngolê

[2] Lê li gorî me rastiya vê hevokê, divê wiha be: “(ev) Avên çemên zozan(an) **ne** sar in”.

[3] Di vê hevokê de xuyaye ku ji ber qertafa ‘ne’, ‘n’ya cînava ‘min’ ketiye û dîsa ‘d’ya ku maneya pirjimariyê dide peyva ‘bira’jî li şûna ‘yên’/’n’ de hatiye bikaranîn. Yanî xuyaye hevok wiha ye: “Birên(Birayên) min **ne** helal û bi qîmet.”

[4] Di vê hevokê de, dîsa di rûpela 23’yan de heman qertaf wekî ‘nê’ hatiye bikaranîn ku bi ya me ew di eslê xwe de ‘ne’ ye û guheriye. Jixwe gelek çîrok û klam, li deverên cuda yên Kurdistanê, di devê dengbêj û pîrbêjan de guhertin dîtine.

[5] Di raveka navî de heke raveker nêr be yan paşgira ‘î’ digre yan jî nav ditewe. Lê di hin navan de ev pîvan nayê bikaranîn. Me yê yan bigota ‘Hesen’ yan bigota ‘Hesenî’ yan jî me yê bigota Hesê(n). Di vê derheqê de nîqaş hene. Ji bo zêdetir agahî binêre: (Yıldırım, 2012, r.57-58), (Baran, 2012, r.78)

## Raboriya bikaranîna alfabeya latînî

### û xebatên sereke yên li ser zimanê kurdî

*Seîd Veroj*

Dixwazim li ser dewra sereke ya çapkirina eserên kurdî, xebatên li ser nivîsandina kurdî û alfabeyê bikim. Babetê girîng a weşanên salên destêka 1900î, nivîs û gengeşeyên li ser xebata ziman û eserên kurdî ye. Di vê çarçoveyê de; ji nû ve çapkirina berhemên klasîkên kurdî, nivîs û nûçeyên di derheqê xebatên rêxistinên kulturî û siyasî yên kurdan de, sansora li ser zimanê kurdî, meseleya şêwe û diyalektan, hewldanên standartkirina zimanê kurdî û çêkirina alfabeyê nû, babetên tewr girîng ên nivîs û nivîskarên weşanên wê demê bûn.

Feqet îro dema ku behsa bikaranîna alfabeya latînî ji bo nivîsîna zimanê kurdî bête kirin, pêşiyê Celadet Bedirxan têtê bîra me. Bêguman di pêkanîna şiklê dawî û tetbîqkirina vê alfabeyê de para Celadet Bedirxan û ekola *Hawarê* gelek zêde ye. Lêbelê di kudandina vê rê de keda gelek mirovên beriya wî jî hene, divê ew jî bêne bi bîrxistin û ev encam, wek pêvajoyeke gehiştî û kolektîf bête dîtin. Lewra li ser vî babetê nêrînên cihê cihê hene.

Qedrî Cemîl Paşa, di bîranînên xwe de li ser rabirdûya xebata bikaranîna alfabeya latînî û gengeşeyên li ser vî babetê dibêje:

“Pêşniyara qebûlkirina tîpên (herfên) latînî, cara yekemîn di sala 1913yê de ji layê memurê posteya Stenbolê Fewzî Beg ve hatiye kirin ku bi xwe jî endamê Komela Hêvî bû. Her weha Dr. Abdullah Cevdet jî di nivîsên xwe yên nav rûpelên kovara *Rojî Kurd* de ji bo nivîsandina zimanê kurdî pêşniyara bikaranîna alfabeya latînî dike û dibêje tîpên erebî nikarin bi temamî zimanê kurdî îfade bikin.” [1]



Dr. Abdullah Cevdet di hejmara yekem a *Rojî Kurd* de li ser girîngî û pêdiviya perwerdeyî û guhartina alfabeyê weha dibêje:

“Divê rêjeya xwendin û nivîsandina kurdan bi kêmtirîn bigîje 40%. Ya din, divê zarokek 7-8 salî, tewr zêde di nav mehek de fêrê xwendin û nivîsandinê bibe û karibe rast bixwîne. Ji bo pêkanîna vê jî, divê dev ji herfên kevnare bête berdan û yên nû bêne qebûlkin.” [2]

Dema em bala xwe bidin nav rûpelên *Rojî Kurd*, diyar dibe ku li ser alfabeyê gelek gengeş çêbûne û pêşniyar hatine kirin. Digel pêşniyarên li jorê, nivîskarê *Rojî Kurd* Mesudê Silêmaniyeyî jî îşaret û herekeyên alfabeya erebî wek bargiraniyeke dijwar dibîne û pêdiviya nûkirina alfabeyê tîne ziman û dibêje:

“Ji bo hînkirina 33 herfan, ji dusedî zêdetir şekil ji xwendevanan re tîne nîşandan. Ev, xwendevan û mamosteyan gelek diwestîne û pêdiviya performansek gelek zêde ji wê re divê. Bi giştî sebebê nezaniyê jî ev e.

Çareseriyê wê yekê jî; divê di destpêka perwerdeyî de ji bo her herfekê tenê şiklek bête destnîşankirin û dest ji yên din bête berdan.” [3]

Wê demê komeleyek bi navê Îlîmlerîn Genelleştîrîlmesî ve Harflerîn Dûzenlenmesî Cemiyetî [Cemiyeta Belavkirina Îlim û Serrastkirina Tîpan] hebû û ew jî tevî van gengeşeyan dibe û ji bo rêvebirên kovara *Rojî Kurd* pêşniyarek wisa dikan:

“Sebebê tewr girîng ê paşvemayîna me, kêmasiya herfên (tîpên) me ye. Heta roja îro li ser vê babetê gelek dîtin hatine pêşkêşkirin; beşekî gotine bila herfên latînî, ermenî bêne qebûlkin û beşekî din jî wê pêşniyarê wek xeteriyek dîtine û gotine bila herfên erebî yên ku ji aliyê alema îslamî ve tîne bikaranîn bêne sererastkirin û qebûlkin...”

Bi dîtina me, zimanê kurdî, bi herfên dervayê alfabeya erebî bête nivîsandin, dê ziman bête xerakin. Ji ber vê yekê, ji bo zimanê milletên misilman qebûlkirina alfabeyên biyanî, ne munasib e; xeternak e. Em nabêjin ne mimkun e, em dibêjin ne munasib e. Ger ji wê xeternakiyê nebe, dikare mimkun be. Ji ber vê yekê, divê herfên erebî li gorî zimanê hemû milletên misilman ji nû ve bêne sererastkirin.” [4]

Li ser meseleya alfabeyê, M. S. Azîzî jî di hejmarê duyemîn a *Rojî Kurd* de, pêşniyarên Cemiyeta Belavkirina Îlim û Serrastkirina Tîpan erênî dibîne û dibêje:

“Meseleya lêkolandin û amadekirina alfabeyê hêsan û nû ya ji bo kurdî, berdewamî serê min meşxul kiriye; ez wisa bawer dikim ku pêşniyara Cemiyeta Belavkirina Îlim û Sererastkirina Tîpan a li ser alfabeyê, ji her kesî bêtir bi kêrî me kurdan tê.” [5]

Di heman hejmarê *Rojî Kurd* de Modanî Xelîl ku bi kurteya “M. X.” nivisindiye dibêje: “Elîfbayek li ser tarzekî nû lazim e.” [6]

Ji *Rojî Kurd* şûn ve di nav kovar û rojnameyên wekî *Jîn, Kurdistan û Serbestiyê* de jî li ser alfabe, zimanê kurdî, sansura li ser nivîsandina kurdî, perwerdeyî û çapkirina berhemên klasîk ên kurdî nixandî û pêşniyarên ciyawaz hatine kirin.

Sansur, wê demê jî babetê girîng a çapemeniyê bû û bi taybetî nivîsên kurdî jî hatine sansurkirin. Dema em bala xwe bidin hin hejmar û rûpelên weşanên wê demê, diyar dibe ku valayî di nav de heye û ew valayî ji ber sansur û qedexeya li ser zimanê kurdî bû. Li ser meseleya sansurê, di hejmarê 29ê Nîsan 1919 ya *Serbestiyê* de weha hatiye gotin: “Ji ber ku di nava îdareya matbûatê de mutercîmekî şarezayê zimanê milletê kurd nîne, gelek astengî li pêşiya neşriyata kurdî çê dibe. Ji ber vê yekê, roja bihûrî, helbesteke kurdî ji nav rûpelên rojnameya me hatiye sansurkirin.” [7]

Ji ber vê sansurê, di nav rûpelên *Serbestî* de bi navê “*Neşriyata Kurd*” daxuyaniyek hatiye belavkirin û dibêje:

“Ji aliyê îdareya sansurê ve helbesteke kurdî ji nav rojnameya me hatiye derxistin. Helbest bi tevî tercumeya xwe hatibû nivîsandin û rakirina wê ne li gorî teamulên heyî bû. Gelek rojname 20-30 rêzik û qitayên bi zimanê fransîzî û farisî çap dikin û rastî tu astengiyekî nayin, em hêvî dikin ev qaîde ji bo neşriyata me jî bêne tetbîqkirin.” [8]

Digel van rexne û balkêşiyên, di nav rûpelên weşanên kurdan de gengeşe û nivîsên li ser vê babetê têne domandin. Naveroka paneleke ÇTKê bi sernivîsa “*Di heqê zimanê kurdan de*” weha hatiye ragehandin:

“Ji aliyê xortê çeleng ê kurd Abdurehman Rehmî yê Hekarî ve, do li navenda Cemiyeta Tealiya Kurdistanê li ser girîngiya ziman û pêşxistina qabîliyeta kurdî panelek muhîm hate sazkin.

Axaftvanî hinek berhemên şairên kurd bi dûr û dirêjî tetkîk kirin û li ser kultura neteweyî ya kurd, hin esasên balkêş dane diyarkirin.”[9]

Du roj piştî belavkirina vê nûçeyê, li Stenbolê di navenda CTKê de, komîsyonek taybet ji bo lêkolîn û çapkirina eserên alim û şairên kurd têtê damezirandin. Di nûçeyê de hatiye gotin ku “Hin zatên îlmiye û mûlkiyeyê hatine wezîfedarkirin ku di heqê eserên îlmî yê kurdî de xwedî malumat in. Vê komîsyonê, lêkolînên xwe yên li ser *Mem û Zîn* Mele Ehmedê Xanî temam kirine. Heşt formayên vê eserê hatine çapkirin û yên mayî jî di demeke kurt de têtê çapkirin. *Mem û Zîn*, şaheserekî edebiyata klasîk a kurd têtê qebûlkirin.”[10] *Mem û Zîn*, bi vê çapê, cara yekemîn dikeve nav lewheyên matbeayê.

Li ser xebatên standartkirina zimanê kurdî û hewldanên Cemiyeta Neşrê Mearîf ê Kurd [Komela Kurd a Belavkirina Zanîna], di hejmara 480ê ya *Serbestiyê* de, bi sernivîsa “*Tedvîna lîsanê kurdî*” [*Standartkirina zimanê kurdî*] nivîseke wisa hatiye belavkirin:

“Piştî îlankirina Meşrûtiyetê, ji bo îsleh û standartkirina kurdî, Komela Kurd a Belavkirina Zanîna û hin rêxistinên din hatibûn damezirandin. Van rêxistinan di dema destpêkirina Şerê Giştî de xebat û weşana xwe dabûn rawestandin. Ji dawîhatina Şerê Giştî şûn ve, van rêxistinan bi belavkirina kovara *Jînê*, dest bi berdewamkirina xebata berê kirine.

Komela navborî ji berê ve dixebite ku li ser esasê cihê nivîsandina herfan, gramereke zimanê kurdî binivîsîne û bide çapkirin. Alfabe hatiye amadekirin û hetanî çend rojên din dê bête çapkirin. Alfabeya ku nûha têtê çapkirin, ji alfabeya berê bêtir mifedar û mukemeltir e. Em mûteşebbîs û nivîskarên wê pîroz dikin.”[11]

Kamuran Bedîrxan jî di nivîsa xwe de behsa girîngiya xebata vê komelê û karê standartkirina zimanê kurdî dike û dibêje: “Ew milletên ku zimanê xwe reforme bikin, qaîdeyên gramera xwe sererast bikin, herfên sade û sivik çêbikin û pê binivîsînin, asteng li ber îstiqbal û pêkhatina hêviyên wan

namînin.”[12] Nivîskar di çarçoveya vê dîtinê de, bala komîsyona navborî dikişîne li ser van xûsusetan û dibêje:

“Xusûsiyetên tewr girîng ên ku komîsyon dîqet bike ev in: 1- Alfabeya ku ji bo xwendin û nivîsandina kurdî bête duristkirin, divê gundî jî karibin di demeke kurt de bi wê alfabeyê hînê xwendin û nivîsandinê bibin. 2- Meseleyek tewr dijwar jî, şikil û rêbaza alfabeyê ye; gelo ev alfabe dê ji milê çep ber bi milê rast ve yan ji milê rast ber bi milê çep ve bête nivîsandin. Dema em bala xwe bidin girîngiya vê babetê, divê em bi hîssa faaliyeteke azamî û têgehîştinek nûjeniyê tevbigerin.”[13]

Li ser vê babetê gengeşeyek balkêş jî, meha Tebaxa sala 1919yê di navbera Noel û şanda wî ya kurd de çêdibe. Di rêwîtiya Meletiyê de, li ser zimanê kurdî du xusûsiyetên balkêş dibin meseleya rojeva gengeşiya Noel û endamên heyeta wî ya kurd; cûdatiya şêwe-diyalektên kurdî û alfabeya nivîsandina kurdî. Ji ber ku bi rêya Entab û Meraşê re diçûn, dema heyet digîje qeza Pazarciq a Meraşê, tiştêkî girîng bala Noel dikişîne, dibîne ku axaftvanên şêwe û diyalektên van herêman û yên herêmên din ên Kurdistanê bi hêsanî hev têdigîjin. Lewra endamên heyeta wî yek ji Botan, yek ji Hekarî û yê din jî kurdê Diyarbekirê bû, di têkilî û hev têgihîştina wan û yê van herêman de tu problemk tune bû. Li ser vê yekê Noel dibêje:

“Bi pirranî dihat gotin ku zimanê kurdî zimanek têkel e, li gorî herêman diguhere û hev têngîjin. Rast e, baba kurdî ya ku li başûrê rojavayê Kurdistanê tête axaftin, di navbera wê û kurmançî de ferq heye, lê ku em bêjin şêweyên cûda yên kurmançî di esasê de ji hev cûda ne, ev nerast e. Li nik min kurdên Botanî, Hekariyî û Diyarbekirî hene, ew di navbera xwe de û bi kurdên tewr bakurê Kurdistanê re bi rehetî hev têdigîjin. Di nav çend hefteyan de dikarin bi temamî wekî kurdên binekî yên li vê deverê biaxivin. Ferqa bingehîn a di navbera axaftina wan de, bikaranîna tîpên dengdêrin.”[14]

Xûsusetek din jî bikaranîna alfabê ye;

“Noel dibêje, min notên xwe yên li ser zargotinên herêmî yên kurdî bi alfabeya latînî dinivîsand û hevalên min ên kurd jî bi alfabeya erebî dinivîsandin. Bi tevî ku ez hîn baş bi kurdî hîn nebûbûm jî, di dema xwendinê de, min ji wan baştir dengên kurdî derdixist û xwendina min jî ji ya wan bêqisurtir bû. Wê demê min têgehîşt ku herfên erebî ji bo tîpên dengdêrin ên kurdî têr nakin û ne bes in. Piraniya

wan ciwanan bawer dikir ku tîpên latînî bêtir dikarin dengên kurdî derbixin û dixebitîn ev dîtinên hanê li Kurdistanê jî bêne qebûlkin. Lêbelê neslên beriya wan û ulema, ji ber sebebên dîni, li hemberê gorandinek weha ne.”[15]

Encam û gengeşeyên rêwîtiya serdana Meletiyê, di serê Celadet Bedirxan de fikra bikaranîna alfabeya latînî ya kurdî peyda dike. Celadet Bedirxan bi xwe jî li ser bihûriya peydabûna fikra alfabeya latînî ya kurdî dibêje:

“Ev elfabeya hanê ku îro em zimanê xwe pê dinivîsinin paşiya xebateke salinên dirêj e.

Di sala 1919an de me da bû çiyayên Meletiyê. Em ketibûn nav eşîra Reşîwan. Mêcer Noel jî digel me bû. Mêcer zarê nivro dizanî bû, dixebitî ko hîne zarê bakur bibe û ji xwe re her tişt dinivîsandin. Min jî hin medhelok, stran û çîrok berhev dikirin.

Carinan me çav li nivîsarên xwe digrandin, dixwendin û diedilandin. Min bala xwe dida Mêcer, bi bilêvkirineke biyanî, lê bi dişwarî destnivîsa xwe dixwend. Lê belê ez, heta ko min (û, ۆ) ji (o, ۆ) û (î, ێ) ji (ê, ێ) h. p. derdixistin diketim ber hezar dişwarî. Ma çima? Ji ber ko Mêcer bi herfên latînî, lê min bi herfên erebî dinivîsandin. Ser vê yekê, di cih de min qerara xwe da û ji xwe re bi herfên latînî elfabeyek lêkanî. Êdin min bikariya destnivîsa xwe paş hezar salî jî bê dişwarî û weke xwe bixwînim, ji ber ko her deng cihê cihê li ser kaxezê dihat sekinandin.”[16]

Piştî van nirixandin û gengeşeyên dûr û dirêj, cara pêşîn di sala 1928an de li Erîvanê yekemîn pirtûka kurdî ya bi alfabeya latînî hatiye çapkirin. “Elfabeya Kurdî ya bi tîpên latînî cara ewilî di sala 1928an de li Ermenîstanê ji teref nivîskarên kurd Erebe Şemo û Îsahak Maragulovê Asûrî ve hatiye çêkirin. Ji aliyê hikumeta Ermenîstanê û herweha hikumeta yekîtiya Sovyetê ve jî hatiye pejirandin.

Di sala 1929an de bi vê elfabeyê pirtûka perwerdekirina zimanê kurdî hat weşandin. Navê vê pirtûkê “*Xo xo hînbûna xwendina nivîsara kurmancî*” bû. Ev pirtûka hînkê li Erîvanê hat weşandin. Divê bê zanîn ku ev pirtûka kurdî, pirtûka bi tîpên latînî ya pêşîn e li cîhanê. Ev pirtûk, niha di pirtûkxaneya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê de ye.”[17]

Ev pêvajoyê bi van gengeşî û pêşniyaran digîje hetanî destpêka salên 1930an. “Di sala 1931ê de li Şamê di mala Elî Axayê Zilfo de civînek tête darxistin û Celadet Bedirxan, Hemzeyê Miksî, ji kurdên Şamê Musa Beg û Ekrem Cemîlpaşa wek lijneya amadekirina elîfbaya kurdî/latinî dihêne hilbijartin. Ligel vê yekê, ji layê hevalan de çend elîfba hatine derxistin.” [18]

Nûredîn Zaza sala 1931ê digel kekê xwe Dr. Nafîz ji Helebê diçin Şamê û li wê derê dibe temaşevan û guhdarvanê gengeşeyên li ser alfabeya latînî/kurd. Dibêje: “Celadet Bedirxan, elfabeya kurdî, bi tîpên latînî, pêk tanî û dil dikir ko bi van kovarekê derêxe. Ekrem Cemîl Paşa, hemzeyê Miksî û hinekên din tê de pir kêmanî didîtin û bi hişkî lê radibûn. Lê, rehmetî Celadet bi gelek zimanan dizanî, pir li Ewropa mabû, bi ser de jî zor zîrek, bi hiş û hûner bû, bala xwe dida rexne û gotinên xelkê û dixebitî ko şaşiyên xwe binase, elfabeya xwe li gora dengên zimên û ji şîwe û zaravayên têvel rêz û dûzanên bingehîn derêxe. Ew ji zû da li vî tiştî hûr dibû, lê li Şamê ev karê ha bûbû mijûlayiya wî ya hergavî. Di sala 1932an de, piştî ko elfabeya xwe danî û rêzimanek jî dirust kir” [19], dest bi derêxistina kovara *Hawarê* kir.

Ev gengeşiyên ku beriya bîst salan dest pê kiribû, di sala 1932yan de digîje radeyek bilind û dibe pêngavek nû. Bêguman ev radeya nû jî, encam û berhemê ew gotar û gengeşeyên beriya bîst salan bû.

Piştê ku alfabeya latînî di kovara *Hawarê* (1932-1943/ 57 hej.) de hate ceribandin û qebûl kirin, paşê kovarên wekî *Ronahî* (1942-1945), *Roja Nû* (1943-1946/ 73 hej.) û *Stêr* (1943-1945/ 3 hej.) jî bi vê alfabe hatin weşandin. Îro, ziman û diyalektên kurdî, pirranî bi vî alfabe têne nivîsandin, bi taybetî jî di nav kurdên bakur û rojavayê Kurdistanê û dîasporayê de tête bikaranîn.

[1] Qedrî Cemîl Paşa (Zinar Silopî), *Doza Kurdistan, Weşanên Bîr, Diyarbekir*, 2007, r. 138

[2] Abdullah Cevdet, *Bir Hitap [Xîtabetek], Rojî Kurd*, h: 1, 30ê Gulana 1913, *Weşanên War, Diyarbekir*, 2007, r. 16-17

[3] Suleymaniyeli Mesud, *Harflerimiz ve okuma kolaylığı, Rojî Kurd*, no: 1, 6 Heziran 1329 (1913), *Weşanên War, İstanbul*, 2002, r. 29

- [4] İlimlerin Genelleştirilmesi ve Harflerin Düzenlenmesi Cemiyeti, *Rojî Kurd mecmuası yüce müdürlüğüne, Rojî Kurd*, no: 2, Weşanên War, İstanbul, 2002, r. 56-57
- [5] M. S. Azîzî, *Harflerimiz ve okuma kolaylığı, Rojî Kurd*, no: 2, 6ê Temûza 1329 (1913), Weşanên War, İstanbul, 2002, r
- [6] M. X., *Ziman, Rojî Kurd*, no: 3, 6ê Temûza 1329 (1913), weşanên War, İstanbul, 2002, r. 88
- [7] *Serbestî, Kürd sansürü [Sansora kurdî]*, no: 480, 29 Nisan 1919
- [8] *Serbestî, Kürdçe yazılar [Nivîsên kurdî]*, no: 480, 29 Nisan 1919
- [9] *Serbestî, Kürd lisanı hakkında [Li ser zimanê kurdî]*, no: 477, 26ê Nîsana 1919
- [10] *Serbestî, Kürd eserleri tetkik komisyonu [Lijneya lêkolîna eserên kurdî]*, no: 479, 28 Nisan 191
- [11] *Serbestî, Kürd lisanının tedvini [Standartkirina zimanê kurdî]*, no: 480, 4 Mayıs 1919
- [12] Kamuran Bedirhan, *Kürdler ve Kurdistan: Kürd lisanı [Kurd û Kurdistan: Zimanê Kurdî]*, Serbestî, no: 486, 5ê Gulana 1919
- [13] J. b.. 5ê Gulana 1919
- [14] Edward William Charles Noel, *Kurdistan 1919*, Weşanên Avesta, İstanbul, 1999, r. 22-23
- [15] J. b., r. 23
- [16] Celadet Bedirxan, *Pêşgotinek, Hawar*, hejmar: 13, 14yê Çileyê-Berê 1932, Weşanên Nûdem, cild: 1, Stockholm, 1998, r. 263
- [17] <http://www.kovarabir.com/2015/07/mir-osmane-deriki-mir-celadet-ali-bedirxan-1893-1951/>, 21 Temmuz 2015

[18] Qedrî Cemîl Paşa (Zinar Silopî), *Doza Kurdistan*, Weşanên Bîr, Diyarbekir, 2007, r. 138

[19] Dr. Nûredîn Zaza, *Pêşgotin, Hawar (1934-1943)*, h.: 24-57, çapxanên: Mindik el- Mibkî, Teraqî, Şam



## DI SEDSALIYA NIVÎSKARIYA XELÎL XEYALÎ DE BEHSA ZIMANÊ KURDÎ Û RÊZIMANÊ

**Ayhan YILDIZ**

### Destpêk

Xelîl Xeyalî, yekî ji wan xîretkêşan e ku di serê sedsala bîstan de, di nav rewşenbîrên serdema dewleta osmanî de, li bajarê Stenbolê, ketiye nav rêxistinên mafparêz ên kurd û tevî nifşê wan entelektuelên malmezin ên kurd ku ji dil û can, di serê sedsala bîstan de doza bidestxistina mafên rewa yên neteweya xwe dikirin, ked û hed mizaxtiye. Heta em dikarin wî weke ronakbîrekî serdema dawî ya osmaniyan bihesibînin. Roj hatiye, ji bo ku kurdî bibe zimanê xwendin û nivîsandinê, pirtûka *Elîfbayê* amade kiriye; roj hatiye, ji bo ku li ser zimanê kurdî hestiyariya gel û giregirên gel çê bike, ji rojname û kovarên mîna *Kürd Teavün ve Terakkî [Rojnameya Kurd û Teawunê]*, *Hetawî Kurd*, *Rojî Kurd û Jîn* re gotar û rexnenivîs berepêşî raya giştî ya gelê kurd kirine û dîsan roj hatiye, ji bo ku zarokên kurd bi zimanê kurdî binivîsin û bixwînin, di bin mercên dijwar de, doza vekirina dibistanên kurdî kiriye. Heta ji me bê, em dê zor bidin xwe; da ku ji van aliyan ve em berê bal û dêhna xwe bidin ser keda Xelîl Xeyalî yê Modanî ku xemxurekî xêrxwaz ê kurdî ye û ka di kîjan komele û rêxistinên de cî girtiye û di kîjan kovar û rojnameyan de çî nivîsiye, fikra wî çî ye...

### Xelîl Xeyalî kî ye?

“Xelîl Xeyalî Efendî, kurê Yusûf Axayê rehmêtî ye ku ew ji eşîreta navçeya Mûtîkî ya nav sînorên bajarê Bilîsê ye. Sala malî ya 1282 (m.1865) li gundê Zendera navçeya Mûtîkî welidiye. Li Bilîs Mahalle Mektebî xwendiyê; dersên serf, nehîw, bedî’ û beyanê, li medreseyan tehsîl kiriye. Nivîskar, dizane bi erebî, farisî bipeyive û bi erebî û farisî dinivîse. Di 16 saliya xwe de li Bilîsê di karmendiya Midûriya

Maliyeyê de xebitiye; 30yê Çileyê Pêşî yê sala 1911an, bûye karmendê muhasebeya Halkalı Ziraat Mektebi.”[\[2\]](#)

### **Xemên Xelîl Xeyalî yên Li Ser Zimanê Kurdî**

Gava ku salên 1900î, telebeyên gewrerman ên kurd, li payitexta Osmanî, li ser pêşdebirina doza mafê millî û azadiya welatê xwe dikevin nav lêgerînê û ji bo vê xizmetê diqilqilin û dixwazin ku komeleyekê ji bo navenda xebatên xwe damezirînin, Xelîl Xeyalî jî, di rêza pêşî de xwe dide bin barê kar û xebatên wan.

### **Nivîsên Xelîl Xeyalî di “Hetawî Kurd” de**

Xelîl Xeyalî, di jimareyên 1, 2, 3yan ên rojnameya *Hetawî Kurd* de, bi navê M. X. nivîsên xwe nivîsiye. Di jimara 10an de, navê “Bavê Naco” daniye dawiya nivîsa xwe. Di jimarên dî de bi kîjan navî çî nivîsiye, bi destê me neket.

Navê nivîsên wî yên di jimara 1ê de “*Ji Mezinên Kurdan Ra Ye*” û “*Şaîrê Baban û Soran*” e, di jimara 2yan de bi navê “*Fe’tebîrû Ya Ulîl Elbab*” gotareke wî heye û navê xwe jî li dawiya wê, “Bavê Naco” daniye. Di heman jimarê de nivîsa wî ya “*Derdê Kurda*” heye û navê xwe, weke “M. X.” daniye. Îca di jimara 3yan de, navê nivîsa wî, “*Ji Keşîdeya Hacî Rehmet Têne Zanîn Ku..*” ye. Di jimara 10an de bi sernavê “*Tahirê Mewlewî*” nivîseke wî heye.

Di nivîsa xwe ya jimara 1ê de, piştî ku gelek gilî û gazin ji şêx, axa û melayên kurdan dike, dora qisedanê tîne ser vê mijarê:

“Sê sed sal berê, -Rehmeta Xwedê lê be- Şeref Xan, ji bo kurdan tarîxek nivîsiye, ew tarîx tercumeê bi zimanê îngîlîz û alman û fransîz bûye, hêja bi zimanê kurdan tercume nebûye.”[\[3\]](#)

Di pey vê gazinê de îca li ba xwe giliyê gel dike:

“Bi zimanê xû naxwînin, pêş bi zimanê xû nakin, zimanê me di çavê me da bê fûd e.”[\[4\]](#)

Agahiyeke dîrokî jî wiha dide:

“Zimanê me, serf û nehwa me, xelk -elman- tercume kirine, hêja em ji bona xû di şubhê de ne.”<sup>[5]</sup>

Di pey vê rexneyê de, gelê kurd û ermen ji hêla zimên ve dide ber hev:

“Li koşêk Kurdistanê da nîhayet çar heb fileh hebe, ji bona wî, ji Kurdistanê ra Filistan dibêjin. Çavê wan lê ye ku Kurdistanê ji destê me bigrin, navê me ji dunê wenda bikin. Mêrika ji bona wî, nasekinin, dixebitin, yekdil, yekziman û yekxîret in.

Em van dibînin û îbret nagrin, çima em mekteban venakin, çima em wek wan naxebitin, bi hev nakevin, yekdil û yekdest nabin? Her kî bixebite û mirov bi guherîna ew serdest dibe. Ne Xudê teala gotiye: *Leyse lîl însanî îlla ma se'a.* [Ji mirovan re ji xeynê xebata wan, tiştêkî dî tune ye.]<sup>[6]</sup>

### Elîfbaya Xelîl Xeyalî

Di dîroka zimanê kurdî de, kesê ku cara ewil bi tîpên alfabeya erebî, ji bo kurdî elîfba amade kiriye, ew e.

“Ji xeynê zaravayê zazakî û kurmançî yê kurdî, bi tirkî, farisî, erebî û frensî zanibûye. Çawa ku wî alfabeya herî ewil a zimanê kurdî ku tê zanîn, Elîfbêya Kurmançî çê kiriye. Tê zanîn ku wî Nehwa Kurdî û Qamûsa wî jî amade kiriye. Tevî van, ew nirxên wî yên kurdî ku di weşanên nasnavkurdî de derketine, di nav mînakên ewil ên nivîsa peşanî ya zaravayê kurmançî de tîpên hesabandin. Ew, yek ji wan kesên pêşî ye ku ji tirkî wergera kurdî kiriye.”<sup>[7]</sup>

Li ser berga berhemê wiha hatiye nivîsandin:

“Elîfbayê Kurmançî, Muherrîr Xelîl Xeyalî, Mûtkî, Tabî': Kurdîzade Ehmed Ramîz, sal 1325 (m. 1909)”

Di dawiya Elîfbayê de jî wiha hatiye nivîsandin:

“Rica: Bihayê vê ji bo tebi'kirina kutûbê kurmançan e, li pey vê qiraet û serf û nehwa zimanê kurmançî jî dê tebi' bibe; feqet em muhtacî arîkirinê ne. Bê arîkirin tiştêk nabe. Hêviya me, xeyret û ciwanmêriya kurmançan e. Meqseda me ji zarokê kurmançan ra nîşandayîna ilm û hunerê ye. Ketebehu Mûsa Ezmî El Kurdî, temmet, 1325”<sup>[8]</sup>

### Nivîsên Xelîl Xeyalî Di “Kurd Teawun we Tereqqî Xezetesî” De

Gava ku kurdên ronakbîr ên serdema dawî ya Osmanîyan bi navê “Kurd Teawun we Tereqqî Cemiyetî” komeleyekê ava dikin û bi vî navî kovarekê diweşînin, Xelîl Xeyalî jî, dibe yekî ji wan kesan

ku bi nivîsên xwe, reng û rûyekî xweş dide kovarê. Di hejmara wê ya 8an de, behsa zimanê kurdî, wiha dike:

“Şerefa kurmancî muhefeze bikin.”<sup>[9]</sup>

### **Rojî Kurd û Zimanparêziya Xoce Xelîl Xeyalî**

Gava ku rewşenbîrên asofireh ên malmezinên welêt, bi navê “**Cemiyeta Hêvî**” komeleyekê ava dikin, Xelîl Xeyalî jî, dibe yekî ji xebatkaran. Cemiyeta Hêvî, biryar dide ku bi navê **Rojî Kurd**, kovarekê derxe. Xelîl Xeyalî jî, bi nivîsên xwe yê nûtîparêz, şewq û ronahiya kovarê zêde dike. Gelek balkêş e, ev kovar, digel ku bi turkiya osmanî, bi soranî û kurdiya kurmancî derdikeve, Xelîl Xeyalî, temamê nivîsên xwe, bi kurdiya kurmancî nivîsiye. Digel ku -li gor agahiyên devkî- Xelîl Xeyalî kurdekî dimilî yê herêma Hewêlê ye, gelek zêde ciyê mereqê ye ku çima wî qet bi kurdiya dimilkî nenivîsiye.

Em di kovara komeleyê **-Rojî Kurd-** de rastî nivîsa ewil a Xelîl Xeyalî tînin ku wî bi xwe navê xwe, *Modanî X.* nivîsiye. Navê wê nivîsê, “Ziman û Nezaniya Kurdan” e. Peyva ziman, gelek balkêş e. Di vê nivîsê de, em dibînin ku Xelîl Xeyalî, serê ewil, ji ber ku melayên me di medreseyan de, gava tiştêkî dinivîsin, bêtir bi zimanê erebî, farisî yan jî bi tirkî dinivîsin, wan rexne dike. Ev rexnegirtina wî ya li çînên cûr bi cûr ên gel, helbet bi tena serê xwe bûyereke mezin e û li gor şert û mercên wê hingê, ne karekî piçûk e. Ev helwesteke xîretkêş a welatperwerî û neteweperwerîya wî ye. Di paragrafa heman nivîsê de, kula dilê xwe dide der û yekser, hîna wê hingê, bala xwendevanan dikşîne ser “perwerdehiya bi zimanê maderî”:

“Çira ku îro di dunyayê de hewqa millet û qewm hene ku em yekî wan qenc nas nakin, hed û hesabê wî tune, bi zimanê xwe dixwînin û dinivîsin, kitêban çê dikin û mekteb û [di] medreseyan xwe da talimî zarokê di xwe dikin. Yek ji wan ranebûye negotiye ku zimanê me, xwendin û nivîsandina wî zehmet e. Ez dê bê şermî zimanê miletek qebûl bikim.”<sup>[10]</sup>

Xelîl Xeyalî, di pey van nêrînan de, berê gotinê aniye ser hedîseke şerîf ku tehsîla ilim li ser hemû muslîmên mêr û pîrek ferz kiriye. Bi ser de jî, nezaniyê, weke belayekê dîtiye û di nav alemê de, şertekî hebûna miletan, bi wê yekê ve girê daye ku ji nezaniyê xelas bibin. Di vê hêlê de, ji ber ku berhemên xwe yê li ser doza Kurdan nivîsiye, pesnê Şêx Ubeydullahê Nehrî û Şêx Ehmed Kakeî û Şêx Firsafî daye.<sup>[11]</sup>

Di heman hejmara heman kovarê de, nivîseke Xoce Xelîl Xeyalî ya bi navê “Ji Rojnaweyê Sebîlurreşad, Vekirî Bûye Hedîsa Şerîf” heye ku helbesteke Mehmet Akîf Ersoy, ji zimanê tirkî wergerandiye kurmançî. Ev wergera wî gelek girîng e, ji ber ku ji xebatên “serê pêşî” yên kurdî ye.

Nivîseke qedirgiran a X. Modanî jî, di hejmara 3yan de derçûye. Navê wê, “Ziman” e. Di vê nivîsê de, piştî ku behsa girîngiya ziman a ji bo mirovan dike, îca dora rexneyê tîne ser temamê gel ku çima wan bi kurdî pirtûk nenivîsîne, mekteb û medreseyan bi kurdî venekirine:

“Îro di rûyê erdê de, nêzîkî şeş mîlyon kurd heye û hemû bi aqil in, bi çav in, li ba mileta xwe, xasime ji bo misilmaniya xwe, çend kitêb nevişandine, çend mekteb û medrese vekirine?..” [12]

Di pey van gilî gazinan de, Xoce Xelîl ketiye coş û peroşê û dest bi duayê kiriye; peyre van daxwazên dîrokî ku li gor sed sal berî niha, têra xwe modern in, diyar dike:

“1. Ji bo xwendin û nivîsandinê, hîref

2. Ser terzeke nû elîfbayek

3. Ji bo zanîna temamê zimanê kurdîtiyê qamûsek

4. Îlmîhalek

5. Tarîxê bav û kalê kurdan û ‘an’aneyê wan

6. Welatê kurdan û adet û teb’ê wan û mîqdar û navê eşîran

7. Kitêba hîsabê

8. Ji bo zimanê kurdan serf û nehwek

9. Tercumeya hal a mezinê di kurdan

10. Edebiyata kurdan û navê şaîrê wan, ji bo çêkirina van tiştan, çiqas kitêbên kurdî hene, lazim e wan bişînin. Ji dengbêjan lawjek û çîrok û qewlê kurdan, pirs bikin û binivîsin û rê kin.” [13]

Heke em îlan bikin ku di dîroka edeba kurdî de, kesê ku cara ewil behsa van kar û barên mezin ên li ser xebatên ilmê ziman û edebiyata kurdî dike, Xelîl Xeyalî ye, dibe ku angaşteke rast be. Em dikarin bi dilekî rehet bi vê nivîsa mamoste serbilind bibin ku, cara ewil, wî bi xwe di vê nivîsa xwe de behsa pêwistiya xebatên bi vî rengî kiriye. Helbet em xebatên ku di rojnameya kurdî ya ewil *Kurdistan* (22 Nîsan 1898) de behsa girîngiya folklorê kurdî hatiye kirin, ji nedîtî ve nayên.

Em ji van tesbîtên jor hîn dibin ku hîna wê hingê, hay û baya Mamoste Xelîl Xeyalî, ji van şaxên zanistê hebûye:

1. Zanista ziman

2. Zanista gel, ango folklor

### 3. Antolojî

Îca gava em berê xwe didin nivîseke wî ya dî ku di heman hejmarê de heye, em dibînin ku ji Mem û Zîna Ehmedê Xanî, beşek helbest girtiye û behsa Elî Herîrî û Melayê Cizîrî dike:

“Eva mîsala Eliyê Herîrî ye neh sed û sî sal berê hatiye; bi zimanê kurdî beyt gotiye.”[\[14\]](#)

#### **Xoce Xelîl, Di Komeleya Pêşketina Kurdistanê de**

“Sazkarên komelê Xelîl Xiyalî, berpirsyarê "Jîn"ê Hemzeye Muksî û Bedîuzzeman Mela Seîdê Kurdî bû ne. Paşê, piraniya xwenda û zanayên kurdan ên li Stanbolê bûne endamên wê; bi wî awayî komele di demeka kurt da xurt bûye.”[\[15\]](#)

#### **Di Kovara “Jîn” de Nivîsên Xoce Xelîl**

“Kovara "Jîn" di payiza sala 1918'an da li Stanbolê dest bi derketinê kirîye. Wisa tê zanîn ku organa neresmî ya *Komela Pêşketina Kurdistanê* bûye. *Jîn* 25 jimare hatîye weşandin. Tarîxa jimareya pêşîn 7/11/1918 ye.”[\[16\]](#)

Digel vê agahiyê, jimarên *Jînê*, di pey vê tarîxê de dîsan derketine. Weke weşaneke Kurd Teşkilat-ı İçtimaiye Cemiyeti, hejmarên wê yên 33 ve 36an, di destê me de hene.

“Kovara *Jîn*, bi wê bawerîyê û bi wê biryarê, jîyana xwe nêzîkî salekî domandiye. Jimareya wê ya paşîn, yanî ya 25'an di tarîxa 2/10/1919'an da derketîye. Kovar piştê wê tarîxê hatîye girtin û bi wî awayî di dîroka gelê Kurd da veşîrîye.”[\[17\]](#)

“Yek ji nivîskarên "Jîn"ê yên timî jî Xelîl Xiyalî bûye. Zana û nivîskarê gewre Xelîl Xiyalî, nivîsarên xwe bi navê "Kurdîyê Bedlîsî" nivîsine; di wan nivîsarên xwe da gelek şolên dîrokî, mîtolojîk, civakî, zimanzanî û felsefî girtine destê xwe û bi awayekî zanyarî ew tehlîl kirine. Nivîsarên Xelîl Xiyalî hemî bi zimanê Tirkî ne.”[\[18\]](#)

Çi heye ku nivîsên wî yên di “**Kovara Jîn**” û “**Rojnameya Jîn**”ê de, bi awayekî zelal nehatine diyarkirin. Digel ku ev agahiya M. E. Bozarslan heye jî, di hejmara 16an de, nivîseke bi sernavê “Gazindek” ku bi kurdiya kurmancî ye, heye. Di rûpelê munderecatê de, li ser navê *Kurdîyê Bitlîsî* ye; lê di dawîya nivîsê de navê “Kurdîyê Siwêregî” nivîsandî ye.

Nivîsa wî ya ewil, di hejmara 1ê de, bi ser navê “Göçmenler Müdürlüğü Yayınlarından «Kürdler» Adlı Kitap Dolayısıyla Dehak Efsanesi” derketiye û di hejmara 2yan de jî devam kiriye. Di hejmara sisiyan de, bi sernavê “Kürtler Münasebetiyle” nivîseke wî ya li ser dîroka kurd û Kurdistanê heye. Nivîsa wî ya bi sernavê “Kürdistan'daki Şehirler Sekenesi Türk Müdür?” Di hejmara 6an de

derketiye. Di hejmara 13an de, navê nivîsa wî “Kürdlere Dair” e. Sernivîsa wî ya bi navê “Kürdçeye Dair”, di nav rûpelên hejmara 14an de dixuyê.

Di vê gotarê de, mijareke girîng û balkêş ku hîna jî di rojevê de ye, girtiye destê xwe. Dixwaze ku em li ser kurdî bifikirin; bê ka zimanê kurdî têra divêtiyên neteweyî dike yan na. Dîsan diyar dike ku: “Her kurdê ku difikire û bê dilê xwe be jî dibêje ku rewşa îro ya zimanê me, têra zimanekî ilmî nake, ji vê naverokê dûr e.”<sup>[19]</sup> Mamoste, di pey vê de, behsa divêtiya zimanekî muşterek dike. Peyre di dirêjahiya nivîsê de, mizgîna nûçeya vebûna “Kurd Tamîmî Mearif we Neşriyat Cemiyatî” ku di *Jînê* de derketiye dide. Diyar dike ku dewr, dewra xebatên komeleyî ye û hişyar dike ku kurd bi xebatên ferdî tevbigerin, helbet dê bi ser nekevin. Bernameya vê xebatê ya Komeleyê, weke ussulesasê hebûna ziman, **milliyet** û **hebûnê** dibîne. Piştî ku diyar dike ku pêşeng û dildarên komele û rêxistinê ku di Herba Mezin a Cîhanê de telef bûn, hawar bi alîkariya ciwanan dike. Peyre gotinê tîne ser zimanê muşterek ê kurdî û dide xuyakirin ku îhtiyaceke mezin ê gelê kurd, li Îran û Turkiyeyê bi zimanekî hevbeş heye. Hebûna diyalektan jî, ji bo kurdî, weke xezîneyekê dibîne û dide zanîn ku divê ji her lehçeyekê re heqqê heyatê hebe; lê belê divêtiya zimanekî muşterek ê edebî jî, bingeh digre.

Di Hejmara 15an, sernivîsa wî ya “Kürdçeye Dair” bi dîroka 28 Mart 1335 (1919) dewam dike. Behsa zêdegaviyên ku lazim e di ziman de neyêtin kirin dike. Diyar dike ku di hêla tenzîmkirina ziman de, li ser rûyê erdê, kesê ku bi ser neketibe tune ye. Digel vê yekê, diyar dike ku pêdiviya herî mezin a zimanê kurdî ew e ku gramer û ferhenga wî nehatiye amadekirin û ev jî dibe sedem ku edeb û zimanê muşterek çênebe. Her çendî lêkolînên li ser kurdî ku ji aliyê biyanîyên mîna ûris, îngilîz, eleman û frensî ve hatibin kirin hebin jî, têra mezinahiya kurdî nabîne. Heta hin pirtûkên rêzimanî û ferhengên ku ji aliyê hin erbabên kurd ve hatibin kirin hebin jî, van tîr nabîne. Digel van agahiyan, diyar dike ku hin edîbên kurd ku bi kurdî helbest nivîsîne û berhem dane hene; bes ne bi kurdiya xwerû ne, peyvên erebî û farisî di wan de hene û dûrî zimanê gel in. Dora behsê tîne ser zimanê eslî yê gel û fikra xwe diyar dike ku ev zimanê gel ku pîrekên pîr pê dipeyivin, divê ku ji zimanê edebî re weke bingeh bête girtin û ew bêje û qalibên zimanê gel, bi awayekî zanistî bêne berhevkerin û ji bona vê jî van karan rêz dike:

1. Divê ku heyeteke daîmî, ji bo ziman li navenda Kürd Tamim-i Maarif ve Neşriyat Cemiyeti bicive û sirf vî karî bike.

2. Divê ku ev heyet, bi navê Encumena Lîsan bête binavkirin û her azayekî vê komê, ji zanayên tehsîldar be û bi hindikî, tevî ku bi çend zaravayên kurdî bizanibin, divê ku bi zimanekî biyanî jî bizanibin.

3. Divê ku ev heyet, bi xwe terzê zemanê xebata xwe tayîn bike û ew di karûbarên dî yên komeleyê de neyêtin xebitandin.

4. Divê wezîfeya eslî û girîng a vê heyetê karê zimên be.

5. Divê pirtûka ferhenga zimanekî biyanî esas bête girtin û li gor vê ferhengê, bergîdana her bêjeyeke wê, di her diyalekteke kurdî de bête vekolîn û dîtin. Wekî dî, heke wateya hin bêjeyên kurdî, di ferhenga biyanî de tune be, divê ew bêjeyên kurdî, di deftereke dî de bêne qeydkirin.

Ji xeynî van, divê ku gotinên pêşiyar, li gor exlaqî û derveyî exlaqî, bêne berhevkin. Divê ku hemû hikaye, çîrok û efsane, li gor exlaqî û derveyî exlaqî, bêne berhevkin. Ew her cûre helbestên ku di nav gel de hene, divê bêne berhevkin û ew ferhengên ku li ber destan hene, divê bêne civandin û ew kesên ku van karan dikin, divê bêne perûkin.

6. Divê ku ji zimanê erebî û pehlewî, zendî û farisîya kevn ku bi eslê zimanê me re eleqedarîya wan heye, sûd bête girtin.

7. Encumen, divê ku serê pênc salan carekê, wê ferhenga ku çap kiriye, nû bike û çap bike. Divê ku mecmuaya gotinên pêşiyar di rojnameyê de payîdar bike û biweşîne.

8. Divê ku hasilata safî ku ji neşriyata Encumenê tê, ji azayan re bête diyarîkin.

9. Ji tenzîmkirina rêzimanîyê, divê ku devoka hêla Hekarî û Botanê bête tercîhkirin û ev cemiyet, divê ku hemû nivîsarên rojnameyan, li vê gorê îcra bike.

Di hejmara 18an de sernavê nivîsa wî “Kürdler İranî Değil Midir?!” e û di hejmara 19, 20 û 21an de heman nivîs dewam dike. Gelek balkêş e ku ev nivîsa wî, tam di formata gotarên modern de ye.

### Encam

Wan roj û demên ku edîb û neteweperwerên osmanî li pey zindîkirina nîrxên xwe yên millî digerin û tevî qelema xwe ketine xîzmeta edebiyata bi zimanê tirkî, Mamoste Xoce Xelîl jî, bi temamê hêz û şiyana xwe, mil û mîxên xwe daye ber gurûgeşkirina zimanê kurdî, heta jê hatiye, berê bal û dêhna giregir, zana û xuyaniyên malmezînan ên gel kişandîye ser berhemên kevnar û nûjen ên edebî yên kurdî û weke helwesteke xîretkêşane, bi fikr û hestên gelek asofîreh, hemû nivîsên xwe yên rojname û kovaran jî, -kovara Jînê ne tê de- bi kurdî nivîsiye.



**Pêvek 1**

“Belê, ev meyla her yek ji we ya axatîyê û fikra serbixwetiyê û enaniyeta ku li sehayên rabirdûyê ku bûye sedema keşmekêşîya we, vêga jî di se’adet-serayên medeniyetê yên pêşerojê de, dê vegere fikra îcadê, teşebûsa şexsî û fikra hurriyetê. Heta dikarim bibêjim ku: Li gorî medreseyên xelqê yên bê his û bê deng, medreseyên we yên bi heytehol meclîseke mebûsî ya ilmê nîşan dide. Weke pistepistên we yên semawî û rûhanî, a li pey mele fatîhe xwendina we, ji hêla mezheb, medrese û qewmîyetê ve, weke sirrekî, îma û nîşaneyê qederê heye ku di mahiyeta we de qabiliyeta meşrûtiyê heye.

[20] Şewqa teşebûsa şexsî dike, ya ku navlêkirineke wê yî din e.

Hem jî “*wêrekî û namûsa millî*” ya ku avaker û hamiyê her cure fezîletê ye, ferman dike ku: Çawan ku heta vêga bi vekirina mecrayekê ji mejî bal bi dil ve, we aqil û qewetê ghişandibû hev û her wiha çawa bi hînbûna perwerdehiya li ser devê şûr, hûn di wêrekiya maddî de bi pêş ketin, vêcarê, neqebekê/qulekê ji dil bal bi ramanê ve vekin, qewetê bi hewara aqil ve, hissan bi gaziya fikran ve bişînin, da ku namûsa millî li meydana medeniyetê ya wêrekiya eqilî paymal nebe. Divê şûrê we ji cewherê fen û sin’etê were çêkirin.

Hem jî, ew zimanê we yê ku jê re “*zimanê mederzad*” [21] tê gotin û teyisîngeha biriqokên hestên millî ne û fêkiyên dara edebê ne û cihoka ava jiyana hîndekarî û perwerdehiyê ye û mîzana edaletê ya qîmet û kemilîna we ye ku rasterast ji wijdanê her kesî re bi vekirina şibakeyekê, mîna demeta tîrêjan bandoreke mayende dihêle (ji ber îhmalkirina we gelek tevlihev bûye û hinek şaxên wê hatine tamandin), digel ku ev ziman ji ajdana dareke mîna dara Tûbayê re misaîd bû; wiha hişk bûye, perîşan maye û ji edebiyata ku zimanê medeniyetê ye bêpar maye. Ji ber van sedeman zimanê we, bi zimanekî mehzûn ji walatparêziyê re giliya we dike.

*Ziman mora qedera mirovan e. Heçî sûretê mirovahiyê ye, di reng û ruyê ziman de xweşikahiya xwe dide der.* Ji ber ku zimanê maderzad sirûştî ye, bêyî ku lefz bîn vexwendin tîn bîra mirov. Ji ber ku danûsitandin tenê bi maneyê tê kirin, di nav duriyanê de heyirî namîne û agahdariyên dikevin wî zimanî mîna “neqşê ale’l-hacer/nexşên li ser kevir” mayende dimînin. Û her çî tiştên ku bi wî kirasê zimanê millî bixuyên henûn dibin. Vaye mînakeke welatparêziyê pêşkêşî we dikim ku; ew jî *Mîrze Xelîl Xeyalîyê Motkiyî* yê ku wekî di her beşê welatparêziyê de, di warê ziman de jî pêşekiyê bi dest xistiye. Û alfabe, serf û nehwa ku esasên zimanê me ne, anîye wucûdê. Û heta ez dikarim bibêjim ku Esra hemiyet, xîret, fedakarî û parastina zeîfan ghişandiye hev û wucûda wî ya manewî

çêkiriye. Heqîqeten ji ber ku em li cewherekî wiha yê xîretê ku ji kana Kurdistanê ye rast hatine, hêvî heye ku dê gelek cewherên wekî wî pêşeroja me ronahî bikin.

Vaye ev zat, nimûneyeke welatparêziyê ya ku hêjayî mirov bide dûv nîşan daye û ji bo zimanê me yê millî ku muhtacê kemilînê ye temekek avêtiye. Ez ji mirovên bixîret re şîretan dikim ku li dûv rêça wî herin û li ser temelê wî ava bikin.”[\[22\]](#)

### Bediuzzeman Seîdê Kurdî

\*\*\*

#### JÊDER Û SERÇAVÎ

Bediuzzeman Seîdê Nûrsî, Dîwana Herba Urfî, (Wergêr: Aydin Uneşî) Weş. Hizmet Vakfi Yayinlari, Istanbul, 2012

Ji Eşîra Mûtîkî Xelîl Xeyalî, “Kurdçe Lîsanîmiz, Weten û Îttîfaqa Kurmanca” *Kurd Teavûn ve Terakkî Gazetesî*, no. 8, 1 Muharrem 1329 [1909] Stenbol

Kurdiyê Bidlîsî, “Kurdçeye Daîr”, *Jîn*, Stenbol, 1919, (Çapa Weşaxaneyê Deng, 1985) hejmar. 14  
Malmîsanîj, (2010), Istanbul, Yirminci Yüzyılın Başında Diyarbakir’de Kürt Ulusçuluğu, Weşanên Vateyî

Mehmet Bayrak, Açık-Gizli, Resmi-Gayrıresmi, Kurdoloji Belgeleri, Öz-Ge Yayınları, Ankara, 1994

M. Bozarlan, Kovara Jîn, Cild I, Siwêd, Weşanxana Deng, 1985

Modanî X, “Ziman û Nezaniya Kurdan” *Rojî Kurd*, Stenbol, 1913, hejmar 2, çapa Weşanên War, (2002

M. X. “Ji Mezinê Kurdan Ra Ye” *Hetawî Kurd* Stenbol, 1909, jimar: 1

M. X, “Ziman” *Rojî Kurd*, Stenbol, 1913, hejmar 2, çapa Weşanên War, 2002

---

[\[1\]](#) Ji ber ku nivîskarê me, peyva Modanî bi kar aniye, me jî ev tercîh kir.

[2] Malmisanîj, (2010), Istanbul, Yirminci Yüzyılın Başında Diyarbekir’de Kürt Ulusçuluğu, Weşanên Vateyî, r. 126.

\* Lêkolerê kurdolojiyê Weysel Aydenîz fotokopiyên vê rojnameyê dane me, mala wî ava be.

[3] M. X. “Ji Mezinê Kurdan Ra Ye” *Hetawî Kurd* Stenbol, 1909, jimar: 1, r. 20.

[4] Heman nivîs.

[5] Heman nivîs.

[6] M. X. “Ji Mezinê Kurdan Ra Ye” *Hetawî Kurd* Stenbol, 1909, jimar: 1, r. 20.

[7] Mehmet Bayrak, Açık-Gizli, Resmi-Gayriresmi, Kurdoloji Belgeleri, Öz-Ge Yayınları, Ankara, 1994, r. 491.

[8] Mehmet Bayrak, Açık-Gizli, Resmi-Gayriresmi, Kurdoloji Belgeleri, Öz-Ge Yayınları, Ankara, 1994, r. 505.

[9] Ji Eşîra Mûtîkê Xelîl Xeyalî, “Kurdçe Lîsanimiz, Weten û Îttîfaqa Kurmanca” *Kurd Teawun we Tereqqî Xezetesî*, no. 8, 1 Muharrem 1329 [1909] Stenbol, r. 69-71

[10] Modanî X, “Ziman û Nezaniya Kurdan” *Rojî Kurd*, Stenbol, 1913, hejmar 2, çapa Weşanên War, 2002, r. 67.

[11] Heman gotar, r. 68.

[12] M. X, “Ziman” *Rojî Kurd*, Stenbol, 1913, hejmar 2, çapa Weşanên War, (2002), r. 88.

[13] M. X, “Ziman” *Rojî Kurd*, Stenbol, 1913, hejmar 2, çapa Weşanên War, (2002), r. 88.

[14] Heman cî, r. 94.

[15] M. Bozarşlan, Kovara Jîn, Cild I, Siwêd, Weşanxana Deng, (1985) r. 23.

[16] M. Bozarşlan, Kovara Jîn, Cild I, Siwêd, Weşanxana Deng, (1985) r. 5.

[17] Heman cî r. 5.

[18] M. Bozarşlan, Kovara Jîn, Cild I, Siwêd, Weşanxana Deng, (1985) r. 8.

[19] Kurdiyê Bidlîsî, “Kurdçeye Daîr”, *Jîn*, Stenbol, 1919, (Çapa Weşaxaneya Deng, 1985) hejmar. 14 r. 10.

[20] - Ji bo însan, ji bilî xebata wî tiştekî din nîn e. (Necm: 39)

[21] - **Zimanê Mederzad:** *Zimanê zikmakî, maderî.*

[22] Bedîuzzeman Seîdê Nûrsî, *Dîwana Herba Urfî*, (Wergêr: Aydın Uneşî) Weş. Hizmet Vakfî Yayinlari, Istanbul, 2012, r. 61-63.

## Pêşekiyekî zor kurt bo zimannasî:

### Zimannasî çi ye?

#### *Ce'ferî Şêxulîslamî*

Hemû însanêk, bêtû helumercî fîzîkî leşî kemayesî nehênê û gwêy le zimanêkîş bê ke le dewruberî qisey pê bikirê, lanî kem fêrî yek ziman debê, be bê ewe ke be aşkirayî xoy be fêrbûnî ew zimanewe mandû û şeket bika. Be kurtî, ême zimanî zigmakîman le xowe fêr debîn û pêman wa niye ke şitêkî seyrman kirduwe. Renge eme yekêk lew hoyane bê ke zorbey xellik şarezay ew buware zanstiyê nîn ke le ziman dekolletewe. Em şareza nebûneş le zimannasî û, babetekanî lêkolînewe lew buware da, her taybet be kurd niye.

Le mawey ew çend saleda ke xerîkî xwêndinî zimannasî bûm, bom derkewit ke zor Kenedayîş nazanin xwêndkarî zimannasî çî dexwênê. Paşî ewe ke le willamî "çî dexwênî?" da, demgut "zimannasî", zorbey xellik yan deyangut "le zimannasî da çî dexwênî?", yan deyangut, "kame ziman fêr debî?", yan "çend ziman fêr debî?" detwanim bilêm ke şarezayî zorbey xellik le zimannasî, êstaş, lewe tînapêrê. pêman wa niye ke komelgakanî dîkeş lew barewe ciyawaz bin.

Başê berastî zimannasî, eger birîtî nebê le fêrbûnî zimanêk yan çend zimanêk, çiye? Em witare kurte hewldanêke bo willamdanewey em pirsiyare. Nasînî zimannasî, be taybet bo ew fêrxuwazaney ke bîr le dirêjedanî xwêndin le piley zanistge da dekenewe, yan her kesêkî ke hez bika xo be babet û diyardekanî zimanewe xerîk bika, girînge. Hoy be girîng zanînî em xale le ber emeye ke nasînî zimannasî wekû buwarêkî zanstî bo kurd pêwîste. Be hebûnî zimannasî zortir ke xo be zimanî Kurdiyewe xerîk biken û be şêwey zanistî lêy bikolnewe, lewaneye hîway hebûnî asoyekî rûnak, yan rûnaktir, bo em zimane wêçûtir û le rastî nizîktir bê.

### Zimannasî çi ye?

Zimannasî birîtî ye le lêkollînewey zanistiyaney ziman. Egerçî zanînî ziyatir le zimanêk lewaneye yarmetî xwêndkarî zimannasî yan zimannasêk bida ke baştir le çemk û diyardekanî ziman têbiga, zimannas naçar niye zimanêkî dîke fêr bê. Belkû, zimannas hewil deda ke le ziman, wekû diyardeyekî komelayetî û însanî, têbiga. Zimannasî, bo nimûne, le willamî em çeşne pirsiyarane degerê: Dengekanî ziman çon saz debin? boçî katêk qisekerêk em dengane be duway yektir da rîz deka, yekêkîtir, wate gwêgirêk, deuwane lem dengane wata û mana çê bika? herweha, boçî em sazkirdiney wata le deng be hemû gwêgirêk nakirê? zanînî zimanî zigmakî manay çiyê? aya zimanî helle û zimanî nahelle hen? aya zimanêkî berbilawî wekû Ingîlsî le zimanêkî serkutkirawî wekû Kurdî, yan zimanî gundêkî dûredestî Efrîqayî tewawtîre? ciyawazî le nêwan diyalekt (lehce) û ziman da çiyê? bo nimûne, aya Kurdî zimane, yan lehce? ciyawazî şêwe qisekirdinî jin û piyaw çiyê? em ciyawazîane çi tesîrêkiyan le pêge û piley komelayetî jin û piyaw da heye? emane û zor pirsiyarî tirîş babetî xwêndinewe û lêkollînewey fêrxuwazekanî zimannasî û zimannasanin. Çiyawazî û berbilawî pirsiyargelêkî yekcar zor sebarete be ziman buwete hoy eme ke zimannasî be çendîn lik dabeş bikirê.

### Likekanî Zimannasî

Ziman be şêwey corawcor lêy dekolldrêtewe û mutala dekirê. Her bew pêyeş, zimannasî dekirê be çend şêwe dabeş bikirête ser çendîn lik û po. Herkam lew likane willamî hendêk pirsiyarî taybet dedenewe û le babetgelêkî taybet dekolldewey:

1. Zimannasî tîorîk (Theoretical linguistics) (xalîs û bineretî: zimanekan çon kar deken?)
2. Zimannasî mêjuyane (Historical linguistics) (zimanekan çon bûn be emey ke êsta hen?)
3. Zimannasî komelayetiyane (Sociolinguistics) (pêwendî ziman le gel pêkhatekanî tirî komelayetî çiyê?)
4. Zimannasî derûnnasiyane (Psycholinguistics) (ziman le naw mêşk da çon saz debê û dekwête kar kirdin?)

5. Zimannasî pêkgirtin/ karpêkerane (Applied linguistics) (fêrbûn û fêrkirdinî ziman, wergêran, htd.)
6. Zimannasî kampiyutêrî (Computational linguistics) (be kompiyutêr kirdinî zimanî însan)

Cige le emane, hêndêk likî dîkeş le zimannasî debinewe. Bo wêne hêndêk zimannas le zimanî malat dekollewe. Hêndêkî dîke xerîkî lêkollînewe le zimanî kemendamanî bîstin û gutinn. Hêndêkîş le keresekekanî tirî pêwendî girtin, wekû hêma û îşare, dekollewe. Hî waş heye ke le felsefey ziman dekolletewe. Hemû ew beşaneş ke ta êsta nawyan hatûwe, le xoyanda dabeş dekirênewe ser likî biçûktir. Le dirêjey em wîtarede, kurteyek sebarete be herkam lew beşane pêşkeş dekirê.

1. Zimannasî tîorîk (Theoretical Linguistics): em beşe bawtirîn beşî zimannasî û beşêkî girîngî zorbe here zorî kolêcekanî zimannasiye. Em likey zimannasî le ziman wekû diyardeyekî însanî û keresekekî pêwendîgirtin dekolletewe. çunke ziman le çendîn pêkhate, wekû deng, wişe, riste, mana û htd, çê buwe, em likey zimannasîş xoy be çendîn likî biçûktir dabeş kirawe. Em like biçûkane birîtin le fonetîk, fonolojî, morfolojî, ristesazî, watasazî û, pragmatîk (tesîrî helumerc le ser bekarhênanî ziman).

1.1. Fonetîk (Phonetics): "fon" wate deng. fonetîk wate zanistî nasînî deng. Le zimannasî da, fonetîk be kollekey zanistike û nasînî ziman denasrê. Hoy girîngayetî fonetîk le eme daye ke ziman le esasda birîtiye le komeleyek deng ke be şewegelêkî taybet û, zorbe katan be pêy yasayekî rêkupêk, sîstemêkî pêwendî girtinyan çê kirduwe. Fonetîk le çonyetî pêkhatinî em dengane dekolletewe. Bo wêne fonetîk le ewe dekolletewe ke le zimanî Kurdî da çend deng hen. Em dengane le kwêy ewik, zar, ziman û lût da saz debin û çon saz debin? dewrî endamekanî leş (zar, ziman, ewik, lût, lêw, didan û htd) le sazûnî em dengane da çîn? herweha, kamane lem dengane dengî serekîn(fonêm), kamaneş dengî naserekîn(alefon)? emane û zor şitî girîngî dîkeş babetekanî lêkollînewe le beşî fonetîk da pêkdênin.

2.1. Fonolojî (Phonology): le halêkda ke fonetîk xo be diyarîkirdin û saxkirdinewey dengekanî zimane xerîk deka, fonolojî le çonyetî sîstemî rêkxistinî ew dengane dekolletewe. Bo nimûne, fonetîk saxî dekatewe ke "j" dengêkî serekî(fonêm) le zimanî kurdî daye. Ew denge dengêkî "xişok"e, le katî sazîkirdinî da, serî ziman deçêt bo ser sextemelaşû, piştewey zimanîş berew nermemelaşû beriz debêtewe. Le layekî dîkewe, fonolojî lewe dekolletewe ke dengî "j" le kwêy wişekanda dê. Her lem pêwendiyêş da, willamî pirsiyarêkî awa dedatewe: boçî dengî "j" lem wişaneda heye, wekû "kujran", "bikuj", yan "kujraw", belam le wişeyekî dîkeda, wekû "kuştin", niye û debêt be "ş"? aya

"ş" debêt be "j" yan be pêçewanewe, yan herdûkiyan? ew cêgorkêney "ş" û "j", be her şêweyek ke bibê, aya her lem çend wişeye daye û be şêweyekî hellkewte, yan be pêy yasayekî taybete û le wişey dîkeş da rû deda? Eger be pêy yasayeke, ew helumerce çiyê ke ew yasaye têyda dête arawe? Emane ew çeşne pirsiyaranen ke fonolojî deyanka û le willamekaniyan degerê. Ke wabû, fonolojî le sîstimî rêkkewtin û rêkxistinî dengekanî zimanêkî taybet dekolletewe.

3.1. Morfolojî (Morphology): morfolojî birîtiye le zanistî lêkollînewe le wişekanî ziman. Em beşey zimannasî le çonyetî pêkhatinî wişekan, rîşey wişekan, kerese likênerekan yan ciyakerewekan, pêşgir û paşgirgel û htd, dekolletewe. Le morfolojîş da, wekû hemû buwarêkî zanistî, hêndêk çemkî girîng û taybetî hen. Morfolojî lem çeşne pirsiyarane dekolletewe: wişey çiyê? morf, morfêm û alemorf çîn? wişey "têkhelçûnewe", bo nimûne, le çend wişey biçûktir, yan le çend morf û morfêm pêkhatuwe? Em witare çend wişey têdaye, çon dezanîn û pêwaneman çiyê? be çend şêwe ême detuwanîn wişey nwê le zimanî Kurdîda da taşîn û durust bikeyn?

Morfololojî le willamî em pirsiyarane û pirsiyarî lem çeşne dekolletewe. Morfolojî be şwên ewe weye ke yasay rêkkewtin, pêkewe likan, têkelawbûn û têkbezînî wişekan diyarî bika. Lem rûwewe, morfolojî wekû beşêkî girîngî giramêr (rêziman) çawî lêdekirê.

4.1. Sîntaks (Syntax): sîntaks le giramêr (rêziman) û çonyetî pêkewe likanî wişekan bo sazdan û çêkirdinî riste û şêweriste le ziman da dekolletewe. Hêndêk le yasakanî rêzimanî le hemû zimanekan da wekû yekin. Bo nimûne, le hemû zimanêkda, risteyek, lanî kem, le yek biker û yek kirdar pêkdê, wekû, "hana dê", "hana mîayed," yan ".Hana comes". le gel emeş da, zor yasay pêkewe likanî wişekan le zimanêk bo zimanêkî dîke ciyawaze. Herçend ke wişekan manay serbexoy xoyan heye, belam wa heye ke be pêy rîz bûnyan le risteda mana bigorin. Bo nimûne ême detuwanîn bilêyîn, "xec xoy bo siyamend heldaş." detuwanîn her bem wişane, belam be gorînî şêwey rîz bûnyan, manay risteke bigorîn, wekû "siyamend xoy bo xec heldaş." herweha, detuwanîn em wişane be corêkîş rîz bikeyn ke ristekeman her manay nebê, lanîkem be aşkirayî, wekû em risteye: "heldaş bo xoy xec siyamend." başe boçî ristekanî pêşû, ke her lem wişane pêkhatbûn, manayan hebû, belam em risteyey duwayî, her bew wişanewe, manay niye? Aşkiraye ke êwe delên çûnke ew risteyey duwayî le yasay rêzimanî Kurdî lay dawê. Raste. bellam, ew yasayane çîn? herweha, hêndêk car le waneye risteyekîş be tewawî yasay rêzimanî reçaw neka, keçî bîserêkî Kurd detuwanê le mebestî qisekereke têbiga. Bo nimûne, detuwanîn bilêyîn ke her çend em risteye tewaw rêzimanî niye,

bellam hemû Kurdêkîş têy dega: "Ehmed xward nan malî ême." bîserêkî Kurd dezanê ke mebestî qiseker eme ye ke "Ehmed nanî le malî ême xward." baş e eger ême le herdû riste têbigeyn, çon dezanîn ke kame riste le barî rêzimanîyewe raste û kameyan helleye? riste le çend beş pêkhatuwe? kam beş detuwanê be kam beşewe binûsê û le kam helumerc da? kurttirîn ristey zimanî kurdî le çend wişe pêkdê? dirêjtirîn riste çiyê? emane û setan pirsîyarî dîkeş, sebarek be rêzimanî ziman, babetî lêkollînewe û lê wirdibûnewey likî sîntaksî zimannasîn.

5.1. Sementîk (Semantics): sementîk (mananasî) birîtiye le lêkollînewe le mana û watay morfêmekan, wişekan, şêweristekan, ristekan û gutarekan (discourses). Aşkiraye ke zanîni zimanêk birîtiye le zanîni dengikan, wişekan û ristekanî ew zimane. Bellam, le rastî da, amancî serekî le zanîni ewane emeye ke qisekerêk bituwanê mebestî xoy, çak yan xirap, be hoy zimanewe rabigeyênê. Lem ruwangeweyeye ke beşî sementîk û mananasî girîngayetî taybet be xoy heye. Lem likey zimannasî da, le babetgeli wekû wişe hawmanakan, wişe dijekan û htd dekolldrêtewe. Her lem beşêş daye ke le pêwendî wişekan, ristekan û gutarekan le gel mana, mebest, amanc, fikir û bîr, siyaset û aydîolojî dekolldrêtewe. Helbet zimannas yan kolêcî mutalay zimannasî ewto hen ke le mananasî da ta ew radeye wird nabinewe û, le radey watay wişe û risteda dewestin. Le batî mananasî, wird bûnewe le manay beşekanî ziman le radeyekî berbilawtir da dexirête estoy buwarî piragmatîk yan buwarî lêkdanewî gutar (Discourse Analysis).

6.1. Piragmatîk (Pragmatics): piragmatîk birîtiye le lêkollînewe lew beşaney wata û ziman le katî kelik lêwergirtin da ke bestirawetewe be helumercî xudî qiseker, bîser û ew çuwarçêwe û kontêksteş ke qisekey têda kirawe yan bîstirawe. Be watayekî tir, piragmatîk lew diyarde û faktoraney gutar (dîskors) dekolldrêtewe ke tesîryan le sazûn û sazdanî wata û mana da heye. Hêndêk lew faktorane birîtin le, le çî helumercêk da qiseyek kirawe, le kwê, key, le layen kêwe û bo kê? Amancî qiseker çî buwe? çend lew qiseyey ke derbirdrawe agadarî nweye û, çendey kone? bo têgeyştin le derbirdrawey taze, bîser agadarî pêşûy ta çî radeyek pêwîste û ew agadariyane çîn? Emane û zor wirde babetî dîkeş xalekanî lêkollînewey buwarî piragmatîk pêkdênin.

2. Zimannasî mêtûyiyane (Historical linguistics): em likey zimannasî le mêtû û pêşîney zimanekan û pêwendî û xizmayetî nêwanyan dekolldrêtewe. Le barî kat û zemanewe ziman dekirê lanî kem be dû şêwe mutala bikirê: Sînkiranîk(synçronîç) û dayakiranîk (diacronîç). Lêkollînewe û xwêndinewey sînkiranîk birîtiye le lêkollînewey ziman le katêkî taybet da û bew şêweyey ke ziman lew kateda kelkî



lê werdegîrê. Bo nimûne, zimannasî modêrn, ziman bew şêweye ke êsta heye mutala deka û lêkîdedatewe. eme lêkollînewey sînkiranîk yan sînkironîke. Bellam, dayakiranîk wate le dirêjayî kat û zeman da. Lêkolînewey dayakiranîkaney ziman wate lêkollînewe le ziman le kat û şwênî ciyawaz da. Eme birîtiye le şêwe lêkollînewey zimannasî mêjûyî, wate lêkollînewe le ziman le dirêjayî mêjû da. Her bem pêyeş, lêkollînewe lem buwarde da le ser esll û pirênsîpêkî serekî damezrawe: ziman degordrê. Têgeyştin le çend û çonî gorînî ziman le dirêjayî mêjû da, xizmayetî zimanekan, peyda bûn û goranî elf û bêyekan, wergirtinî wişe le zimanêkewe le layen zimanêkî tirewe, we babetgelî lem çeşne, babetî lêkollînewe û lêkdanewekanî buwarî zimannasî mêjûyiyane, yan zimannasî pêkgirtinane (Comparative linguistics) pêkdênin.

3. Sosîozimannasî (zimannasî komelayetiyane) (Sociolinguistics): Sosîozimannasî, be kurtî, birîtiye le lêkollînewe le çonyetî pêwendî le nêwan bekar hênan û dekarkirdinî ziman le gel baqî pêkhate yan sitiraktore komelayetiyekan. Be watayekî tir, sosîozimannasî le ewe dekollêtewe ke komel û pêkhatekanî çi tesîrêkiyan le ser ziman heye û, be pêçewaneweş, ziman çi tesîrêkî le ser pêkhate komelayetiyekanî dîke heye. Sosîozimannasî le rastî da be şwên willamî zor pirsiyaran da degerê ke nek her bo sosîozimannasekan, belkû bo zorbey xellkî asayîş serncrakêşn. Bo nimûne, hêndêk lew pirsiyarane birîtîn le emane: ciyawazî le nêwan Kurdî Rojhelatî û Kurdî Rojawayî da çiyê? Aya em dû şêwe axawtine ewende lêk ciyawazin ke be dû ziman binasrên, yan dû diyalektî yek zimanin? ciyawazî le nêwan qisekirdinî jin û qise kirdinî piyaw da çiyê? aya qise kirdinî em dû jêndere tesîriyan le ser berdewam bûn yan nebûnî pêge û piley komelayetî em dû jêndere, bem şêweyey ke heye yan buwe, heye yan na? sosîozimannasî le pêwendiyekanî ziman û çîne komelayetiyekan, ziman û xwêndewarî yan nexwêndewarî, zimane xorskekan yan zimane muturbekan, gorînî ziman, mirdin û kuştinî ziman, plan danan bo ziman, mafî zimanî, serkutkirdinî zimanekan, zimanî zigmak û zimanî zêde, yekzimane yan çendzimane bûn û htd dekollêtewe. Be kurtî, pêwendî diyardekan û faktorekanî komelayetî le gel ziman û, tesîrî dûlayeney em dû diyarde însaniye, babetî serekî lêkollînewe le buwarî sosîozimannasî dan.

4. Zimannasî derûnnasyîane (Psycholinguistics). Em beşey zimannasî le çonyetî fêrbûnî ziman le layen însanewe û, dewrî mêşk û hizir lew piroseye da, dekollêtewe. Bo wêne, ew beşe deyewê rûnî bikatewe ke boçî ême ziman fêr debîn û çon? boçî malat natwanin wekû însan fêr bin? mêşkî ême çi qabîliyetêkî heye ke mindalêkî 4 salane, tenanet kemtirîş, bituwanê em hemû yasa û qanûnaney ziman fêr bê? aya mindalêk em yasayane le ber deka, be hoy pirove û temrînewe, yan mêşkî ême

wa durust buwe ke çî bimanewê û çî nemanewê, madam ke le buwarî fizîkiyewe îradman le mêşk da nebê, naçarîn ke lanî kem zimanêk her fêr bîn? Em likey zimannasî zor le fêrbûnî ziman le layen mindalewe dekolletewe û gerekiyetî hemû ew yasa hizriyane bidozêtewe ke yarmetî mindalêk deden ke zimanekey fêr bê. Bo dozînewey willamî em pirsiyaraneş saykozimannasekan le qisekirdinî mindalekan le labiratorekan da, le şêwey qisekirdinî ew kesaney ke tûşî zerbey mêşki bûn(eyfasiya), we herweha lew kesaneş ke girftî xwêndineweyan heye(dîslêksiya) dekollewewe.

5. Zimannasî karpêkerane (Applied linguistics): em likey zimannasî dekirê ziyatir le manayekî hebê. Bo nimûne, le hêndêk le zankokanî zimannasî da, zimannasî karpêkerane birîtiye le lêkollînewe le tîorîgelî fêrbûnî zimanî zêde (wekû fêrbûnî Inglîsî le layen kurêkewe) û dozînewey baştirîn rêgakanî fêrkirdinî zimanî zêde. Keçî le hêndêk şwênî dîke, zimannasî karpêkerane yan pêkgirtin hemû ew buwaraney lêkollînewe degrêtewe ke beder le gorebanî zimannasî tîorîkin. Le zor zankoy zimannasî da, em buwarane hemu ser be zimannasî karpêkeranen: sosîozimannasî, yasa û plan danan bo ziman, fêrbûn û fêrkirdinî zimanî zêde, dûzimanebûn û çend zimanebûn, kampiyutêr û ziman, lêkdanewe û şîkarî deq û gutar, ziman û deselat, ziman û îdêolojî, nîşane nasî (semiotics), nexwêndewarî û xwêndewarî û, htd.

6. Zimannasî kampiyutêrî (Computational linguistics) (be kompiyutêrekirdinî zimanî însan) em likey ziman-nasî, ke le zor zanstge lewaneye ke ser be zankoy derûninasî yan zankoy kampiyutêrewewe bê, lewe dekolletewe ke çon dekirê be şêweyekî rêkupêk ew karaney ziman ke be mêşik dekirên be kompiyutêr bikirên, bo nimûne wergêrran le zimanêkewe bo zimanêkî dîke, lêkdanewey deq, tayp kirdinî ew şitey ke be qise degutirê û le rêgay mîkrofonêkewe dedrê be kompiyutêr. Beşêkî girîng û pirdahatî em beşey zanist birîtiye le çêkirdinî bername kompiyutêriyekan bo fêrbûn û fêrkirdinî zimanî zêde, be taybet zimanî Inglîsî. Aşkiraye ke zorêk lem karane her êsta be kompiyutêr dekirên, bellam emane dekirê baştir bikirên, be şêweyek ke berhemî karekanî kompiyutêr lew buwareda deqîqtir û xêratir bê.

Hemû ew beşaney zimannasî tijî babetî lêkollînewen, be taybet bo fêrxuwazêkî zimannasî kurd. Le gel eweşda ke deretan bo Kurd zor kem bûwe ke xemxor yan ogiranî buwarî zimannasî bituwanin, be şêweyekî zanistî, be zimanî Kurdî rabigen, ta êsta karî baş kirawe. Bellam, ewe bes niye û karî zorman mawe ke bîkeyn. Pirsiyar êsta emeye ke le kam buwar da debê karî ziyatir bikirê. Rastiyekey emeye ke ewe lewaneye zortir bigerêtewe ser zewq û îştîyaî fêrxuwazanî zimannasî. Bo nimûne, min

xom zor hez le buwarî lêkdanewey rexnegiraney gutar û deq dekem, bellam emeşim le ber çawe ke bo nimûne le buwarî fonetîk yan morfolojî zimanî Kurdîda zor karî be nirix dekirê. Be giştî, be leberçawgirtinî helumercî zimanekeman, ke êstaş le zorbey Kurdistanda hereşey mirdinî lêdekirê, dû beş lew beşaney ke le serewe basman kirdin, pêwîste ke ziyatir le beşekanî dîke girîngayetiyan pê bidrê. Ew dû beşe birîtin le beşî zimannasî tîorîk (fonetîk, fonolojî, morfolojî, rêziman, mananasî û pragmatîk) û sosîozimannasî.

Sereray ewe ke rêzî xom derdebirm bo ew kesaney ke xerîkî rabirdûy zimanekemanin, çunke pêwîstî wê le rûy dilsoziyewe karekeyan deken, naçarîşim eme bilêm ke xozge wuze û katî xoyan terxan kirdiba bo lêkollînewe le zimanekeman bew şêweyey ke emro heye. Reng bê xo mandû kirdin be babetekanî zîndûy zimanekeman girîngtir bê le ewe ke bizanîn Kurdî zortir xizmî kame zimane? yan rîşey filane wişe Turkiye yan Farsî? zimanekeman çi pêwendî be "Almanî"-yewe hebê û çi pêwendî be "Suwahîlî" yewe hebê, her eweye ke heye. Ba le eme bikolînewe ke êsta çîye, çone, yasakanî çîn, baştirîn rêgay fêrkirdinî yan fêrbûnî çîye? ba le eme bikolînewe ke baştirîn rêgay pêwendîgirtin be Kurdî çîye le qisekirdinî asayî da, le witardanî siyasîda, le gutardanî komelayetîda, le jurnalîsmda û htd. Kar kirdin be ziman û, lêkollînewe le çonêtî û çendêtî ew karaney ke be ziman deykeyn le hells û kewte komellayetiyekeaniman û hemû buwarekanî jiyana daye ke zimanêk zîndû radegirê, nek dozînewey wişegelêkî kon û aşna le ser kute perêkî zerd hellgerraw.

## Zimanekanî Hindistan

*Nûsînî mallperrî Indiansaga*

*Wergêrran le Inglîsiyewe: Hesênê Qazî*

Şêwe qarey Hînd le jimareyek komellgey ciyawazî zimanî pêk hatûwe ke herkameyan le ziman û koltûrêkî hawbeşda şerîkin. Xellkî Hîndistan be zor ziman û diyalêktan qisan deken ke zorbeyan şêwezarî 15 zimanî serekîn.

Hêndêk le zimanekanî Hîndistan mêjûyekî dirêjî edebîyan heye - temenî edebiyatî Sanskrit ziyatir le 5000 hezar sall û temenî Tamil degate 3000 sall. Hîndistan her weha zimanî ewtoşî heye ke şêwezarî nûsîniyan niye. Le Hîndistan 18 ziman be resmî nasrawin (le sallî 1992 zimananî Konkanî, Manîpurî û Nepalî lew lîsteye ziyad kiran) û her kam lew zimanane edebiyatêkî zor girîng û dewllemendyan berhem hênawe.

Ew zimanane egerçî le zor rûwewe le yek ciyawazin, bellam hemûyan le pê naw kultûrêkî yekdest da kar deken ke cewherî edebiyatî gewrey Hîndistan pêk dehênê. Ewe pêşkewtinêke le serzweînî lehcey zoruzewendî cor be cor da. Jimarey axêweranî her kam le zimanekan le yekdî zor ciyawazin. Bo nimune, Hindi ziyatirî le 250 mîlyon kes axêwerî heye, bellam be rêje xellkêkî zor kem be zimanî Adamanes qise deken.

Egerçî be hêndêk le zimanekan degutrê zimanî " hozî " yan "xocêyî", bellam ew heşîmetey qiseyan pêdeken lewaneye lew axêwerane ziyatir bin ke be hêndêk le zimane Urrûpayiyekan dedwên. Bo nimûne Bhili û Santali ke herdûkyan zimanî hozî n, her kamêkyan ziyatir le 4 mîlyon kes qiseyan pêdeken. Nizîkey dû mîlyon kes be zimanî Gondi qise deken. Le fêrgekanî Hîndistan da be 58 zimanî ciyawaz dexwêndirê. Le Hîndistan be 87 ziman rojname derdeçê, be 71 ziman bernamey radyoyî heye û be 15 zimanan fîlm dirust dekrê.

Zimanekanî Hîndistan ser be çuwar binemalley zimanîn: Hindu – Urrûpayî, Dravidiyai, Mon – Ximêr û Çînî û- Tîbetî. Zorbey here zorî danîştûwanî Hîndistan be zimanekanî ser be binemalley Hîndu-Urrûpayî û Dravidiyayî qise deken. Binemalle zimaniyekan kemtazor be ser girûpe cugrafiyayekanda dabeş debin. Zimanekanî ser be girûpî Hîndu-Urrûpayî be şêwey serekî le herêmekanî Bakûr û Nêwerrast da qiseyan pê dekrê.

Zimanekanî Xuwarûy Hîndistan be şêwey serekî ser be girûpî zimananî Dravidiyayîn. Hêndêk destey êtinîkî le Asam û hêndêk le beşekanî Rohellatî Hîndistan be zimananî girûpî ser be binemalley Mon-Ximêr qise deken. Ew xellkey le herêmi Hîmalîyay Bakûrî û le nizîk sinûrî Burme dejîn be zimanekanî ser be binemalley Çînî û- Tîbetî qise deken. Axêweranî 54 zimanî ciyawazî ser be binemalley Hîndu – Urrûpayî sê le çuwarî heşîmetî Hîndistan pêk dehênin. 20 zimanî ser be binemalley Dravidiyayî le layen yek le çuwarî danîştûanewe qiseyan pêdekrê. Axêweranî 20 zimanî ser be binemalley Mon – Ximêr û 98 zimanî ser be binemalley Çînî û- Tîbetî dû le sedî danîştûwanin.

### Edebiyatî Hîndistan

Reçellekî edebiyatî Hîndistan degerrêtewe bo ziyatir le 5000 hezar sall lemew pêş. Ewe deqe kilasîkekanî dînî Hîndûyayetî, Bûdayetî, Ceyniyayetî, û Sîkayetî † edebiyatî dîwexanî padşakanî Hîndistan† şê'rî zarekî û goranî† şê'r û pexşanî taze ke bîr û hizrî nwê derdebrrin weber degirê.

Egerçî ew wecaney be dûy yekdîda hatûn herkameyan edebiyatî Hîndistanyan dewllemend kirdûwe û beşî xoyan têxistûwe, deqe kewnarakan hêştas karlêkeriyen heye. Ta serubendî modêrrn, be asayî edebiyat be rêgey nwindin û gutnewey degeyişte bîsteran. Deq û çîroke dîniyekan, ke zoryan zorcar zor dûrudirêj bûn, le ber dekiran û be şêwey zarekî sîng be sîng le wecêkewe radegwêzran bo wecêkî dîke. Ca boye egerçî nizîkey nîwey danîştûwanî Xuwarûy Asiya nexwêndewarin û natuwanin bixwênnewe û binûsn, bellam kultûrî herêmeke heta billêy berewpêş çûwe.

Edebiyatî şêwe qarrey Hîndistan be ser sê serubendanda dabeş dekrê. Serdemî kewnara, ke zimanî Sanskrit balla dest bû ( ta nizîk 1000 sal duway zayînî xayand) serubendî nêwerrast , le nizîkey 1000 sall duway zayîn ta berayiyekanî 1800 ( ke lew maweyeda zimane herêmiyekan berew pêş çûn)† û serubendî modêrrin, ke ferhengî Urrûpayî karlêkerî leserî hebûwe. Le dû serubendî yekemda, zorbey

edebiyat şê'r bû yan be şêwey êpîgiram ( şê'rêkî kurtî, be nêwerok) , egerçî pexşaniş dekar dekra. Le serubendî modêrrin da, bekarhênanî pexşan be tewawî pêş xirawe.

Edebiyatî Hîndistan be zor zimanan nûsrawe. Her zimaney beşî xoy tê xistûwe û taybetmendî lemerr xoy têda derbirrîwe. Bellam le sertaserî mêjûy edebiyatî Hîndistanda, zimanekanî ewê le yekitryan wergirtûwe û le babet, şêwaz, peşewî, arraste û cwillanewekanyanda hawbeş bûn.

Edebiyatî her zimanêkî taybetî, form, remz û niyansî lemerr xoy heye, ca boye zor mentîqîtire eger bigutrê le Hîndistan be radey edebiyat, ziman hene ke le edebiyat da pişkûtûn û gullyan kirdûwe. Willamî hawdillî nûseranî afirênerî Hîndistan be zor zimanan bo gîrugiriftî hawbeş û ezmûnî wekû yek bê emla û ewla rûn û aşkraye.

Sanskritî qise pêkirdin ew kaniyeye ke zimanekanî Ariyayî Hîndistan lewewe hellqyllîwin' beşî serekî wuşekan û sîstimî gerdan kirdinyan lew serçawe yewe dê. Tenanet zimananî Dravidiyayîş ke binaxeyekî be tewawî ciyawazî wuşerronanyan heye le biwarî wuşe û fonolojiyewe qerzdarî sanskrit in cige le rêzperrî zimanî Tamil nebê.

Le barî mêjîney serçawey edebiyewe be duway sanskrit da Tamil dê. Zimanî Urdu tenê xawenî mîratêkî nizîk pêncsed salleye. Hîndî şwênêkî hellkewtûy heye le qewarey sertaserî da wekû zimanî resmî yekêti Hîndistan û şeş dewlletekanî.

## Sanskritî

Sanskritî kon pêyi degutira Vedik yan sanskritî Vedik û zor pêçellpêçtir bû le şêwezarî duwatirî ew zimane, ke nêwî Sanskritî kilasîk bû. Zimanî Vedik be gorrani be sanskritî kilasîk hasantir bûwewe. Le sallanî 400-î ber le zayîn, rêzmannûs Panini şerhêkî zor be wurde rîşallî le ser sanskritî kilasîk nûsî, îdî ewe pêşî bewe girt zimanî edebî (zimanî nûsîn) allugorrî ziyatirî têda bikrê.

Sanskrit nweberayeti destkewti here gewrey zimananî Hîndu- Ariyayî deka. Egerçî lem rojgare da zor kem qisey pêdekrê, Sanskrit le qanûnî binçîneyî da wekû zimanêkî neteweyî pejrêndirawe.

Sanskrit kontirîn zimanî edebî Hîndistan û binçîney zorêk le zimane modêrnekani henûkey Hîndistane, le wane Hindi û Urdu. Şêwazî diyalêkitî here berayî ew zimane, wate Vedik, le layen ariyayiyekanewe qisey pêdekira. Sanskrit wekû zimanêkî zîndû nizîkey sallî 100-î ber le zayîn damirka û kip bû, bawekû eweş, her wek zimanî Latîn le Rrojawa, sanskrit berdewam bû ke zimanî derbar û şê'r û dirama bê. Her weha wek zimanêkî zanîn bû bo zanist, felsefe û deqe dîniyekan. Tenanet emrroş, hêndêk le zanayan le Hîndistan, be zimanî sanskrit ders dellênewe, qisey pêdeken û pêyî denûsn.

Sanskrit hellbijardeyekî dewllemendî danganî heye, egerçî le sanskritî Vedik hasantire, legell eweşda, sanskritî kilasîk zor le zimananî modêrrin pêçellpêçtîre. Ew zimane 10 wavêl û 4 dîftongî heye. Her weha 25 dengî konsonant û 4 şêwe wavêl, her weha dengî fîtû amal 'cige leme dû dengî henaseyî, û dengêkî nêwkepoşî heye.

Rrêzimanî Sanskrît zor alloz û pêçellpêçe. Bo nimûne naw û awellnaw sê cînsiyetyan heye (nêr, mê û bêlayan). Ewan be sê jimarey rêzimanî gerdan dekirên (tak, dûyî û ko). Ewan her weha xawen heşt doxin (bikerî, berkarî, amrazî, doxî berkarî bê nawgir, doxî berkarî dirawe pal, doxî xawenetî, doxî cêgirewe, doxî neda) sîstimî kirdarîş herwa pêçellpêçe.

Ew zimane, xawenî heşt doxî rêzimanî beşekanî axaftine (şêwazî gerdankirdinî naw, cênaw û awellnaw).

Her weha sê doxî "hejmarî" heye -- wate tak, ko û dûyî (doxêkî naw, awellnaw û kirdar katêk bo amaje be dû kes yan dûşit dekardekirdirê). Lew zimane da sîstimêkî girîngî çon nûsîn heye ke pêyî degutirê sandhî, ewîş eweye ke kotayî wuşe be pêy dengî dirawsê allugorrî be ser da dê.

## **Dravidiyayî**

Zimanekanî xuwarûy Hîndistan le binemalley zimane diravîdiyayiyekan pêk dên. Ew axêweraney be zimanekanî binemalley zimananî diravîdiyayî qise deken lew beşaney Hîndistanîş dejîn ke zimane bakûriyekan balla destin. Nizîk 250 mîlyon kes le xellkî Hîndistan be zimananî binemalley diravîdiyayî qise deken.

Zimananî binemalley diravîdiyayî bo xoyan desteyekî serbexon û be pêçewaney axawtinekanî Ariyayî, Awstirî yan Çînî û – Tîbetî, çi pêwendî û xizmayetiyen niye le derewey şêwe qarrey Hîndistan,

wate, Hîndistan, Pakistan û Bengaladêş. Binemalley zimananî diravîdiyayî dûwemîn destey here gewrey zimanan le Hîndistan, û %25 gişt le danîştûwanî Hîndistan qiseyan pêdeken. Le şêwe qarrey Hîndistan da em binemalley zimanane dekrê be ser sê lik da dabeş bikrên-

1. Likî Bakûrî le zimanî Brahui y pêk dê ke le Belûçistan qisey pê dekrê û zimananî Kuruhk û , Malto ke le Bengall û Orissa qiseyan pê dekrê.
2. Likî dûhem birîtiye le zimanî Telugu û jimareyek lehcey dîke ke le Nêwerrastî Hîndistan qiseyan pê dekirê.
3. Likî Başûrî le zimananî Tamil, Kannanda, Malayalama, Tulu, Badaga, Toda, Kota û Kodagu pêk dê.

Zimane here çawrakêşekanî destey binemalley diravîdiyayî birîtîn le:

1. Zimanî telugu, ke zimanî dewletî ye le Andhra Pradeş, û le barî jimarewe gewretirîn zimanî naw binemalley zimananî dravîdiyayî ye.
2. Tamil, zimanî dewletî ye le Tamil Nadu, be ruwallet kontirîn û pakitrîn likî zimananî binemalley Dravîdiyayî ye.
3. Kannanda (ke Çanarese şî pêdellên), zimanî dewletî ye le Karnataka, emêş zimanêkî kewnaray binemalley Dravîdiyayî ye ke serbexoyane pêş kewtûwe.
4. Malayalamî zimanî dewletî ye le Kerala, zimanî here piçûk û here kem temenî naw binemalley zimananî Dravîdiyayî ye.

Zimananî Dravîdiyayî desteyekî be tewawî ciyawazin le zimananî Hîndu-Urrûpayî, egerçî ewanîş zor wuşeyan le zimanî Sanskritewe xuwastûwetewe. Çuwar zimanî serekî naw binemalley zimananî Dravîdiyayî wate Tamil, Telugu, Kannanda û Malayalam çuwar le zimananî fermî Hîndistanin. Dravîdiyayiyekan belanî kemewe 4500 salle, le nawçeke jiyawin, û zimananî Dravîdiyayî mîjûyekî astekirawî (tomarkirawî) ziyatir le 2000 salliyen heye. Axêweranî zimane Dravîdiyayiyekan hest be yekêtiyekî kultûrî zor pitew le naw yektrî da deken.

### Zimanekanî Hîndû-Aryayî




Pisporranî ziman şwênî sê qonaxî serekiyan le pêşweçûnî zimananî Hîndu-Ariyayîda da hellgirtûwe. Qonaxî yekem zimanî Sanskrit bû. Xellkî koçerî danîştûy Bakûrî Rojawa le Bakûrî Hîndistan serubendêk ber le sallî 1000-î zayînî zimanî Sanskrityan bekar dehêna.

Le qonaxekey dîke da, zimanî Prakrit nizîkey sallî 250-î ber le zayîn le Sanskritewe zawe. Pali yekêkî dîke le zimanekanî ew serubende bû ke ewîş le Sanskritewe firçikî girt. Le nizîkey sallî 1000-î duway zayînewe, şêwezarekanî duwatirî Prakrit, ke hemû beyekewe be Apabhramşa nêwdêr dekran, zimane corbecore herêmiyekaniyan lê bû ke lem rojgare da dekar dekirên.

Zimane modêrrne serekiyekanî ke le şêwezare corbecorekanî herêmi Apabhramşa zawin birîtîn le Assamese, Bengali, Gucarati, Hindi, Keşmirî, Konkani, Marathi, Nepali, Oriya, Puncabi, Racastani, û Sindi . Ew zimanane le sallî 1000-î duway zayînewe destyan kird be serhellhênan û peyda bûn, be dem berewpêş çûn yanewe, destyan kird be wuşe xuwastînewe le Sanskrit û her weha zimanî Farsî ( yekêk le zimanekanî silsilekanî musulmanî Hîndistan). Ew zimananey Bakûrî Hîndistan êsta zimananî serekî herêmin , û her kamêkyan le layen çendîn mîlyon kesewe qiseyan pê dekrê.

Zimanî Nepal, ke xizmêkî nizîkî zimanî Hindi ye, zimanî neteweyî Nepal e. Bengali zimanî neteweyî Bengaladêş û her weha zimanî Rojaway Bengale le Hîndistan. Zimanî Hindiy modêrrin, ke le ser binemay lehcey Delhî hellnirawe bellam zor wuşeşî le Sanskrit xuwastûwetewe, zimanî zorbey xellke le Hîndistan. Zimanî destexuşikî Hindi, wate Urdu her heman rêzimanî heye bellam zor wuşey le Farsî û 'Errebiyewe xuwastûwetewe. Urdu zimanî neteweyî ye le Pakistan.

Zimane modêrrne Hind û – Ariyayiyekan cige le wuşey xuwazrawe le Farsî û 'Errebiyewe zor wuşeşyan le zimanî Inglîsî û zimananî dîkey Urrûpayiyewe xuwastûwetewe. Zimane modêrrine serekiyekanî ke le şêwezare corbecorekanî herêmi Apabhramşa kewtûnetewe birîtîn le Assamese, Bengalî, Gucarati, Hindi, Keşmîrî, Marathi, Oriya, Puncabi, Racastani, Urdu û Sindi.



\* **Asamî**, zimanêkî Hind û-Ariyayî û zimanî resmiye le wîlayetî (dwletî) Assam. Assamese le Sedey 13-î zayînî bemllyewe zimanêkî edebî pêş xistûwe.

\* **Bengalî**, yek le zimane serekiyekanî binemalley zimananî Hindu-Ariyayî û zimanî resmiye le Rojaway Bengall, nizîkey 200 mîlyon kes qisey pêdeken, zorbey ewan êsta le Bengaladêş wate Rojhe llatî Pakistanî pêşû dejîn. Em zimane êsta yekêk le here zimane pêşweçûwekanî Hîndistane.

\* **Gucarati**, yek le zimananî endamî binemalley Hindu-ariyayî û zimanî resmî wîlayetî Gucarate. Le

dewruberî sallî 1200 y duway zayînewe destî pêkird bewey ke bibê be zimanêkî serbexo.

\* **Hindî**, le barî jimarey axêweranewe gewretirîn zimanî nêw binemalley zimananî Hindu-Aryayî û zimanî resmî Hîndistane. Le nêw lehcecorbecorekanî Hindi da, ew lehceyey ke wekû Hindiy resmî hellbijêrdirawe standardî Khariboli ye, ke be rênûsî Devanagarî denûsrê. Hindi dû edebiyatî gewrey berhem hênawe, Urdu û Hîndiy (berz).

Herdûkyan 'eynî rêzimanyan heye û wuşe binçîneyiyekanyan wek yek waye. Ciyawaziyan le rênûs û dekar kirdinî wuşey beriztir daye. Zimanî Urdu be xetî allugorrkirawî Farsî û- 'Errebî denûsrê û bo nûsînî Hindi xetî Nagari bekar dehêndirê, şêwezarî Hindi lay pesndtîre wuşey petî Hindi bekar bihênê, be pêçewane le Urdu da jimareyekî zor wuşey xuwazrawey Farsî û 'Errebî hen.

\* **Keşmîrî**, zimanêke ser be destey binemalley Hindu-aryayî, zor car be helle dekuatrê ke zimanî dewlletî bê le Camû & Keşmir. Le katêkda le Camu & Keşmîr, Urdu zimanî dwilletiye. Edebiyatî keşmîri degerrêtewe bo sallanî 1200î duway zayîn. Be şêweyekî rêjeyî zimanêkî pêşweçûwe.

\* **Marathî**, ser be zimananî kolkey Hindu-Aryayî ye û le mellbendî Maharaştra zimanî resmiye. Egerçî şêwey edebî ew zimane tenê le sedey 13-î zayînewe dest pêdeka, bellam henûke edebiyatêkî tewaw pêşweçûy modêrrinî heye.

\* **Oriyayî**, zimanî fermî eyaletî Orissa ye. Reçellekî astekirawî (tomarkirawî) zimanî Oriya degerrêtewe Sedey Dehemî zayînî. Bellam kesayetî edebî ew zimane tenê le Sedey 14 hem bem layewe dest pêdeka.

\* **Puncabi**, yek le zimananî ser be binemalley Hindu-aryayî, û zimanî resmî eyaletî Puncabe. Puncab legell eweşda ke zimanêkî le mêjîne ye, tenê le Sedey Pazdehemewe bûwe be zimanêkî edebî. Em zimane be rênûsî Gurumukhi denûsrê.

\* **Racastanî**, likêk e le kolkey zimananî Hindu-Aryayî û zimanî resmî eyaletî Racastane.

\* **Sindi**, likêk e le binemalley zimananî Hindu- Ariyayî. Nizîkey 16 mîlyon kes qisey pêdeken, ke lewane 6 mîlyonyan le Sind (Pakistan), û ewanî dîke zorbeyan le Hîndistan dejîn. Bo nûsînî zimanî Sindi le Pakistan elfupêtkey allugorrkirawî Farsî û- 'Errebî dekar dekrê. Û axêweranî sindi le Hîndistan bo nûsînî zimanekeyan be şêwey serekî rênûsî Devanagar bekar dehênin.

\* **Urdu**, ke zimanî dewlletî ye le Camu & Keşmîr, le Hîndistan nizîkey 20 mîlyon kes qisey pêdeken.

Serçawe: Mallperrî [Indiansaga.info.com](http://Indiansaga.info.com)

## LÊKER (KAR) DI ZIMANÊ KURDÎ DE (3)

*Deham Ebdulfettah*

### BIRRÊ HEFTEM

- Navên ji karan tên Dariştin

(الاسماء المشتقة من الافعال)

**1 - Navê kara (karayî)**

- Ji karên Nederhingêv

- Ji karên Derhingêv

- Ji karên Lêkdayî

**2 - Navê Berkar (berkarî)**

**3 - Navê Jêderî**

- Jêder û Navên Jêderî

- Raweyên Navên Jêderî

**4 - Navê Cihî**

**5 - Navê Alavî**

**6 - Hinek Navên Giştî**

**1 - Navê kara ( اسم الفاعل )**

Di navbera (kara) û (navê kara) de cudayî heye. Ev cudayî ji hêla erk û watedariyê ve û ji hêla binesaziyê ve jî diyar dibe:

- Ji hêla erk û watedariyê ve, (kara) ew nav e, yan ew cînav e, yê ku qewimandina bûyerên karan pê ve girêdayî ye, anku ew bixwe kiryarê karan e, yê ku dibe sedema bûyîna wan.

Wek: - Mîrza hat

- Ew nameyê dinivîse

Lê (navê kara) ew nav e, yê ku di pêvajoya hevokê de, li gora cihê xwe, dikare bibe kara, berkarê rasteder, berkarê nerasteder û hevalnav jî.

Wek: - Bêjer dipeyive / kara /

- Ez bêjerekî dinasim / berkarê rasteder /

- Gotina bêjer rast bû / berkarê nerasteder /

- Ev mirovê bêjer rewanbêj e / hevalnav /

Ji hêla binesaziyê ve jî, dibe ku kara cînavêk be, yan navek, ji hemû cor û celebên navan be (xwerû, dariştî, lêkdayî, razber û heyber...).Lê (navê kara) pêdivî ye ku navekî ji jêdereke karan hatibe dariştin.

Navê kara ew nav e, yê ku wateya bûyerke qewimî bi xwe ve digire û destnîşan dike ku wî bixwe ew bûyer kiriye. Anku, ew nav e, yê ku pêjina kar û karayê wî karî (bi hev re) jê tê.

Wek: - Memo (rûniştî) ye.

Di vê mînakê de bêjeya (rûniştî) navê kara ye, ji karê (rûniştin - rûnişt) hatiye dariştin. Ji ber vê yekê pêjina bûyera karê (rûniştinê) jê te. Ji hêleka dî ve jî, ew bixwe (rûniştî) ye, ne kesekî dî ew daye rûniştin.

Navê kara ji karên nederhingêv (têneper) û yên derhingêv (têper) jî tên dariştin.

**1 - Ji Karên Nederhingêv:**

Navê kara ji karên nederhingêv bi van şeweyên jêrîn tê dariştin:

a - (Binyata karê borî + paşgira / î / = navê kara)

Nimûne:

<u>Jêder</u>	<u>Binyata Borî</u>	<u>Navê Kara</u>
- Daketin	daket	daketî
- Razan	raza	razayî
- Hatin	hat	hatî
- Çûn	çû	çûyî

- Ketin	ket	ketî
- Têkçûn	têkçû	têkçûyî
- Geriyan	geriya	geriyayî
- Zan	za	zayî
- Bûn	bû	bûyî
- Riziyân	riziya	riziyayî
- Reviyan / revîn	reviya	reviyayî
- Giriyan / girîn	giriya	giriyaî
- Keniyan / kenîn	keniya	keniyayî
- Firiyan / firîn	firiya	firiyayî
- Kişiyân / kişîn	kişiya	kişiyayî

- HD.....

**Berçav e ku hindek karên nederhingêv bi du forman bikar tên, wek (keniyan / kenîn, giriyan / girîn, geriyan / gerîn...). Navê kara jî, ji van karan bi du forman tê.**

**Wek:** - Keniyan: keniyayî

- Kenîn: kenîyî

- Giriyan: giriyaî

- Girîn: girîyî

- Geriyan: geriyayî

- Gerîn: gerîyî.

**Gelek caran tevhevî di navbera bilêvkirina karê boriya sergihayî û navê kara de peyda dibe, nemaze ku (î) ya dawîya navê kara (raket/î/) bi egera sivikbûnê dibe (i).**

**Wek:** - Karê borî: Zîn raketîye

- Navê kara: Zîn raketî / raketî -ye

**Ev tevhevî bi rastnivîs û rastxwendinê baş zelal dibe.**

- Di rastnivîsa wan her du mînakên me de, gerek (ye) bi karê borî ve bê nivîsîn: (Zîn raketîye).

- Paşgira (î) ya dawîya navê kara wekî xwe (bê sivikbûn) dimîne û (ye) jê cuda dibe. Li vê gorê, gerek ew mînak wisan bînin nivîsîn û li gora vê nivîsînê jî bêne xwendin:

Karê borî: - Zîn raketîye

Navê kara: - Zîn raketî ye

**b** - Navê kara ji hinek karên nederhingêv, bi alîkariya paşgira (ok) jî pêk tê. Ev forma navê kara ji binyata jêderî (ya ku ji karê dema nuha tê wergirtin) û paşgira (ok) saz dibe:

- (Binyata nuha<sup>58</sup>) + paşgira / ok / = navê kara)

**Nimûne:**

<u>Jêder</u>	<u>Nuha</u>	<u>Binyat</u>	<u>Navê kara</u>
--------------	-------------	---------------	------------------

- Revîn	direve	rev	revok
---------	--------	-----	-------

- Kenîn	dikene	ken	kenok
---------	--------	-----	-------

- Gerîn	digere	ger	gerok
---------	--------	-----	-------

- Tirsîn	ditirse	tirs	tirsok
----------	---------	------	--------

- Firîn	difire	fir	firok
---------	--------	-----	-------

- Qehirîn	dîqehire	qehir	qehirok
-----------	----------	-------	---------

- Girîn	digirî	girî	giryok
---------	--------	------	--------

- Xişîn	dixişe	xiş	xişok
---------	--------	-----	-------

(Mar canewerekî xişok e)

- Kelîn	dikele	kel	kelok
---------	--------	-----	-------

- Xeyidîn	dixeyide	xeyid	xeyidok
-----------	----------	-------	---------

- Gindirîn	digindire	gindir	gindirok
------------	-----------	--------	----------

- Qirçîn	dîqirçe	qirç	qirçok
----------	---------	------	--------

- Qurifîn	dîqurife	qurif	qurifok
-----------	----------	-------	---------

- Kizirîn	dîkizire	kizir	kizirok
-----------	----------	-------	---------

- Bezîn	dibeze	bez	bezok
---------	--------	-----	-------

- Zîvirîn	dîzîvire	zîvir	zîvirok
-----------	----------	-------	---------

- Biriqîn	dîbiriqe	biriq	biriqok
-----------	----------	-------	---------

- HD.....

c - Navê kara ji hin karên nederhingêv, ên ku dengên giyanber û tiştan dinimînin pêk tê. Ev celebê navê kara ji dubarekirina binyata jêderî û paşgira (ok) saz dibe:

- (Binyata dubare + paşgira / ok / = navê kara)

**Nimûne:**

<u>Jêder</u>	<u>Nuha</u>	<u>Binyat</u>	<u>Navê kara</u>
--------------	-------------	---------------	------------------

- Qîjîn	dîqîje	qîj	qîj - qîjok
---------	--------	-----	-------------

<sup>58</sup> - Hindek şarezayên zimên binyata jêderî, ji dema nuha distînin, hindek jî, ji raweya fermanî. Her du şewaz jî durist in û her du jî wek hev in :

- Revîn : - Direve = di + rev + e = ...rev... = rev (nuha)

- Bireve = bi + rev + e = ...rev... = rev (fermanî).



- Leqîn	dileqe	leq	leq - leqok
- Teqîn	diteqe	teq	teq - teqok
- Firîn	difire	fir	fir - firok
- Çûzîn	diçûze	çûz	çûz - çûzok
- Kazîn	dikaze	kaz	kaz - kazok
- Nûzîn	dinûze	nûz	nûz - nûzok

- HD.....

Helbet, navê kara ji karên nederhingêv, ên dariştî û lêkdayî jî saz dibe.

Wek: - Rabûn = rabûyî

- Rawestan = rawestayî (rawestiyayî)

- Derketin = derketî

- Jihevbûn = jihevbûyî

- Dahatin = dahatî

- Sorbûn = sorbûyî

- Lihevhatin = lihevhatî

- Lihevketin = lihevketî

-HD.....

## 2 - Ji Karên Derhingêv (têper):

Wekî ku navê kara ji karên nederhingêv tên dariştin, ji karên derhingêv jî bi çend şewazan tên dariştin:

a - Ji binyata dema nuha, ya jêderên hindê karên derhingêv û paşgira (er) tê dariştin:

- (Binyata nuha + paşgira / er / = navê kara)

Nimûne:

<u>Jêder</u>	<u>Nuha</u>	<u>Binyat</u>	<u>Navê kara</u>
- Gotin	dibêje	bêj	bêjer
- Kuştin	dikuje	kuj	kujer
- Dîtin	dibîne	bîn	bîner
- Xwendin	dixwîne	xwîn	xwîner
-(Xwêndin	dixwêne	xwên	xwêner)
- Nivîsîn	dinivîse	nivîs	nivîser
- Firotin	difiroşe	firoş	firoşer

- Parastin diparêze parêz parêzer

- Givaştin digivêşe givêş gifêşer

-HD.....

Hindek karên derhingêv ên xwerû nakevin ber rêzan û destûra jorîn û navê kara bi wê pîvanê ji wan nayê dariştin, mîna van karan:

1 - Hemû karên derhingêvên xwerû, yên ku binyata karê dema nuha ji tîpekê tenê be, paşgira (er) nagihêje wan û navê kara ji wan saz nabe.

Wek:

<u>Jêder</u>	<u>Nuha</u>	<u>Binyat</u>	<u>Navê kara</u>
- Kirin	dike	...k...	.....
- Birin	dibe	...b...	.....
- Xistin	dixe	...x...	.....
- Dan	dide	...d...	.....

- HD.....

2 - Karên derhingêv, ên xwerû ku tîpa dawîya binyata nuha di wan de (r) be, paşgira (er) nagihêje wan û navê kara ji wan nayê dariştin.

Wek:

<u>Jêder</u>	<u>Nuha</u>	<u>Binyat</u>	<u>Navê kara</u>
- Birrîn	dibirre	birr	.....
- Girtin	digire	gir	.....
- Kirrîn	dikirre	kirr	.....

Navê kara bi şêweyekî dîtir, ji van karan pêk tê.

b - Ji karên derhingêv ên dariştî û lêkdayî jî navê kara saz dibe. Ev navê kara ji binyata nuha û paşgira (er) pêk tê.

- (Binyata nuha + paşgira / er / = navê kara)

Wek:

<u>Jêder</u>	<u>Nuha</u>	<u>Binyat</u>	<u>Navê kara</u>
- Damezrandin	dadimezirîne	damezirîn	damezirîner
- Rahînan		radihîne	rahîn rahîner
- Raxistin	radixe <sup>(59)</sup>	rax	raxer

<sup>59</sup> - Li hin herêman, li şûna (radixe) şêweyê (diraxe) bikar tê, wek (dirabe) li şûna (radibe).

- Lêxistin                    lêdixe            lêx            lêxer
- Lêkirin            lêdike            lêk            lêker
- Karkirin            kar-dike            kar-..k..            karker
- Afirandin            diafirîne            afirîn            afirîner
- Rastkirin            rast-dike            rast-...k...            rastker
- Pêkirin            pê-dike            pê-...k...            pêker
- Vexepirandin            vedixepirîne            vexepirîn            vexepirîner
- Têkoşîn            têdikoşe            têkoş            têkoşer
- Fêrkirin            fêr dike            fêr -...k...            fêrker
- Peyambirin            peyamê-dibe            peyam-..b..            peyamber  
(Peyxambirin            peyxam-dibe            peyxam-.b.            peyxamber)
- Lêkolîn            lêdikole            lêkol            lêkoler
- Temaşekirin            temaşe-dike            temaşe-..k            temaşeker
- HD.....

c - Navê kara ji hin karên derhingêv, (ên xwerû û nexwerû) bi alîkariya paşgira /ek / jî pêk tê:

- (Binyata dema nuha + paşgira/ ek/ = navê kara)

Wek:

<u>Jêder</u>	<u>Nuha</u>	<u>Binyat</u>	<u>Navê kara</u>
- Dizîn	didize	diz	dizek
- Gerrandin	digerrîne		gerrîn            gerrînek
- Badan		ba-dide	ba-....d...            badek
- Birrîn	dibirre	birr	birrek <sup>(60)</sup>
- Dirrandin	didirrîne	dirrîn	dirrînek

-HD.....

ç - Navê kara ji binyata nuha, ya hindex karên derhingêv û paşgira / ok / jî saz dibe:

Wek:

<u>Jêder</u>	<u>Nuha</u>	<u>Binyat</u>	<u>Navê kara</u>
- Xapandin	dixapîne	xapîn	xapînok

Paşgira / ok / bi binyata karê borî re jî navê kara pêk tîne:

<u>Jêder</u>	<u>Binyata Borî</u>	<u>Navê kara</u>
--------------	---------------------	------------------

<sup>60</sup> - Badek, birrek : Ev her du bêje navê kara ne, lê ji hêla wate û bikaranînê navên alav in.

- Bihîstin                      bihîst                      bihîstok
- Kirin    kir    kirok <sup>(61)</sup>
- Kuştin                      kuşt                      kuştok / kujer
- Veşartin                      veşart                      veşartok

d - Navê kara ji binyata dema nuha, ya hindek

karên (derhingêv û nederhingêv) bi alîkariya alava neyînê (ne) jî pêk tê.

Wek:

<u>Jêder</u>	<u>Nuha</u>	<u>Binyat</u>	<u>Navê kara</u>
- Mirin	dimire	mir	nemir
- Bezîn	dibeze	bez	nebez
- Zanîn	dizane	zan	nezan

- HD.....

### 3 - Ji Karên Lêkdayî (nav + kar):

Navê asayî (normal) û binyata jêderê (nuha), her du bi hev re navê kara saz dikin:

- (Nav +binyata nuha = navê kara).

Wek:

<u>Jêder</u>	<u>Nuha</u>	<u>Binyat</u>	<u>Navê kara</u>
- Geriyan	digere	ger	(şev) + ger = şevger
- Kuştin	dikuje	kuj	(mêr) + kuj = mêrkuj
- Revandin	direvîne	revîn	(xew) + revîn = xewrevîn

-HD.....

Li vê gorê em karin jêderên karên lêkdayî (ji nav û karan) navê kara (yê ku ji wan tê dariştin), bi vî şêwazî kurtebirr bikin:

<u>Jêderên Lêkdayî</u>	<u>Navê Kara</u>
- Mêrkuştin	mêrkuj
- Şevgeriyan	şevger
- Xewrevandin	xewrevîn
- Rojîgirtin	rojîgir
- Nimêjkirin	nimêjker <sup>(62)</sup>

<sup>61</sup> - Cegerxwîn peyva / kirok / (di rêzimana xwe de bi wateya / navê kara / aniye, anku ji / kirinê / kesê ku dike ).

<sup>62</sup> - (Nimêjker = nimêj + / k / ya binyat + paşgira / er / ).

- (Bilêvker = bilêv + / k / ya binyat + paşgira / er / ).

- Paşgirtin		paşgir
- Bilêvkerin		bilêvker
- Xwînmêtin	xwînmij / xwînmêj	
- Darberrîn		darberr
- Xemcivandin	xemcivîn	
- Dilrevandin	dilrevîn	
- Mazîçinîn		mazîçin
- Gulfirotin / gulfiroştin	gulfiroş	
- Cildirûtin / cildirûn		cildirû
- Baweşandin		baweşîn
- Avrijandin		avrijîn
- Karsipartin		karsipêr
- Axkişandin		axkişîn
- Goştbiraştin		goştbirêj
- Nanpatin / pehtin		nanpêj
- Masîgirtin		masîgir

-HD.....

- Navê kara ji hindek karên lêkdayî bi du şêwazan saz dibe û bi her du şêwazan jî bikar tê:

1 - Ji binyata nuha û paşgira (er).

Wek:

- Birêvebirin: birêve -dibe, birêve-...b..., birêveber.

2 - Ji binyata karê borî:

Wek:

- Birêvebirin: birêve - bir, birêvebir

- Ji bilî wan şêwazên çûyî, yên ku navê kara li gora wan tê saz kirin, hindek kar di zimanê me de hene, navê kara ji her yekê ji wan bi taybetmendiyekê pêk tê.

Wek:

### Jêder

- Goştxwarin

- Xwarin

- Hesinkutan

### navê kara

goştxwer / goştخور

xwere / xure (pir dixwe)

hesinkut



<u>Jêder</u>	<u>Binyata borî</u>	<u>Navê Berkar</u>
- Kuştin	kuşt	kuştî
- Raxistin	raxist	raxistî
- Çandin	çand	çandî

H D.....

**Berkar** û navê berkar ji hev cuda ne. Em dikarin wê cudahiye di van xalên jêrîn de bipelînin:

- Ji hêla binesaziyê ve, berkar dibe ku navek ji her celebê navan be (pendî, nependî, dariştî, nedariştî, bernas, giştî....) yan cînav be.

Wek:

- Min pirtûk da Zînê
- Ez te dinasim
- Kê girtiyên zindanan berdan ?

**Lê** navê berkar navekî dariştî ye, ji karên derhingêv û paşgira / î / tenê saz dibe.

- Ji hêla erk û rolê ve jî, berkar ew nav e (yan cînav e) yê ku bûyera karê derhingêv lê dibe. Lê navê berkar di reseniya erkê xwe de, hevalnav (rengdêr) e. Hindek caran navê rewşdar <sup>(63)</sup> ji hevokê tê avêtin û hevalnavê wî cihê wî digire.

Wek:

- 1 - Mirovekî girtî hat berdan  
(Girtiyek hat berdan)
- 2 - Min mirovekî girtî xelat kir  
(Min girtiyek xelat kir)

**Di** hevoka yekê de navê (mirovekî) kara ye. Dema ku ev nav hat avêtin hevalnavê wî (girtî) li şûna wî bûye kara. Di hevoka duwê de jî, navê (mirovekî) berkar e. Dema ew jî hat avêtin hevalnavê wî jî (girtî) li cihê wî bûye berkar.

**Me** berî nuha gotibû, ku corek ji (navê kara) weku (navê berkar) bi alîkariya paşgira / î / saz dibe. Ev / î / li dawiya wan her du navan tê nivîsîn. Wek (Azad ketî ye) û (Azad girtî ye). Gelek caran bi egera vê / î / yê, tevheviyek di navbera (navê kara) û (navê berkar) de peyda dibe. Bo zelalkirina vê kêşeyê, gerek em di bîra xwe de bînin, ku navê kara ji binyata borî, ya karê nederhingêv û paşgira / î / saz dibe.

<sup>63</sup> - Navê rewşdar ew nav e, yê ku hevalnav (rengdêr) pê ve girêdayî ye û rewşa wî diyar dike. Wek : (Gula sor, dergehê girtî).

Wek:

- Azad ketî ye
- Baran bariyayî ye.

Lê navê berkar ji binyata borî, ya karê derhingêv û paşgira / î / saz dibe.

Wek:

- Azad girtî ye
- Berx serjêkirî ye.

Li gora vê pîvanê jî, em dikarin (navê kara) û (navê berkar) di pêvajoya guhertina yek hevokê de ji hev binasin. Wek:

- 1 - Çavên mirîşka Fatê rijiyane  
(Çavên mirîşka Fatê rijiyayî ne) / navê kara /
- 2 - Fatê çavên mirîşka xwe rijandine  
(Çavên mirîşka Fatê rijandî ne / navê berkar/

Bi wê rêpîvana dariştina navê berkar, ku ji binyata dema borî, ya karên derhingêv û paşgira / î / durist dibe. Ew nav ji her sê corên karên derhingêv (xwerû, dariştî, û lêkdayî) pêk tê.

**Nimûne:**

**1 - Karên Xwerû:**

<u>Jêder</u>	<u>Binyata Borî</u>	<u>Navê Berkar</u>
- Şandin	şand	şandî
- Xistin	xist	xistî
- Bihîstin	bihîst	bihîstî
- Çandin	çand	çandî
- Sotin	sot	sotî
- Çinîn	çinî	çinîyî
- Dotin	dot	dotî
- Firotin	firost	firostî
- Guhestin	guhest	guhestî
- Kuştin	kuşt	kuştî
- HD.....		

**2 - Karên Dariştî :**

<u>Jêder</u>	<u>Binyata Borî</u>	<u>Navê Berkar</u>
--------------	---------------------	--------------------



- Ragirtin	ragirt	ragirtî
-Rakirin	rakir	rakirî
-Daxistin	daxist	daxistî
-Vekirin	vekir	vekirî
-Vedan	veda	vedayî
-Dahîştin	dahîşt	dahîştî
-Rûkirin	rûkir	rûkirî
-Rûdan	rûda	rûdayî
-Kîşandin	kîşand	kîşandî
- HD.....		

### 3 - Karên Lêkdayî:

<u>Jêder</u>	<u>Binyata Borî</u>	<u>Navê Berkar</u>
-Pêxistin	pêxist	pêxistî
-Têdan	têda	têdayî
-Têvedan	têveda	têvedayî
-Sorkirin	sor- kir	sorkirî
-Binpêkirin	binpêkir	binpêkirî
-Çavşikandin	çav-şikand	çavşikandî
-Destjêkirin	destjêkir	destjêkirî
-Rastkirin	rastkir	rastkirî
-Pêvedan	pêveda	pêvedayî
-Avdan	avda	avdayî
- HD.....		

Diyar e, ku ji hêla wateyê ve, navê berkar têgeha raweya karê nediyar (nepenî) berçav dike.

Wek: 1 - Şêro bexê xwe serjêkiriye

2 - Bexê Şêro hatiye serjêkirin

3 - Bexê Şêro serjêkirî ye .

Bi wê pîvanê jî em dikarin bibêjin:

- Hatiye kuştin = kuştî ye
- Hatiye revandin = revandî ye
- Hat belavkirin = belavkirî ye.

- HD.....

Lê ji hêla teşe û ruxsarê ve, berçav e, ku raweya her du mijaran (navê kara û navê berkar) bi paşgira /î / yê dihengivin hev, lê:

- Navê kara ji karên nederhingêv saz dibe / reviyayî /
- Navê berkar ji karên derhingêv saz dibe / revandî /

### 3 - Navê Jêderî (اسم المصدر)

Navê jêderî, navekî dariştî û razber e (manewî ye), wateya jêderê bi xwe ve digire. Anku, têgeha rûdaneke bêdem bi xwe ve digire. Di zimanê Kurdî de du corên navên jêderî hene:

1 - Navên jêderî, yên ku ji jêderên karan tên dariştin.

Wek:

<u>Jêder</u>	<u>Navê Jêderî</u>
- Xebitîn	xebat
-Lezîn	lez
-Kenîn	ken
-Nivîsîn	nivîs
-Gerîn	ger
-Revîn	rev
- HD.....	

2 - Navên jêderî yên ku ji nav û hevalnavan bi alîkariya paşgiran tên sazkin.

Wek:

<u>Navê Asayî</u>	<u>Navê Jêderî</u>
-Mirov	mirovayetî
-Mela	melayetî
-Şêx	şêxîtî
-Bira	birayetî
-Kurd	kurdîtî / kurdayetî
-Bav	bavitî
-Dost	dostayetî / dostanî
- HD.....	

Ji hevalnav û paşgiran jî navên jêderî tên dariştin.

Wek:

<u>Hevalnav</u>	<u>Navê Jêderî</u>
-----------------	--------------------

-Dirêj	dirêjahî / dirêjayî
-Kurt	kurtasî / kurtahî
-Bilind	bilindayî / bilindî
-Reş	reşayî
-Pak	pakitî / pakî
-Nizim	nizmayî / nizmî
- HD.....	

**Digel** ku ev navên jêderî, yên ku ji nav û hevalnavan pêk hatine, ne ji jêderên karan hatine dariştin jî, lê ji ber ku têgeha wan jêderan bi xwe ve digirin, navlêkirina (navên jêderî) li wan jî bûye.

Nimûne:

- Mirovayetî: Rûdan û rweştên ku bi jiyana mirovan ve girêdayî ne (mirovbûn).
- Melayetî: Kar û barên ku bi rewiştên mela û melatîyê ve girêdayî ne.
- Şêxîti: Erk û pêdiviyên kar û tevgera Şêxan.
- Birayetî: Bûyer û têtikîyên di nav birayan de.
- Kurdayetî: Sinc û rewiştên kurdewariyê (kurdubûn).
- Dirêjahî: Dirêjbûn (şêweyê dirêjbûnê)
- Kurtîti: Kurtbûn.
- Bilindayî: Bilindbûn
- Reşayî: Reşbûn
- Kesayetî: Kesbûn (<sup>64</sup>).
- HD.....

Ji ber ku ev navên jêderî ne ji jêderên karan têne dariştin, ew ne ji mijara me ne û em zêdetirî vê danasîna jorîn, xwe nêzî wan nakin.

### **Jêder û Navên Jêderî:**

**Beriya** nuha me gotibû, ku navên jêderî, yên ji jêderên karan tên dariştin wateya jêderên xwe didin û weku wan jî navînî razber in (manewî ne).Lê navên jêderî û jêder di van xalên jêrîn de ji hev cuda dibin:

- 1 - Jêder makdera hemû corên karan e, navên kara û berkaran jî, jê têne dariştin.  
Navê jêderî ji jêderan tê dariştin, lê tiştê jê nayê dariştin.
- 2 - Jêderên karan teşeyên (ruxsarên) xwe li gora

<sup>64</sup> - Dr. Elî Ruxzadî : Awa û destûrî Zebanî Kurdî. Tehran. (1379 ) koçî - Hetavî. Rû. / 118 /. (Bi Zimanê Farisî - Kurdî ).

rêzan û destûrine destnîşankirî werdigirin. Dawiya hemû jêderên karan bi nîşandeka jêderî / in / yan jî / n / kuta dibin, wek (xwendin, hatin, dan, bezîn, rabûn.....).

- Navên jêderî bêyî rêzan û destûr formên xwe wergirtine. Anku, bê pîvan û li gora ku hatine bihîstin têne nasîn. Bo vê çendê jî, her hijmarek ji navên jêderî, bi şêweyekî cuda ji jêderên xwe tên dariştin.

3 - Jêder wateya karan bi xwe ve digire û ji hêla ruxsarê ve jî, raweya karê borî di kombêjîyê de û raweya jêderên wan karan, wekî hev tên dîtin.

Wek:

- Zarokan sêv xwarin (kar)
- Xwarin bo her kesî pêwîst e (jêder)
- Min pirtûkên xwe dan Zînê (kar)
- Bersiva xwestinê dan e (jêder)

- Hin navên jêderî û jêderên wan bi yek formê tên, û hin jî bi formine taybet berçav dibin.

4- jêder têgeha bûyereke bê dem bi xwe ve digire.

Wek: Şewitîn, bezîn, giriyan, kenîn...

- Navê jêderî darêjeke bê bûyer û bê dem e.

Wek:

Şewat, bez, ger, ken....

### **Raweyên Navên Jêderî**

Navên jêderî, yên ku ji jêderên karan tên dariştin, ne bi pîvan û rêbazeke destûrî pêk tên. Ev nav bi rêbihîstinê raweyên xwe yên core - cor wergirtine:

a - Beşek ji navên jêderî li gora binyata jêderên xwe (binyata nuha) tên destnîşankirin. Anku, raweya binyata karê dema nuha û raweya wan navên jêderî, wekî hev (bi yek formê) berçav dibin.

Nimûne:

#### **Jêder   Dema Nuha   Binyata Nuha   Navê Jêderî**

- Bezîn	dibeze	...bez.....	bez
- Revîn	direve	...rev.....	rev
- Tirsîn	ditirse	...tirs.....	tirs
- Pirsîn	dipirse	...pirs...	pirs
- Kuxîn	dikuxe	...kux...	kux / kuxik
- Livîn	dilive	...liv.....	liv

- Geriyan digere	...ger...	ger
- Xuriyan <sup>(65)</sup> dixure	...xur...	xur
- Xemilîn dixemile	...xemil....	xemil
- Hejîn diheje	...hej...	hej
- Lerizîn dilerize	...leriz...	leriz / lerz
- Tevizîn ditevize	...teviz...	teviz / teviz
- Peyivîn dipeyive	...peyv...	peyiv / peyv
- Meşîn dimeşe	...meş...	meş
- Girîn digirî	...girî...	girî
- Şûştin dişo	...şo...	şo
- Kelîn dikele	...kel...	kel
- Kenîn dikene	...ken...	ken
- Parastin diparêze	...parêz..	parêz
- Nivîsîn dinivîse	...nivîs..	nivîs
- Firîn difire	...fir...	fir
- Xeyidîn dixeyide	...xeyd/ xeyid..	xeyd
- Xapîn dixape	...xap...	xap

- HD.....

b - Hindek navên jêderî jî, raweya xwe ne li gora binyata jêderên xwe, yên dema nuha wergirtine. Anku, binyata nuha bi ruxsarekê hatiye û navê jêderî bi ruxsareke dîtir hatiye.

Nimûne:

**Jêder   Dema Nuha   Binyata Nuha   Navê Jêderî**

- Şewitîn dişewite	...şewit...	şewat
- Xebitîn dixebite	...xebit...	xebat
- Verişîn vedireşe	...veriş...	verişî
- Dizîn didize	...diz...	dizî

- HD.....

Berçav e ku ev her du navên jêderî (verişî, dizî), yên ku di mînakên me de, weku binyata karê borî ji jêderên xwe (verişîn, dizîn) hatine:

**Jêder   Binyata Borî   Navê Jêderî**

<sup>65</sup> - Hindek jêderên karan bi du şeweyan bilêv dibin, wek (xuriyan - xurîn, geriyan - gerîn, hejiyan - hejîn, giriyan - girîn, keniyan - kenîn, liviyan - livîn.... ).

- Verişîn verişî verişî

- Dizîn dizî dizî

Bi dîtina min, ev jî lihevhatinek e, ne ku li gora pîvaneke rêzimanî hatiye pê.

- Di pêvajoya vê mijara me de pirseke giring raberî me radiweste. Ew jî ev e: Navên jêderî ji pîrraniya jêderên zimanê me, li ber çavan xuya nabin. Gelo ew jêder bê navên jêderî ne, anku navên jêderî ji wan nayên dariştin ?!

Kesekî ji şarezayên zimanê Kurdî xwe nêzî vê pirsê nekiriye. Dibe ku hindekan ev pirs, di pirtûkên rêzimanî de kiribe û bersiva wê jî, bi şêwekî ji şêweyan, hatibe dayîn, lê min bixwe nedîtiye.

Navên jêderî ji gelek jêderên karan berçav nebûne wek Nimûne: (Avdan, berdan, kolan, lêkirin, çêkirin, jêbirin, xwarin, vexwarin, xistin, raxistin, hîştin, birin, dahîştin, biraştin, birrîn, kirrîn, ristin, rahatin, rijandin, ponijîn, girtin, mirin.....).

Em pîrsa xwe dupat dikin, gelo navên jêderî ji van jêderan û yên wekî wan hene yan na ???

Eger hebin, gelo bi çi raweyê tên û çawa... ?!

Di danasîna jêderan de me gotibû ku jêder ew bêje ye ya ku bûyereke bêdem berçav dike. Ev jî tê wê wateyê ku jêder bûyerek e, qewimandina rûdanekê ye. Li vê gorê, jîrbêjî (mentiq) dixwaze, ku her bûyerek navek jê re hebe, ji ber ku navê jêderî, navê bûyera jêderê ye.

Bi dîtina û baweriya min, ev ruxsara (forma) jêderan, di heman dem de, ruxsara navê jêderî ye jî. Anku, raweya navên jêderî û raweya jêderên wan, herî yek in. Ev jî ew formên ku jêder bi wan tên xebitandin.

Wek:

<u>Jêder</u>	<u>Navê Jêderî</u>
- Avdan	avdan
- Kolan	kolan
- Girtin	girtin
- Berdan	berdan
- Lêkirin	lêkirin
- Kuştin	kuştin
- Revandin	revandin
- HD.....	

Vêca, ku hinek navên jêderî û jêderên wan, bi yek formê bîna xebitandin (wek mînakên jorîn), ka em ê çawa her du raweyan (ya navên jêderî û ya jêderên wan) ji hev binasin ?!

Digel ku jêder û navê jêderî, her du navînî razber in (manewî ne) jî, lê dîsan her du nav ji hev cuda ne:

1 - Jêder bûyereke bê dem destnîşan dike.

Wek:

- Avdana daran wan geş dike

- Xwarina sêvan mufa ye.

2 - Navê jêderî navê bûyera wê jêderê ye.

Wek:

- Bi avdanekê tenê dar geş nabin

- Sêv xwarineke sivik e

Bi vê têgehê, her jêderê bûyereke, yan bizavekê bi xwe ve digire, weku wan mînakên / 1 / ê. Her bûyereke, an bizavekê jî bi navekî tê nasîn, weku mînakên / 2 / ê. Ji bilî van her du wateyan, forma hin jêderan, wek (xwarin) wateya navekî heyber (madî) jî bi xwe ve digire, Wek:

- Ev xwarin kelê (bê xwê) ye.

- Vê xwarina sar germ bike

Raweyên navên jêderî ne li gora rêzaneke, yan jî bi pîvaneke formên xwe werdigirin. Hin ji wan bi formên jêderên xwe tên dîtîn û hin jî bi formên taybet, dûrî formên jêderên xwe tên dîtîn.

Nimûne:

<u>Jêder</u>	<u>Karê Nuha</u>	<u>Navê Jêderî</u>
- Bezîn	ew dibeze	ew ê <u>beza</u> xwe bike
- Kenîn	ez dikenim	ez <u>kenê</u> xwe dikim
- Xwendin	tu dixwînî	<u>xwendina</u> xwe bernede
- Ketin	ez dikevim	ez bi wê <u>ketinê</u> êşiyam
- Cemidîn	tu cemidî	<u>cemed</u> bo te ne baş e
- Razan	ew pir radize	<u>razana</u> pir, nexweşî ye
- Lêgerîn	tu li çi digerî?	<u>lêgera</u> te bêsûd e
- Pîvan	ez zeviyê dipîvim	<u>pîvana</u> min bi gavan e
- Meşîn	va em demeşin	<u>meşa</u> me giran e.
- HD.....		

Di van mînakên jorîn de, du formên navên jêderî berçav dibin:

1 - Forma taybet, weku navên (bez, ken, cemed, lêger, meş), ku ji jêderên (bezîn, kenîn, cemidîn, lêgerîn, meşîn) hatine dariştin.

2 - Forma hevbeş, ku navên jêderî û jêderên wan bi yek ruxsarê ne, (xwendin, ketin, razan, pîvan). Ev ruxsar, di heman dem de, forma jêderên wan in jî.

Di forma / 2 / ê de jêder û navê jêderî, bi sanahî ji hev nayên nasîn û gelek caran li şûna hev jî tên xebitandin. Bo vê yekê jî, gelek şarezayên zimên guman dikin ku navên jêderî ji vî corê jêderan nîn in.

– Diyar e, ku corekî dîtir, ji raweyên navên jêderî li herêma Behdînan bikar tê. Ev rawe ji binyata karê dema borî û paşgira / ar / saz dibe.

Seyda Sadiq Behadîne Amêdî amaje bi wê raweyê kiriye<sup>(66)</sup> û ev mînak di ber çavan re derbas kirine:

- Kuştin - kuşt - kuştar (komkujî)

- Gotin - got - gotar

Lê ku dawîya binyatê tîpa / î / be, navê jêderî bi / yar / kuta dibe (li gora gotina Seyda Amêdî):

- Birrîn - birrî - biriyar

- Dizîn - dizî - diziyar (dizî)

- Pirsîn - pirsî - pirsiyar (pirs)

- Zanîn - zanî - zaniyar (zanyaî / zanist)

- Revîn - revî - reviyar (rev)

- Kenîn - kenî - keniyar (ken)

- Kirin - kirî - kirar

Seyda **Amêdî** pê de diçe û dibêje, bi alîkariya paşgira / e / jî navên jêderî pêk tên.

Wek:

- Heriftin - herift - herifte

- Lerizîn - lerizî - lerze

- HD.....

**Bi** qasî ku ez zanim, ev mînakên Seydayê me, Amêdî li herêma me û li Bakur jî bikar nayên. Tenê ev her sê bêjeyên ha (gotar, biriyar, pirsiyar) van salên dawî ketine rojeva xebitandinê. Ew jî, ji Başûr derbasî bikaranîna me bûne. Hindek ji wan mînakên, ji çarçewa navên jêderî derketine jî. Wek:

- Kirar: Li nik Celadet Bedirxan, beranberî kara ye. Anku, ji (kirinê) kesê ku dike û weku têrm (zarave), li şûna (kara, kirde, kiryar), anku (fail - فاعل)

bikar tê.

- Diziyar: Yarê dizan, kesê ku dizan diparêze. Lê navê jêderî ji (dizîn) dizî ye.

<sup>66</sup> - Sadiq Behadîne Amêdî : Rêzimana Kurdî - Bexda (1987). Rû. (402 - 403).



- Zanyar: Xwedî zanîn, kesê pir zana.
- Keniyar: Xwedan ken, kenok, pirken.
- Reviyar: Revok, revoke .

Ev raweya ku ji (binyata dema borî + yar) saz dibe, li nik me bi wateya navê jêderî, bikar nayê.

**Mamoste Samî Tan** di pirtûka xwe de dibêje: (paşgira / î / û / andin / ji nav û rengdêran lêkeran (karan) çêdikin. / î / lêkerên negerguhêz çêdike û / andin / lêkerên gerguhêz çêdike:

- Rev - revîn - revandin
- Bez - bezîn - bezandin
- Êş - êşîn - êşandin
- Kel - kelîn - kelandin
- Cemed - cemedîn - cemedandin
- Xap - xapîn - xapandin <sup>(67)</sup>

Beriya Samî Tan jî Seyda Feqî Huseyn Sagniç û Mamoste Murad Ciwan jî ev mijar, di pirtûkên xwe de, bi vê baweriya Samî Tan şirove kiriye <sup>(68)</sup>.

Bi dîtina van şarezayan ev nav (rev, bez, êş, kel, cemed û xap) navinê asayî ne, xweser in, bi alîkariya paşgira / î / karên nederhingêv saz dikin.

Wek:

- Rev + î = revîn
- Bez + î = bezîn
- HD.....

Paşgira / andin / jî digihêje wan navan û karinê derhingêv ji wan saz dike:

- Rev + andin = revandin
- Bez + andin = bezandin
- HD.....

**Derbarî vê şirovekirina wan biraderan dixwazim bibêjim:**

a - Ev nav (rev, bez, êş, kel, cemed, xap..) ne navinê asayî û normal in, wek (derd, xem, hiş, av, nan.....). Ev nav ji jêderên karan hatine dariştin. Ev nav di reseniya xwe de, weku navên jêderî û binyatên dema nuha ne, ji jêderên xwe yê resen hatine dariştin.

Nimûne:

**Jêder    Dema Nuha    Binyat    Navê Jêderî**

<sup>67</sup> - Samî Tan : Rêziman û Rastnivîsa Zimanê Kurdî. Sitanbol (2005) - Rû. / 198 /.

<sup>68</sup> - Murad Ciwan : (Kurtçe Dilbilgisi Kurmanc Lehcesî ). Siwêd - Jîna nû (1992) - Rû. / 82 - 83 /.

- Revîn	ez di - rev - im ...rev....	rev
- Bezîn	tu di - bez - î ...bez....	bez
- Êşîn	ew di - êş - e ...êş.....	êş
- Kelîn	ew di - kel - in ...kel....	kel
- Cemidîn	hûn di - cemid - in ... cemed..	cemed
- Xapîn	em di - xap - in ...xap....	xap
- HD.....		

Li vê gorê, ev nav (rev, bez, êş, kel, cemed, xap) ji karan (lêkeran) çêbûne, ne ku kar ji wan çêdibin. Anku, ew nav ji karan in, ne kar ji wan in.

- Ev pirtika / î / jî, ne ku paşgir e gihîştîye wan navan û ew kirine karên nederhingêv.

Ev / î / beşekî resen e ji binesaziya jêderên wan navan, (rev - î, bez - î, êş - î, kel - î, cemed - î, xap - î).

Li gora ku ez zanim, di Kurmancî de paşgirek tenê bi forma / î / heye, ew jî paşgira raspartinê (nisbetê) ye. Wek:

- Reng	+ î = rengî
- Bang	+ î = bangî
- Bingeh	+ î = bingehî
- Jor	+ î = jorî
- Şerm	+ î = şermî
- Mis	+ î = misî
- HD.....	

b - Beriya nuha me gotibû, ku ev nav (rev, bez, êş, kel, cemed û xap) navên jêderî ne û di heman dem de jî binyatên dema nuha ne, yê van karên nederhingêv (revîn, bezîn, êşîn, kelîn, cemidîn û xapîn). Taybetmendiya paşgira / andin / a sereke ew e, ku digihêje binyata dema nuha, ya karên nederhingêv û karên derhingêv ji wan saz dike.

Li vê gorê / andin / gihîştîye wan binyatan û ew kirine karinî derhingêv:

#### **Karê Nederhingêv   Nuha   Binyat   Karê Derhingêv**

- Revîn	di-rev-e ...rev...	rev + andin
- Bezîn	di-bez-e ...bez...	bez + andin
- Êşîn	di-êş-e ...êş.....	êş + andin
- Kelîn	di-kel-e ..kel....	kel + andin

- Cemidîn di-cemid-e.. cemid.. cemid + andin

- Xapîn di-xap-e ...xap... xap + andin.

Bi vê dîtinê paşgira / andin/ nagihêje nav û hevalnavan (rengdêran). Lê eger hat û bû, anku gihîşte navekî, wek (şop + andin = şopandin), hingê divê ev kiryarî li ser rêbazekê ji van her du rêbazan bikar hatibe:

1 - Divê peyva (şop) binyata nuha ya karekî nedrhingêv bi forma (şopîn) be. Di dema kevin de ev kar hebû, lê bi demê re hatiye jibîrkirin (weku gelek karan) û binyata wî (şop) tenê jê maye.

Ev binyat di heman dem de bûye navê jêderî, bo wê jêdera jibîrbûyî jî.

2 - Li ser rêbaza peyvên biyanî (Erebî), yên ku di zimanê Kurdî de bikar tên û li gora karên Kurdî jî (andin) gihîştîye wan. Wek:

(cerribandin, ricifandin, elimandin, kitibandin, qedirandin, terikandin û / şopandin / jî).

Lê bi baweriya min, / şop / binyata karekî Kurdî yê jibîrbûyî ye.

#### 4 - Navê Cihî (اسم المكان):

Navê cihî ew nav e, yê ku cih, war û hêwirgeha mirov, canewer û tiştan destnîşan dike.

Wek:

- Kurdistan: Cih û warê Kurdan (welatê Kurdan)

- Ermenistan: Cih û welatê Ermeniyan

- Şêrelan: Cihê şêran

- Gulzar: Gulşen, gulistan

- Xwaringeh: Cihê xwarinê

- HD.....

Di zimanê Kurdî de navê cihî bi çend şêweyên core - cor saz dibe:

#### 1 - Ji Nav û Paşgirekê (dariştî):

Ev corê navên cihî, ji navekî giştî û bi alîkariya paşgirekê têne dariştin. Paşgirên ku di vî warî de bikar tên ev in, (istan, zar, en, geh,lan).

Wek:

**İstan:** - Gul + istan = gulistan

- Mûrî + istan = mûristan

- Gor + istan = goristan

**Zar:** - Gul + zar = gulzar

- Lale + zar = lalezar

- Xunce + zar = xuncezar

**En:** - Çîm + en = çîmen

- Pûş + en = pûşen

- Sîm + en = sîmen

**Geh:** - Xwarin + geh = xwaringeh

- Leşker + geh = leşkergeh

- Kan <sup>(69)</sup> + geh = kangeh

## 2 - Ji Du Navan (Lêkdayî):

Ev her du nav (xane, lan) bi wateya cih û war tên xebitandin. Dema ku navekî giştî dikeve ser navekî ji wan, navekî lêkdayî ji navên cihê pêk tê.

Wek:

**Xane:** - Pirtûk + xane = pirtûkxane

- Kar + xane = karxane

- Çap + xane = çapxane

**Lan:** - Şêr + lan = şêrelan (cihê şêr)

- Mîz + lan = mîzelan (mîzdanik)

- Pûş + lan = pûşelan (cihê pûş)

- HD.....

**Mijara** me navên cihê, yên ku ji karan tên dariştin tenê ye. Anku, ew navên cihê, yên ku ji nav û paşgirên (istan, zar, en...) tên dariştin ne ji mijara me ne. Bo vê egerê, me ew navên cihê, tenê destnîşan kirine, bêyî ku em wan bi hûrbînî ronî bikin. Lê navên cihê, yên ji karan saz dibin, ew cihê tevdana me ne. Navên cihê, yên ku ji karan û bi alîkariya paşgira (geh) pêk tînin, bi du şeweyan saz dibin:

### 1 - Ji Jêder û Paşgira (Geh):

(Jêder + geh = navê cihê).

**Dariştina** hemû corên navên cihê, ne li ser rêbazeke destûrî bi pîvan û pîvanok saz dibe. Her komek ji wan navên cihê, li gora ku hatine bihîstin, bi şeweyekî tînin dariştin. Ji ber vê egerê jî, ev navên ku ji jêder û paşgira (geh) saz dibin, ne ji jêderên hemû karan saz dibin. Tenê ew jêderên ku di riya bihîstinê re bikar hatine, em dikarin wan li wê gorê bixebitînin. Wek:

- Zanîn + geh = zanîngeh (cihê zanîne / zanko)

<sup>69</sup> - Kan : Maden (hesin, zêr, sifir...).

- Kangeh : cihê ku (kan) jê dertê.

- Xwendin + geh = xwendengeh (cihê xwendinê)
- Kuştin + geh = kuştengeh (cihê kuştinê).

## 2 -Ji Binyata Karê Nuha Û Paşgira(Geh):

(Binyata karê nuha + geh = navê cihî):

Wek:

<u>Jêder</u>	<u>Dema Nuha</u>	<u>Binyat</u>	<u>Navê Cihî</u>
- Nivîsîn	dinivîse	..nivîs..	nivîsgeh
- Çêrîn	diçêre	..çêr...	çêrgeh
- Gevizîn	digevize	..geviz..	gevizgeh
- Firîn	difire	..fir...	firgeh <sup>(70)</sup>
- Bezîn	dibeze	..bez... bezgeh / yarîgeh	
- Birrîn	dibirre	..birr...	birgeh
- Firotin	difiroşe	..firoş...	firoşgeh
- Parastin	diparêze	..parêz..	parêzgeh
- Rawestan	radiweste	..rawest..	rawestgeh
- Rêtin	dirêje	..rêj...	rêjgeh
(rijtin	dirije	..rij...	rijgeh)
- Hêwirîn	dihêwire	..hêwir..	hêwirgeh
- HD.....			

Diyar e, ku pirraniya navên cihî, yên ku ji karan û paşgira (geh) saz dibin, bi vê rêzikê pêk tên:

(Binyata dema nuha + geh = navê cêgehî).

## 5 - Navê Alavî (اسم الآلة):

Navê Alavî jî ew nav e, yê ku alavekê ji wan alavên ku mirov di jiyana xwe de bikar tîne, destnîşan dike, wek (das, bêr, derzî, şûjin....).

Mebesta me ji vê mijarê navên alavî, yên ku ji karan tînin dariştin tenê ye. Ji ber ku pirraniya navên alavî ruxsarên xwe bi şêweyekî serbixwe wergirtine. Anku çî tîkiliya wan ruxsaran bi karan ve nîn e. Wek:

(Mastêrk, kovik, bivir, qazme, kevçî, çetel, çengal, serrad, miqor, halet, gîsin, kilçîv, kêr, çeço, xencer, destar, mûçink, meşik, zerik...).

<sup>70</sup> - Ji (nav + xane ) jî, (firokxane ) hatiye.

Hindek ji navên alavî jî, ji karan têne dariştin. Ev dariştin jî, ne li gora rêbazeke rêzimanî tenê pêk tê. Anku, her çend navên alavî bi şêweyekî ji karan saz dibin:

1 - Hinek navên alavî ji nav û jêdera karê (dan) pêk hatine. Wek:

- Kil + dan = kildan
- Gul + dan = guldan
- Çay + dan = çaydan
- Şekir + dan = şekirdan
- HD.....

1 - Hinek jî, ji navekî û binyata dema nuha, ya karê (girtin), ku (gir) e, (lê bi raweya / gîr / hatiye xebitandin) pêk tên.

Wek:

**Jêder**    **Dema Nuha**    **Binyat**    **Navê Alavî**

- Girtin digire    gir / gîr    kef + gîr = kefgîr
- Girtin digire gir / gîr    kew+ gîr = kewgîr<sup>(71)</sup>

2 - Pirraniya navên alavî, yên ku têkiliya wan bi karan re heye, ji navekî giştî û binyata jêderî ya karê dema nuha (bê guherîna binyatê) tên dariştin.

Anku, (navê giştî + binyata nuha = navê alavî).

Nimûne:

**Jêder**    **Dema Nuha**    **Binyat**    **Navê Alavî**

- Şuştin    dişo / dişoye    şo    cil + şo = cilşo
- Jimartin - dijimêre - jimêr- dem + jimêr = demjimêr
- Jimartin - dijimêre - jimêr    kat + jimêr = katjimêr
- Pîvan    - dipîve - pîv - gerim + pîv = gerimpîv
- Birrîn    - dibirre - birr - caw + birr = cawbirr
- Kutan    - dikute - kut - mîr + kut = mîrkut
- Şikandin - dişikîne - şikîn - şekir + şikîn = şekirşikîn
- Maltin    - dimale mal berf + mal = berfmalik
- Maltin    - dimale mal ber + mal = bermalik
- Bînan    - dibîne bîn dûr + bîn = dûrbîn
- Dotin    - didoşe doş ber + doş = berdoş/beroş

<sup>71</sup> - Kewgîr : Alava ku nêçîrvan pê kewan digire.

- Kilan - dikile kil nav + kil = navkil\*<sup>72</sup>
- Weşandin diweşîne weşîn ba + weşîn = baweşîn
- HD.....

4 - Hindek navên alavî jî hene, bi şêweyekî bêpîvan, ji jêderên hin karan hatine dariştin. Wek:

- Bêjing: ji (bijartin)ê, yan (werbêjkin)ê hatiye dariştin.
- Birrek: ji (birrîn)ê hatiye.
- Parzûn: ji (parzinandin)ê hatiye.
- HD.....

**Bêguman**, gelek nav û hevalnav ji karan tene dariştin, lê mebesta me di vê mijarê de, tenê ew navên alavî ne, yê ku ji karan tene dariştin.

### 6 - Hinek Navên Giştî:

Ji bilî van navên ku ji karan hatine saz kirin, (navê kara, navê berkar, navê jêderî, navê cihî, navê alavî), jimarek ji navên lêkdayî jî hene. Ev nav jî, ji karan saz bûne. Têveliya di navbera van navan û wan her pênc beşên navan de ew e, ku ev navên lêkdayî têgeha navînî giştî didin, weku navên cil û bergan, rewş û nexweşiyên. Lê ew her pênc navên (kara, berkar, jêderî, cihî û alavî), her beşek ji wan têgeheke taybet bi xwe ve digire. Ev navên giştî, yê tiştan ji nav û binyata dema nuha, ya hindek karan pêk tene. Anku:

(Nav + binyata nuha = navê lêkdayî / giştî /)

Nimûne:

<u>Jêder</u>	<u>Dema Nuha</u>	<u>Binyat</u>	<u>Navê Giştî</u>
- Maltin	dimale	mal	pêş + mal = pêşmal
- Maltin	dimale	mal	dest+ mal = destmal
- Girtin	digire	gir / gîr	pêşgîr / peşgîr
- Êşan	di-êşe	êş	serêş
- Êşan	di-êşe	êş	dilêş
- Kêşan	dikêşe	kêş	destkêş
- Kêşan	dikêşe	kêş	serkêş
- HD.....			

**Bêguman**, ev navên ku di van mînan de, ji karan hatine saz kirin, di darêja xwe de weku hindek navên (kara, berkar, jêderî, cihî û alavî) ne.

<sup>72</sup> - Kilan : navkila meşkê, dareke bi her du aliyên meşkê ve tê girêdan da ku meşk rast bimîne (netewe).

Lê (weku me berê gotiye) ji hêla watedariyê ve nakevin rêza wan her pênc beşên navan. Ji ber ku navên vê mijara me navînî giştî ne, li hinek tiştan bûne:

- (Destmal, pêşmal, peşgîr): Navên sê parçeyên cil û bergên ku mirov bikar tînin.

- (Destkêş): Hevalnav e, rewşeke çawanî ye.

Wek:

- Temo li hespekî siwar e û yek jî destkêşî xwe kiriye.

- (Serkêş): Bi wateya (serkirde, rêber, pêşewa).

Wek:

- Ferîdon serkêşê hevalên xwe ye.

Ji bo vê têvelî û qetirmeyê jî, me ev navên mijara xwe, weku beşê şeşem ji navên ku ji karan tên saz kirin şirove kirine.



## EDEBIYATA KURDÎ YA KLASÎK

*Ayhan Meretowar*

### Destpêk

Edebiyata klasîk a kurdî, ji kîjan sedsalê ve dest pê kiriye û heta kîjan sedsalê dewam kiriye, bi kîjan bûyer, edîb û berhemê hatiye bisînorkirin, hîna jî, li gor qenaeta me, baş nehatiye neqandin. Digel ku hin lêkolerên edebiyata kurdî[1], li gor sedsalan, edebiyata kurdî dabeşî serdeman dikin jî, hêja ye ku meriv bipirse ka gelo krîterên ku wan edebiyat pê dabeş kirine, çi ne? Ew berhemên ku weke qklasîk tên binavkirin, ka gelo bi rastî jî klasîk in an na? Edebiyata klasîk a kurdî, bi misilmanbûna kurdan dest pê dike yan na? Ji ber ku pêdivî bi bersivdayina van pirsan heye, min ev mijar ji xwe re kir karê vehûrînê. Heta ku ji destê min bê, ez dê li gor derfetên gotarekê, asta sînorên “lîteratura klasîk a kurdî” diyar bikim. Helbet ez dê çavkaniyên edebiyata lorî, goranî, kurmancî, soranî û kirmanckî jî, ji vê xebatê re bingeh bigrim. Bi vê projeyê, min niyet ew e ku bi hindikî be jî, sûde bidim dîroka serdemên edebiyata kurdî.

### 1. Edebiyata Klasîk a Kurdî

Di nav edebiyatên klasîk ên dinyayê de, edebiyata klasîk a kurdî jî, digel hemû taybetiyên xwe heye û têra xwe dewlemend e. Çi heye ku bêjeya klasîk, di nav kurdiya kirmanckî, goranî û soranî de, bêtir li berhemên ku bi kurdiya kurmancî hatine dayin tê. Lewre, serê ewil em bi wateya “klasîk” ê dikarin dest pê bikin. Di nav berhemên klasîk de jî, em dê tenê bala xwe bidin ser wan berheman ku weke pirtûk gihîştine ber destê me; îca ew çend helbestên ku vir de wê de, di nav mecmû’eyan de, ne weke pirtûk; bes weke beşên wê gihîştine roja me, li derî vê xebatê bihêlin.

#### 1. 2. Bêjeya Klasîk

Bêjeya klasîk ku ji zimanê frensî ketiye zimanên cîhanê, tê wateya tiştê ku bi ziman û hunera serdema kevn a Roma û Yewnan re têkildar e.[2] Ew hilberîna ku bi ziman, huner û nivîskarên frensî ên serdema XVIIan a zayînî re têkildar in jî, li dinyayê weke wateya klasîkê hatine qebûl kirin. Her wiha, ji bo wan berhem û edîbên ku demeke dûvedirêj bi ser wan re derbas dibe; lê belê ew hîna tevî qîmet û girîngiya xwe di nav civakê de dijîn, ji wan re jî klasîk tê gotin. Di lîteratura dinyayê de, bêjeya “klasîzm” jî, weke navê teoriyeke felsefî ya edebiyatê hatiye destnîşankirin.

Di kurdî de bêjeyên mîna “kevnar” û “kevnepî” jî, beramberî bêjeya “klasîk” tîn bikaranîn. Di vê xebatê de em dê wateya klasîk, ji xwe re li gor ku *hîna jî ew berhem tê xwendin û tu tiştêkî ji hêjahiya xwe wenda nekiriye*, asas bigrin.

### 1. 3. Berhemên Klasîk û Merheleyên Wê

Wateya edebiyatê ew e ku hunermend, hin hest, raman û xeyalên xwe, li ser bingeha bûyeran, bi rêya ziman, bi awayekî karîger û balkêş, bi tehera devkî yan jî nivîskî vedibêje. Îca berhema klasîk ew e ku li ser bingeha asteke baş a edebî û hunerî hatiye dayin. Her berhema kevnar ku di serdemeke zemanê berê de hatiye nivîsîn, ne klasîk e. Tenê ew berhema ku xwedî hin taybetiyên astbilind ên ilmî û hunerî ye û di zemanê berê de, ji aliyê edîbekî behremend û hunermend ve hatiye nivîsîn, dibe klasîk. Îca ew berhema ku li welatekî, di nav gelekî de dibe klasîk, bere bere, ji aliyê gelên cihê cihê yê dinyayê ve tê naskirin û dibe berhemek ji berhemên klasîk ên cîhanê. Ji vê re jî mînaka herî ewil a berbiçav ku di serdema Edebiyata Kurdî ya Îslamî de hatiye nivîsîn, “*Dubeytî*” ya Baba Tahirê Lorî yê Hemedanî ye. Lewre hem di nav gelê faris de, hem di nav gelê ereb de, hem jî di nav gelê turk de hatiye naskirin, qebûl kirin û xwendin û wergerên wê jî hatine kirin.

Çawa ku lîkolerên edebiyata turkî jî diyar dikin, berhema ku edebiyata turkî ya Îslamî dest pê kiriye, “*Kutadgu Bîlîg*” a Yusuf Has Hacîb e ku bi zaravayê turkî yê Hakaniye hatiye nivîsîn.[3] Berhemên mîna “*Atabetul Hakayiq*” û “*Dîwan-i Hîkmet*” ku di serdema vê berhemê de hatine nivîsîn, weke *Berhemên Serdema Ewil a Îslamî*, hatine dabeşkirin. Îca berhema ku Edebiyata Kurdî ya Îslamî dest pê kiriye, bi qenaeta me, “*Dubeytî*” ya Baba Tahir e ku bi dîyalekta lorî hatiye nivîsîn. Ji ber vê egerê, divê ku em

serdema edebiyata klasîk a kurdî, piştî vê berhemê bidin destpêkirin. Helbestên Mele Perîşan jî, ji xwe hema di serdema Babe Tahir de ne.

Sînorê wan berhemên kurdî yên klasîk, heta kîjan sedsalê dirêj dibe, bi kîjan edîb û kîjan berhemê gihîştîye asta xwe ya herî baş, bi kîjan edîb û berhemê bi dawî bûye, hêjayî lêkolînê ye. Helbet dê bersiva van pirsan bi awayekî zanistî, ji aliyê lêkolerên dîroka edebiyata kurdî ve, rojekê bê dayin. Mebesta me ji edebiyata klasîk a kurdî ew berhem in ku weke pirtûk, digel metnên xwe yên nivîskî, bi awayekî pêt gihîştine serdema me. Jixwe em wan helbestên hin edîbên ku tenê di hin çavkaniyên dîroka edebiyatê de hatine gihîştine me, nikarin weke berhemên klasîk bihesibînin. Lewre ji niha ve em dikarin *“Dîwan”*a Melayê Cizîrî, ji bo asta herî kemilî ya klasîzma kurdî destnîşan bikin. Çawa ku Dr. A. Adak jî diyar dike: “Melayê Cizîrî, yekem helbestvanê kurd e ku bi terzê edebiyata klasîk a rojhilatî, dîwaneke bi kurdî aniye holê.”[4] Xanî jî, bi berhema xwe ya *“Mem û Zîn”* berdewamî daye vê pêvajoya gur û geş. Di pey wan de, serdema teqlîdê dest pê kiriye. Piştî ku dawî li Mîrektiyên kurdan hatiye, ew atmosfera berhemên ku asta qalîteya wan a edebî û hunerî bilind e, felişîye.

#### 1. 4. Maweya Edebiyata Kurdî ya Klasîk û Navendên Wê

Ji weqtê ku di sedsala 11an de Baba Tahirê Lorî yê Hemedanî, berhema xwe ya bi navê *“Dubeytî”* daye û bi şûn de, bi qasî 6 qern derbas bûne û berhemeke mezin ku bibe klasîk, - dewreyên goraniyan ne tê de- di destê me de tune ye. Berhemên edebiyata klasîk a kurdiya goranî, li dormedora navendên mîna Kirmanşan, Qubad, Hewraman û Sineyê ku li ser dewleta Erdelanî bûne, gelek in û heta sedsala XIXan berdewamiya wan hatiye. Di tabloya jêr de, hinek ji wan hatine diyarkirin.

Digel ku çend hukûmetên kurd ên serdema Îslamî hatine damezrandin jî, berhemên edebî ku bi kurdî, di van serdeman de hatine nivîsandin, di destê me de tune ne. Piştî ku *serdema mîrektiyên* di jiyana kurdan de dest pê kiriye, em dibînin ku hîna nû edîbên mezin gihîştine û berhemên klasîk hatine dayîn. Weke Melayê Cizîrî (1567-68-1640)[5] – *“Dîwan”* Feqiyê Teyran (1563-1641) û menzûmeyên wî, Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî (1588-1674)[6] û helbestên wî, Ehmedê Xanî (1651-1709)[7] û *“Mem û Zîn”*a wî, Xanay Qubadî (1662-1747)[8] û mesnewiya wî ya *“Xusrew û Şîrîn”*. Em

destpêka edebiyata klasîk a kurdî, bi wan berheman didin destpêkirin ku gihîştine roja me. Dîwana ewil ku gihîştîye roja me û li gorî krîterên edebiyata rojhilatê, bi taybetî ya Îranê, dîwaneke muretteb nivîsandîye, Melayê Cizîrî ye.[9]

Navendên mîna Bedlîs, Cizîr, Hekkarî, Muks, Hîzan, Sêrt, Bazîd, Diyarbekir, Xelat, Amêdiyê, Brîfkan, Silêmanî, Koye, Sêwreg, Hezan û Licê, bûne ciyê gihîştina edîbên mezin û dayina berhemên giranbiha. Di van navendên mîrektiyan, medreseyan navdar vebûne û tevî tekiyayên hin terîqetên mezin, edebiyata kurdî, di nav şêxên terîqetê, melayên medreseyan û mîrên mîrektiyan de şax daye. Heta ku komara Turkiyeyê hatiye damezrandin, edebiyata kurdî ya klasîk, bi awayekî gur û geş, li bakurê welêt, berdewamî daye hebûna xwe. Serdema mîrektiyan kurdan, ji bo şaxvedana edebiyata kurdî, kartêkereke gelek girîng e. Hema hema her mîrekî şehrekî welêt, li teniştê mizgefta mezin a bajarê xwe, medreseyeke mezin vekirîye, muderrisên mezin wezîfedar kirine, feqî (telebe) dane xwendin û di asta elîtî de karê perwerdehiya ilim û me'rifetê de têde daye îcrakirin. Bi ser de jî, li navçeyan jî weke şaxên van medreseyan, ciyên dî jî vekirine. Heta li gorî derfetan, li gundan jî di teşeyê medreseyê de, "hucre" hatine vekirin û tehsîla ilim hatiye kirin. Bi xêra vê xebatê, di nav feqî, talib, mela û mîrê feqiyan de, çanda edebiyatê jî serî daye. Muderrisên navdar, serê ewil edebiyata farisî di medreseyan xwe de daye hînkirin; peyre bere bere wan bi zimanê xwe jî edebiyat îcra kirîye. Cara ewil jî, Cizîrî ev kevneşopî kirîye nav van medreseyan. Peyre qesîde û xezelên wî ji aliyê ehlê medreseyê ve hatine jîdevkirin. Vê yekê bala ehlê tesewwufê jî kêşaye û wan jî dest bi îcrakirina edebiyata kurdî ya tesewwufî kirîye.

Di sedsala hijdehan de, du edîb û nivskarên kurmanç hene ku di warê pexşana kurdî de xwedî berhem in. Ew jî Mela Yûnisê Helqetînî û Mela Mihemedê Erwasî ne.

## **2. Kartêkerên Li Ser Edebiyata Kurdî ya Klasîk**

Ji ber ku çîna arîstokrat a kurd, li welatê xwe, li ser bîngeheke neteweyî nebûye xwedî îqtîdareke hêzdar, çîna kedkar jî, di hêla zanatî û perwerdehiyê de, bîvê nevē negihîştîye asta gelên dinyayê. Piştî ku hukûmetên Îslamî yê kurd hilweşîyan, êdî dawî li desthilatdariya wan malbatên ku bi wasîteya dîn bûbûn pêşwayên civakê hat. Di nav wan şer û pevçûnên ku Îranî û Osmaniyan li ser singa welatê kurdan dikir de, civaka kurd, digel esilzadeyan xwe dipelçiqî. Ronakbîrên civata kurdan,

ha di nav van şert û mercan de, ji xwe re li ciyekê geriyane ku di hêla ilim û îrfanê de xwe bigihînin zana û bîrbirên xelkên dora xwe. Ji van sazî, dezgeh û ciyan, tekane cîgeh, medreseyên mîran û tekiyayên terîqetan bûne. Her mîrekî her herêmeke Kurdistanê, ji bo ku alim, zana, bîrbir, hunermend û edîbên xwe bigihîne, ji xwe re medreseyek daye vekirin; ji ehlê medreseyê re tayîn daniye û bi wan re alîkarî kiriye. Alimên van medreseyan, tevî tehsîla ilmê dînî, ji ber pêdiviya mercên serdema xwe, ehlê wan, cî daye tesewwif û edebiyatê jî. Ha piştî vê atmosferê, çawa ku li medreseyan ehlê ilim gihîştine, li rû medreseyan jî, tekiya vebûne û mutesewwif gihîştine. Serê pêşî, berhemên tesewwufî yê edîbên faris, turk û ereb ên bi zimanê wan hatine xwendin, peyre jî di nav van egeran de, edîbên kurdan gihîştine û wan jî berhemên xwe dane. Tevî şêxê tekiya û muderrisê medreseyê, îca dîwana mîrê herêmê û hozanê gel jî, bandor li ser edebiyata kurdî ya nivskî kiriye. Bi domana demê re, edebiyata kurdî ya nivîskî, li ser kartêkirina van hêmanan teşe û dirûv girtiye.

## 2. 1. Tesîra Medreseyan Li Ser Edebiyata Kurdî ya Klasîk

Zemanê ku desthilatdariya kurdan li ser bingeha Mîrektiyan bûye, tenê yek ciyek ji bo talîm û tadrîsatê hebûye, ew jî medrese bûne. Medrese, bêjejeke erebî ye û wateya wê ew cî ye ku tê de zêde zêde ders tê dayin û girtin. Ev çand, ji şaristaniya Îslamê[10] hatiye û çawa ku li nav temamê milletên misilman berbelav bûye, li welatê kurdan jî, serê ewil di bin mahiyet û hemiyeta mîran de, li gelek deverên welatê kurdan, medreseyên navendî vebûne. Peyre her ku feydeya van navendên ilim û îrfanê hatiye dîtin, îca li gundan jî, bi navê “hucre”yan hatine vekirin. Qedr û qîmeta ehlê medreseyan, her ku zeman pê ketiye, di nav gel de zêde bûye. Wisan bûye ku civata kurd, her cûre arîşe û pirsgirêkên xwe, bi alîkarî û rênîşandana alim û seydayan çareser kirine. Alimên medreseyan, çawa ku li darsa gramera erebî, ilmê tefsîrê, ilmê hedîsê, ilmê fiqhê, huqûqa Îslamê û îbadetê dane talib û feqiyên xwe, wan di nav xwe de, serê ewil, ji edebiyata ereb û farisan jî, mifa û kelk girtiye. Ji ber ku di hiyama wan de tesîra edebiyata farisî gelek zêde bû, wan jî di nav dersên xwe de, bêtir cî dida Sadiyê Şîrazî û Firdewsî. Peyre di nav van şert û mercan de, bere bere edîbekî bi navê Melayê Cizîrî ku alim û dersdêrekî mezin ê medreseyên mîna Heskîf û Cizîrê bûye, gihîştîye û wî jî *Dîwaneke* di kalîteya wan Dîwanên mezin ên faris, turk û ereban de daye. Navenda her medreseyeke her mîrektiyekê, ji bo edîb û şaîrên kurmanc, bûye cîgeha berfireh a gihîştinê.

## 2. 2. Tesîra Tekiyayan Li Ser Edebiyata Kurdî ya Klasîk

Hin ji alimên medreseyan, bala xwe dane civakê ku her kes nikare bê medreseyê, bi salan xwe bide ber ders û talîmê û hînî exlaqê hesene yê Pêxember 'eleyhîselam bibe. Lewre wan dezgeh û saziyeke ku tenê ji bo awamên gel xebata edeb û exlaqê Îslamî bike, vekirîye. Kurdên lorî, goran, kurmanc, soran û dimilî, ji xwe re li dor van tekiya gihîştine hev. Wan ji van tekiyayan re “dergah”; ji mutesewwifên xwe re jî “babe-bavo” gotiye. Piştî demekê, hin serokterîqên tekiya û tesewwufê, bala xwe danê ku dergah, bê seyda û muderrisan nabe, lewre wan jî dest pê kiriye, di bin mahiyet û hemiyeta xwe de, ciyê dersdayina seydayan jî vekirine û wan jî xwestiye ku bi vê riyê, hejmara mirîd û peyrewên xwe zêde bikin; bi vî awayî jî bandora xwe di nav civatê de zêde bikin. Di nav wan mutesewwif û xelîfeyên terîqetê de jî, şaîr û edîbên jîr derketine û wan jî berhemên giranbiha dane. Şêx Şemsedînê Xelatî, yek ji wan şairan e ku ji kevneşopiya tesewwifê hatiye.

Ciyê mereqê ye bê ka edîbên mîna Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî, bi çî awayî di van medreseyan de, di nav şert û mercên tekiyayên terîqetan de gihîştine û wan ev berhemên klasîk dane...

### 2. 3. Dîwanên mîran

Serê ewil, di dîroka pêşkêşkirina berhemên edebî de, li şûna dîwanên mîran, mizgeft hebûn. Çawa ku di Mizgefta Nebewî ya Medîneyê de, ji bo tadrîsatê beşek li dawîya mizgeftê hatibû veqetandin, îca di weqtê xelîfeyên Emewî, Ebasî, Eyûbî, Tîmûrî, Selçûqî û Merwaniyan de, dezgehên ji mizgeftan cihê, ji bo ehlê hedîsê hatibûn vekirin: “Darul Hedîs”. Peyre, li derdora mizgeftê, saziyên mîna medrese, tekiya û dîwana mîr, hakim/qadî û wezîran vebûbûn. Her ku dewlet mezin bûn û şertên dîrokî zor da wan, îca beg û mîran, ji xwe re qesr û seray jî dan avakirin. Ji van ên ku di nav kurdan de vebûne, “Seraya Îsheq Paşa”, mînaekeke berbiçav e ku hîna jî heye. Îca edîbên ku li medreseyan digihîştin, di rojên diyar de, -weke êvara îne- hatine “Dîwana Mîr” û li wê derê, li hember mîr û giregirên wê derê, hunera xwe ya edebî pêşber kirine. Bi vî awayî, bêjeya “dîwan”ê ketiye çanda edebiyata klasîk û wê jî bandor li berhemên edebî kiriye.

### 3. Çavkaniyên Edebiyata Klasîk a Kurdî

Çawa ku edebiyatên nivîskî yên piraniya gelên dinyayê, ji materyalên xwe yên devkî mifa digrin, edebiyata kurdî ya nivîskî jî, di îcrakirina tekstên xwe de cî daye metnên gelêrî. Tevî vê, em dibînin ku metnên dînî jî, di edebiyata kurdî de bûne çavkaniyên girîng.

### 3. 1. Di Edebiyata Kurdî ya Nivîskî de Çavkaniyên Gelêrî

Gava di edebiyata kurdî ya nivîskî de behsa edebiyata gelêrî tê kirin, rasterast Feqî û Xanî tîna bîra meriv. Cara ewil, wan ew berhemên ku di nav gel de, bi awayê keneşopiya devkî nifş bi nifş berbelav bûne, derbasî nivîsê kirine. Destana “Kela Dimdimê”, efsaneyê bi navê “Zembîlfiroş”, hîkayeya “Şêx Sen’an” û “Bersîsê ‘Abid”, ew berhem in ku Feqiyê Teyran, ew ji nav edebiyata gelêrî girtine û derbasî edebiyata nivîskî kirine. Şêx Ehmedê Xanî jî, hîkayeya gel a bi navê “Mem û Zîn”, bi terz û teherê “mesnewiyên” derbasî nivîsê kiriye.

### 3. 2. Di Edebiyata Kurdî ya Nivîskî de Çavkaniyên Dînî

Di serî de metnê yekem ku Quran e, bi hîkayeyên xwe yên ku behsa qisseyên Nebiyên dike, ji edebiyata kurdî ya nivîskî re bûye serçavî. Mesnewiya “Yusûf û Zelîxa” ji bo vê, mînak e.

### Encam

Edebiyata klasîk a kurdî, bi qasî wan agahiyên zanistî yên ku heta niha em pê hisiyane, li gor derfetên xwe yên tarîxî, bi kultura/çanda bawermendiyê, dest pê kiriye. Çi heye ku sînorekî diyar ê destpêk û dawiyê, ji hêla ciyê navendî û sedsala destpêkê ve, bi awayekî zelal, nehatiye danîn. Di sedsala 7an a zayînî de ku gelê kurd, rastî kultur û medeniyeta Îslamî bûye, çawa ku jiyana gel a civakî ketiye bin bandora wê, bivê nevé ji hêla simbol û motîfên edebî ve jî, tevî motîfên edebiyata devkî, li gor pêdiviyên vê pêvajoyê, ketiye reng û rûyê zihniyeta vê baweriyê.

### ÇAVKANÎ Û JÊDER

Abdurrahman Adak, “Dîroka Edebiyata Kurdî” Weş. Nûbihar, Stenbol, 2013.

Kadri Yıldırım, “Ehmedê Xani Külliyyatı, Nûbihara Biçûkan”, Avesta, Stenbol, 2008.

Seyîd Celal Nizamî, “Xusrew û Şîrîna Bi Kurdî ya Xanay Qubadî”, *Zend*, j. 13., Stenbol, 2010.

Lys Edebiyat, Konu Anlatımlı, Heyet, Analitik Yayınları, İzmir, 2009.

Navê Herême	Navê Edîb	Navê Berhemê	Çeşnê Wê	Wîladeta Edîb	Sedsal
Hemedan	Baba Tahirê Hemedanî yê Lorî	Dubaytî	Rubaî	937-1010	X

Navê Herême	Navê Edîb	Navê Berhemê	Çeşnê Wê	Wîladeta Edîb	Sedsal
Kirmaşan	Mela Perîşanê Dînewerî	Dîwan	Helbestên cûrecûr	1356-1421	XIV-XV
Hewraman	Baba Celîlê Dewdanî	Dewre	Helbestên cûrecûr	? – 1560	XVI
Qubad	Xanay Qubadî	Xûsrew û Şîrîn	Mesnewî	1704-1778	XVIII
Sine-Senedac	Mestûre Mahşeref Xanima Kurdistanî	1. Tarîxî Erdelan 2. Dîwan 3. Mecma'ul Udeba	Mersiye	1805-1844	XIX

Navê Navenda Herême	Navê Edîb	Navê Berhemê	Çeşnê Wê	Dîroka Jiyana Edîb	Sedsal
Herîrî	Elî Herîrî	Hespê Reş/Borê Qer	Destan		XVI
Cizîr	Mela Ehmedê Cizîrî	Dîwan	Helbestên cûr bi cûr	1567-1640	XVI
Muks	Feqiyê Teyran	1. Şêx Sen'an 2. Bersîsê 'Abid 3. Zembîlfiroş	1.Hîkayeya menzûm	1563 – 1641	XVI



		4. Dimdim	2. Hîkayeya menzûm 3. Hîkayeya menzûm 4. Destan		
Bazid	Ehmedê Xanî	1. Nûbihara Biçûkan 2. Eqîdeya Îmanê 3. Mem û Zîn 4. Dîwan	1. Ferhenga menzûm 2. Mesnewî 3. Mesnewî 4. Helbest	1650 - 1707	XVII
Muks	Elî Termaxî	Serfa Kurmancî /Tesrîfa Kurmancî	Gramer	?	XVII
<b>SEDSALA HIJDEHAN</b>					
<b>Navê Navenda Herêmê</b>	<b>Navê Edîb</b>	<b>Navê Berhemê</b>	<b>Çeşnê Wê</b>	<b>Dîroka Jiyana Edîb</b>	<b>Sedsal</b>
Botan	Mela Huseynê Bateyî	1. Mewlûdname 2. Zembîlfiroş 3. Hemaîl	1. Mesnewî 2. Hîkayeya menzûm	1675- 1760	
Bedlîs	Selîmê Silêman	Yusuf û Zelîxa	Mesnewî	1754- ? I	
Bedlîs	Harisê Bedlîsî (Sewadî)	1. Leyla û Mecnûn 2. Yusuf û Zelîxa	1. Mesnewî 2. Mesnewî	1758- ?	
Bazîd	Îsmâîlê Bazîdî	Gulzar	Ferhenga Erebî-Farisî	1665 – 1709	
Bazîd	Miradxanê Bazîdî	Zembîlfiroş	Destan	1737 – 1784	
Sêrt	Şêx Xalidê Zêbarî yê Yekem	Qewlê Newala Sîsebanê	Destan	(? - m. 1805)	


Navê Navendê	Navê Edîb	Navê Berhemê	Çeşnê Wê	Dîroka Jiyana Edîb
Muks	Mela Yûnisê Helqetînî	1. Zurûf 2. Terkîb	Gramer	?
Muks	Melayê Erwasî	Tibba Erwasî	Dermandarî	

Navê Mîrekiyê	Navê Medreseyê	Tarîxa wê
Mîrekiya Cizîrê	Medreseya Sor	Sedsal XV - XVI
Mîrekiya Erûhê	Medreseya Tanzê	
Mîrekiya Amêdiyê	1. Medreseya Amêdiyê 2. Medreseya Qubehanê	
Mîrekiya Hîzanê	Medreseya Dawudiyê	
Mîrekiya Miksê	Medreseya Mîr Hesênê Welî	1570 – 1566
Mîrekiya Şîrwanê	Medreseya Zeynel Beg	1591 – 1597
Mîrekiya Licê	Medreseya Weqif Ehmed Begê Etaxî	
Mîrekiya Xoşabê	Medreseya Etaxiyye	
Mîrekiya Dêrzinê	Medreseya Şaqûlî Beg	
Mîrekiya Girdikan	Medreseya Nasir Beg	
Mîrekiya Bazidê	Medreseya Sînaniye	
Mîrekiya Heskîfê	Medreseya Siltan Adil	
Mîrekiya Bedlîsê	1. Medreseya Kamiliye (Melik Kamilê Eyûbî) 2. Medreseya Hacî Begî (Mewlana Muhemmedê Zirkî) 3. Medreseya Îdrîsiyeyê (Mewlana Ebdirehman) 4. Medreseya Îxlasiye (Mewlana Mihemed Şêrenîşî) 5. Medreseya Şerefiyeyê (Mewlana Xidir Beg)	

- [1] Adak, A. (2013) "Dîroka Edebiyata Kurdî" Weş. Nûbihar, Stenbol.
- [2] Farqînî, Z. (2000) "Türkçe – Kürtçe Sözlük", Weş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol.
- [3] Lys Edebiyat, Konu Anlatımlı, Heyet, Analitik Yayınları, İzmir, 2009, r. 161.
- [4] Adak, A. (2013) "Dîroka Edebiyata Kurdî" Weş. Nûbihar, Stenbol. r. 186.
- [5] Adak, r. 193.
- [6] Adak, r. 221.
- [7] Kadri Yıldırım, "Ehmedê Xani Külliyyatı, Nûbihara Biçûkan", Avesta, Stenbol, 2008, r. 13-33.
- [8] Seyîd Celal Nizamî, "Xusrew û Şîrîna Bi Kurdî ya Xanay Qubadî", *Zend*, j. 13., Stenbol, 2010. r. 21.
- [9] Adak, A. (2013) "Dîroka Edebiyata Kurdî" Weş. Nûbihar, Stenbol. r. 206.
- [10] Perwerdehiya ilm, di nav alema misilman de, cara ewil di mizgeftan de hatiye kirin. Dema ku Pêxemberê Îslamê Hz. Muhemmed 'eleyhîselam hatiye şarê Medîneyê, mizgeft ava kiriye, quncikekî wê jî, ji bo katibên wehyê veqetandiyê. Hin ciwanên dildar jî bûne telebeyên vê derê. Ji wan re "*Eshabê Suffe*" hatiye gotin. Ew bi şevê li wê derê raketine û bi rojê tim li dor Hz. Pêxember 'eleyhîselam di nêçîra ayet û hedîsan de mane. Debara van telebeyan, ji aliyê hevalên Pêxember 'eleyhîselam ve hatiye kirin. Peyre, her ku şert û mercên misilmanan xweş bûye û ew rastî çand û şaristaniyên mîna Sasanî û Bîzansan hatine, ji wan jî mifa girtine û wan êdî mekanekî cihê, ji bo ciyê dersê veqetandiyê. Bêjeya "medrese"yê, di pey vê serdemê de derketiyê. Bi taybetî, di weqtê Xelîfeyên Ebbasiyan de, sazî û dezgeyên ku weke navendên perwerdehiya ilim hatine vekirin, ketine serdema xwe ya zêrîn. Li medreseyan, zana û alimên mezin gihîştine. Peyre hin medrese bûne ciyên îcrakirina zanistên pozîtîf ên mîna tib, astronomî, cografya, matematîk, fizîk û kîmyayê; hin jê bûne navendên gelek girîng û binavûdeng ên ilmên mîna hedîs, tefsîr, huqûq û tarîxê.

## Destana Dewrêşê Evdî li inglîzî hat wergerandin

*Şahîne Bekirê Soreklî*



Wekî di sedsalên par de bûye, di sedsala 21emîn de jî hîn yê xwedî li berhemine çandîye klasîk yê Kurdan derdikevin û wan dixin nav çanda bilind ya cîhanê bi pirranî akadêmiyên biyanî ne. Yek ji berhmên klasîk yê gelêrî di nav çanda kurdî de berhema Dewrêşê Evdî ye. Ev berhema nerxibilind jî, wekî gellek stran, destan û çîrokên Kurdan, bêxwedî maye û bi rê ve pirr ji şêweya xwe ya resen wenda kiriye. Ji ber ku berhem nehatibû nivîsandin ew bi şêweyên cuda û ligor gotina dengbêjên herêman bi babetên devokî yê ji hev cuda gihîşt sedsala 20emîn. Yek ji wan babetan şêweya ligor gotina stranbêjê ji Kobaniyê, bi rehmetî Baqî Xido, bû.

Baqî Xido yê ji paşerehên ereb ji herêma Herranê mirovekî belengaz bû, li herêma Kobaniyê û ya Surûcê dihat nasîn, lê pirraniya jiyana xwe perîşan ma û di nav xelkê de ne weqa rêzlêgir bû, kesek lê xwedî dernediket, bi kêmasî ta dawiya salên 80yan, mixabin. Wekî pirraniya sazbandên Kurdan, di nav wan de yê ji paşerehên ermenî jî, strangotin ne karê wî yê herdemî bû, ne jî pere ji bo jiyana wî û malbata wî qezenc dikirin. Baqî destana Dewrêşê Evdî, heye ku ji bavê xwe Xidoyê Hindawî fêr bû bû, wek stran digot. Di serîlêdanên min yê welêt de Baqî her carê ji rindiya xwe dihat serîlêdana min û her carê min piçek alîkariya aborî pê re dikir. Min carê jê xwast ku stranine xwe ji min re bişîne, da ku wan binivîsînim. Ji ber ku baqî bi xwe nexwende bû, nikaribû bi kurdî bixwenda, wî destana Dewrêşê Evdî wek çîrok li ser sê kasêtan tomar kir û sal 1987 ji min re şand. Min dît ku berhem yeke layiqe pesindanê û xwedîlêderketinê ye. Min guh da naveroka kasêtan û berhem peyv bi peyv bi daktîlo nivîsand. Yê Baqî dinasin dizanin ku di axaftin û strangotina wî de gellek peyvên herêmî yê ji rêzimanîyê dûr û yê tirkî û erebî hebûn. Çiqa min hewl da berhemê wekî ku hatibû gotin bihêlim jî, hinek guhertin û edîtekirin pêwîst bûn. Hema çend nimûneyên guherandina peyvên û hevokan:

“E dibêm” >>> Ez dibêjim

“qetl û qîtal” >>> lihevexistin, şer

“Evaya ewela qîsa wan e” >>> ev serpehatiya wan e

tişteki “îcbarî” >>> tişteki grîng

“di ortê da” >>> di navberê da

“mihafeze bikin” >>> biparêzin

“Mek’şîn qeyxan” >>> Mekşîn xeman

“Yasax e” >>> qedexe ye

“fîtilî” >>> fertilî

û gellekên din...

Ji bo xatirê zelalkirina wateyê û mentiqîkirina hevgerîdanê, neçar mam her weha berhemê li hinek şûnan edîte bikim û bûyeran bi hev de girê bidim, bêyî guherandina wateyê. Ev yekemîn car bû di dîroka Kurdan de ku Destana Dewrêşê Evdî bi vê şêweyê nivîskî derdiket. Ez ne mirovekî weha bûme

ku pesna xwe dide û xwe mezin dike. Ji bo xatirê ku alîkariya Baqî Xido bikim, wî navdartir bikim û destana Dewrêşê Evdî têxim nav rûmeteke layiqtir, min pesn û senaya keda xwe û rola xwe nekir. Min granî bêtir da ser rola Baqî û nerxê giran yê destanê.

Min berhem ji şûnên wek Enstîtuya Kurdî ya Parîsê re şand, bi hêviya ku çap bikin, lê nebû. Min ew her weha bi rêya [www.avestakurd.com](http://www.avestakurd.com) da weşandin, û beşine wê bi rêya Fêsbûk jî, lê di nav neteweya kurdî de ne çapxaneyekê, ne weşanxaneyekê, ne jî aliyekî din xwast vê berhema bedew têxe nav pirtûkekê. Min bi xwe jî, bi encama dilsariya ji Kurdan û nivîsandina ji bo wan, tevdeera ku berhemê wek şano binivînim li şûn hîşt. Sal 2004 min tevahiya destanê bi dengê xwe û bi şêweyeke dramatîkî li ser CDyan tomar kir. Ji ber ku dirêj bû, wê demê tomarkirina tevahiya destanê li ser 1 CD ne pêkan bû. Lewma, bi alîkariya SBS RADIO berhem li ser DVD hat tomarkin û me jimareke ji DVDyan bêpere ji guhdarên meraq dikrin re şandin, her weha ji kesine ji derveyê Australya xwastin re jî.

Destpêka meha 6emîn/2017 emailek ji jineke akadêmî ya swîsrî, ji Dr. Barbara Sträuli, gihîşt min. Bi kurtî, wê Destana Dewrêşê Evdî ya ligor gotina Baqî Xido û nivîsandin/edîtekirina Şahîn Bekir Soreklî bijartiyê û di nav pirtûkeke bi înglizî de, ligel şêweya Kurmancî... li almanya daye çapkirin û weşandin. Weha xuya ye ku wê kopiya ku min nivîsibû berê wek mijara wergirtina "masterê" bi kar haniye, ger ne şaş bim. Ji rindiyan xwe kopiyeye pirtûkê ji min re şand. Pirtûka bi 243 rûpelan bi şêweke baş derketiyê, ji aliyê Gottinger Orientforschung Iranica (Harrasowitz Verlag – Wiesbaden: 2017) hatiye weşandin û bi nerxê 54 Euro di firotanê de ye.

Min di jiyana xwe de pere ji karê nivîskariya bo Kurdan qezenc nekirine û ligel her tiştî û her neheqîlêkirinê ez ê gellekî dilşad bû bûma ku ev destana ji çanda gelê Kurd û navê Baqî Xido ketin nav çand û dîroka cîhanê. Lê li şûna dilşadiyê, mixabin ez gellekî êşiyam û bi ber ketim. Yek, ji ber ku berhema ku min nivîsandibû û Baqî Xido gotibû hatibû bikarhanîn, "edîtekirin" û weşandin bêyî rêdana min û bêyî haydariya min. Jê bêtir, kopiya ku min pêş dora 30 salan wek reşnivîs ji dostekî re şandibû hatibû bikarhanîn. Di warê hinek rastiyan û wergeranê de jî hinek şaşî di pirtûkê de hene; û ev pirtûkeke akadêmî ye û tiştên tê de dê bi sedsalan bimînin.

Pirr êşiyam, lê min nexwast bi encamê xwe têxinim nav serêşiyeye dirêj û kûr, ne jî meraq dikim Dr.

Sträuli, ya ku xuya ye li kiryara xwe poşman e, derbarê negirtina rêdanê û pirsîna biryarê de (dibêje, hewl daye lê nikaribûye navnîşana min bi dest xîne) têxînim nav tengasiyê. Dr. Sträuli hêvîdar e, dirêj nake çapa 2yemînê li pêş be. Soz dide ku dê di wê de şaşiyên serrast bike û navê min jî bi navê xwe û yê Baqî Xido re deyne ser qabê. Bi kurtî, neheqîlêkirineke mezin e, qe nebe ligor min, lê li milê din, ne cara 1emîn e û dê ne cara dawîn be. Wek mirovekî ku beşekî mezin jî jiyana xwe daye keda ji bo doza kurdî û zimanê Kurmancî, ez êdî fêrî neheqiyên û kêmtêqêrkirinê bûme. Qe nabe Xatûn Barbara Sträuli piçek teqêrkirin xistiye nav pirtûkê û yek ji min re şandiye!

## KILMEANALÎZÊK SEYEHMED Û XECE SERO

*Seîd Veroj*

Kê şênê vajê ke kultur û folklorê kurdan, “paştiya xo daya veng û vatişî”, bi vatiş û eşnawitişî reyde ameyo heta eyro. Mesela Seyehmed û Xece, yew parçeyo kehên yê folkloro ma wo. Eno nûste de, verê heme çî, ez wazena derheqê ena mesela de biney agadareye bida şima û tayn xûsusiyetanê aye bîyara ziwan. Wexto ke bahsê folklor û edebiyatê şarî yê kurdan bibo, bêguman verê hemine destanê zey *Seyehmed û Xece*, *Memê Alan* yenê kê vîrî. Gama ke babete(dakera) eseranê folklorî sero bo, ma biwazê nêwazê varyantê ciya yê enê eseran vejyenê vera ma. Xora peydabiyayîşê ay ciyayê bi xo, xûsusiyetêko esasî yê eser û berhemanê folklorî yo. Ena çaçova de, hewceyo kê verê heme çî goreyê varyantê ciyayê “Seyehmed û Xece”, bahsê bedêlyayîşê nameyê qehremanê ena destane bikê.

Wexto ke ma bala xo bidê varyantê ciya yê *Sîyabend û Xece*, dîyar beno ke her yew varyantê yên de nameyê qehremanê ena destane ciya ciya ameyê nûstiş. Roger Lescot vateyo verên yê berhevoka *Memê Alan* de wexto ke bahsê ena mesela keno seba bêjê aye vano “destan” û name zî zey “*Sîyamendê Silîvî*” dîyar keno.[1] Kitaba Huseyn ERDEMÎ de, nameyê qehremanê mesela zey “*Sîyabend*”î[2] ameyo nûstiş. Kitaba ke bi nameyê “*Destanên Kurdî*” terefê Celîlê Celî û Ordîxanê Celîlî ra ameya amedekerdiş, ewca de zî name zey “*Sîyabend*” vêreno. Kitaba “*Folkloro Kurmanca*” de, çehar varyantî ameyê nûstiş û her yew varyantê ênan nameyê ciya yê ameyê nûstiş zey “*Sîabend*”, “*Siyabend*”, “*Siyavend*” û “*Sîamanto*”. [3] Kitaba M. Said Ramazan El Bûtî de zî name zey “*Siyamend*”[4] ameyo nûstiş. Varyantêko deyrbaz(dengbêj) Husênê Fare zey kilame vano, ewca de zî name “*Sîehmed*”[5] o. Varyantê dimilî(zazakî) yo ke Gêl de û fektê Hûsê Quçe ra ameyo giroteş de, “*Seyehmed*”[6] vêreno, ke eno nûste de zî ay name ameyo tercîhkerdiş. Mi hete de çinî yo, labelê goreyê tayê agadariyan varyantêk dimilî yê “*Seyehmed û Xece*” zî, nûşttox Koyê Berzî dayo çapkerdiş. Eke ez bişêna enê varyantî zî peyda bikera, bêguman o da zî fayde bido ena xebata ma.



Seyehmed û Xece hem bi mesela(çîrok) û hem zî bi deyre reyde vajyena. Yanî hem xûsusiyetê destanan û hem zî yê çîrokan tede estî; hem xûsusiyetê nesrî (pexşan) û hem zî yê şîîrî tede estî. Kê şênê vajê ke destanî, yew bêjê edebiyatê arîstokratan o. Ziwanê şîîrî zî wasitewê îfade kerdişê enî bejî yo. Feqet destanan de zaf ray qahreman yewdo zadegan (Mîre, Axa, Şêx, Serekeşir, ... ) o. Mesela Seyehmed û Xece de qahreman zadegan nî yo, şarî ra yew o; heta tebaxa binên ra yewêdo seyek yo.

Wexto ke ma bala xo bidê mewzû û biyayişê mesela Seyehmed û Xece, tayê xûsusiyetê ayê mûhîmî dîyar benê. Mewzûyê esasî yê mesela; merdişê pî û maya Seyehmedî -qehremanê çîroke- û seyek mendişê ey yo. Nameyê pîyê qehremanî Ehmed bîyo. Vanê wexto ke pîyê ey merdo, O, hema pîzeyê marda xo de pitikêko çend aşme bîyo. Wexto ke marda xo ra beno, sebebo ke pîyê ey merdo, nameyê pîyê ey nanê pa û êdî tira vanê Seyehmed. Bîyayişê Seyehmedî ra dime wextêko kilm vêreno maya ey zî mirena. Seyehmed êdî beno seyekê verdestê dat(ded) û datcinî. Êdî çî beno ze ke weyta ra dime dest bide keno. Seba ke çînişîyê û feqîreye mîyan de yî, mecbur manenê ke dew ra koç bikê, şîrê cayêna xo rê karêk bivînê û pê pîzeyê xo mird bikê. Raywaneya koçkerdişî dest bide kena. Ena raywanê de çîyê ke benê (qewmîyenê) û yenê ênan serî ser, esasê mesela teşkîl kenê.

Seyehmed, merdişê may û pîyê xo û seyek mendişeya xo, sebebê heme çîyê (tebayê) ke ey serî ser de ameyê, qebûl keno. Û zano ke ganê pî û maya ey zî “felekê-melekê mewtî” giroto, ay sebeb ra hedefê ey gangêrê pî û ma yo, yanî “felekê-melekê mewtî” yo. Vano “*gerek ez ey biveyna û heyfê kokima maya xo tira bigîra*”. Heta tena bi girotişê heyfê kokima maya pîre zî razî nêbeno, vano “*eger ez ey bivîna, ne bi ya mi, bi ya Homayî, ez do bi wûrdî çokan vazda sênedê ey ser, dewrê Hezretê Ademî ra bigîre heta eyro, pers û sewalê keynek û veyvekanê şarî bide bika, tira pey zî ez do hesabê kokima maya pîre ey ra pers*”. Eslê xo de sebebê heme çîyê ke mi serî ser de ameyê o bi xo yo, eger ey, ez bê pî û maye, seyek û keberan vera nêverdaynê, enî meseleyî pêro mi serî ser de nêameynê.

Seyehmed heta ke raştê Xece yeno û beno zerrkewteyê aye, hedefê ey, “*felekê-melekê mewtî*” ra heyf girotiş o. Labelê wexto ke raştê Xece yeno û aşîqê aye beno, eşqê eyo raştikên hedefo esasî bide dano vinîkerdiş. Eşq Seyehmedî keno dexisok û hesûd, ena hesûdeye hende vêşî bena ke, bide dest û lingê destbirakê eyê Qeregetranî dano qeydan kerdiş. Ey ra dime, êdî mesela rengêko dunyewî gêna. “*Eşîra Şîkakîyan*” [7] mîyan ra remnayîşê Xece, agêrayîşê koyê Sîpanî, û pê mirad nêkerdiş, peynîya mesela ya. Eno het ra peynîya mesela *Seyehmed û Xece*, biney manena peynîya mesela *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî. Labelê ma zanê ke temaya eşqê di heskerdoxan û pê mirad nêkerdişê ênan, bêguman rojo tewr verên ra hetanî ewro kulturê heme milletan de esto û îtibarê xo zî qet vinî nêkerdo. Wexto ke bahsê enê wûrdî eseran bibo, hewceyo kê yewna xûsusiyetê ênan o

mûhîm bîyarê xo vîrî; *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî de biney tesîrê farisî dîyar beno, labelê *Seyehmed û Xece* de, qet şopa tesîrê farisî nêasena, bi zîwanêko sade û zelal vajyena.

Wexto kê bîyayîş û qewmiyayîşê mîyanê çîroke de xo çîman vera bigîrê, karê ke Seyehmed keno, bi zerba ey nîyê. Halo ke tede wo, sebebê esasî yê enê karan qebûl keno. Coka vano: *“Wa biney rehma Homay dekewo zerrda şîma. Ez etiya de veyşan a, ez bame (viran) ya, ez warwa ya.”* Û her karo xirab û nerindeya ke bi destê ey bena, tira pey zî seba telafîkerdiş û kemîkerdişê zirarê ay karî, çî ey dest ra bêro keno û vano *“Belkî xêrê û guneyê mi zî têvero şorê”*. Eger ke ma baş bala xo bidê, psîkolojîya ke ey ver bi enê karan bena û tira pey zî muhasebeyê eyê derhqê karandê xo de; şopa felsefeyê dualîstî ano kê vîrî. Qehremanê ena destane, hem *“rindeye-başeye”* û hem zî *“xirabeye”* temsîl keno. Her karo xirabo ke xo mecburê kerdişê ey vînenno, kerdena ey ra pey, ena raye seba kemênayîşê encam û telafîkerdişê ay xirabeye xebityeno û wazeno dîyar biko ke sebebê ena xirabeye we(o) bi xo nîyo, eyê ke o bê pî û bê maye verdayo, o bi xo yo.

Seyehmed û Xece de, mekan û zeman pêwa girêdaye yî, cê nêbiryenê, zemanêko dîyarkerde zî çînî yo. Mesela de bi giraneye ser bahsê heyatê dewe bibo zî, têkilîya ênan û şeharî ra zî qutbiyaye nîya. Heme varyantê ke mi deste estî, mitleqa ênan de bahsê *“bajarê Encewaz”*î beno. Ca û warê destbidekerdişê mesela, dewêka Silîva ya. Çîmkî wexto ke qehremanê xo dano sinasnayîş vano *“nameyê mi Seyehmed o. Eslê mi Silîvan ra yo. Mi ra vanê Seyehmedê Silîvî.”*[8] Tira pey raywaneya ver bi koyê Sîpanî û şeharê Elcewazî dest bide kena. Ena mesela de çiyê(tebayê) ke benê, zemanê ênan pêro bi girêdayeyê şexsiyetê qehremanî yî. Cayê seet û roj û aşm û seran de, bîyayîşê dergeye û kilmeya karê qehremanî dîyar keno.

Bêguman yew çîyo mûhîm zî, tespîtkerdişê peydabîyayîşê wextê ena mesela yo. Goreyê varyantê ke mi hete estî, wexto kê dewrê qewmiyayîşê tebayê ke enê varyantan de bahs beno xo çîman vera bigîrê, derheqê wextî de tayê nîşanê mîhîmî dîyar benê. Labelê ganî kê baş tespît bikerê, ke bahskerdişê ay qewmiyayîşan, qandê şênberkerdişê meseleya yo, yan zî heqeten eleqa ênan û mesela ra esta yan nê.

Ke ma baş bala xo bidê mesela Seyehmed û Xece, gelek xûsusiyetê ciya û zaf kehanî tede dîyar benê. Tema û qewmiyayîşê fewqalede, xûsusiyet û vateyê mîtolojîk û efsanewî zî te de estî. Mesela Seyehmed û Xecê de vateyê mîtolojîk, efsanewî û raştaya kulturê civata kurdan dekewtî têmîyan. Bêguman motîfê dînî zî zaf cayanê mesela de yenê tekrarkerdiş. Wexto ke tayê varyantan de nameyê eşîran, çeka destê Seyehmedî(çîqê devî), qewmiyayîş û bîyayîşê tayê hedîseyan, çarçova dîyalogan, ûsil û adetê qehreman û akotoranê bînan bîyarê xo vîrî, enê xûsusiyetî dîyar benê.

Mîsal, motîfî zey çeka destê Seyehmedî(çîqê/çîmê devî) û hêz-qewetê yê, hejdiyeyê serê çîmedê awe(ke Seyehmed ey kişeno), “felek û melekê mewtî”, “Erebzincar a keyna mîredê cinan” [9], Deybilqiran, çend motîfê mûhîm î. Wexto ke Seyehmed bi girçikê dara vinêşkêr pawa halê xo îfade keno vano: “cotê şalûl û bilbila, ji hal û dilê min û Xeca min ra dixweynê **sêsed û şêst û şeş** zimanî.” Etiya de humartiş û belîkerdişê mîqdarê tebyan de reqamê hîrê(3) û reqamê qatê hîrê, xûsusiyetêk mîtolojîk û zaf kehên yê kulturê Hind-Awropa yo. Wexto ke ma baş bala xo bidê, destana “*Memê Alan*” de eynî xûsusiyet esto.

Adet û toreyê ke bahsê ênan beno, eşîret(şikakî), şêlik û heyatê ênan, keleşeye, neyareye, tabîr û vateyê ke mîyandê çîroke de vênênê, gawaneye, meymanperwewereye, golikvaneye, xizmetkareye û sewbî xûsusiyetî, vate û xûsusiyetê komelgeya kurdî yî.

Wexto ke babete berhemêko folklorîk bo, îmgeyê ke tede vênênê û dereca raştaya îmgeyê ke bahsê ênan beno zî mûhîm a. Çîmeyê folklorî dîrê raştaya nîyê, labelê her îmgeyê folklorîkî zî raştaya bi xo nîya. Zafê îmgeyê çîrokan, îmgeyê viraşte yî, tesawirkerde yî. Hejdiyayê ke dekiwenê çîmedê awe, Erebzincar a keyna mîredê cinan, çeka zey çîqê devî, dêwê hewtsereyî û sb. Enî bêj îmgeyî raştaya xo de qet nêbîyê.

Hinek nivîskarên me hene ku kesên Kurdperwer in û Kurmanciya wan ya nivîskî yan pirr baş e, yan ne xirab e. Hinekan ji wan ciwanmêran hewl dan di mîdy-ya civatî de tenê bi kurdî binivîsîn, lê bi dîtî ku tenê jimareke nizm ji Kurdan wan nivîsaran dixwînin û pîrraniya yê dixwînin jî ji naverokê baş tê nagihên. Lewma hinek ji wan neçar man dîsa bi E'rebî yan bi Tirkî binivîsîn, da ku nivîsarên wan ji aliyê bêtir kesan ve bihên xwendin. Ev jî wê wateyê dide ku xelkê me bi pîrranî nikare Kurmanciya nivîskî bixwîne û ji naveroka berheman baş tê bigihê. Ne ku naxwaze, lê nikare, ji ber ku bi zimanê Kurmancî perwerde ne-bûye. Ji bîr neçêt, mirov 12, 13, yan 14 salan diçe xwendegehê û bi hezaran sa'et li xwendegehan derbas dike ta ku bi hêsanî dixwîne, dinivîsîne û ji naveroka berhemên bi zimanekî têdigihê.

Çiqas xuyakirina pêşniyaziyan di rewşa îroj de hema-hema bêyî sûd be, çimkî derfetên ji heqê wan derkevin nînin. Lê dê bi kurtî hinek pêdiviyên, yan hewcedariyan, ragihînim ku ji bo pêşvexistina Kurmancî û berfirekîna Kurmanciya nivîskî pêwîst in:

1. Perwerdekirina mamosteyên fêrkirina Kurmancî li dû amadekirina bernameyên akadêmî yê pêdagojî yê ligor zanîna nûjen ya fêrkirina zimanan.
2. Birêxistina encûmeneke ji akadêmîyên zimanzan ji bo pêşvexistina peyvên ji bo zimanê nûjen pêwîst û danîna rêyên ji bo yek-kirina bendên rêzimanî yê Kurmanciyê standard ji bo nivîsandinê.
3. Damezirandina enstîtû û akadêmîyên zimên, bi şertê ku bi rê ve nebin rêxistinên siyasî yê partiyan.
4. Birêxistina dezgehên televizyonî yê pêşvexistina Kurmancî bo xwe dikin yek ji armancên grîng.
5. Ziyadekirina jimara xwendegehên Kurmancîziman û xwendegehên êvaran ji bo perwerdekirina dayan û bavan.
6. Weşandina rojname û kovarên bi naverokeke rengîn û bi zimanekî durist û hêsan.
7. Perwerdekirina endamên civatê ji bo nerxdayîn û grîngdîtina xusetê xwendinê.
8. Misogerkirina piştgiya aborî bo nivîskarên xwedî behemên baş, yan xwedî hêza afirandina bedew ya wêjeyî.
9. Birêxistina navendên bo xwendinê û yê bo ji gengeşeyên wêjeyî; her weha avakirina şanoxaneyan, navendên perwerdeyî û pirtûkxaneyan.

10. Amadekirina ferhengên baş û durist. Her weha pirtûkên fêkirina gramerê yên baş û ji aliyê zimanzanên akadêmî ve hatinî amadekirin.

11. Dîtina çareyan ji bo birêxistina derfetên kirîna rojnameyan, kovaran, pirtûkan û xwedîderketina li berhemên nivîskî.

Van tevdêran û yên din grîng in, ji bo misogerkirina rizgarkirina Kurmancî ji tehlûkeya helandinê, yan herimandinê, û da ku ev ziman ji bo nifşên siberojê bimîne.



## RÊZIMANA INGLÎZÎ BI KURDÎ

*Husein Muhammed*

### PÊŞGOTIN

Zimanê inglîzî roj bi roj zêdetir dibe zimanê serekî yê hemû dinyayê. Her gava ku du qisekerên zimanên cuda bên ba hev, heke yek ji wan zimanê yê din nizane, bi ihtimaleka gelek mezin ew herdu dê bi alîkariya zimanê inglîzî danûstandinê bikin.

Kurd jî ji her demê zêdetir niha hewceyê hînbûn û zanîna zimanê inglîzî ne. Lê mixabin heta niha ti kitêbek li ser rêzimana inglîzî bi kurmancî peyda nabe. Ya rasttir, niha rêzimana ti zimanekê din – ji bilî zimanê kurdî bi xwe – bi kurmancî ne berdest e.

Kurd heta niha neçar bûn ku bi rêya zimanekê dagirker (erebî, farisî yan tirkî) dest bi hînbûna inglîzî bikin. Tesîreka nebaş ya van zimanan li ser fêrbûna inglîzî jî li kurdan dibe: kurd baş hîni inglîzî nabin ji ber ku di erebî û tirkî de gelek ji dengên inglîzî nînin. Di inglîzî de dengên hevberî "ç, ê, ç, g, j, o, p, v" yên kurdî hene lê ew di erebî de nînin. Di tirkî de jî "ê, w" û li dawiya peyvan jî "b, c, d, g" nînin ku di inglîzî de peyda dibe. Lê ev deng û û teqrîben dengên din jî yên inglîzî di kurdî de hene û dengkirina peyvên kurdî li gor dengnasiya kurdî hêsantir e. Wek din jî rêzimana inglîzî ji erebî û tirkî zêdetir dişibe ya kurdî. Kurdî û inglîzî ji eynî binemala zimanan anku ji zimanên hindûewropî ne lê erebî û tirkî ne ji wê binemalê ne.

Ev kitêb bingeheên rêzimana inglîzî bi kurdiya kurmancî dide nasîn. Ji ber ku ev yekem rêzimana inglîzî ya bi kurmancî ye, ew bo hînberên destpêker hatiye nivîsîn: ne hewce ye ku mirov bo xwandin û feydekirina ji vê kitêbê berî niha ti inglîzî bizane. Lê ev pirtûk hewl dide ku hemû qeyd û bendên bingeheên yên rêzimana inglîzî pêşkêşî xwandevanên xwe bike. Loma kesên ku ji berê ve hinekê inglîzî dizanin jî dikarin jê mifadar bibin.

Kitêb ne tenê bi kurmancî hatiye nivîsîn lê ew bi taybetî jî li gor hewcedariya kurdîaxivan hatiye amadekirin. Inglîzî ne zimanekê fonetîk e anku her herf herdem ne wek hev tê xwandin. Loma awayê xwandina peyvan jî li ber wan li gor alfabeya kurdî hatiye diyarkirin daku kurdîzan bikarin wan peyvan rast bixwînin. Bo nimûne, peyva inglîzî ya bi maneya "rast" ya kurdî wek "right" tê nivîsîn lê wek "rayt" tê gotin. Loma di nimûneyan de ew wiha hatiye diyarkirin: "right [rayt]: rast"

ku ji çepê ve ya yekem awayê nivîsîna peyvê ye, ya duyem şêweyê gotina wê ye û ya sêyem jî wateya wê peyvê ye.

Gelek caran awayê gotina peyvan bi alfabeya fonetîk ya navneteweyî IPA tê nivîsîn. Lê di vê rêzimannameya destpêkî de me bi zanetî li cihê IPAYê alfabeya kurdî bo diyarkirina awayê xwandina peyvên inglîzî bijartîye. Sebebê vê ew e ku piraniya kurdên destpêkerên zimanê inglîzî IPAYê yan qet nas nakin yan jî xwandina wê li ber wan giran û asê ye. Heke mirov bixwaze, dikare awayê gotina peyvên inglîzî bi IPAYê di gelek ferheng û rêzimannameyên din yên inglîzî de bibîne.

Ev rêziman bi taybetî bo kurdîxwînan hatiye hazirkirin daku ew hînî inglîzî bibin. Lê di rêzimannameya me de gelek nimûne hene ku bi inglîzî û kurdî ne. Inglîzîaxiv jî dikarin sûdê ji wan wergirin û bi wan nimûneyan piçekê fêrî kurmançî bibin. Bo hêsankirina xwandina peyvên kurdî bo inglîzîzimanan, awayê xwandina herfên kurdî bo inglîzîzimanan bi lîsteya li jêr hatiye diyarkirin.

Me herwiha peyvên rêzimanî bi inglîzî jî dane. Hêvî heye ku piştî hînbûn bingeheên rêzimana inglîzî, xwandevean dê bikarin bi alîkariya wan peyvên rêzimanî li ser wan babetan di nav kitêb û berhemên rêzimanî yên inglîzî de jî li gor pêwîstiyên xwe li wan mijaran bigerin û peyda bikin.

Demek kurt piştî vê rêzimannameyê, ferhengeka inglîzî-kurdî ya bi 1000 peyvên herî zêde li kar yên inglîzî li gel wergerên wan yên kurdî tê bêt belavkirin. Li gel her serpeyvê (headword) dê bi kêmî yek hevoka nimûne jî hebe.

***Husein Muhammed***

*Helsinki, zivistan 2013/2014*

## HOW TO READ KURDISH?

This book introduces the basics of English grammar in the Kurdish language (Northern or Kurmanji dialect). The main target audience is Kurds who wish to learn English.

However, the book includes plenty of examples in both English and Kurdish. Therefore, they might be of at least some help for English-speakers who want to learn Kurdish.

Kurdish alphabet is quite phonetical: words are pronounced pretty much the way they are written, apart from some exceptions; there is a one-to-one correspondence between a letter and a sound. For instance, “a” is always pronounced in a similar way (as English “a” in “father”), contrary to English (e.g. in words like “bath, father, tame”...)

To better help English-speakers to read correctly Kurdish words and phrases included in this grammar, we provide a list on how Kurdish letters are pronounced. The pronunciation is slightly simplified.

Ç, K, P and T are typically unaspirated. Word-initially they are sometimes aspirated, especially in loanwords.

### Kurdish alphabet

### Like English...

A a	A in “father”
B b	B in “big”
C c	J in “John”
Ç ç	CH in “CHurch” (aspirated) or CH in “churCH” (unaspirated)
D d	D in “dry”
E e	A in “hat”

Ê ê	EA in "head"
F f	F in "far"
G g	G in "game"
H	H in "have"
I i	I in "big"
Î î	EE in "see"
J j	S in "treasure" or French J in "jour"
K k	K in "key" (aspirated) or "sky" (unaspirated)
L l	L in "less"
M m	M in "make"
N n	N in "nap"
O o	O in "boring"
P p	P in "Paper" (aspirated) or P in "paPer" (unaspirated)
Q q	K in "can" but further back in the throat, Arabic ق
R r	R in "right" (word-initially more trilled/ rolled)
S s	S in "sea"
Ş ş	SH in "sharp"
T t	T as "take" (aspirated) or "star" (unaspirated)
U u	U in "put"
Û û	OO in "food"

V	V in "very"
W w	W in "wait"
X x	CH in Scotch "loch" or German "acht"
Y y	Y in "yes"
Z z	Z in "zero"

## ALFABE Û DENGNASÎ

Hemû herfên inglîzî di kurdî de jî hene lê di inglîzî de herfên kurdî yê bikumik (ê, î, û) û yê bipêncik (ç, ş) nînin<sup>73</sup>. Lê helbet hemû herfên inglîzî û kurdî wek hev nayên xwandin.

Herf	Navê herfê	Dengê(n) herfê
A a	ey	e, ey, a, o
B b	bî	b

<sup>73</sup> Di hin peyvên biyanî de (bi taybetî yê ji frensî) carinan hin herfên din jî tên bikaranîn ku di bingehê alfabeya inglîzî de nînin, bo nimûne "é" di peyva "café" (qehwexane) de.

C c	sî	k, s
D d	dî	d
E e	ê	ë, ê
F f	êf	f
G g	cî	g, c
H	êç	h
I i	ay	i, ay
J j	cey	c
K k	key	k
L l	êt	l, t
M m	êm	m
N n	ên	n
O o	ow	o, ow
P p	pî	pî
Q q	kyû	k
R r	ar	r
S s	ês	s, z
T t	tî	t
U u	yû	u, yu, ä
V v	vî	v
W w	dabîf-yû	w
X x	êks	ks, s
Y y	way	w
Z z	zî, zêd	z

Rêzimana inglîzî bi awayekê giştî gelek sade ye. Lê mijara ji hemûyan zehmettir nakokiya di navbera herfan û dangan de ye: eynî her di peyvên cuda de dikare bi awayên ji hev cuda bê xwandin û hin caran jî hin peyv mit/bêdeng in anku qet nayên xwandin (bo nimûne “e” li dawiya peyvê). Sebebekê vê nelihevîyê ew e ku axiftina inglîzî di dîrokê de gelek guheriyê lê nivîsîna inglîzî zêdetir wek berê maye. Sebebekê din jî yê giring ew e ku inglîzî li deverên cuda yê cîhanê bi awayekê giştî wek hev tê nivîsîn lê bi awayên ji hev cuda tê axiftin.

Di rastiyê de ti qeyd û bendên mitleq nînin ku mirov bikare diyar bike ka filan herf çawa tê xwandin: mirov çend qeydan rêz bike jî, dîsa hin peyvên inglîzî dê hebin ku ne li gor wan qeydan in. Lê dîsa jî hin qeyd hene ku dikarin alîkariya xwandevanan bikin ku piraniya peyvên rast bixwînin. Loma gava em li jêr dinivîsin ku filan herf bi bêvan awayî tê xwandin, divê wisa neyê fehmkirin ku “herdem” wisa tê xwandin lê “bi piranî” wisa tê xwandin.

## KONSONANT

Em ê pêşî ji konsonantan (herfên bêdeng, *consonants*) dest pê bikin ji ber ku dengê wan ji dengên vokalan (herfên bideng, *vowels*) kêmtir li gor peyvên diguherin.

Konsonantên inglîzî ev in: **b, c, d, f, g, h, j, k, l, m, n, p, q, r, s, t, v, w, x, z**. Y nîv-konsonant e: carinan konsonant e , carinan jî vokola e (li jêrtir binêre).

**B, D, F, H, M, N, V, W, Z** wek hevberên xwe yê kurdî tên xwandin:

- *big [big]: mezin*
- *dark [dark]: tarî*
- *far [far]: dûr*
- *horse [hors]: hesp*
- *member [membir]: endam, uzû*
- *name [neym]: nav*
- *very [vêrî]: gelek, pirr, zehf*
- *way [wey]: rê*

**J** wek C-ya kurdî tê xwandin: *job [cob] = kar, kargeh*.

**R** wek kurdî tê xwandin lê nermtir e û li dawiya peyvê hema-hema mit/bêdeng e anku nayê gotin.

**L** wek L-ya kurdî ya zirav (wek di peyva “lêv”) tê gotin: *lip [lip]: lêv*. Lê hin caran jî L wek L-ya qelew ya di peyvên “silav, welat” de tê bilêvkirin. Em ê di vê rêzimanê de dengê L-ya qelew bi herfa [ɫ] binivîsin: *apple [epit]: sêv*.

**K, P, T** wek hevberên xwe yê kurdî yê bihilm anku “req” tên xwandin. Wek di peyvên “kar, perde, tamam” de, ne wek di peyvên “kirin, pênc, te” de.

- *king* [king]: paşa, melik, qral
- *party* [partî]: partî hizb; şahî, cejn
- *tea* [tî]: çay

**S** wek S-ya kurdî tê gotin: *say* [sey]: gotin. Lê li nav û dawîya peyvê gelek caran wek Z tê bilêvkirin: *rise* [rayz]: rabûn, bilind bûn, hilketin, hilkişîn.

**G** bi piranî wek G-ya kurdî tê gotin lê carinan li berî E, I yan Y wek C-ya kurdî tê xwandin: *give* [giv]: dan lê *Germany* [cërminî]: Elmanya.

**C** bi piranî wek K-ya kurdî tê gotin lê li berî "e" û "i" wek S-ya kurdî tê gotin: *can* [ken]: karîn, şivan lê *cinema* [sinëmä]: sînema.

**Q** wek K-ya kurdî tê xwandin. Di transrîbsiyona nav û peyvên rojhilatî de ew li cihê Q-ya kurdî tê bikaranîn: Qur'an.

**X** wek KS tê xwandin. Li destpêka peyvê ew wek dengê S tê gotin.

**Y** li berî yan piştî vokalekê (a, e, i, o, u) wek Y-ya kurdî tê gotin. Eger ew bikeve piştî konsonantekê, ew wek "î" ya kurdî yan jî "ay" ya kurdî tê xwandin:

- *ready* [rêdî]: hazir, amade
- *by* [bay]: bi.

Gelek caran dengê bi cotekê herfan tê diyarkirin. Cotherfên gberbelav yê konsonantî ev in:

**CH** wek Ç-ya kurdî tê xwandin: *change* [çeync]: guherîn yan guherandin.

**SH** li gel hev wek Ş-ya kurdî tê xwandin: *she* [şî]: ew (jin)

**PH** wek F tê xwandin: *philosophy* [filosofî]: fîlosofî, felsefe.

**TH** wek Z-ya "fis" ("zal" ya erebî) – bi alfabe fonetîkî ya navneteweyî anku IPA [ð] – yan jî wek S-ya "fis" ("sa" ya erebî) – bi IPA [θ] – tê xwandin. Em jî dê wek IPAYê S-ya "fis" bi [θ] û Z-ya "fis" jî bi [ð] diyar bikin. Heke mirov nizane ka ew çawa tê gotin, mirov dikare wan herdem wek T bixwîne:

- *they* [ðey]: ew (pirhejmar)
- *three* [ðrî]: sê

Gava ku **KN** li destpêka peyvê bin, tenê N tê xwandin: *knife* [nayf]: kêr.

Heke **WR** li destpêka peyvê bin, tenê R tê bilêvkirin: *wrong* [rong]: xelet.

Dema ku **WH** li destpêka peyvê bin, carinan tenê W tê gotin (*what* [wat]: çi) û hin caran jî tenê H (*who* [hû]: kî).

**GH** li dawîya peyvê wek F tê xwandin (*enough* [înaf]: bes) lê carinan jî bêdeng e (*though* [ðuw]: tevî ku, digel ku). Di transrîbsiyona (tîpguhêziya) nav û peyvên rojhilatî de ew li cihê "xeyn"ê anku Ğ-/Û-



yê tê nivîsîn (Baghdad, Afghanistan: Bexda, Efxanistan). -IGHT bi giştî wek “-ayt” tê gotin (*fight* [fayt]: şerr; *might* [mayt]: dibe ku; *right* [rayt]: rast) . Lê awarte: “*eight* [êyt]: heşt; *weight* [wêyt]: giranî, wezn”.

**KH** di transrîbsiyona (tîpguhêziya) nav û peyvên rojhilatî de li cihê X-ya kurdî tê bikaranîn: Khalid (Xalid).

## VOKAL

Vokalên inglîzî ev in: **a, e, i, o, u**. Y jî carinan vokal e lê hin caran jî konsonant e.

Mixabin ti ji vokalên inglîzî herdem bi eynî dengî nayên gotin. Li jêr em ê hin qeydên gelek giştî diyar bikin. Ya baş ew e ku xwandevan dikarin di ferhengên bikêrhatî yên inglîzî de awayê gotina her peyvê li ber awayê wê yê nivîskî bibînin.

**A** bi piranî wek “e” ya kurdî tê xwandin: *man* [men]: mêr, zelum. Carinan jî wek “a” ya kurdî tê gotin: *father* [faðer]: bab, bav.

Heke piştî A-yê konsonantek hebe û piştî wê konsonantê jî “e” hebe, hingê “a” wek “ey” (*same* [seym]: eynî, heman) yan jî wek “ê” (*care* [kêr]: xwemxwerî, sexbêrî) tê gotin. “ai” bi piranî wek “ê” tê xwandin (*hair* [hêr]: mû, pîrç, porr). “aw” wek “o” yan “ow” yê kurdî tê gotin: *saw* [so]: dît.

Li berî du L-yan (ll) “a” wek “o” tê bilêvkirin: *ball* [boł]: gog, hol, top, tepk; *small* [smoł]: biçûk; *mall* [moł]: firoşgeh, bazar.

**E** bi piranî wek “ê” ya kurdî lê kurttir tê gotin. Em ê di vê rêzimanê de ê-ya kurt wek “ë” binivîsin: *her* [hêr]: wê. Heke piştî E-yê konsonantek hebe û piştî wê konsonantê jî “e” hebe, hingê E-ya yekem bi piranî wek “î” ya kurdî dirêj tê gotin: *here* [hîr]: vir, vê derê. “ea” wek “ê” yan jî “î” yê kurdî tîn bilêvkirin: *hear* [hîr]: bihîstin, guh lê bûn; *bear* [bêr]: hirç. Du “e” li gel hev (ee) wek “î” ya kurdî tîn xwandin: *beer* [bîr]: bîra.

**I** bi piranî wek “î” ya kurdî yan jî piçekê dirêjtir (lê ji “î” ya kurdî kurttir) tê gotin: *big* [big]: mezin. Heke ew tenê piçekê ji “l” ya kurdî dirêjtir be, em ê wê wek “l” binivîsin. Lê heke bi zelaî ji “l” ya kurdî dirêjtir lê ji “î” ya kurdî kurttir be (wek “i” ya tirkî), em ê wê wek “î” (du nuqte li ser “i”) binivîsin: (*twenty* [twëntî]: bîst). Heke piştî I-yê konsonantek hebe û piştî wê konsonantê jî “e” hebe, hingê I wek “ay” ya kurdî tê xwandin: *time* [taym]: dem, wext, çax, kat. “l” wek peyveka serbixwe bi maneya “ez” jî wek “ay” tê bilêvkirin.

**O** li gor peyvên wek “o”, “ow” yan “a” tê gotin: *so* [so]: wisa. Du O (oo) bi hev re bi piranî wek “u” yan jî “û” ya kurdî tîn gotin: *book* [buk]: kitêb, pirtûk lê *food* [fûd]: zad, xwarin.

**U** hin caran wek U-ya kurdî tê gotin: *put* [put]: danîn, bi cih kirin. Lê gelek caran wek “a” ya kurdî lê piçekê kurttir tê xwandin. Em ê vê a-ya kurt di vê rêzimanê de wek “ä” binivîsin: *but* [bät]: lê, feqet, ema. Heke du konsonant bikevin pey U, ew dengê nêzîkî “i” ya kurdî digire: *hurt* [hirt] = êşîn yan êşandin.

Y li dû yek yan çend konsonantan wek “î” yan jî “ay” tê gotin: *merry [mêrî]: bicoş, bikeyîf, xweş lê by [bay]: bi*. Heke Y bikeve pêş yan paş vokalekê, ew wek Y-ya kurdî tê xwandin.

## NAVDÊR

Navdêr (*nouns*) navên tiştan, deveran, kesan û bûyeran in: sêv, Kurdistan, Ehmed, muzîk, baran...

Navdêrên inglîzî jî wek yên kurdî hejmêrbar (*count nouns*) in yan jî nehejmêrbar (*uncount nouns*) in. Anku hin jê dikarin bîn hejmartin (jimêrbar) û hin jî nayên hejmartin. Navdêrên hejmêrbar dikarin wek navdêrên kurdî yekhejmar yan jî pirrhejmar bin. Lê berevajî kurmancî, navdêrên inglîzî cinsê (zayenda) rêzimanî nîne. Herwiha navdêrên yekhejmar tenê formeka xwerû heye, ew nayên çemandin/tewandin. Bo nimûne hem “sêv” û hem jî “sêvê” bi inglîzî “*apple*” e.

## PIRTIKÊN DIYARÎ Û NEDIYARIYÊ

Navdêrên nediyar yên hejmêrbar di kurdî de paşpirtika “-ek” yan “-yek” digirin: “kitêb-ek, rojname-yek”. Bi maneya wê di inglîzî de pirtika nediyariyê ((*indefinite article*) “a” yan “an” li pêş navdêrê tê danîn û jê cuda tê nivîsîn: “*a book*” (*kitêbek*), “*an apple*” (*sêvek*).

“An” wek “en” tê xwandin, “a” bi piranî wek “e” tê gotin. Lê heke giranî li ser “a” be anku mirov bixwaze bibêje ku tiştek bi tenê yek e û ne zêdetir in, hingê “a” wek “ey” tê gotin.

Heke navdêr bi dengê konsonantî dest pê bike, hingê “a” tê bikaranîn: “*a boy*” (*kurek*). Lê heke navdêr bi dengê vokâlî dest pê bike, hingê “an” tê bikaranîn: “*an eye*” (*çavek*).

Ya giring ew e ku peyv bi dengê konsonantî yan vokâlî tê gotin, ne giring e ka ew bi konsonantekê yan bi vokalekê tê nivîsîn: carinan peyvek bi konsonantekê tê nivîsîn lê bi vokalekê tê gotin û carinan jî berevajî. Ya muhim awayê gotinê ye, ne awayê nivîsînê: “*an hour*” [*en awir*] ji ber ku “*hour*” wek [*awir*] tê gotin) û “*a university*” [*e yunivêrsitî*] ji ber ku “*university*” wek [*yunivêrsitî*] tê xwandin.

Ji bilî pirtikên nediyar, di inglîzî de herwiha pirtika diyar (*definite article*) “**the**” [ðî yan ðî] jî heye. Ew hevberî “-eke” ya soranî, “el-” ya erebî, “le, la, l” yên frensî û “der, das, die” yên almanî ye. Ew hingê tê bikaranîn dema ku mexseda navdêrê filan tiştê diyar e: “*the chair*” (“ew kursî” yan “filan

kursî”, ne “çi kursiya hebe”). Pirtika diyar hem li gel navdêrên yekhejmar û hem jî yên pirhejmar li kar e:

- *Bring the chair, please! (Ka [vê/Wê filan] kursiyê bîne!)*
- *Take away the chairs, please! (Ka [van/wan filan] kursiyên bibe!)*

## PIRHEJMARÎ

Di inglîzî de forma komî (pirhejmar) bi amî bi alîkariya herfa “s” ji forma kit (yekhejmar) tê çêkirin:

Kit	Gotin	Komî	Wate
friend	[frênd]	friends	heval
school	[skûl]	schools	xwandingeh
car	[kar]	cars	tirimpêl, erebe
hand	[hend]	hands	dest
pen	[pên]	pens	qelem, pênûs
computer	[kompyûtir]	computers	kompûter

Heke forma yekhejmar bi “-ss, -ch, -s, -sh, -x” û gelek caran bi “o” bi dawî bê, hingê pirhejmarî bi herfên “-es” tê çêkirin:

Kit	Gotin	Komî	Wate
class	[kles/klas]	classes	pol, sef, sinif
watch	[woç]	watches	saet
wish	[wiş]	wishes	hêvî
bus	[bäs]	buses	otobûs
box	[boks]	boxes	qutî, sindoq

potato [pityto] potatoes petat, kartol

Gava ku forma yekhejmar bi konsonantekê + Y bi dawî dibe, hingê Y ji forma pirhejmar tê avêtin û li cihê wê “-ies” tê nivîsîn:

Kit	Gotin	Komî	Wate
lady	[leydî]	ladies	xanim, hurmet
country	[kantrî]	countries	welat
party	[partî]	parties	partî

Lê heke berî Y-ya dawiya peyvê vokalek hebe, hingê Y wek xwe dimîne û tenê S lê tê zêdekirin:

Kit	Gotin	Komî	Wate
boy	[boy]	boys	kur, kurik
days	[dey]	days	roj
play	[pley]	plays	lîstik, yarî; şano

Heke di forma yekhejmar, di kîteya dawiyê de F hebe, ew gelek caran di forma pirhejmar de dibe “-ves”.

Kit	Gotin	Komî	Wate
wife	[wayf]	wives [wayz]	jin (jina kesekî)
life	[layf]	lives [layvz]	jiyan, ruh
knife	[nayf]	knives [nayvz]	kêr
leaf	[fîf]	leaves [fîvz]	pelg, pel, belg, belçim

Ji aliyê dengnasî ve bi awayê giştî “s” ya pirhejmariyê wek “s” tê gotin. Lê heke ew li peyv vokalekê yan jî li dû dengên li gor alfabeya kurdî “b, d, g, v, ð (z-ya fis) bin, hingê “s” wek “z” tê gotin. Heke li pey “s, z, ş, j, ç, c” jî be, hingê wek “-iz” tê gotin.

Formên hin navdêran awarte ne (*irregular*):

Kit	Gotin	Komî	Wate
man	[men]	men [mën]	mêr, zêlam (mîrovên nêr)
woman	[wumen]	women [wimin]	jin (mîrovên mê)
child	[çayîd]	children [çîîdrên]	zarok
foot	[fut]	feet [fît]	pê
tooth	[tûθ]	teeth [tîθ]	qelem, pênûs
person	[pîrsin]	people [pîpîî]	kes, mîrov
mouse	[mawz]	mice [meys]	mişk

Navdêrên awarte ne tenê yê li jor lîstekirî ne. Ev tenê hin nimûne ne.

Pirhejmarên hin peyvan jî wek yekhejmarên wan in:

Kit	Gotin	Komî	Wate
fish	[fiş]	fish	masî
sheep	[şîp]	sheep	pez
deer	[dîr]	deer	xezal

Berevajî kurmancî, di inglîzî de forma pirhejmar hingê jî tê bikaranîn dema ku di kurmancî ne navdêr lê lêker yan diyarkerek eşkere dike ku navdêr pirhejmar e:

- *Kurd\_ bi kurdî diaxivîn. Kurds speak Kurdish*
- *Heval\_ baş in: Friends are good.*

- *Wî gelek heval\_ hene: He has many friends."*

## XWEDÎTÎ

Xwedîtî di inglîzî de bi zêdekirin apostrofeke (') û herfa "s" tê çêkirin:

- *a friend's house: mala hevlekî*
- *John's wife (jina Johnî)*
- *Rachel's husband (mere Rachelê)*
- *children's books (kitêbên zarokan)*

Heke "s" ji xwe wek nîşana pirhejmariyê li dawiya peyvê hebe, hingê tenê apostrof (') li dûv wê tê zêdekirin, êdî S-yeka din lê zêde nabe:

- *dogs' tails (kuriyên kûçikan, kilikên seyan)*
- *books' pages (rûpelên pirtûkan)*
- *my father's job (karê babê min)*

Xwedîtî herwiha dikare bi "the ... of the ..." jî bê diyarkirin

- *the pages of the book (rûpelên kitêbê)*
- *the first page of the book (yekem rûpelê kitêbê)*
- *the pages of the books (rûpelên kitêban)*
- *a picture of my father (wêneyekê babê min, wêneyekê ku babê min tê de ye)*

Hin caran jî di kurdî de gotinek bi xwedîtiyê tê diyarkirin lê di inglîzî de bi du peyvên li pey hev. Hingê peyvrêziya inglîzî berî ya kurdî ye:

- *winter clothes* (*cilên zivistanê* – *winter: zivistan; clothes: cil*)
- *evening meal* (*xwarina êvarê* – *evening: êvar; meal = xwarin, cem*)

## HEJMAR

Mirov dikare hejmarên (*numbers, numeral*) inglîzî li ser du beşan parve bike: hejmarên bingehîn (*cardinal numbers*) û hejmarên rêzî (*ordinal numbers*)

Ji hejmarên bingehîn baş diyar dibe ku kurdî û inglîzî xizmên hev in û herdu ji eynî binemala zimanên hindûewropî ne. Bi taybetî bala xwe bidin awayê gotina hejmarên 2, 3, 6, 9, 10.

### Hejmarên bingehîn

Nivîsîn	Gotin	Wate
1 one	wân	yek
2 two	tû	du
3 three	θrî	sê
4 four	for	çar
5 five	fayv	pênc
6 six	siks	şeş
7 seven	sëvin	heft

8 eight	êyt	heşt
9 nine	nayn	neh
10 ten	tên	deh
11 eleven	îfëvin	yazde(h)
12 twelve	twêlv	duwazde(h)
13 thirteen	θirtîn	sêzde(h)
14 fourteen	fortîn	çarde(h)
15 fifteen	fiftîn	pazde(h)
16 sixteen	sikstîn	şazde(h)
17 seventeen	sëvintîn	hevde(h)
18 eighteen	êytîn	hejde(h)
19 nineteen	nayntîn	nozde(h)
20 twenty	twëntî	bîst
21 twenty-one	twëntî- wân	bîst-û-yek
22 twenty-two	twëntî-tû	bîst-û-du
23. twenty-three	twëntî- θrî	bîst-û-sê
...	...	...
30 thirty	θirtî	sî, sih
thirty-one	θirt-wân	“sî-û-yek
...	...	...
40 forty	fortî	çil
50 fifty	fiftî	pêncî



60 sixty	sikstî	şêst
70 seventy	sêvintî	heftê
80 eighty	eytî	heştê
90 ninety	nayntî	not, nod
100 one hundred	wân händrêd	sed
101 one hundred and one	wân händrêd end wân	sed-û-yek
121 one hundred and twenty-one		sed-û-bîst- û-yek
200 two hundred		dused
300 three hundred		sêsed
1 000 one thousand	wân θawzind	hezar
1 011 one thousand eleven		hezar-û-yazde
10 <sup>6</sup> one million	wân miñyin	milyon
10 <sup>9</sup> one billion	biñyin	milyar

Wek kurmancî jî, hejmarên bingehîn tên berî navdêra ku tê hejmartin. Lê berevajî kurmancî, navdêr hingê herdem (ji bilî heke 1 be) nîşana pirhejmariyê (-s, -es) digire:

- *book (kitêb) > two books (du kitêb)*
- *watch (saet, demjimêrk) > ten watches (deh saet)*

Di hejmartinê de mirov bi kurmancî bo 100, 1 000 û 1 000 000 dibêje "sed, hezar, milyon" lê bi inglîzî dibêje "one hundred, one thousand, one million" anku "yek sed, yek hezar, yek milyon" (bide ber "du sed, du hezar, du milyon"). Di nav hevokan de mirov herwiha dikare bibêje "a thousand" anku "hezarek".

Hem kurmancî û hem jî inglîzî ji bilî navdêran, herwiha dikarin hejmaran bi xwe jî bitewînin, bi taybetî hejmarên temam yên wek sed, hezar, milyon:

- *hundred of students [händrêd ov styudints]: bi sedan xwandekar*

- *thousands of visitors* [ʃawzindz ov vizitirz]: *bi hezaran serdanker / mêvan*

Li cihê “bi dehan” bi piranî “dozens of” [dazins] li kar e.

### Hejmarên rêzî

Bi hejmarên rêzî mirov cihê kesekî yan tiştekî di sirayê anku rêzên li pey hev de diyar dike. Di kurdî de mirov dikare hejmarên rêzî bi gelek awayan çêke:

- *yekem, duyem, sêyem...*
- *yekemîn, duyemîn, sêyemîn*
- *-a/-ê/-ên yekê, -a/-ê/-ên dudiwa[n], -a/-ê/-ên sisiya[n]* (kurmanciya navendî)
- *-a/-ê/-êt êkê, ya/yê/yêt duwê, ya/yê/yên siyê / sê'ê* (kurmanciya rojhilatî)

Li gel formên bi “-em” û “-emîn” navdêr dikare berî yan piştî hejmarê be:

- *yekem car, cara yekem*
- *yekemîn car, cara yekemîn*

Bi formên din re navdêr tenê dikare piştî hejmarê be

- *cara yekê, hevalê diduwa, welatîyên tebeqa sisiya*
- *cara êkê, hevalê duwê, welatîyêt tebeqa siyê / sê'ê*

Bi inglîzî hejmarên rêzî 1., 2. û 3. ev in:

Nivîsîn	Gotin	Wate
1 first	first	yekem
2 second	sêkind	duyem
3 third	θird	sêyem

Ji wan her sê hejmaran pê ve yên din bi paşpirtika “-th” [θ] tên çêkirin

Nivîsîn	Gotin	Wate
4 fourth	forθ	çarem
5 fifth	fifθ	pêncem

6 sixth	siksθ	şêşem
7 seventh	sëvinθ	heftem
8 eighth	êyθ	heştêm
9 ninth	naynθ	nehem
10 tenth	tênθ	dehem
20 twentieth	twëntîθ	bîstem
21 twenty-first	twëntî- wân	bîst-û-yekem
22 twenty-second	twëntî-tû	bîst-û-duyem
23. twenty-third	twëntî- θrî	bîst-û-sêyem
24. twenty-fourth	twëntî- forθ	bîst û çarem
...	...	...
30 thirtieth	θirtîθ	siyem, sihem
40 fortieth	fortîθ	çilem
50 fiftieth	fiftîθ	pênciyem
...	...	...
100 hundredth	händrêdθ	sedem

### Hişyarî

- 1) Ji çarê pê ve paşpirtika "-th" bigire jî, di rastnivîsîn û gotina hin hejmaran de cudahî peyda dibe:
  - 5 five [fayv] > fifth [fifθ] (guherîna nivîsînê û gotinê)
  - 8 eight [êyt] > eighth [êyθ] (guherîna nivîsînê û gotinê)
  - 9 nine [nayn] > ninth [naynθ] (tenê guherîna nivîsînê)
- 2) Hejmarên 11 - 19 bê guherînan paşpirtika "-th" digirin:
  - *eleventh, twelveth, thirteenth...*
- 3) Heke hejmar bi "-y" bi dawî bên (wek "*twenty, thirty...*") di rastnivîsînê de ew dibe "-ieth":

- *twentieth, thirtieth.*

## Parjimar

Mebest ji parjimar (*fractions*) hejmarên ne tamam in. Hin nimûne ji parjimarên ev in: "nîv anku  $\frac{1}{2}$ , çarêk/çarek anku  $\frac{1}{4}$ , sêyek anku  $\frac{1}{3}$  (yek ji sê, parçeyek ji sê parçeyak), du ji pêncan anku  $\frac{2}{5}$ , 1 û nîv anku  $1\frac{1}{2}$  ...

Di inglîzî de jî, wek kurdî, "nîv"ê û "çarêk"ê navên xwe yên taybet hene:

- **half** [helf]: nîv (pirhejmar: **halves** [helvz])
- **quarter** [kortir / kwortir]: çarêk, çarek

Wek dî parjimar bi formulaya "parjimar bi hejmara xwe ya bingehîn û hejmara tamam forma xwe ya rêzî + -s" (heke parjimar ne 1 be) tên çêkirin:

- one-third (1/3)
- two-thirds (2/3)
- three fourth (3/4)
- three-fifths (3/5)

## Hesabkirin

Di hesabkirinê de peyvên bingehîn di inglîzî de ev in:

### Nivîsîn û nîşan

### Gotin

### Wate

plus +

pläs

zêde, û

*One plus two equals three.*

*Wän pläs*

*Yek û du dibin du.*

*1 + 2 = 3*

*tû îkwîtz*

*Ûrî.*

minus -

maynis

kêm

*Five minus one equals four.*

*Fayv*

*Pênc kêm yek dibe çar.*

*5 - 1 = 4*

*maynis*

*wän îkwîtz*

*for.*

times X	divayd	parve kirin, lêkve kirin
<i>Two times three equals six.</i>	<i>Tû taymz Ûrî îkwîtz sîks.</i>	<i>Du caran sê dibe şeş.</i>
divided by /	divayd	parve kirin, lêkve kirin
<i>Six divided by three equals two.</i>	<i>Sîks divaydid bay Ûrî îkwîtz tû.</i>	<i>Şeş li sêyan parvekirî dibin du.</i>

## RENGDÊR

Rengdêr anku sifet (*adjectives*) ew peyv in ku diyar dikin ka kesek yan tiştêk çawa ye: baş, dirêj, giran, sor, sar, rengîn...

Di kurmancî de di komika peyvên de rengdêr bi awayekê giştî bi izafeyan (paşpirtikan) bi navdêran ve tên girêdan: *mal-a xweş, reng-ê sor, dest-ên paqij, mal-ek-a mezin, dar-ek-ê stûr, kitêb-ên erzan.*

Anku di kurmancî de peyvêrêziya di vê rewşê de wiha ye:

- 4) navdêr + (pirtika nediyariyê “-ek / -yek”) + izafe (-a / -ê / -ên) + rengdêr (nimûne: “mal-ek-a mezin” yan li gor hin devokan “mal-ek-e mezin”)

Di inglîzî de rengdêr yekser (dîrekt) tên berî navdêran. Heke pirtikên diyarkirinê yan hejmar yan cînav jî li gel hebin, peyvêrêziya wiha ye:

- 5) pirtik / hejmar / cînav + rengdêr + navdêr.

Ne di kurmancî de jî di inglîzî de rengdêr bi xwe li gor hejmarê yan cîsî natewin.

## Cînav

## Wate

good friends	(hin) hevalên baş
a good friend	hevalek baş
the good friend	hevala / hevalê baş
the good friends	(filan) hevalên baş
two good friends	du hevalên baş
no good friend(s)	ti hevalê(n) baş
every good friend	her hevala/ê baş

Rengdêr herwiha bi alîkariya lêkerekê girêder çawaniya navdêran diyar dikin:

6) *This car is new. (Ev tirimpêl nû ye.)*

7) *That film seems interesting. (Ew film balkêş dixuye.)*

Di vê rewşê de peyrêziya kurmancî ye: (cînav / hejmar / hoker +) navdêr + rengdêr + lêker.

Di inglîzî de peyvrêzî wiha ye: (cînav / pirtik / hoker +) navdêr + lêker + rengdêr.

## RENGDÊRÊN GIRING

Em ê li vê derê lîsteya giringtirîn rengdêrên inglîzî bi awayê wan yê nivîskî li gel şêweyê gotina wan û wateya wan bi kurdî pêşkêş bikin. Tenê wateyên bingehîn yên peyvê hatine dan loma hin wateyên din jî dikarin hebin ku di vê lîsteyê de nehatine diyarkirin.

## Nivîsîn

## Gotin

## Wate

able	eybiî	bişiyar, kara, yê ku dikare
afraid	efrêd	bitirs, tirsîyayî
alive	eîayv	zindî, sax, nemirî
awake	eweyk	hişyar (ne di xew de)
bad	bed	xirab

beautiful	biyûtifut	spehî, delal, ciwan
big	big	mezin
bitter	bittir	tehl
brave	breyv	wêrek
broad	brod	fireh, berfireh
bright	brayt	geş
busy	bizî	mijûl, meşxul
careful	kêrfit	xemxwer, bisexbêr
cheap	çîp	erzan
clean	klîn	paqij, pak
clear	klîr	zelal
clever	klêvir	jîr, bîaqil
close	kîowz	nêzîk
closed	kîowzd	girtî (ne vekirî)
colorful / colourful	katirful	rengîn
cloudy	kîawdî	ewrîn, biewr
cold	koîd	sar
cool	kûl	hênîk; xweş
dangerous	deynciriz	bitehlîke, xeternak
dark	dark	tarî
deep	dîp	kûr
difficult	difikult	zehmet
dirty	dirtî	pîs
dry	dray	zuha, ziwa

dead	dêd	mirî
early	early	zû (berî dema xwe)
empty	emptî	vala, vale, xalî
exciting	ikzayting	biheyecan
expensive	ikspensiv	bihagiran, giran
fair	fêr	dadmend, adil
famous	feymis	navdar, binavûdeng, meşhûr
far	far	dûr
fast	fast	bilez, lezgîn
fat	fet	qelew
fine	fayn	(gelek) baş; hûr, hûrik
flat	flet	pehn
free	frî	azad, serbest; betal
fresh	frêş	hênik; taze, teze; terr
full	ful	tijî; têr
funny	fanî	pêkenok, (bo zewqê) xweş
generous	cêniris	merd
gentleman	cêntîlmen	camêr, xweşmirov
glad	glêd	şa, keyxweş
good	gud	baş
great	greyt	hêja, (gelek) baş
happy	hepî	dilşa, dilxweş, kêfxweş
hard	hard	req; zehmet
healthy	hêtêî	saxlem
high	hay	bilind



hot	hot	kel, (gelek) germ
hungry	hangrî	birsî, birçî
important	importint	giring, muhim
interesting	intiristing	balkêş, dilkêş, cazib
jealous	cêfis	çavnebar, hesûd
kind	kaynd	xweşmirov, camêr
large	larc	mezin; berfireh
late	leyt	dereng, direng
light	łayt	sivik
little	litî	kêm, piçek
lucky	łakî	bişans, bextiyar
low	łow	nizm
loud	ławd	(dengê) bilind
lucky	łakî	bişans, bextiyar
narrow	nerow	teng
near	nîr	nêzîk
necessary	nêsisirî	pêdivî, pêwîst, zerûrî
new	nîw	nû
nice	nays	xweşmirov; xweş
noisy	noyzi	biqerebalix, dengbilind
old	oîd	kevn; pîr
open	owpin	vekirî, vebûyî
quiet	kwayit	bêdeng, bêqerebalix, tena, rehet, aram
quick	kwik	bilez, zû
polite	połayt	rêzgir, bi-ihtiram

poor	pûr	feqîr, jar, hejar
rich	riç	zengîn, dewlemend
sad	sed	xemgîn, melûl
safe	seyf	biewle, bêtehlîke
salty	sofî	sûr, şor, têrxwê
short	şort	kurt, kin
sick	sik	nesax, nexweş
slim	slim	narîn, nazenîn, zêf, libar
slow	sîow	hêdî
small	smoî	biçûk
soft	soft	nerm
sour	sawir	tirş
strong	strong	xurt, bihêz, qewî, qaîm
sweet	swît	şîrîn
tall	toî	(mirovên) dirêj; (avahiyên) bilind
thick	θik	stûr, qalind; tîr
thin	θin	tenik
thirsty	θirstî	tî, têhnî (hewceyî avê)
tiny	taynî	hûrik, pirr biçûk
ugly	aglî	kirêt, kirh, necis
useful	yûzfuî	bikêrhatî
useless	yûzîs	bêkêr, bêxêr
warm	worm	germ
well	wêî	baş; sax, saxlem
wet	wêt	şil

weak	wîk	qels, lawaz, zeîf
windy	windî	biba, badar, têrba
whole	howt	temam, kamil, tev
worthless	wurθlës	bêqîmet, bêbiha, bêkêr
worthwhile	wurθwayt	bihagiran, bikêr, biqîmet
young	yang	genc, xort, ciwan

Gava ku mirov bixwaze bibêje tiştek û tiştekê dî "hindî hev" yan "wek hev" in û wan bi rengdêrekê bide nasîn, em peyvika "as ... as" [ez ... ez] bi kar tînin:

- This is as good as that one. Ev wek ewa han baş e.

- This is **as** good **as** that one. (Ev wek wê baş e.)
- Summer isn't **as** cold **as** winter. (Havîn ne wek zivistanê sar e.)

## RENG

Navên rengan (*colors / colours*) dikarin di kurdî û di inglîzî de jî hem wek rengdêr û hem jî wek navdêr bînin bikaranîn. Navên rengan di lîsteyeka li jêrtir de hatine rêzkirin.

Nivîsîn	Gotin	Wate
black	blek	reş
blue	blû	şîn
brown	brawn	qehweyî
green	grîn	kesk
grey	grêy	gewr
orange	orinc	pirteqalî, narincî
pink	pink	pembeyî, pîvazî, pînk
purple	pirpit	mor, xemr

red	rêd	sor
white	wayt	spî
yellow	yêfow	zer

## BERHEVDAN

Di inglîzî de, wek kurdî, mirov dikare taybetiyên tiştan bide ber hev: "mezintir, biçûktir, mezintirîn, biçûktirîn".

Forma berhevder (*comparative*) bi **"-er"** [-ir] yan **"more ..."** [mor] tê çêkirin. "More" dikeve pêş rengdêrên dirêj (sêkîteyî yan dirêjtir):

Sade	Berhevder
difficult zehmet	<b>more difficult</b> zehmettir
beautiful spehî	<b>more beautiful</b> spehîtir
expensive (biha)giran	<b>more expensive</b> (biha)girantir

"-er" dikeve pey rengdêrên kurt (yek- yan dukîteyî):

Sade	Berhevder
slow hêdî	<b>slower</b> hêdîtir
soft nerm	<b>softer</b> nermtir
rich zengîn	<b>richer</b> zengîntir
high bilind	<b>higher</b> bilindtir
low nizm	<b>lower</b> nizmtir

Heke rengdêr bi xwe bi "-e" bi dawî bê, êdî tenê "r" lê tê zêdekirin: "large > larger" (berfireh), "nice > nicer" (xweşmirov, xweş).

Heke rengdêr bi "-y" bi dawî bê, di forma berhevder de "-ier" tê cihê wê: "tiny > tinier" (hûrik), "lucky > luckier" (bişans, bextiyar).

Formên berhevder yê peyvên "good" (baş), "bad" (xirab) û "little" (kêm, piçek, hindik) awarte/istisna ne:

### Sade

### Berhevder

good [gud] **baş**

**better** [bêtir]

baştir, çêtir

bad **xirab**

**worse** [wirs]

xirabtir

little [litl] **kêm, piçek, hindik**

**less** [lès] kêmtir,

piçektir

Di hin peyvên kurt de konsonanta dawîya peyva sade di forma berhevder de dubare dibe:

### Sade

### Berhevder

**big** mezin

**bigger** mezintir

**hot** kel, germ

**hotter** germtir

Bo diyarkirina kut îstek "ji" tiştekê din cuda ye û eşkerekirina wê bi rengdêrekê di inglîzî de bi alîkariya peyvika "**than**" [ðen] tê bikaranîn:

- *This is better **than** that one. (Ev ji wê baştir e.)*
- *Summer isn't colder **than** winter. (Havîn ne ji zivistanê sartir e.)*

Forma sêperlatîv (*superlative*) bi kurdî dikare bi sê awayên ji hev cuda bê bikaranîn

- **-tirîn**: firehtirîn, tengtirîn
- **herî + forma sade**: herî fireh, herî teng
- **ji hemûyan + forma berhevder**: ji hemûyan firehtir, ji hemûyan tengtir

Bi inglîzî forma sêperlatîv bi alîkariya paşpirtika "**-est**" (rengdêrên kurt) yan jî bi peyvika "**most** ..." (rengdêrên dirêj) tê çêkirin:

Sade	Berhevder	Sûperlatîv
hard <b>req</b>	harder reqtir	<b>hardest</b> reqtirîn
hot <b>kel, germ</b>	<b>hotter</b> keltir, germtir	<b>hottest</b> germtirîn
dangerous <b>xeter</b>	<b>more dangerous</b> xetertir	<b>most dangerous</b> xetertirîn

Hemû guherînên di forma berhevder de çêdibin, di forma sûperlatîv de jî cih digirin:

- dubarenebûna "e" ya li dawiyê: *nice > nicer > nicest*
- "y > "-iest": *lucky > luckier > luckiest*
- dubarebûna konsonantê: *big > bigger > biggest*

Formên sûperlatîv yên peyvên "good" (baş), "bad" (xirab) û "little" (kêm, piçek) jî awarte ne:

Sade	Berhevder	Sûperlatîv
good [ <b>gud</b> ] baş	<b>better</b> [bêtir] baştir, çêtir	<b>best</b> [bêst] baştirîn
bad [ <b>bed</b> ] xirab	<b>worse</b> [wirs] xirabtir	<b>worst</b> [wirst] xirabtirîn
little [ <b>litl</b> ] kêm, piçek, hindik	<b>less</b> [lê] kêmtir, piçektir	<b>least</b> [lîst] kêmtirîn

Forma superlatîv di de bi alîkariya "ya / yê / yên" yên serbixwe yan jî "-a / -ê / -ên" yên bi navdêrê ve girêdayî tên xebitandin:

- *Ev ya/yê baştirîn e. Ew yên baştirîn in.*
- *Ev sêva baştirîn e. / Ev baştirîn sêv e.*

Di inglîzî de li cihê wan wê pirtika diyarker "**the**" yekser li pêş navdêrê cihê xwe digire:

- *the best apple (sêva baştirîn / baştirîn sêv)*
- *This is the best. They are the best. (Ev ya/yê baştirîn e. Ew yên baştirîn in.)*
- *This apple is the best. (Ev sêva baştirîn e. / Ev baştirîn sêv e.)*

## Pêşîn û paşîn

Di kurdî de tişta berî hemûyan li dawiya hemûyan bi gelek awayên tên gotin:

- yekem, ya/yê/yên yekê, ewil, pêşîn, ya/yê/yên pêşiyê
- dawîn, ya/yê/yên dawiyê, axir, ya/yê/yên axirî, axirîn, paşîn

Di inglîzî de yekem **"first"** [first] û "dawîn" jî **"last"** [last] yan **"final"** [faynit] e.

## CÎNAV

Di kurmancî de du desteyên cînavan hene: desteya xwerû (ez, tu, ew, em, hûn, ew) û desteya çemandî (min, te, wê/wî, me, we, wan).

Tevî ku di inglîzî de tenê desteyeka navdêran heye (bo nimûne "book" li cihê "kitêb" û "kitêbê") lê di inglîzî de pênc desteyên cînavan hene.

## Desteya kirde

Nimûne	Gotin	Wate
I	[ay]	ez
you	[yû]	tu
he	[hî]	ew (mêr û kit)
she	[şî]	ew (jin û yekhejmar)
it	[it]	ew (heywan yan tişt yê kit)
we	[wî]	em
you	[yû]	hûn
they	[ðey]	ew (komî: ferq nake mêr, jin, heywan yan tişt bin)

Ev deste wek kirdeyên hevokan tîn bikaranîn anku di hevokan de ew tiştêkî dikin yan tiştêk yan kesek in:

- 8) *I say (ez dibêjim).*
- 9) *I said (min got).*
- 10) *You are here. (Tu li vê derê yî).*
- 11) *He went (Ew çû).*
- 12) *She ate (wê xwar).*

- a) Bala xwe bidinê ku di kurmancî de forma cînavî carinan diguhere (ez dibêjim / min got) lê di inglîzî de, heke cînav kirde be, ew herdem bi vê desteya xwerû tê bikaranîn (I say / I said).
- b) Di inglîzî de hevberî "tu" û "hûn" herduyan tenê "you" heye. Anku inglîzî wek ihtiramgirtinê tenê ji her kesî re dibêjin "hûn", ti caran nabêjin "tu". "Thou" (tu) ya dîrokî êdî di zimanê niha de nemaye.
- c) Hişyar bin ku di inglîzî de li cihê "ew" ya kurdî çar cînavên cuda hene.



## Desteya berkarî

Cînav	Gotin	Wate
me	[mî]	min
you	[yû]	te
him	[him]	wî (kesî)
her	[hër]	wê (kesê)
it	[it]	wê/wî (heywanê/î yan tiştê/î)
us	[äs]	me
you	[yû]	we
them	[dëm]	wan

Ev deste wek berkarên hevokan (*object*) û li gel daçekan (prepositions) tên bikaranîn anku di hevokan de ew tiştêk li wan tê kirin yan di wan de ye yan ji wan dice yan tê wan yan bi wan tê kirin: *You see me (Tu min dibînî), You saw me. (Te ez dîtîm), for us (bo me, ji me re).*

- Bala xwe bidinê ku di kurmancî de forma cînavî carinan diguhere lê di inglîzî de, heke cînav berkar yan bi daçek be, ew herdem bi vê desteya berkarî tên bikaranîn.
- Di hevokên kurmancî peyvêza normal kirde+lêker+berkar e (ez te dibînîm) lê di inglîzî de kirde+berkar+lêker e ("I see you" ku peyv-bi-peyv dibe "ez dibînîm te").

## Desteya xwedîtiyê ya girêdayî

Cînav	Gotin	Wate
my	[may]	(-a /-ê /-ên) min
your	[yor]	(-a /-ê /-ên) te
his	[hiz]	(-a /-ê /-ên) wî (kesî)

her	[hër]	(-a /-ê /-ên) wê (kesê)
its	[its]	(-a /-ê /-ên) wê/wî (heywanê/î yan tiştê/î)
our	[awir]	(-a /-ê /-ên) me
your	[yor]	(-a /-ê /-ên) we
their	[đer]	(-a /-ê /-ên) wan

Ev deste wek xwediyên / xudanên komika peyvan tê bikaranîn:

13) *my book* (*kitêba min*),

14) *your friend* (*hevalê te*)

15) *her eyes* (*çavên wê*)...

- Di peyvîziyê de di kurmancî de tiştê xwedîkirî berî xwediyê xwe ye û bi izafeyê (-a / -ê / -ên) bi xwediyê xwe ve tê girêdan (*kitêb-a min*, *bira-y-ê wî*, *çav-ên wê*). Lê di inglîzî de xwedî berî tiştê xwedîkirî ye ("*my book*" ku peyv-bi-peyv dibe "*a-min pirtûk*", "*his brother*" dibe "*ê-wî bira*", "*her eyes*" dibe "*ên-wê çav*")
- Ev desteya cînavan tenê hingê bi kar tê dema ku yek yan zêdetir navdêrên xwedîkirî li dûv wan hebin: "*your head*" (*serê te*), "*my books and pens*" (*kitêb û qelemên min*). Heke mirov bixwaze cînavên xwedîtiyê bê tiştê xwedîkirî bi kar bîne, wek "ya min, yê min, yên min" (li cihê "kitêba min, dilê min, çavên min", hingê mirov di inglîzî de cînavên desteya xwedîtiyê ya serbixwe dixebitîne (li jêrtir binêre).
- Bala xwe bidinê ku di kurmancî de navdêr berî cînavê tê û navdêr bi izafeyê / qertafê (*kitêba min*, *hevalê te*, *çavên min*) bi cînava li pey xwe ve tên girêdan. Izafe di kurmancî de cînsê nêr yan mê yan jî pirhejmariyê diyar dike. Di inglîzî de cînavê xwedî berî navdêra xwedîkirî tê û pirhejmarî – heke hebe – bi dawiya navdêrê ve girêdayî ye (*her eyes*).
- Heke li gel navdêrê rengdêrek jî hebe, hingê rengdêr dikeve navbera cînavî û navdêrê: "*my new friend*" (*hevalê min yê nû*).

## Desteya xwedîtiyê ya serbixwe

Cînav	Gotin	Wate
mine	[mayn]	(ya /yê /yên) min
yours	[yorz]	(ya /yê /yên) te
his	[hiz]	(ya /yê /yên) wî (kesî)
hers	[hêrz]	(ya /yê /yên) wê (kesê)
its	[its]	(ya /yê /yên) wê/wî (heywanê/î yan tiştê/î)
ours	[awirz]	(ya /yê /yên) me
yours	[yorz]	(ya /yê /yên) we
theirs	[ðerz]	(ya /yê /yên) wan

Ev deste wek cînavên xwedîtiyê / xudaniyê tên bikaranîn gava ku ew serbixwe tên xebitandin anku tiştê xwedîkirî li dû wê nayê:

## Desteya 3

It is my book (**Ew** kitêba min **e**).

This is her bag (**Ev** çanteyê wê **ye**.)

Are these your pens? (**Gelo ev** qelemên te **ne?**)

## Desteya 4

It is **mine**. (Ew **ya min e**).

This is **hers**. (Ev **yê wê ye**.)

Are these **yours**? (Gelo ev **yên te ne?**)

## Cînavên refleksîv (xwegêr)

Cînav	Gotin	Wate
myself	[maysêlf]	(ez) xwe
yourself	[yorsêlf]	(tu) xwe
himself	[himsêlf]	(ew mêr) xwe
herself	[hêrsêlf]	(ew jin) xwe
itself	[itsêlf]	(ew heywan / tişt) xwe
ourselves	[awirsêlvz]	(em) xwe
yourselves	[yorsêlvz]	(hûn) xwe
themselves	[dêmsêlvz]	(ew) xwe (komî: mirov, heywan yan tişt)

- Ev desteya cînavan wek berkara hevokê tê bikaranîn gava ku berkar û kirde eynî bin: *I see myself in the mirror.* (Ez xwe di eynikê re dibînim.)
- Ev deste wek berkara daçekan jî dikare bê bikaranîn: *She cooked food for herself.* (Wê xwarin bo xwe çêkir.)
- Wek kirdeyê hevokê dema ku mirov bixwaze bibêje kesekî “bi xwe” yan “bi tenê” tiştê kiriyê: *He did it himself.* (Wî bi xwe ew kir.)
- Hişyarî: berevajî kurdî, di inglîzî de ev deste nayê bikaranîn dema ku hin tiştên wisa tên kirin ku mirov adeten bi xwe dike: “Wî **xwe** şûşt.” (He washed ~~himself~~.) “Wê cil li **xwe** kirin” yan “wê cil kirin ber **xwe**.” (She dressed ~~herself~~.)

## Cînavên hevî (resîprokal)

Cînavên hevî anku resîprokal (*reciprocal*) di inglîzî de “each other” û “one another” in. Ew hemû maneya “hev, hevdu, hevudu, hevûdin, yekûdu, êkûdu” yên kurmacî didin. *We see each other every day. (Em her roj hev dibînin.)*

“Each other” bi forma xwe ya xwedîtiyê “each other’s” jî heye: *“We are each other’s friends.” (Em hevalên hev in.)*

## Cînavên nîşander

Cînavên nîşander (*demonstrative pronouns*) bi kurmacî “ev” û “ew” in û formên wan yên çemandî / tewandî ne (vê/vî/van, wê/wî/wan). Di kurmacî de ew li gor cinsî /vê/vî, wê/wî), li gor hejmarê (yekhejmar “vê/vî” û “wê/wî” lê pirhejmar “van” û “wan”) û herwiha li gor kirde û berkarê (kirde: “ev mal xweş e” lê berkar: “ez ê vê malê bikirim”) diguherin.

Di inglîzî de cînavên nîşander li gor kirde û berkarê yan li gor cinsî naçemin lê li gor hejmarê tên tewandin.

Yekhejmar	Pirhejmar	Wate
-----------	-----------	------

this [ðis]	<b>these</b> [ðîz]	ev
------------	--------------------	----

that [ðät]	<b>those</b> [ðûz]	ew
------------	--------------------	----

- *This book is good. (Ev kitêb baş e.)*
- *These books are good. (Ev kitêb baş in.)*
- *That pen is sharp. (Ew qelem tûj e.)*
- *Those pens are sharp. (Ew qelem tûj in.)*
- *I read this newspaper. (Ez vê rojnameyê dixwînim.)*
- *I read those newspapers. (Ez van rojnameyan dixwînim.)*
- *I write with that pen. (Ez bi wî qelemê dinivîsim.)*
- *I write with those pens. (Ez bi wan qeleman dinivîsim.)*

“**This one**” maneya “eva han, evê han” dide gava ku li dûv wan ti navdêr di komikê de tine bin. “**That one**” jî wateya “ewa han, ewê han” dide. Pirhejmarîyên wan jî wiha ne: “these ones” (evên han) û “those ones” (ewên han).

Heke rengdêrek raveker jî li gel navdêrê hebe, hingê rengdêr dikeve navbera cînavî û navdêrê:

- *this new car (ev tirimpêla nû)*
- *that old house (ew xaniyê kevn)*

Di kurmancî de cînavêkê nîşander û cînavêkê kesî dikarin bikevin pey hev\_

- *Ev hevalê min*
- *Ev hevalê te yê nû*

Di inglîzî de cînavên nîşander û yên kesî nikarin bikevin dûv hev. Loma di rewşên wiha de mirov hewceyî avakirineka din ku gelek wek qalibê kurdî ye:

- *this friend of mine*
- *this good friend of yours*

Herwiha ev qalib hingê pêdivî ye gava ku mirov di eynî komikê (frazê) de cînavêkê xwedîtiyê û pirtikeka serbixwe ya diyariyê (the) yan nediyariyê (a, an) bi kar bîne:

- *a friend of mine (hevalekê min)*
- *a good friend of yours (hevalekê te yê baş)*

## CÎNAV Û HOKERÊN PIRSYARKÎ

Cînavên pirsyarkî (*interrogative pronouns*) ew cînav in ku mirov pê pirsî tiştan yan kesan dibe. Di kurmancî de “çi, çî” cînavêkê neçembar e anku herdem wek xwe dimîne. Lê, berevajî “çi”, cînavê “kî” forma tewandî “kê” jî heye. Herwiha cînavê “kîjan” jî jê hatiye çêkirin.

Herçi hokerên pirsyarkî (*interrogative adverbs*) ne, mirov bi wan pirsî dem, cih, sebab û çawaniya tiştan dipirse: “kengî, kû, çima, çawa”. Ew di kurdî de nayên tewandin (ne \*kengiyê, \*çimayê...)

Di inglîzî de jî ji cînavên pirsyarkî “what” (çi) û “which” naçemin. Hemû hokerên pirsyarkî jî neçembar in: “how” (çawa), “when” (kengî), “where” (kû, kû derê).

Cînav

Wate

what [wät]	çi
who [hû]	kî; kê (wek kirde)
whom [hûm]	kê, kî (wek berkar û li gel daçekan)
whose [hûz]	(ya /yê /yên) kê
which [wiç]	kîjan, kîj, kîşk
where [wër]	kû, kû derê; li kû
when [wën]	kengî, kingê
why [way]	çima, bo çi, ji ber çi

- *What is this? (Ev çi ye?)*
- *What are you doing? (Tu çi dikî?)*
- *Who is he? (Ew kî ye?)*
- *Whom do you know? (Tu kê nas dikî?)*
- *Whose home is this? (Ev mala kê ye?)*
- *Which is yours? (Kîjan y ate ye?)*
- *Where do you go? (Tu kû ve diçî?)*
- *Where are they? (Ew li kû ne?)*
- *Where does he come from? (Ew ji kû tê?)*
- *When do you return? [ritin] (Tu ê kengî vegerî?)*
- *Why are you so sad? [sow sed] (Tu çima wisa xemgîn î?)*

Bala xwe bidinê ku:

- a) “Who” li gor berkariyê (whom) û di rewşa xwedîtiyê de (whose) ditewe.
- b) “Where” hem maneya “kû, kû ve” (livîna ber bi cihekî ve) û hem jî wateya “li kû, li kû derê, li kû ve” (mana li cihekî dide). Lê heke mirov bixwaze livîna “ji cihekî” diyar bike, daçeka “from” yan tê pêş “where” (from where) yan jî dikeve dawiya hevokê: *Where he comes from? (Ew ji kû tê?)*
- c) Di hevokên bi cînavên yan hokerên pirsyarî de cînavê/hokera pirsyarkî li destpêkê ye, forma tewandî ji lêkera “be” (am, is, are...) li dû wê ye û paşî jî kirdeyê tê: “What is this?” (“Ev çi ye?”, peyv-bi-peyv: “Çi ye ev?”) “Who is he?” (“Ew kî ye?”, peyv-bi-peyv: “Kî ye ew?”)

- d) Heke lêker ne formeka ji lêkera "be" be, hingê hevok bi lêkera alîkar "do" (li gel cînavê sêyem yê yekhejmar "does") tê avakirin: "What do you say?" ("Tu çi dibêjî?" ku peyv-bi-peyv dibe "Çi dikî tu gotin?")

## CÎNAV Û HOKERÊN TÊKILIYÊ

Cînavên "what" û "who" (li gel "whom, whose, which") herwiha wek cînavên têtikiliyê (*relative pronouns*) jî tên bikaranîn:

- *You can say what you want. (Tu dikarî bibêjî [ka/bê] te çi divê.)*
- *I know who you are. (Ez dizanim [ka/bê] tu kî yî.)*
- *I forgot whom I saw? (Min ji bîr kir [ka / bê] min kî dît.)*
- *This is my friend who studies biology. [bayolocî] (Ev ew hevalê min e yê ku biyolojiyê dixwîne.)*
- *That bag is the one whose owner I don't know. (Ewê han ew çante ye yê ku ez xwediyê wî nanasim /nizanim.)*

Ji bilî "what, who, whom, whose, which", "that" [đet] jî wek cînavê pirsyarkî tê bikaranîn û wateya "ku" ya kurmancî dide:

- *I didn't know that you are here. (Min nedizani ku tu li vir î.)*

## HIN CÎNAV Û DIYARKERÊN DIN YÊN GIRING



Ev cînav yan diyarker di inglîzî de naçemin anku herdem bi eynî formê ne: bo nimûne “a little” hem maneya “piçek” û hem jî wateya “piçekê, piçekî” dide.

Em ê li jêr van diyarker (determiners) û cînavan (pronouns) bi nimûneyan pêşkêş bikin.

## Cînav

## Gotin

a few [e fîw]

hin, hinek,  
hindek,  
çendek,  
çend (ne  
wek pirsiyar)

*I know a few persons here.*

*Ez çend  
kesan li vir  
dinasim.*

a little [e litt]

piçek,  
hindik, kêr,  
hinek

*He speaks a little English.*

*Ew piçekê  
inglîzî  
dizane.*

any [eni]

her, kîjan be

*Bring any books you have.*

*her kitêba ku  
te hebe bîne.*

anyone [eni wan]

her kes, kî jî  
be

*Anyone can do this.*

*Her kes  
dikare vê  
bike.*

anything [eniθing]

her tişt, çi  
tişt be jî, ti  
tişt

*Is there anything I can do for you?*

*Gelo tişteke  
heye ku ez  
bo te bikim?*

a number of [e nâmbir ov]

hejmareka,  
hejmareke,  
hinek,  
çendek

*A number of people were killed.*

*Hejmareka  
mirovan  
hatin kuştin.*

a couple of [e kapîf ov]

cotek,  
du-sê

*A couple of friends visited me.*

*Du-sê heval  
hatin  
serdana min.*

all [ot]

hemû, hemi,  
giş, gişt, tev

*All the students came to the class.*

*Hemû  
xwandekar  
hatin dersê.*

almost [otmost]

teqrîben,  
hema-hema

*Almost all were happy with the results.*

*Teqrîben  
hemû bi  
encaman  
razî bûn.*

another [inâdîr]

ya/yê din,  
ya/yê dî

*Try another time.*

*Careka din  
biceribîne.*

any [eni]

*Bring anything you what.*

her, kîjan be

*Her tiştê ku  
bixwazî bîne.*

both [bowθ]

*We are both writers.*

herdu

*Em herdu  
nivîskar in.*

certain [sirtin]		filan, diyar, yek yan hin kes yan tiş tên diyar
<i>Certain things must be changed.</i>		<i>Hint işt hene ku divê bên guherandin.</i>
each [îç]		her yek, her kes
<i>Each of us will have to answer the questions..</i>		<i>Divê ku her yek ji me bersiva pirsan bide.</i>
either ... or [îdir ... or]		yan ... yan jî
<i>Either you will do it or we will not pay you.</i>		<i>Yan tu ê wê bikî yan jî em pare nadin te.</i>
enough	[înâf]	têr, bes, têra
